

# KERKÛK LI BENDA WE YE HEVAL!

# ***KERKÛK LI BENDA WE YE HEVAL!***

**Di Kesayetiya Ş. Merwan Û Ş. Armanc De; Pêşkêşî Tevahî Cangoriyên Şerê Dijberî DA’ÎŞ’ê Dikim!**

**Ji bo amadekirin û nivîsandina vê pirtûkê spasî û destxweşiyê weke deynekî dibînin li beramberî hemû hevalan qada navîn. Spas ji bo alîkarî û teşwîqên we!**

**NAVÊ PIRTÛKÊ: KERKÛK LI BENDA WE YE HEVAL!**

**AMADEKIRINA PIRTÛKÊ: AYTEN AMED**

**DÎROKA AMADEKIRINÊ: 2016**

**DÎROKA ÇAPÊ: 2016**

**ÇIHÊ ÇAPÊ: ÇAPXANEYA AZADÎ**

## LI SER NIVÎSÊ ÇEND PEYVEK!

Ger gotin di nava dilan de bi cih bibûya ez bawer dikim me yê hemû hestên xwe ji xwe, ji derdora xwe û ji tevahî mirovan veşarta. Lê weke ku hûn jî dizanin ti hest û raman nikarin xwe di nav dilên bi hestên ciwan dagirtî ve veşêrin. Gelek caran difikirim dibejim gelo mirov heye li ser rûyê vê dinyayê ku bikaribe hestên xwe yên xweşik û ciwan ji mirovan veşêre, dikare vê xirabiyê berê li xwe û paşê jî li dîroka xwe bike. Ger ez van kêlî û hestên dagirtî di van mehan de dijîm nenivîsînim ez ê tenê ne berevajî xwe bikevin; dibe ku berevajî dîrok û rastiya jiyana xwe jî bikevim. Di zanebûna vê rastiyê de me. Ji bo wê ye ji roja ku hatime vê qadê heta niha ramanên min bi min re di nav pêşbirkê de ne. Aliyekî min dixwaze van rojên dagirtî binivîse, aliyê min ê din mîna her car di nav xemsariyê de dijî. Lê ya ku min ji nivîsê şûn de dide ne ev in. Ya ku min şûnde dide tirsa têrênekirina pênûsa mine. Ew tirse ku ez ê nikaribin van kêliyên dijîm li ser van rûpelan bixemlînim. Hûn dizanim ji bo ku mirovek hestên xwe binivîse û nivîsên xwe zindî bike divê xwedî wêjeyeke bihêz û pênûseke bi quwet be. Gelo ew hêza min heye ku ez bikaribin pênaseya van rastiyan bikim. Divê ku ez êdî dev ji pirsan berdim û dest bi bersivan bikim. Na! Na! Ez ê bersiva van pirsan ji we re bihêlim, hevalên min ên hêja! Belê, bila bersiva van pirsan ji we re bimîne. Dema ku we ev nivîs xwendin ji kerema xwe re li şûna min van pirsan bi bersivînin. Bê ka min  heqê van kêlîyan daye an na?............

Wan jiyan kir min nivîsand. Ger min nekariye ez bi hemû aliyan wan kêliyan bînim ziman, ji hemû hevalên ku ew kêli jiyan kirine lêborîna xwe dixwazim. Dizanim ne gengaze ku ji hemû hest, soz û hêviyên we re bibim bersiv. Kêmek be jî min xwest wan kêliyan bi vê nivîsê zindî bigirim. Pena tînim wan dilê we yê mezin ji bo aliyên ku kêm mane!

★

Dixwazim

Te di nava hestên bê dawî de

Vebêjim.

Ji nava stêrkên asîmanan

Hilbijêrim

Di şevên tarî û bêdeng de

Bedewiya ser rûyê te yê zêrîn

Biqîrînim.

Di berbanga sibê de

Di kêliyên di navbera jiyan û mirinê de

Di germahiya berxwedanê de

Navê te,

Kenê te

Evîna te

li ser lêvên zarokên pêxwas,

tazî û kelogirî

Binivîsînim.

Te binivîsînim keça berxwedêr

Bejna te ya dirêj

Porê te yê xelekî

Binexşînim li ser lat û zinarên welatê penaberan

Binexşînim bi nalîna dilê pir li êş û jan.

Kenê li ser lêvên te

Yên kêliyên dawî

Xem û kulê dilê min e

Îro Arîn dibe

Kobanê dibe cihana dilê şikestî

Dilê min bi dilê we re lêdide.

Firmêskên çavên min tevlî xwîna lehengan dibe

Ber bi geliyê Zîlan ve diherike

Mîna Avaşîn û Basya

Bi hev re diherikin

Di kêliya ku firmêskên çavên min û xwîne we digihêje hev

Jinek nû serhildide

Hin caran navê vê jinê Îştar

Hin caran Star û Stêrke

Lê îro Arîn û Kobanê ye

Navê jina serhildêr.

**XANEQÎN**

Di nava deryaya êşên dilê min de

Tu tenê dilopekî

Di nava deryaya hestên min de

Tu tenê xemekî

Awirên li ser çavên te yî reş!

Jana dilê hêviyên min e

Di nava kêliya hestên min de

Renge te

Dengê te û evîna te heye

Tu êşî li ser zeryaya dilan

Tu janî di xewnên şevan de

Tu yî şêrînê ber dilê evîndaran

Tu hêviya hesretên me yî

Çavên te yên zêrîn

Kenê li ser lêvên zarokên Kerkûkê ye

Êş bi şadiya te

Xemgînî bi kene li ser lêvên te

Belav dibe mîna ewrên biharê

Ger tu êş bî

Ger tu jan û hesret bî

Ger tu hêviya şikestî û dilê birîndar bî

Dîsa jî nexeme

Êşa te

Jan û hesreta te

Bi serser û çavan

Mêvanê her roj a dilê welatê min

## VAYE DÎSA HAT DEMA XATIRXWESTINÊ

YEK JI ROJÊN havînê, germahî giştibû çi pileyê nizamim. Weke ku pileya germahiya havînê nizanim di heman demê de wê rojê li gorî ku min dizanî ber bi nexweşxaneya diranan ve birêketim. Di vê rêwîtiyê de ya ku ez ne li bendê bûn hate pêşiya min. Ji aliyekî ve germa, ji aliyê din ve jî bendewariya ku ez ê kengî biçim hindur û derkevim. Di nav van hestan de min hewl dida bi çend hevalên ku ji yekîneyên leşkerî hatine nexweşxaneyê re giftûgo bikim. Armanca min him naskirina wan hevalan bû, him jî derbazkirina demê bû. Ji nivşikê ve hevalek ji hundur derket û got: “ Başbû ku me tu dîtî, ji vê sibehê ve em hewl didin xwe bigihînin cihê te da ku em bêjin were karê hevalan bi te heye.” Dema ku min ev gotin ji deve wê hevalê bihîst ya ku ez pê fikirîm ew bû ku dîsa karê hevalan ê wergerê bi min heye bû. Bi xemsariyeke mezin çûm oda klînîka diranan. Çend derziyên bencê li devê min dan û hatim derê. Piştî ku karê min bi dawî bû ber bi cihekî gelek diyar, lê cihê ku dê çarenûsa min a nediyar tê de bê nîqaşkirin ve çûm. Ji aliyekî de bê xem diyar bûm, lê ji aliyê din ve jî di nav meraqeke mezin de bûm. Gelo wê vê carê berê min bikeve kîjan cih û warî, ez ê ber bi kîjan nediyariyan ve bikevim nava rêwîtiyê û hwd. Di nav mejiyê min de pirsên bi vî rengî dikirin hawar. Jixwe ya ku hawar dikir ne mêjiyê min ya rast hestên min bûn. Ji aliyekî ve pêvajo, ji aliyê din ve ez û daxwazên min hebûn. Min ne dixwest dev ji daxwazên xwe berdim, ne jî dixwest berevajî pêvajoyê tevbigerim. Lê min pir baş dizanî ku di wê kêliyê de çi bê pêşiya min ez ê nikaribin mîna demên borî bêjim na! Min baş dizanî ku di vê nîqaşê de wê gotina na ji devê min dernekeve. Weke ku tê payîn ev nehêzeke xwedayî,

nejî qedr û qeder bû. Ya rast pêvajoyê dest û lingên min girê dabû li beramberî hemû egeriyan. (îhtîmal) min tevahî egerî dan berçavê xwe ji bilî egeriya na. Gotina na jî hilbijardeyeke, lê ev hilbijarde her tim di nav hilbijardeyên şoreşger û pêşenga de nîne. Heta piraniya caran nîne. Ji ber ku di wê kêliya ku tu biryara şoreşgeriyê didî de tu tevahî hilbijardeyên xwe li şûn xwe dihêlî. Ji bilî hilbijardeya bê sînor xizmetkirinê. Tenê di xizmetkirinê de tu sînorên te nîne. Ger na divê ku tu dev jî hemû daxwaz û hilbijardeyên xwe yên şexsî berdî û bi dûv hilbijarde û berjewendiyên giştî de bazdî. Heta ku digihêje armanc, ango hedefa xwe.

BELÊ, ev demek dirêje ku min dev jî hilbijardeyên xwe yên şexsî berdabû. Tenê mîna bablîsokê li dûv hinek rastiyan dibezim. Hinek caran di vê beza xwe de di nîvê rê de radiwestiyam, hinek caran jî bi înad îradeyeke mezin ber bi hengava dawî ve dibezim. Mîna lîstokvanê ku ber bi maratonê ve dibezî. Lê vê carê min nedizanî bê ka ez ê ber bi kîjan warî ve bikevim pêşbirka birin, ango nebirinê. Di hemû pêşbirkan de serfeftin û binkeftin heye, lê em jibîr nekin ku di hinek pêşbirkan de jî wekhevmayîn heye. Li gorî min wekhevmayîn şêwazê binkeftina herî xirabe. Di jiyana xwe de qet min nexwestiye di pêşbirkan de wekhev bimînim. Ji sibehê heta demjimêr dehê şevê ez li bendê bûm ku tenê du gotin ji min re bê kirin û ez bizanibim bê ka ez ê ber bi kîjan nediyarî, tirs û xofan ve bikevin ser rê. Rê, lê rêyeke çawa?

Dİ DERENGİYA ŞEVÊ di bin banê esmanekî reş û tarî de, bi dilekî şikestî di nav çend xulekan de ji min re hat gotin ku ez ê derbazî Kerkûkê bibim. Ger gotin di cih de be ya ku ez qet ne li bendê bûm li ber min bû. Kerkûk. Bele, ez berê jî li wan deran mabûm. Ji xwe ev demek bû min qet nedixwest biçim xebatên bajar, ango civakî. Ya di dilê min de wan nedizanî, ya di dilê wan de ne li gorî min bû. Lê di wê kêliyê de naçarbûm ku biryarekê bidim. Erê, yan na! Erê jî hinek egerî û zehmetî diafirand, na jî bi

heman şêwazê. Lê mala rastî û hestyariyan xirabe. Ji ber hestyariya pêvajoyê negengaz bû ku gotina na ji devê min derkeve. Ji xwe beriya ku ji min re bihata gotin min biryara xwe dabû û min gotibû ger vê carê berê min bikeve dozehê jî ez ê biçim. Tenê şevek li berdestê min bû. Yanî şeveke min hebû ji bo ku ez careke din xatirê xwe ji evîndara xwe bixwazim. Pişta xwe bidim wan çiyayên ku ez tenê li wan rehetim. Tenê di nava wan de hizûrê dibinim û xwe li mala xwe hîs dikim. Diviyabû ku min xatirê xwe ji wan bixwesta. Diviyabû ku cara dawîn min hewaya wan deran hilmijiya. Mîna zarokê li ber sînga dayika xwe şîr dixwe, ji dayika xwe ya pîroz diviya bû min xatir bixwesta. Qut bibama. Wê şevê min têra xwe li esman li stêrkan nêrî. Yek bi yek, ji tevahî hezkiriyên xwe re silav şandin bi rêya wan. Hesreta dilê xwe ji wan re vegot. Ew jî bûn şirîkê xemên min. Nizanim heta sibehê çend stêrkan xatirê xwe ji min xwest û ber bi erdê ve rijiyan. Çend caran heyv di bin ewran de ma, çend caran bi awirên fedyok li min nerî? Ango min ji evîna xwe ya li beramberî xwezaya wê şerm kir. Kî ji me fedyok, kî ji me wê şevê bieş bû ez nizanim. Ya ku dizanim diviyabû ku careke din ez ji pêsira dayika xwe qutbibûma. Ma zarokê şîr xwurî dikare bê pêsîra dayika xwe bijî; ma dikare bêy ku bêhna dayika xwe bigire nefes bistîne. Na, na nikare.

GELO kî dikare texmîn bike ku wê şevê min çend xwezî arasteyî xwedayê xwe yê ku qet baweriya min pê nebû ku xweziyên min pêk bîne kir? Ma kîja xweziyên min heta niha ji aliyê xwedê ve hatibûn pejirandin heta ku ev bihata pejirandin. Ji bo ku ji ber sînga dayika xwe neyêm qutkirin heta sibehê min çend awatî, daxwaz arasteyî xwedayê li erşê asîmanan kir nizanim. Ya ku dizanim tenê ew bû ku êdî kêliya xatir xwestinê hatibû. Gelo hûn dizanin di nava nefretên min de yek ji wan jî mîna jinekê giriye. Ez ji giriyê jinan gelekî aciz û bêzarim. Girî, ji bo min lewaziye di hinek rewşan de. Wê şevê min tevahî firmêskên çavên xwe zûwa kirin mîna hestên xwe. Çavên xwe yên kelogirî ji

derdorê veşart. Awirên xwe ber bi hinek şûnên nediyar ve veda. Heta wê kêliyê ku edî min nekarî ku ez rê li pêşiya wan bigirim. Dema ku min xatir xwest ji min re weha hat ku ev kêliyên jiyana min ên dawîne di van cih û waran de. Wê demê firmêskên min ên ku min bi zor rê li ber herikandina wan girtibû, mîna bendava ku rê lê hatiye girtin bi ser hinarokên rûyê min de herikîn. Lê naxwazim ev kêliyên min ên dawî bin. Naxwazim ji sînga dayika xwe qut bibim bikevim paxila zilamên nenas. Naxwazim di nav hestên zilamên nenas de bigevizim. Naxwazim dev ji evîndara xwe berdim. Naxwazim ji aliyê cenawarên bi navê bajaran ve bêm daqurtandin. Naxwazim, naxwazim; naxwazim. Lê tevî ku naxwazim berve baz didim. Ev çi pevçûne lawo? Pêvçûna di navbera hest û raman de, pevçûna di nav rastî û xwestekan de! Aqil te ji daxwaziyên te qut dike, hestên te di nav daxwaziyan de difetise. Ey hawar da ka werin û ji vê re çareseriyekê bibînin hevalno!

DÎ DEMSALA havînê de di germahiya tebaxê de, bi dilekî şikestî min tevahî derd, kul û xemên xwe li dilê bar kir; berê xwe da bîra qederê. Dibêjim qeder ji ber ku di wan kêliyan de ya ku ez pê difikirim ev bû. Divê qedera min be Başûr. Gotineke pîrka min a pir bi nav bang hebû. Digot: “jê revya wê tê geryawê” yanî tu ji çi birevî tê ber bi wir ve biçî! Belê, ez jê direvim, ber ve diçûm.

MA KES dikare ji rastiya xwe, rastiyên jiyana xwe bireve? Belê, dema ku rastiyên giştî bibin mijara gotin tevî ku tu dizanî jî tu neçarî jê birevî. Gav bi gav ez ji wan rastiyan dûr diketim. Di pişta Erebê de, min kêlî bi kêlî ew dîmenên dawî di nav dil û mêjiyê xwe de neqîşand. Ji ber ku min dizanî ku careke din weke ku ez dixwazim heta demeke dirêj ez ê nikaribin van dîmenan bibînim. Min dizanî ev çûyîna min wê ji çûyînên caran, ango demên borî cudatir be. Lê min qet texmîn nedikir bê ka wê ev çûyîna min ji kîjan aliyan ve cuda be. Ji ber ku ne ez ya berê bûm, ne jî ew cihên ku ez diçûmê mîna berê bûn. Vê carê şerekî pir dijwar ji aliyê

hêzekî hov li ser gelê Kurd hatibû ferzkirin. Ev şer ne tenê şerê me bû, şerê hebûn û li nav çûna gelê Kurd bû di rastiya Başûrê Kurdistanê de.

GER HÛN rastiyê bixwazin qadê ku em ê weke hêza PKK'ê biçûyanê wê qadên ku em weke tevger qet tê de nedihatin naskirin bûn. Ev ji aliyekî ve avantaj bû, lê ji aliyê din ve jî gelek dezavantaj di nav xwe de dihewand. Berî her tiştî gelê van herêman em nasnedikirin. Weke ku gel em nasnedikirin me jî taybetmendiyên vê herêmên ên leşkerî, civakî, siyasî û çandî zêde nasnedikirin. Dibe ku hinek agahiyên me yên giştî hebûn li ser van herêman, lê em qet bi hûrkariyên van herêman re mijûl nebibin. Ev jî weke tevger û kadroyên vê tevgerê kêmasiya me ya herî mezin bû. Em bixwazin ango nexwazin ev rastî rê li ber gengeşî û aloziyên mezin vedikir ji bo me. Bi tevahî alozî, gengeşî û nenasiyên xwe ve em ber bi nediyariya jiyana xwe ya Kerkûk û derdora Kerkûkê ve bi rêketin. Hêzên me yên leşkerî bi germahiyeke mezin ji aliyê gelê herêmê ve hatibûn pêşwazîkirin. Cara yekemîn bû ku mîna hêzên leşkerî derbazbûna me ya van herêman çêdibû, tevî bê rastiyê jî mîna ku xewna gelê me yê Başûr a ku bi salana pêknehatiye pêk bê, gel hêzên me pêşwazî kirin. Ger gotin di cih de be hêzên me li beramberî pêşwaziyeke bi vî awayî matmayî mabûn. Nema dizanî li beramberî vê pêşwaziyê çi bike, bersiveke çawa bide vî gelî; ji dervî bi awayekî çalak tevlîbûn ji operasyon û çalakiyan re çêkirinê. Ji aliyekî ve rastiya xwedî derketina gel li gêrîla, ji aliyê din ve jî dijwariya şerê ku li herêmê berdewam dikir û weke gêrîla em ê ji vê xwedî derketinê re çawa bibin besiv; di nava pêvçûnên mezin de bûn. Rastiyek hebû, ev jî ew bû ku ji bilî gêrîla gel baweriya xwe bi ti hêzî nedianî ku wî biparêzin. Ev rastî û bawerî eşkereye ku barên hêzên me girantir dikir. Ji ber ku herêmên ku hêzên me yên leşkerî û xebatên me yên civakî xwe tê de bi cih kiribûn herêmên di nav rastiya Iraq û herêmê de xwedî taybetmendiyên pir cuda bûn.

BELÊ, ji wan herêman re tê gotin “**navçeyên dabiraw, yan jî herêmên bi nakok”** Çiye ev nakokî, ango çî ye rastiya vê dabiraw, ango qutbûnê. Ji herêma Maxûrê heta xeta Mendelî yanî bi wateyeke din heta sînorên Xaneqîn ji re tê gotin xeta 36. Ev xet ji bajarê Kerkûkê û tevahî navçe û gundên wê pêk tê. Hinek ji van cihana jî di çarçoveya sînorên bajarê Mûsilê de ne. Divê ku di vir de em rastiya Şengalê jî jibîr nekin. Şengal xwedî statuyeke taybete di nava herdu hikumetan de. Ji hinek aliyan ve hikumeta navendî, ji hinek aliyan ve jî hikumeta herêmê lê xwedî derdikeve. Lê di rastiyê de xwediyê van herêman nîne. Ji despêka despêkirina tevgera Kurdan ve heta roja me ya îro li Başûrê Kurdistanê ev nakokî didome. Piştî despêkirina raperina Kurdan li vî parçeyî û bi destxistina hinek derfetan ve ev nakokî berdewam in. Partiyên siyasî yên Kurd li gorî hinek berjewendiyên xwe yên demî dev ji hinek herêman berdane. Tevî ku dev jê berdane jî, di her derfetê de ji bo ku hinek tawîzan ji hikumeta iraq’ê bigirin van herêman dixin rojevê. Ya ku dixin rojevê ne rastiya dîrokî ye ku ev herêm di navê sînorê Kurdistanê de ne; berevajî ji bo ku bikaribin hinek tawîzan bigirin rojevkirina van herêman e. Di dema nivîsa destûrê de her çiqas aliyên siyasî li ser hevkiribin û aliyê Kurdan li beramberî hinek berjewendiyên teng ên hizbî dev ji van herêman berdabin jî, lê dîsa jî dema ki dilê wan dixwaze ji xistina rojevê jî paş de gav navêjin. Bi taybet di van demên dawî de tevahî siyaseta xwe spartine mijara di şerê dij DA’ÎŞ’ê de ku wan ev herêm parastine. Rastiyeke bi vî rengî heye. Di vî şerî de yên ku ev herêm parastin hêzên Kurdî ne. Ev rastî nikare bê înkarkirin. Lê wê hikumeta Iraq’ê û siyaseta demê bihêle ev herêm ji Kurdan re bibe mal û Kurd van herêman vegerîne ser hikumeta herêmê? Wiha diyare ku weke ku alî pê difikirin wê asan nebe. Tevlîkirina van herêman ji sînorê hikumeta herêmê tê wayeta bi hêzbûna hikumeta herêmê li beramberî hikumeta navendî. Eşkereye ku ev hikumet wê vê bi hêzbûnê zêde nepejirîne. Jixwe li gorî siyaseta navdewletî ya ku li beramberî Kurdan di vê serdemê de tê

meşandin jî dê zêde guncaw neyê dîtin. Çawa ku bi sedên salane ev nakokî di derbarê van navçeyan de didomê, wê bi dehan salên din jî bidome. Ji ber ku di vê mijarê de tu kesên ku xwedî lê derkevin nîne di holê de.

YA RAST GELÊN van herêman jî ne xwedî van herêma ne. Kesên ku derfetên wan hene ber bi bajarên din ve koç dikin. Yanî di welatê xwe de, li ser axa xwe koçberî û penaberiyê dijîn. Yên ku derfetê wan nîne jî naçarin di nav rastiyeke wiha de bijîn. Ger hûn rastiyê dixwazin gelên ku di van herêmên ku em qala wan dikin de dijîn hemû xwedî taybetmendiyên hevbeş in. Li gorî dizayn û statuya siyasî ku hatiye xêzkirin kesayetî jî hatiye parçekirin. Kîja pergal li gorî berjewendiyên wan be ber bi wê ve bêy ku bifikire direve. Ji aliyekî li beramberî herdu pergala azice, xwedî berteke, ji aliyê din ve jî sûd ji herdu pergalan jî digire. Him pê re nakoke, him jî di pê re jiyankirinê de ti xeteriyan nabîne. Hinek caran dema ku mirov pê difikire dibeje; gelo mirov dikare weha bijî? Lê rastiyên jiyana civakî ya van deran bi asanî bersiva vê pirsa mirov dide û dibeje; “belê”  ger mirov bê rêgez be dikare bijî. Çawatiya vê her tim mîna pirsekê hebûna xwe diparêze di mêjiyê mirovên ku xwedî rêgezin. Rêgez xaleke gelek girîng e di jiyana mirovan de, lê girîngiya vê rastiyê ji zû ve wateya xwe di jiyana mirovên vê derê de winda kiriye. Winda ye, ji ber ku tiştek bi navê rêgezê nîne li vî welatî. Ya heyî parastina berjewendiyên kêliyêne, ne berjewendiyên demdirêj, ango netewî. Hema bêje di encama siyaseta pargala heyî de berjewendiyên giştî hatine jibîrkirin; ango rakirine refê. Di nav refên mêjiyê mirovan de riziye.

EM WERİN SER rastiya netewî û hestên netewî li van deran. Gelek caran qala van xalan kirin jî dibe mijara ku hinek kes henekê xwe bi te bikin. Ji ber ku netewbûyîn û siyaset, hebûna partiyên siyasî tenê di kesayetiya partiyên herêmî de hatiye naskirin. Li van deran siyaset=derew; ne ku hunerê meşandina civakê, hunerê parastina deskeftên civak, çaresirkirina pirsgirêkên xwe

birêvebirina civak, ango netewane. Ji bo vê ye ku dema qala siyasete tê kirin her kes ji te direve. Siyaset tenê di wateya parastina berjewendiyan de tê bidestgirtin. Ya şênber di meriyetê de ye, pratik û gavên ku rojane ji aliyê her partiyekê ve tê avêtine. Ger di wê rojê de gavekî şênber ji aliyê kîjan partiyê ve hatibe avêtin bêy ku bifikire dikare wê partiyê biparêze, xwedî lê derkeve. Weke ku hûnê jî fêm bikin, li van dera her tişt, lê her tişt li gorî kêliya dikare bê guhertine. Şoreşgerê îro, dibê dikare beşdarî xebatê dij şoreşê bibe. Tiştek bi navê xwedî derketinê û baweriyê nemaye li van herêman. Ji bo vêye ku tu nikarî di hemû aliyan de baweriya xwe pê bênî. Jixwe di derbarê Başûr giştî de têgihîneke me ya bi vî rengî heye. “Nabin malê me, kesayetiyeke parçekirî heye. Bê rêgeze, rewşa kesayetiyê nediyare” û hwd. Lê ev rastiyên giştî ku em her tim xwe mahkûmî wan dikin û li gorî wan tevdigerin vê carê di vê hatine de hema bêje ji bo min hemû hevalan vala derketin. Ya rast nêzîkatiyên gel bi me dan valaderxistin. Dibêjin vala derketin ji ber ku rastiyên ku di van demên borî de min û me li van herêman jiyan kir bi rastî jî mijara vegotinê ne. Ez ê hewl bidim ku van hest û sozên ku ji aliyê gel ve li beramberî tevger, gêrîla û PKK heyî vebêjim. Armanca min a ji vê nîvîsê jî hinekî ev e ku ji van hestên gel re ger bi qasî dilopekê be jî bibim bersive.

EZ Ê Jİ HERÊMA Mexmûrê ve despê bikim û heta Mendelî werim. Da ka werin em bi hev re rêwîtiyeke bi hest û sozan dagirtî di van herêman de bikin. Hêvîdarim di vê rêwîtiyê de hûn jî bi qasî min ji van deran hez bikin û pê ve bên girêdan.

★

**MAXMÛR:**

TEVÎ KU Bİ salane gelê me yê Bakurê Kurdistanê dijî û di rewşa koçberiyê de ye û weke rêxistin hebûna li vê qadê heye jî, lê weke pêwîst me hîn taybetmendiyên vê herêmê nasnekirine. Ya ku em di derbarê vê herêmê de dizanin tenê ew e ku di bin bandore PDK'ê de ye. Lê ji dervî vê rastiya herêma Maxmûrê ji aliyê civakî ve xwedî taybetmendiyên gelek balkêş in. Ji aliyê siyasî ve weke ku di bin bandora PDK'ê de tê naskirin di hilbijartinên herî dawî de ya ku zêde deng lê bidest xistin YNK bû. Sedema bi destxistina dengên zêde ne çalakbûna YNK'ê berûvajî; lêgerînên gel yên partiyeke din û bêzariya wan li beramberî PDK'ê ye. Piştî ruxandina Sedam herêm bi awayekî giştî ket destê YNK'ê, lê di demeke kurt de bi destwerdana PDK'ê re ev rastî berevajî bû. PDK ji aliyekî ve gel tirsand, ji aliyê din ve jî zevî, xanî, pere li ser gel belav kir. Tenê bi vê ve jî sînordar nema, kesên ku bi salan bû ji aliyê hikumeta Baas ve nehatibûn damezrandin di nav sazî û dezgeyên hikumî de damezrand. Bi kurtî ew derfetên ku heta wê kêliyê tu kesî pêşkêşî wan nekiribû ji aliyê PDK'ê ve ji wan re hat pêşkêşkirin. Ji bo vê ye ku ev herêm ji aliyê siyasî ve hebûna PDK'ê qebûl dike. Heta gelek caran jî bi vê armancê dikare sîxiriyê li ser kesê ku herî nêzîkî xwe ye bike. Hema bêje kes baweriya xwe bi kesî nayîne. Bav ji kur ditirse, kur baweriyê bi bavê xwe nayîne. Kesayetiya klasîk a Kurdên borî her tim bi zanebûn di dewrê de tê girtin. Navengeke bawerî tê de nebe, ne gengaze ku tu bikaribe rêxistinê pêş bixî.

JÎ ALÎYÊ CÎVAKÎ VE mirov dikare bêje ji hemû herêmên Başûrê Kurdistanê cuda ye. Hinek qanûn, ango kevneşopên civakî hene ku di vê herêmê de hikmê xwe didomînin ji yê serdema navîn jî paşverûtirin. Gelek xalên ku di nav civaka Kurdan de di encamê pêşketina têkoşîne de êdî di dîrokên kevn de mane hîn hikmê xwe didomînin. Ji aliyê axlaqê civakî ve rizandineke pir mezin dijîn. Mijarên mîna qelen, jin bi jinî, destdirêjiya ser keç û jinan ji aliyê zilaman ve rewa dîtin serwerin. Bav dikare keça xwe ji xwe re bide bi jinekê û rewa bê dîtin. Zilam dikare çar jina bîne, heta dikare van jinan ji bo derfetên madî ji aliyê cinsî ve bikar bîne, lê tu kes dengê xwe nake. Tevî ku ew kes nan nîne di mala wî de bixwe, debara zarokê xwe bike. Xulame, lê tevî vê jî zilamtiya xwe di anîna pir jinan de îspat dike. Çiqas jinên wî hebin, xwe ewqas zilam hesab dike. Ji aliyekî ve bi kevneşopan ve girêdayî ye, ji aliyê din ve jî tevahî kevneşopên Kurdan ên di mijara namûs û şerefê de heye binpê dike. Xala ku dijî ne pergala sermayedariyê ye, ne jî feodaliye. Ger feodalîteya Kurdan be, divê jin firoşî qebûl neke, ger vê qebûl dike û ji rêzê dibine divê rê di hinek xalên civakî de li pêşiya jinê veke. Yanî di navbera herdu pergalan de asê maye û li gorî xwe rêyek hilbijartiye. Ev rê jî eşkereye ku li gel kevneşopên çand û exlaqê Kurda neguncave. Pir kêm kes hene ku keçên xwe didin xwendin. Rêjeya xwendinê gelek kême. Pîşeyê sereke pêşmergetiye. Ji bilî pêşmergetiyê pîşeyên din gelek kêmin di vê herêmê de. Asta xwendevaniyê li jêr sifirê ye. Lê çav sor û pê tirsin. Ji mirinê, şer qet natirsin. Çiqas ji PDK'ê û Barzanî acizin, ewqas jî pê ve girêdayîne. Girêdana wan ne girêdaneke zanistî û bîrdoziye, berevajî ji ber ku rastiya bîrdoziya vê partiyê nikarin tahlil bikin û hêza wan ê tahlîlê nîne pê ve girêdayîne. Ji ber ku naxwazin derfetê jiyana xwe ya erzan û bê ked ji dest xwe bidin pê ve girêdayîne. Civakeke bê nakokiye, ji ber ku bê nakokiye ya ku tê pêşiyê mîna xwarina danekî li ser sifrê li pêşiyê ye hema dadiqurtîne. Min ti beşên civakê biqasî ya vê qadê nedîtiye ku bê nakok be.

GELÊN VÊ DERÊ PKK û rastiya PKK'ê di kesayetiya gelê me yê wargeha Ş. Rustem de dinase. Piraniya malan dema ku tu diçiyê dibêjin; "Pêwendiyên me bi PKK'ê re pir bi hêzê, filan karê me ji aliyê PKK'yiyan ve hatiye kirin, karê xwe baş dikin; gelek ji wan ji me dewlemendtir in." Ji ber vê têgehê meşandina xebatê li vir gelekî zahmet e. Bi taybet xebatên aboriyê hema bêje negengaz e. Li vir xebata esasî tenê ew e ku tu rastiya PKK'ê bide naskirin û şer bi kevneşopên civakê re bike. Tu weke kadro ji aliyê gelê vê herêmê ve gelek caran ji malê tê qewitandin, lê şaş fêmnekin ne qewitandineke çorse. Di despêkê de qebûl dike. Tu diçî malên wan, xwarin, vexwarin ji te re tînin; gelekî baş te pêşwazî dikin. Lê piştî vê pêşwaziya germ tu carekê dibînî xwediyê malê li çavên hev dinêrin û dixwazin tiştekî ji hev re bêjin. Tu peyamên ku dixwazin bidin hev ji awir û çavên wan dixwînî. Tu dizanî ne asayiyek heye. Lê heta ku ew naxivin tu nizanî bê ka ew ne asayiya çiye? Hinek caran tu ji gotinên ku di çavên wan de dixwînî, fêm dike ku êdî ew naxwazin tu li mala wan bimînî, ango tehdît li wan hatiye kirin. Dema ku dawetkirin û îtîbara wan dibe mijara gotinê ew jî nikarin eşkere ji te re bêjin " Ka ji mala min biçe" Lê tu dizanî êdî dema te ya çûyînê hatiye. Tevî ku te xwe amadekiriye ku tu vê şevê li wir binînî, hinek cih û malên nû nasbikî jî, tu naçarî saet çendê nîvro; ango şevê dibe bila bibe divê ku tu bi rêkevî. Hinek caran tu bi xwe fêm dikî û bi rê dikevî, hinek caran bi biyaniyên cor bi cor ew te ji malê derdixin. Tenê tu ji mala wan derkevî, ya din gelek asane. Dema ku tu qala çûyînê dikî dîsa teklîfên cuda dikevin dewrê. Hinek ji wan dibêjin hûn kîderê dixwazin em we bigihînin. Heta gihandina te ya QENDÎLÊ jî digire ser xwe û dibêje "Heval ez ewqas ji PKK'ê hez dikim a niha dikarim we bibim Qendîlê, ji vê re jî amademe." Lê ya mijara gotinêye ne hezkirina ji PKK'ê, ango kadroyên PKK'ê ye; berevajî mijara demekê zûtir ji mala xwe dûrxistin û derxistinê ye. Ji ber ku dizane ger te ji mala xwe dernexê dê PDK xirabiyekê bîne serê wî, malbata wî û dawî li jiyana wî ya civakî bîne. Dema ku tehdît dibe mijara gotinê naçara

bi şiklekî te ji mala xwe dûr bixe. Lê di vê dûrxistinê de jî tu êşa di nav çavên wan de dîbînî û pê dêşî.

BELE HEVALNO! Di van kêliyan de ne gengaze ku tu li beramberî hezkirina gel ya ji te û rêxistina te re bê bertek bimînî. Hinek caran di kela germa havînê de tu di kolanên bajaran de jî naçarî dizîvîrî, hinek caran jî tu li nav çavên hev dinêrî û bêy ku tu bi tiştekî din bifikirî dest bi kenekî bi deng dikî. Di wan kêliyan de kî/ ê te li kolanan bibînî wê wiha fêm bike ku tu dînî. Ji ber ku ji bilî dînîtiyê ew ken bi ti awayekî din nayê şîrovekirin. Lê tu dizanî ku kenê te ne ji dînîtiyê, ji berteka te ya li beramberî helwest û fêmkirinên te yê di nav civakê de ye. Ma em çi bikin, devjê berdin bila gelê me, me weke dîn bibînin. Şûna ku weke wan bi aqil bî, dînîtî baştir e ji vê.

Dİ WAN KÊLİYAN de dema ku tu tirsa di nav çavên wan de dibînî tu dizanî bê ka pergalê kesayetî û mirovekî çawa afirandiye. Ger bêjim tirsonek dibe ku ev wişe li beramberî rastiya mirovê Kurd bê wate bimînî. Ji ber ku kesayetiya Kurd her tim bi mêranî û mêrxasiya xwe hatiye naskirin. Lê dema ku rastiya pergala kesayetiyê Kurd dikeve dewrê ev rastî ji holê radibe, yanî Kurd ji Kurdan û xezeba partiyên Kurdî ditirse. Ditirse ku tevahî derfetên ku bi hezar êş û azarî bi dest xistiye ji hezkirina xwe ya li beramberî rêxistinê bike feda. Wêrekiya ku li beramberî dijmin û dijberan raber dike, nikare li beramberî bi gotina wan “birayên” xwe raber bike. Biratiya ku qala wê tê kirin eşkereye ku ne biratiya netewî, qewmî berevajî ya berjewendiyên şexsî ye. Exlaq û çanda ji aliyê malbata Barzanî ve di herêmê de hatiye avakirine.

★

**DUBIZ Û PIRDÊ:**

Ev cihên ku em qala wan dikin ji aliyê fermiyetê ve girêdayî bajarê Kerkûkê ne. Dubiz navçeye, Pirdê jî bajaroke û girêdayî Dubiz e. Ji aliyê dîroka başûrê Kurdistanê ve Dubiz xwedî hinek girîngiyaye. Girîngiya wê jî çavkaniya xwe ji mijara "enfalê" digire. ENFAL gotineke Erebiye û di Qur'anê de ez ne şaşbim ayeta 8'a ye bi wateya ganimet hatiye bikaranîn. Piştî salên 88'ê ji aliyê rêjîma Baas ve bi armanca qirkir û li nav birina tevgerên Kurdî kirdeyeke (pratik) wiha daye despêkirin. Ji xwe em tev dizanin li Başûrê Kuristanê 8 tevgerên enfalê hatine encam dan û di encama van tevgeran de 182 hezar Kurd bê ser û şûn hatine kirin. Lê wişeya "enfal" ji aliyê Kurdan ve di wateya "Winda" de tê bikaranîn. Belê, di encama enfalê de gelek gundên Dubiz ji holê hatine rakirin, hinek ji wan Kurd jê hatine surgunkirin û li şûna wan Ereb hatine bicihkirin. Yên ku karine ji aliyê fîzîkî ve tine bikin tine kirin, yên ku nekarîne jî bi polîtîkayên bişaftin û helandinê hewldane ji holê rakin; wan bi wan bidin jibîrkirin. Lê di nav tevahî tevgerên enfalê de tenê li Dubiz zîndaneke taybet ji bo jinan avakirine. Di encama vê tevgerê de kîja jin li kîderê hatiye desteserkirin anîne vê zîndanê. Piraniya jinan di vê zîndanê de tevî zarokên xwe rûbirûyî zext û zoriyên mezin hatine kirin. Hinek ji wan di encama van îşkenceyan de jiyana xwe ji dest dane, zarok ji birçîna terkî mirinê hatine kirin. Ji bo van jî qebristaneke taybet li vê herêmê, nêzîkî zîndanê hatiye çêkirin. Ev qebristan di bin kontrola dewletê de bûye û tu kesî nekariye biçe vê qebristanê. Heta niha jî bermahiyên vê zindan û qebristanê li nêzîkî bajêr hebûna xwe diparêzin. Weke ku bermahiyên fîzîkî yên dîtin, bermahiyê vê yên çandî, sîyasî û civakî jî heta niha hemûna xwe di vê derê de didimîne.

Li gorî ji aliyê gelê herêmê ve bi taybet ên ku temen mezinin ve tê gotin, bi hezaran jinên Kurd di vê zîndanê de terkî mirinê hatine kirin, hijmarek keçên ciwan di vê zîndanê de ji aliyê leşkeran ve rûbirûyî destdirêjiyê hatine. Hinekan ji wan aqlê xwe ji dest daye. Ji ber kêmiya xwarinê dayikên ku hejmara zarokên xwe zedene xwestine hemû zarokên xwe zindî bihêlin xwarin nexwarine, tenê xwarina hatiye dane zarokên xwe. Hinek ji wan zarokan bê dayik mane. Dema ku dayika wan jî jiyana xwe ji dest daye jixwe kesî ku xwedî li wan derkeve nemaye. Di demeke kurt de wan zarokan jî jiyana xwe ji dest daye. Di hinek gorên wê demê de zarok û dayik bi hev re hatine veşartin. Di yek qebrê de ne. Pêwîst nedîtine ku du qebran ji wan re çêkin. Ez dibêjim qebr lê ya ku hatiye çêkirin ne qebr e, tenê hinek çalên ku termê wan kesan tê de hatine veşartin in. Ji ber ku ji aliyê rejîma Baas ve Kurd, ango jinên Kurd layîqê gorekê jî nehatine dîtin. Kesên ku ew rojên reş jiyane dema ku tu dixwazî bi wan re li ser wan rojan biaxivî û hinek agahiyan werbigirî,ji nişkê ve rewşa rûyê wan tê gorîn. Xemgîniyek li ser rûyê wan rûdine, awirên wan li ser yek xalê kilît dibin. Heta ewqas li yek xalê dinêrin tu gelek caran wiha dizanî ku çavê wan sabît bûye û nema tê girtin. Di wan kêliyan de tu duzanî yê ku di wan awiran de sabît bûye rawestandina demê ye. Dema ku vedigerin wan deman birastî jî dem naherike, disekine. Gotinek heye dibêjin; **hêza tiştekî têra ragirtina demê nake.** Lê birastî jî di pirsên wê serdemê de ji kesên ku bûne şahidên bûyerên wê demê dikî demê disekînîne di çavên wan ên kelogîrî de. Bandora wan bûyer û deman rewşeke cuda di vê herêmê de afirandî ye. Niştecihbûyîna Ereban û hêzên Hizba Baas di vê demê de di gel kiryarên xwe de ji aliyê hejmar ve jî zêde bûne.

JÎ BO VÊ ye ku gelê li vê navçeyê xwedî hinek taybetmendiyên serbixwe ne. Ji aliyekî ve civakeke vekiriye, bi pergala sermayedariyê re ketiye nav hev; ji aliyê din ve jî dev ji xeta mîllîyetçitiyê berneda ye. Dema ku mirov ji der ve, ji dîrok û

rastiyên dîrokî qut digire dest weke nakokî tê. Lê dema ku tu baş dikevî nava vê civakê, dadikeve kûrahiya dîroka vê qadê tu fêm dikî. Ji ber kirdeyên partiya Baas bi giştî bertek li beramberî qewmê Ereb heye, lê li ti derê biqasî ya vê herêmê nîne. Di vê herêmê de dij Erebiyeke bê zanebûn, qewm parêziyeke bê zanebûn heye. Gelek caran ev qewmparêziya mirov dixe nav fikarên tirsinak. Jinek temen 70 salî dikare bêje " **Ger bi destê min be ez ê serê hemû Ereban bibirim, bêy ku bifikirim jine, zaroke, yan jî temen mezine."** Yan hinek ji wan dibêjin **" Ger bi destê min be ez ê tovê Ereban ji vê dinyê rakim."** Kîn û netrefeke mezin a Kurdan li beramberî Ereban hatiye çêkirin. Bêgûman em nikarin vê jî ji rastiya dîrokî, civakî, siyasî,  çandî û bûreyên ku anîne serê gelên vê herêmê dûr bigirin dest. Ger em ji van rastiyan dûr û qut bigirin dest em dê qet nikaribin rastiya van herêman fêm bikin. Li gorî hinek rastî û teoriyên giştî nêzîkatî raber kirin dê mirov ber bi xeletiyeke sosyolojîk a mezin ve bibe. Divê ku her tişt li gorî cih, dem û warê xwe bê hahlîlkirin.

BELÊ, li beramberî van hestan dema ku tu dixwazî qala bi hev re jiyana gelan, projeya netewê demokratîk û biratiya gelan bikî; tu bi asanî bê wateyiyeke mezin di nav çavê wan de dibînî. Weke ku ji te re bêjin " **Tu çi dibêjî, çawa em û Ereb dikarin bi hev re bijîn, çawa em dikarin wan kirdeyên wan ên hov li beramberî xwe jibîr bikin."** Hinekî jî bi gûman te pêşwazî dikin, wiha fêmdikin ku weke tevger ji bo ku tu xwe di nav tevahî çîn û tiwêjên civakê de li Başûrê Kurdistan bide qebûlkirin helwesteke polîtîk raber dikî. Lê qet vê rastiyê fêm nakin ku ev nêzîkatiyeke stratejik a tevgera azadiyê ye. Ji bo ku tu vê rastiyê bi wan bidî fêmkirin divê ku tu xwedî ezmûnekî bîrdozîbi da ku tu bikaribî bi wan bidî fêmkirin. Xala herî balkêş û ecêb jî ew e ku ji Ereban acizin, lê hema bêje hemû kes zarokên xwe dişinin dibistanên bi zimanê Erebî. Dema ku tu sedema vê pirs dikî bersiva ku tê dayîn ev e:  " **Ji ber ku hikumeta herêm qebûl nake zarokên me biçin zankoyên**

**herêmê, diploma ku ew digirin ji aliyê zankoyên herêmê ve nayên pejirandin, di heman demê de li herêmê tayînkirin nîne; em jî ji bo vê zarokên xwe dişinin dibistanên zimanê Erebî.**” Heta radeyekê ev rastiyeke, lê ev rastiya qala wê tê kirin bi rastiya feraset û kesayetiya vê herêmê re heye. Ji ber ku kesên bi zimanê Erebî dixwînîn ji aliyê hikumeta navendî ve di demeke nêzîk de tên tayînkirin. Pirsgirêka tayînkirinê nîne. Dikare piştî wergirtina diploma pîşeyî di demeke kurt de biçe ser kar û mûçe werbigire. Ya ku divê rastiyê de derbazdare ev e. Ji aliyekî ve dijatiya Ereb û Erebî dikin, ji aliyê din ve jî di bin amûrê polîtîkayên bi Erebkirinê. Di vê mijarê de polîtîkayeke taybet a hikumeta navendî jî li ser van herêman heye. Ji bo ku ciwanên Kurd teşwîqî xwendina Erebî bikin nêzîkatiyeke taybet raber dike. Ew jî di nav vê xefkê de dijîn bêy ku pê bizanibin. Yek ji xalên din ên zarokê xwe şandina dibistanên Erebî jî ew e ku zarokên heta amadeyi bi zimanê soranî dixwînin ji ber ku ev navçe ne ser bi herêmê ve ne naçarin biçin zankoyên ser bi hikumeta navendî. Dema ku dest bi zanko dikin û zimanê erebî nizanin gelek zahmetiyan dijîn. Ji ber ku di zankoyên hikumeta navendî de tevahî pirtûk û waneyên tên dîtin bi zimanê Erebî ne. Dema ku ziman bû Erebî ji bo wan gelek zahmetî tên jiyîn. Ew jî naçarin ji despêkê de zarokên xwe bişînin dibistanên Erebî. Ji dervî mesûlan tu kesên din nikarin zarokên xwe bişînin dibistanên taybet. Xwendina di dibistanên taybet de mesrafeke gelek zêde ye û hêza her malbatê têra vê yekê nake. Mînak: Dema ku bajarên mîna Tîgrît, Mûsil, Hewîcw û hwd ji aliyê DA’ÎŞ’ê ve hatin girtin, çûyîn hatina navbera Kerkûk û Bexda yê hat qutkirin, tevahî xwendevanên ku di van zankoyan de dixwendin ji aliyê herêmê ve nehatin wergirtin. Yên ku hatin wergirtin jî salekê xwendin, lê ew xwendin nehat hesapkirin. Weke sala fêrbûna pergala herêmê û zimanê soranî hat pejirandin. Çawa ku dema kesek diçe welatekî derve û dixwaze bixîne şeş mehan ji bo fêrbûna ziman ji wan re tê veqetandin; hema bêje herêmê ji heman muamele li beramberî

wan kesan kir. Ev van kirdeyên xwe reftarên dewletê dike li beramberî hemwelatiyan.

Jİ ALİYÊ erdnîgarî ve hema bêje Dubiz 40 xulek ji Mexmûr dûre. Tevî ku mesafeyeke zêde di navbera wan de nîne jî, ji aliyê civakî ve gelek ji hev cuda ne. Civakeke vekiriye, berevajî Mexmûr rêjeya xwendina keça li gorî ya kuran pir zêde li pêştire. Ji aliyê aborî ve hema bêje hemû kes dewlemend tê hesabkirin. Ji ber ku ji aliyê çandinî, elektîrîk û petrole ve cihê ku herî dewlemend e. Di Başûrê Kurdistanê û tevahiya Iraqê de navçeya ku qet elektîrîk lê nabire, pirsgirêka avê jiyan nake, rêjeya xizaniyê lê kême ev navçeye. Ev bi xwe re derfetên cor bi cor ên kar jî diafirîne. Ji bo vê ye ku zarokên kur hîn di temenekî biçûk de dev jî xwendinê berdidin û dikevin nav jiyana ticaretê. Weke pîşeyekî pêşmergetî li vir hebe û ji aliyê hinek ciwanan ve li şûna xwendinê ev pîşe hilbijartin hebe jî ne mîna cihên din ên Başûrê Kurdistanê ye. Ji ber ku xort bi ticaretê re mijûl dibin û asta fikrî ya civakê jî zêde ne girtiye, zarokên keç hema bêje hemû asteke wan a xwendinê heye. Keçên ku bi zora malbatê ji dibistanê hatibin girtin hema bêje nîne. Tevî vê rastiyê jî ti jin di vê qadê de di nav jiyana çandî, sîyasî de zêde nabînî. Ya rast jin bi xwe pir zêde tercih nake. Ne ku tê astengkirin. Gelek caran bav ji keça xwe dixwaze tevlî hinek karên sîyasî, ango civakî bibe. Heta radeyekê di bin bandora bîrdoziya lîberalîzmê de ye. Asta rewşenbîrî li vir gelek li pêşe, lê rewşenbîriya wan ji nav mala wan û nivîsandina pirtûkan derbaz nake. Ji aliyê xwendin û nivisandinê ve xwe rewşenbîr hesab dikin, lê di pêwendiyên xwe yên civakî de ji endamê eşîretekê zêdetir parêzerê kevneşopên civakî ne. Ti bandora wan nîne li ser pêşvebirin û ronîkirina civakê. Heta di mala xwe de jî mîna zilamê serwer tevgerîn ji bo wan xala devjêneger e.

Jİ BER KU ji aliyê aborî û pergalê ve zêde ne girêdayî partiyên sîyasî yên Başûr in lewra pir zêde ji pergalê jî natirsin. Ji pergalê natirsin, lê naxwazin dev ji jiyana xwe jî berdin, şert û mercên

jiyanî bi ti awayî li xwe têk bidin. Lê hezkirina wan ne mîna ya Mexmûrê ye li beramberî tevgera azadiyê. Di vê qadê de pirsgirêka çûyîna malan, qewitandin, ango nepejirandina rêxistinê ne mijara gotinê ye. Tevî ku ji aliyê fermiyetê ve girêdayî hikumeta navendiye, di pratîkê de îdareya herêmê derbazdar e. Yanî xwedî du pergale. Pergala fermî û ya ne fermî. Lê ya ku hikmê xwe li vir didomîne pergala nefermiye. Hêzên ewlekariyê ser bi hikumeta herêmê ne. Mûçe ser bi ya navendiye. Yanî du pergalî di hemû qadan de tê dîtin.

ME GOT YA, ji aliyekî ve vekiriye, ji aliyê din ve jî girêdayî hinek kevneşopan e. Tevî ku baweriya wan zêde bi dîn re nîne hema bêje hemû jin sergirtîne. Ji aliyekî ve nimêj nakin, ji aliyê din ve jî di nav pêşbirka çêkirina mizgeftan de ne. Lê ji bo nimêjê rojene çend kes deriyê van mizgeftan vedike bi gûmane.

ME GOT YA; weke endamên tevgera azadiyê bi germahî tu tê pêşwazîkirin. Ev pêşwazî ji dile. Ji heft salî heta heftê salî dema ku qala PKK'ê tê kirin tu di çavên wan de hêviyê dibînî. Rastiya pergalê dinasin û dizanin ku hewlên ku di demên borî de dane, awatên wan tenê dikare bi awayekî rasteqîne ji aliyê tevgerê ve cibici bê kirin. Malbat bi germî pêşwazî li te dikin, te dawetî malên xwe dikin. Ne malên ku tu diçiyê, berevajî malên ku tu naçiyê ji te aciz dibin. Dibêjin: "**Hûn çûne mala filankes, çima hûn nayên malê me"** Ev daxwazeke pir girîng e. Ger gotin di cih de be te ji xwe dibînin. Jinên temen mezin û tenê dijîn, ji ber temenê xwe dibêjin: "**Ger em nikarin xizmeta we bikin û hûn bên malê me, em dikarin alîkariya xwe bidin we**". Ger di vê derê de ez qala jinek bi temen nekim ez ê nikaribin derbaz bibim.

ROJEKÊ EM li malekê bûn. Malbateke hevjînên ciwan û du zarokên wan ên keç hebûn. Sibehê zû jinek temenê wê 80'ê salî hat wê malê. Ji xwediyê malê pirsî û got:"**Mêvanên te kîne, ez wan nasnakim"** Jina malê got**: "Ew hevalên PKK'ê ne pûrê"** yanî

xaltîk. Jin ji cihê xwe rabû dest xist milê me û mîna ku awateke wê ya mezin pêk hatibe em maç kirin. Nefeseke kûr hilmijî û got: "**Şukur ji te re xwedayê min, beriya ku ez koç bikim min ev roj jî dîtin "** Demekê li gel me ma û çû mala xwe. Çiqas di ser de derbaz bû ez nizanim, lê ya ku ez dizanim ev bû, ew jin çûbû mala xwe û 50 hezar dînar xistibû deste keça xwediya malê ji me re şandibû. Gotibû: "**Bila li min biborin, temenê min gewreye û ez nikarim li mala xwe xizmeta wan bikim. Lê bila vê alîkariyê ji min qebûl bikin"** Ger hûn rastiyê bixwazin, li beramberî hest û nêzîkatiyê wê jin, ango dayika bi temen ne gengaz bû ku mirov hestên cuda nejî. Di nav hestên cuda de me berê xwe da cihekî din. Cihê ku em çûnê hinek zarokan li kolanan dileyst. Dema ku em giştin gel wan bi coşeke mezin hatin pêşiya me. Mîna ku di nav pêşbirka birinê de bin her yek ji alikî ve destê me girtin û em ber bi mala xwe ve kişandin. **"Heval tu xwa werin ba biçîn malêy ême"** Her yekî/ê ji aliyekî ve destê me dikişandin û dixwestin em biçin mala wan. Di wê navberê de du zarokên keçik lîstokek dileystin. Di lîstoka xwe de daxwaz (dilek) miraz digirtin. Dema ku temam bû bi dengekî bilind gotin: **"Daxwaza me wê pêk bêêêêê! "**Piştre gotin: **"Heval, hûn dixwazin em daxwaza xwe ji we re vebêjin "** Min jî got na: "Ger hûn ji me re bêjin dê pêk neye" Wan jî got: **" Na heval, em ê bêjin"** û gotin: ku tişta me daxwaz kiriye ji xwedê ew e ku heval her tim li gel me bimînin û neçin Qendîlê. Jixwe gelê vê derê tenê wiha dizanin ku tenê warê me Qendîle û ji bilî Qendîlê ti derên din ku em lê bimînin nîne. Ev jî rastiyeke din a ku di derbarê me de dê qet li vir neye fêmkirin e. Bi kurtî daxwazên zarokên ku li kolanan dileyzin jî êdî bûye mayîna gêrîla li van herêman. Dema ku hest bi hebûna gêrîla dikin bi wî temenê biçûk, dilê biçûk hest bi aramiyê dikin. Heta hinek zarok dema ku dayika wan dixwaze wan bi hebûna DA'ÎŞ'ê bi tirsine û ji wan re dibêje **"Werin hundir dê DA'ÎŞ we birevîne"** Ew jî dibejin: **"Heval hatine nahêlin DA'ÎŞ me birevînê, wê wan bikujin."** Weke ku hûn ê jî fêm bikin çawa ku di demên borî de dayikên me em bi leşkerê Tirkan didirsandin û

hemû daxwazên xwe bi me bi cî dianin; dayikên roja îro jî bi tirsa DA'ÎŞ'ê dixwazin van daxwazan li ser zarokên xwe ferz bikin. Lê hebûna hêzên gêrîla di herêmê de vê tirsê ji holê radike, daxwazên dayika li hewa dihêle. Ji ber ku yek zarok jî bi ya dayika xwe nake. Hebûna gêrîla aramiyekê dide avakirin. Bi dilê xwe û temenên xwe yê biçûk jî hest bi vê rastiyê dike, heta gêrîla li wir hebê dê xeterî li ser wan kêm be; ango qet nemîne.

WEKE KU HÛNÊ jî fêm bikin, ji aliyekî ve mirov tê qewitandin, ji aliyê din ve jî mirov dibe evîna dilê gelek kesan. Ya girîng jî dibe evîna dilê pêşerojê yanî zarokên Kurdistanê. Pirsa herî zêde niha di nav malbatan de ji zarokan tê kirin ev e: "**Hûn ê bibin gêrîla, an pêşmerge"** ye. Bê gûman mezin dixwazin cihana wan zarokan li gorî hestên xwe pêk bînin. Lê ji bilî vê jî hestên ku niha li pêşin hestên bûyîna gêrîla û hatina Qendîlê di nava zarokan de ye. Lê ez naçarim li vir rastiyeke din jî bînim ziman. Ew jî ev e ku niha YPG û YPJ li pêşiya gêrîla ne. Hema bêje hejmareke zêde zarok dibêjin em YPG ne. Heta hinek caran dema ku tu di hinek cihan de derbaz dibe baz didin tên pêşiya te û dibêjin hûn jî YPG ne? Tu jî bi lêvên ken dibêjî belê, dema ku gotina belê ji devê te dibihîzin çavên wan ên biçûk dibiriqînin. Em zarokan bi hêviyên wan ên mezin û çavên biriqî bihêlin û derbazî cihekî din bibin.

EM VÊ CARÊ JÎ berê xwe bidin Pirdê, yan jî Altûnkoprî. Di navbera Pirdê û Dubiz de tenê 10-15 xulek mesafe heye ji aliyê erdnîgarî ve. Lê ji aliyê civakî ve ev mesafe gelek mezine. Weke ku ji navê wê jî tê fêmkirin di vê bajarokê de Kurd û Turkmen û Ereb bi hev re dijîn. Lê nakokiyên mezin di navbera wan de heye. Hema bêje ji bilî têkiliyên aborî ti pêwendiyeke wan a civakî bi hev re nîne. Lê nakokiyên di navbera wan de biqasî yê Ereb û Kurdan kûr nîne. Ne ji hev hezdikin, ne jî acizin.  Li vir jî çandinî, bazirganî li pêşe. Lê rêjeya pîşeyê pêşmergatiyê zêdetire. Hinek kes berê xwe didin pêşmergetiyê, hinek jî razîne parsekiyê bikin,lê pêşmergetiyê nakin. Gelek kes di vê baweriyê de ne ku serdema hebûna hêzên

çekdar ê Kurdan derbaz bûye. Lê bi hatina DA’ÎŞ’ê re ev feraset hinekî be jî li navçûye. Ji aliyê aborî û jiyana bajarvaniyê ve ji Kerkûkê zêdetir berê xwe didin Hewlêrê. Bere Turkmena li Kerkûkê, yê Kurdan jî li Hewlêrê ye. Ji xwe Ereb jî di ortê de mane. Li gorî rewşa ewlekariyê geh berê wan li Kerkûkê, geh li Hewlêrê ye. Xala balkêş jî ew e ku çûyîna Hewlêrê ya Erebên vê derê ji ya Kurdan gelekî asantir e. Hema bêje tevahî nokteyên kontrolê yên di vê navberê de heyî ji wan re vekiriye. Lê ji bo Kurdan berûvajî ye. Kesên ku Kurd be û ne xwedî nasnameya kadrotiya PDK’ê be gelek zehmet di van deran de derbaz dibe. Ev jî yek ji xalên nakok ên PDK’ê ye ji aliyê gel ve.

EV Bİ ZANEBÛNE yan na; nizanim, lê ji min re wiha tê ku têkoşîneke veşirtî di navbera herdu netewan de didome di vê mijarê de. Ji aliyê îdareya siyasî ve PDK lê serwer e. Herdu partiyên siyasî mîna gelek mijarên din di vê mijarê de jî lihevkirine. Bi awayekî giştî civakeke girtî û mihafazakar e. Ev muhafazakarî herî zêde di xala jinê de xwe dide pêş. Di vê bajarokê de gelek zahmete ku tu jinekê li derve bibîne. Pêwendiyên civakî gelek sînordar e. Rêjeya xwendina kuran li gorî ya keçan pir li pêş e. Hema bêje mînakeke biçûk a civaka Hewlêrê ye. Lê ne ew Hewlêra ku ji aliyê siyasî, aborî, bajarvaniyê û bînasaziyê ve hêdî hêdî ber bi Dûbayîbûnê ve diçe; Hewlêra ku di nav kevneşopên paşverû de fetisiye. Di nav nerîtên eşîrî û gemariyê de fetisiye.

HESTÊN NETEWÎ, mijarên Kurdatiyê di vê bajarokê de hema bêje nemaye. Kurdatiya ku bi zimanê soranî her tişt **“ fişeye”** yanî vala ye derbazdar e. Ciwanên vê herêmê bêhêvitî û valatiyeke pir mezin jiyan dikin. Ji ber ku pêwendiyên wan ên civakî zêdetir bi Hewlêr re heye, her tim jiyana herdu aliyan rûbirûyî hev dikin û rastiya xwe di nav wê jiyanê de dibînin. Feraseta serwere, “ Em ji kê re bikin, ji bo kê/î xwe bidin kuştin. Em şer bikin hinekî din jê bixwin. Heta hêjmarek zêde ciwanên ku ji virin û pêşmergene eşekere vê dibêjin. **“Ger li cihê ku em lê ne şer derkeve bi ti awayî**

**em ê şer nekin.**” Bi rastî jî şer nakin. Ji ber ku di wê baweriyê de ne ku ew ê xwe bidin kuştin wê hinekî din li ser rûnin û jê bixwin. Ji xwe ev pênaseya rastiyeke siyasî li tavahî Başûrê Kurdistanê dike. Bi taybet feraseta ku di van navçeyên ku jê re tê gotin **“dabiraw”** di hemûyan de ev feraset heye. Hemû di vê baweriyê de ne ku ji bo parastina Hewlêr û Silêmaniyê zarokên xelkê didin kuştin. Dema ku tu li enî û sengerên şer dinêre jî tu wan mafdar dibînî. Li gorî daxwuyaniyên fermî ên wezareta pêşmerge heta niha 1.200 pêşmerge (lê hejmar ji vê zêdetire, ji ber ku di pir cihan de hejmara şehîdên xwe vedişartin.)di şerê DA’ÎŞ’ê de şehit bûne. Lê di nav vê rêjeyê de hejmareke pir kêm ê van bajaran di mijara gotinê de tê de heye.

Li gel vê rastiyê hema bêje her kes ji her kesi ditirse. Kes bi kesî bawer nake. Dema ku tu diçî malekê, ji wê malê ber bi maleke din ve diçî jixwe naxwazin ew mal bizanibe tu ji wê malê çûyî, ji bilî vê tu xwe bikujî mirovê herî nêzîkî xwe jî bi te nanasîne. Naxwaze vê berpirsyariyê rake ser mile xwe. Sedema vê ya esasî tirsa wan a li beramberî hev heye. Yek ew ya din jî her kes ji bo ku xwe bi pergala partiyan bide qebûlkirin û cihekî ji xwe re çêkê hema bêje li ser hev sîxwuriyê dikin. Dema ku tu di nav kolanên bajêr de derbaz dibî, gelek kes tên pêşiya te û pirsa despêkê dikin ev e. **“Ma hûn ne hevalê PKK’ê ne, em pir ji we hez dikin”** Lê hezkirina wan tenê li ser kolanan û cadeya ne. Ev hezkirin weke Tirkan negotî; bir turlî nakeve malê. Lê xala herî balkêş ev hezkirin herî zêde ji aliyê jinan ve tê dîtin. Li gorî jinên vir divê ku jin qet servekirî neçe derve, gunehe. Lê dema ku ev qanûn keçên PKK’yî mijara gotinê be nederbazdar e. Rojekê em di nav bazarê de derbazî malekê dibûn. Jineke bi temen bi duv me ket û ji dûr ve banî me kir. Em sekinîn me xwest ku em fêm bikin bê ka ev jina bi temen çima bang li me dike. Hat pêşberî me rawestiya û ji me re got: **“Ma hûn ji xwudayê xwe natirsin, hûn servekirî di nav van zilaman re derbaz dibin.**” Lê herî zêde jî gotinên wê ji wê hevala

porê wê dirêj re bû. Demekê westiya û got: **“Hûn ne xelkê virin, hûn ji kîderê hatine?”** Me jî got; Dayê em hevalên PKK’ê ne. Dema ku me got em hevalên PKK’ê ne, mîna ku ew pîra gava din têra xwe gotin ji me re gotibû ne ew pîr bû, yeke din bû. Bi rûkenî dest da ser milê me û got: **“Tişnabe keça min her tişt ji bo we rewaye. Porê we jî vekirîbe hûn dîsa jî keçên pîroz in. Em bi we serbilind in. We serê gelê Kurd di nav cîhanê de bilind kiriye, ma serê we vekirîbe wê çibibe. Hûn ji zilaman zilamtirin, xwedê jî vê dizane.”** Dema ku ev gotin dikir destê xwe ber bi esmanan ve vekiribû û li derdora xwe dinêrî. Piştî ku destê xwe yek bi yek xiste sûtiyê me hersê hevalan maç li rûyê me da û çû. Em jî ber bi cihê ku diviya bû biçinê rêya xwe domand.

ME Dİ WÊ kêliyê de fêm nekir bê ka pîrê pesnê me da ya heqareta herî mezin li me kir. Herdu hest di nav hev de bûn. Ji aliyekî ve weke jinekê bi me serbilind bû, ji aliyê din ve jî digot: “Xwedê jî dizane hûn ji zilaman zilamtirin.” Îca di kîjan xalê de em ji zilaman zilamtir bûn li gorî pîrê hûn biryar bidin. Ez ji vê bawerim ku pîrê bi niyazeke baş ev gotin ji me re got. Lê dema ku em li gorî felsefeya xwe bi dest digirin eşkereye ku em vê weke hakaretekê dihesibînin. Lê Ez ê di vê nivîsê de ne li gorî bîrdoziya rizgariya jin, li gorî niyeta baş a pîrê bi dest bigirim. Hêvîdarim ku hûn jî bi hestên pîrê yên wê kêliyê vê mijarê bibînin.

Dİ VÊ navçeyê de zankoyeke taybet hatiye vekirin. Ev zanko ne ser bi hikumetê ye. Ya taybet e. Lê kesê ku vekiriye ser bi PDK’ê ye. Di tevahî bajar û bajarokên herêmê de kesên ku ji bo derbazî zanko bibin dereceyên wan kêm in, li ti zankoyên din nayên wergirtin derbazî vir dibin. Hema bêje ji hemû cihan keç û korên ku di vê zankoyê de dixwînin hene. Lê ev dema ku tên kesên asayî û ji rêzê ne, lê piştî demekê di encama politikaya ku di vê derê de tê meşandin her kes asayîbûna xwe ji dest dide. Xwendekarên jin hema bêje piraniya wan dibin, ya rast dikin leşfiroş, piştî demekê ew bi xwe, xwe pêşkêşî mesûlan dikin. Asta leşfiroşiyê di vê

zankoyê de gelekî li pêş e. Ev zanko tevahî mesrefên xwe li ser esasê bazirganiya mirovan pêk tîne. Keçên ku nekevin nav vê xefkê û qebûl nekin naçarin ji wê zankoyê derkevin. Derketin ji wê zankoyê tê wateya dev ji xwendinê berdane. Ji bo vê kes zêde nikare vê bigire berçav. Ji bo ku bibe endameke pergalê û bibe xwedî pîşeyekî di nav pergalê de naçare hemû tiştên ku jê tê xwestin pêkbîne.

EM Jİ PİRDÊ berê xwe bidin bajarê dilan, cihê hemû netewan, warê gengaziya pêkanîna netewa demokratîk; Kerkûkê.!

**KERKÛK:**

Min berê ji bo Amedê her tim digot: "**Paytexta xewnên zarokatiya min"** Ez bawerim hêdî hêdî bajarê Kekûkê jî ji bo min dibe xwedî heman wateyê. Dema ku ez berê xwe didim vî bajarî wiha dizanim ku ber bi hemêza dayîka pîroz ve diçim. Tevî bê pergalî, alozî, bê derfetî, bê xizmetiya Kerkûkê jî cihekî xwe yê taybet di dilê min de avakiriye. Aramiyê dibexşîne, hizûrê dide min, ev aloziya wî. Aloze, lê ji bo min ev alozî vediguhere aramiyê. Di vî bajarî de mirov qet hest bi bêganebûnê nake. Mirovên wê bi Ereb; Turkmen, Aşûrî û Kurdan ve tu li gel kê/î diaxive wiha dizane ku ev deh sale tu hev nasdikî. Ji naskirinê wêdetir tu dibê qey mirovê hev yê herî nêzîke. Gelê wê xwedî dilekî germ û birehm e. Ger pergal û partiyên siyasî dev ji van gelan berde ev gel wê bê pirsgirêk, bêyî ku bikevin qirika hev û nakokiyên olî bîjin dê bi hev re jiyanê bi ser bibin. Lê, lê heta ku ew feraseta di nav gelan de pêşketiye di nav alî û partiyên siyasî de pêşnekeve negengaze ku ev gel bikaribin di nav aramiyê de bi hev re bijîn. Di bajarê zarokatiya dilê min Kerkûkê de, ya serwere polîtîkayên partî û aliyane. Her yek van gelan ber bi aliyekî siyasî ve dikişîne. Hinek li gorî polîtîkayên xwe yên demî biqasî ji dest wan tê tevlîhev dikin. Çiqas aloz û tevlîhev be, yanî ava şîlo be dikarin tê de nêçîra masiyan bikin. Di navbera hikumeta herêm û navendî de ji xwe nakoke. Di nav pergala îdarî de nakoke, di nav pevçûnên olî de navende. Hema bêje navenda tevahî şer û pevçûna ye. Her alî dixwaze di derbarê destkeftên wê de xwedî maf û axaftine be. Lê di warê xizmetkirinê de tu kes lê xwedî dernakeve. Ne hikumeta navendî, ne ya herêmê, ne jî tevahî partiyên siyasî. Yê Kurd jî di nav de. Yek ji bajarên ku herî zêde ji aliyê partiyên siyasî yên başûr

ve bazarî li ser tê kirin û dixwazin tê de bibin xwedî îrade jî ev bajare.

JÎ BO VÊ YE ku ji roja despêkirina şerê DA'ÎŞ'ê heta vê kêliyê jî di vê mijarê de YNK û PDK gengeşiyên mezin dijîn. Ev şerê ku niha di bin navê dijî DA'ÎŞ'ê de tê meşandin ne tenê şerê dijî çeteyane, di heman demê de şerê serweriya hêzên serdest e. Ev hêzana ji başvekêşana leşkerên Iraqê sûd wergirtin û dixwazin serwerî û serkeftina partiya xwe di vir de îlan bikin. Ji bo vê ya ku çi ji destê wan tê dikin. YNK ji bo ku PDK di Kerkûkê de nebe xwedî maf û îrade dixwaze ji hebûna çend hêzên din sûd werbigire. Yek ji wan hêzên ku niha ji aliyê leşkerî ve hebûna xwe li Kerkûkê diparêze hêzê me yê HPG û YJA-STAR'ê ye. Hebûna hêza me li vê herêmê bi rastî jî deng veda. Çi ji aliyê piştrastkirina felsefeya PKK'ê ya her tim danî ziman, lê derbazî meriyetê nekiribû "Têkoşîn ji bo herçar parçeyên Kurdistanê" ji hemû kesî re selmand, yanî îspat kir. Çi jî ji bo parastina vî bajarî rolê ku ket ser milê hêzên me bi şanazî ve pêk anîn. Ev pêkanîn, egîdî û cengawerî di nav tevahî gelê Başûr de bandoreke mezin ava kiriye. Tu kes nikare nîkolî li vê rastiyê bike. Bi hatina hêza me ya leşkerî ji van herêman re ez dikarim bêjim ku ew rihê netewî yê ku ji aliyê partiyên siyasî ve hatibû qetilkirin ji nû ve hate zindîkirin û gel dest bi rastiya xwedî derketina destkeftên netewî kirin. Di dîroka borî de qala efsaneyan, ango bûyerên mîtolîjîk tên kirin. Gêrîla di van qadan de bi helwest û sekna xwe tenê efsane ava nekir, efsaneyên mirî, jibîrkirî jî zindî kirin.

EZ Ê li vir ji we re qala çawaniya efsanebûna gêrîla û zindî kirina efsaneyên borî bikim. Piştre ez ê vegerim ser rastiya civakî û siyasî ya vî bajarî.

★

## ÇEND EFSANEYEK Dİ DERBARÊ GÊRÎLA DE:

Ger gel ji te hezkir, ji nebûnê hebûnan dafirîne di derbarê te de. Ger te di dilê gel de cihê xwe girt wê demê tu dizanî di çavê vî gelî de tu qet bin nakevî, dixwaze bila tevahî hêzên cihanê yek bigirin, di derbarê te de hezar û yek propagandayên cuda pêş bixe, lê ev tev derbazdariya xwe ji dest didin li beramberî evîndariya gel ji te re. Belê, çavkaniya tevahî serkeftina hezkirin û xwedî derketinan ev rastî bi xwe ye. Dema ku tu ji aliyê hezaran ve hatî hezkirin, hatî hemêzkirin, ya herî esasî jî te bawerî da wan bi sekna xwe êdî hikmê ti lîstok û propagandayên dijber namîne. Tevahî dijberî hikmê xwe ji dest didin di derbarê vê mijarê de. Hatina hêzê gêrîla ji bo vê herêmê di nav gel de baweriyeke pir mezin da avakirin. Di gel baweriyê de çavên ku bi tirs û xof li derdora xwe dinêrîn veguherîn hêviyên mezin. Di nav wan çavan de ku grî li benda herikînê bû zuwa bûn, şûna grî û tirsê, evîn û dildariyê girt. Ji aliyekî ve bi tirs gêrîla dihat pêşwazîkirin, ji aliyê din ve jî tenê rizgarî û parastina xwe di hebûna gêrîla de didît. Tirsa ku gel di despêkê de li beramberî gêrîla jiyan dikir eşkereye ku ji propagandayên dijber yên demê borî qut nebûn. Em tev dizanin di encamê polîtîkayên hizbên Başûr de PKK weke partiyeke zarok diz, enfal û hwd dihat naskirin. Li gel bi coş pêşwazîkirina gêrîla, lê her tim gûmanek jî di serê wan de hebû. Gelo em bi wan re bidin û bistînin, deriyê xwe ji wan re vekin, wan bi germî himêz bikin, wê zarokên me bidizin, ango ji me bistînin an na? Van pirsên bê bersiv ewrekî tarî dixist ser hêvî û baweriya wan, hêviyê ku di çavên wan de di bin siya vê tirsê de dihişt. Ji aliyê hinek kesan ve bêsînor bawerî dihat vegotin, ji aliyê hinek kesan ve jî gûman serwer bû. Lê temenê çavên bi gûman û ewr zêde dirêj nebû. Di demeke pir kurt de, tevahî gûman û tirsên heyî cihê xwe ji heyranî, matmayî û evînê re hişt. Ji ber ku kirdeyên (pratîk)gêrîlayan di van herêman de cih ji ti gûmanan re nedihişt.

ŞEREKÎ PİR DİJWAR hebûna xwe di herêmê de diparast. Hêzên ku mîna hêzên parastinê, yanî çekdar hatibû avakirin û heta niha gel baweriya xwe pê danî pêşmerge weke pêwîst nedikarî rûbirûyî vî hêzî bibe. Di her cihê ku şer tê de derdiket pêşmergeyan şikestin dixwar, bin diketin, cihên ku di destê wan de bû bêy ku li ber xwe bidin dev jê berdidan û diket destê çeteyan. Di heman kêliyê de ji aliyê gerîleyan ve bi awayekî fedayane hêrîş dihat despêkirin û cihên ku ji destê pêşmergeyan hatibûn girtin di demeke kurt de diket destê gêrîla. Bêy ku yek windahiyan bide gêrîla ew cih dixist bin kontrola xwe. Pêşmerge û gelê ku dibû şahidê van bûyeran êdî gêrîla mîna gule nebir (kurşun geçmez.) binav dikirin. Ev ne tenê ji aliyê gel û pêşmergeyan ve ji aliyê çeteyan ve jî êdî bi vî rengî dihat binavkirin. Di hemû operasyon û çalakiyên ku gêrîla tevlî dibû de li ser cîhazan dema ku fermana hêrîşê ji wan re dihat dayîn digotin: "**Ew ê gule nebir li virin em nikarin pêş de biçin"** Ger hûn meraq dikin nasnameya gêrîlayan di vê derê de çiye? Ez ê ji we re bêjim, ên gulenebir e. Di tevahî çalakî û operasyonan de windahî nedayîna gêrîla ji aliyê gel ve ne ku bi zanîn û pisporiya şer dihat ravekirin; berevajî bi pakî, duristî, dilsozî û hêza xwedayî ve hat şîrovekirin. Hêdî hêdî gêrîla mîna tiştekî pîroz hat dîtin. Ji gêrîlayê ku jê ditirsiyan ku zarokê wan bibe, êdî gêrîlayê pîroz dihat afirandin. Ev pîrozî ji aliyekî ve başe, lê ji aliyekî ve jî xeter e. Dema ku tu tiştekî pîroz bikî, pîrozî bê binkeftinin. Bê kêmasîne, qet kêmasiya nakin. Ji ber ku ji mirov nayê hesabkirin. Êdî hêzekî îlahiye. Îlah ma qet kêmasiyan dikin? Ma gelo qet bin dikevin, paşve dikişin, li beramberî dijmin serî datînin? Eşkereye ku bersiva van pirsan hemûyan na ye! Belê, gêrîla di çavê gelên herêmê de êdî wiha bû. Ji bo wê hema bêje çi di mala wan de hebû dixwestin bibin sengerê şer û bidin gêrîla. Pêşbirka çûyîna qadên gêrîla despêkiribû di nav gele herêmê de. Grûp bi grûp berê xwe didan sengeran. Di beroşan de xwarin dikelin, di nav Erebeyan de ji gêrîla re dihat birin. Cihên ku deh gêrîla lê bû li ber çavê gel dibûn sed kes. Jixwe gel di mijara mezinkirina bûyeran de bi rastî jî

pispor e. Êdî wiha lê hat ku tu neamadiyî pêşiya hinek gotin û vegotinan bigirta. Cihên ku em lê, ango ne lê tevahî egîdî û berxwedanî dibû malê me. Rast e, gêrîla bi taybet artêşa Rêber APO di dîroka xwe ya borî de bi egîdî, lehengî û fedakariya xwe hatiye naskirin. Lê gelê me jî em pir mezin kiribûn li pêş çavê xwe. Êdî li beramberî van mezinkirinan hinek caran di nav xwe de me henek dikir û me digot: "Di vê qadê de yek ji taxtîkên gêrîla ku paşvekêşane, ev taktîk li vir hikmê xwe ji dest daye. Yan jî dema ku heval diçûn çalakiyan me bi henekî digot ku pratika "Emer muxtar despêkir" Yanî mirin heye, lê paşvekêşan nîne. Weke ku hûnê jî fêm bikin me taxtîkekî xwe li vir ji ber nêzîkatiyên gele xwe yên ku ji me pir bi bawerin devjê berdabû. Bêgûman bandora di her derfetê de reva pêşmergeyên rêzdar jî di vê mijarê de nabe em jibîr bikin.

EFSANEYÊN gêrîla ne tenê ev in. Di hinek qadan de jî em bûn deh hewarî. Şaş fêm nekin ne dozdeh hawariyên Îsa. Li derdora bajarê Kerkûkê navçeyek û hinek gundên girêdayî vê navçeyê ji aliyê olî ve ne îslam, kakayî ne. Yek ji qadên ku herî zêde jî di bin xeteriya çeteyan de bû ev gund in. Ji bo wê di despêka çûyînê de li çend gundan taburên me hatin bicihkirin. Fermanderên yek ji van yekîneyan jî hevalê Merwan bû. Hevalê Merwan di despêka hatina hêzên me yên gêrîla de derbazî vê herêmê bibû û di nav gruba naskirina erdnîgariya vê qadê de cih digirt. Him weke fermandeyê gêrîla yê yekem, him jî di encamê peywendiyên xwe yên bi gelê herêmê re di demeke kurt de hat naskirin. Di çalakiya gundê Wehdê de dema ku birîndan bû û piştre ji bo ku nekeve destê çeteyan bombe bi xwe de teqand êdî bi kirdeyên xwe wî cihekî taybet di dilê gelê herêmê de ji xwe re vekiribû. Asta xwedî derketina gelê herêmê bi rastî jî pir baldar bû. Ji aliyê gelê Kakayî ve merasîmên taybet jê re hatin lidarxistin. Li gorî baweriya Kakayiyan kesên ku pîroz in ji wan re merasîmeke olî ya taybet pêk tînin û di peresgehên xwe de cihekî jê re vediqetînin. Tevahî

seyîdên wan hatin gel hev û ev pîrozî pê bexşîn. Lê ev merasim tenê ji aliyê wan ve tê zanîn, ji ber ku ji derve re nabêjin. Hevalê Merwan ne tenê şehîdê axa xwe bû, di heman demê de kesekî pîroz jî bû li gorî baweriya Kakayiyan.

Dİ WÊ çalakiyê de pêşmergeyan windahiyên mezin dan, birîndarên wan man di nav çeteyan de, cenaze ketin destê çeteyan. Hinek birîndar piştî çend rojan ji aliyê hevalan ve hatin derxistin û radestî malbatê wan hate kirin. Ev bûyer ji aliyê malbatan ve bi şanazî, dilsozî û baweriyeke mezin hat pêşwazîkirin. Bi taybet dema ku dîmenê hevalan ên ku dema rizgarkirina pêşmergeyên birîndar di çapemeniyê de hat weşandin tevahî propagandayên ku ji aliyê hêzên leşkerî yên herêmî ve di derbarê gêrîla de hatibûn kirin hatin pûçkirin. Ji ber ku me got ya windahiyên wan zêdebûn, dixwestin sî bixin ser berxwedana gêrîla jî. Di her derfetê de digotin; 5 şehîdên wan hene, du gêrîlayên keç ketine destê çeteyan lê vedişêrin. Jixwe rastiya kesayetiya Ş. Mervan û operasyona rizgarkirina pêşmergeyên birîndar ev propaganda vala derxistibû. Êdî gel ev digot. Hêzekî ji bo rizgarkirina pêşmergeyan jiyana xwe dixe xeteriyê û diçe nava dilê dijmin û wan rizgar dike, çawa dibe ku du hevalên xwe yên jin di destê dijmin de bihêle. Ciwanekî 22 salî ji bo ku bi birîndarî nekeve destê wan cesaret dike bombe bi xwe de biteqîne; gelo kadroyên fikir û felsefeyekî bî vî rengî wê çawa bi bîrîndarî xwe bixe destê dijmin. Bersiv û çelîşkiyên ku di vê mijarê de ji aliyê hêzên desthilatdar ve hatibûn afirandin bi egîdiyeke wiha ve vala hatin derxistin. Ji ber ku ji bilî hêzên leşkerî yên fermî hejmarek zêde yên ku ji wan re tê gotin xwebexş (gunullu) tevlî vî şerî bibûn, tevahî gelê herêmê ber bi wê qadê ve herikîbûn. Yanî propagandayên dijber ku hatibûn pêşxistin bey ku gel pêwîstî bi propagandayê valaderxistina wan bibîne, wan rastî bi çavên xwe dîtibûn û ev propaganda li wan vegeriyabûn. Berevajî bandoreke erênî

afirandibûn. Yanî derewkeriya wan derketibû holê, rastgoyiya PKK'ê hatibû dîtin.

PİŞTÎ VÊ çalaki û şahadetê gelê herêmê cade, kolan û malên xwe bi wêneyên hevalê Mervan xemilandibûn. Ji Kerkûkê heta Rihayê girêdaniya xwe û soza xwe li ser pankarta bi nivîsan danîn ziman. Ger mirov qala rastiyan bike divê ku ew rihê netewî ku Ş. Merwan bi şahadeta xwe afirand mirov qet jibîr neke. Cenazeyê heval Merwan hîn di dema domandina çalakiyê de hat rakirin û ber bi Bakur ve hat şandin. Ji bo wê hejmarake zêde haya wan ji şahadetê nebû. Lê merasîma çileyê Ş. Merwan pêvajoyeke nû di vê qadê de da despêkirin. Merasîma çileyê hevalê Merwan li navçeya Kerkûk Daqûqê hat sazkirin. Tevî ku amadekariyeke pir mezin ji bo merasîmê nehatibû kirin jî, asta tevlîbûna gel ji vê merasîmê re hema bêje di serî de em û hemû kes matmayî hiştibû. Dema ku organîzasyoneke wiha hat plansazkirin û cih hat diyarkirin hema bêje piraniya kesan digotin ew cihê ku hatiye girtin pir mezine. We dikarî li cihekî din jî ev merasim lidarxista. Lê roja ku merasîmê despêkir em devjê berdin cih mezinbe, cihê ku hatibû girtin têra nêviyê gelê ku hatibû nekir. Hejmarake zêde xelk di koorîdoran de, heta di bin baranê de li hewşa salonê mabûn. Hemû kesên ku axivîn yek gotin gotin. **"Hezkirin û rihê netewî ku Ş. Merwan afirandiye wiha lêkiriye ku ev hola ku 7 sal nehatiye çêkirin ji bo ti merasîmê ewqas kes tê de kom nebûye kom bike."** Xala herî balkêş jî asta tevlûbûna jinan bû ji vê merasîmê re. Kesên ji bo ewlekariyê hatibûn amadekirin ji aliyê asayişa herêmê ve dema ku jin dihatin di nav xwe de bi awayekî matmayî ev digotin: "**Heylewa jinîş tên"** Yanî law jin jî tên. Çima ev matmayîbûn.? Ji ber ku li gorî baweriyên olî di ti merasim, ango taziyan de jin û zilam bi hev re nabin, divê li cihê cuda kom bibin. Lê di merasîma Ş. Merwan de ev kevneşopa civakê jî hatibû şikandin. Hejmarake zêde keçên ciwan cilên gêrîla li xwe kiribûn û beşdarî merasîmê bibûn. Xala herî balkêş jî ev bû ku şahadeta heval û merasîma wî ji

aliyê me ve ne bi şîn û grî bi tililî û sloganan ve pêşwazikirin bûn. Hinek kesan ev eyb û şer dîtin, hinek kesan jî her tim xwe nûjenkirina tevgera azadiyê di rastiya şahadet û şêwazê pêşwazîkirina şahadetan de dît. Bi vî awayî bersiva pirsên ku rojane di nav gel de di derbarê pêşwazîkirina şehîdan ve jî hatibû dayîn. Gelek caran pirsa "**Bi rastî dilê dayikên we polane, çawa dikarin bi tilîlî, stran û coşeke mezin termê zarokên xwe pêşwazî bikin"** ji me dihat kirin. Ev ji aliyê wan ve mîna bê rehmî, bêwîjdaniyê dihat fêmkirin. Lê ji bo wan jî derket ku ev ne weke ku ew di bên, berevajî ev rihê gelê ku xwe di serkeftinê de killît kiriye; ya rast rihê tevgera APO'yî ye. Jixwe ya ku ew matmayî dihiştin jî çawaniya afirandina vî rihî bû. Him li beramberî vî rihî matmayî bûn, him jî pê bawer bûn. Êdî dizanîn rihê ku ji aliyê fikir û felsefeyeke wiha ve hatiye afirandin dê qet têk neçe.

EM VÊ CARÊ jî berê xwe bidin wan warên ku baweriya deh hawariyan tê de serwer in. Li gorî pêşbiniyên seyîdên Kakayiyan di dîrokeke kevn de yek ji Seyîdê wan gotiye wê di wê herêmê de şerekî pir dijwar biqewime, di wî şerî de jî wê pevçûnên pir dijwar birêve biçin. Piştî şerekî dirêj û xeternak ew gundê bi jin, zarok û tevahî pêkhateyên xwe bikevin nav xeteriyeke mezin. Lê yê ku vî gundî û jiyana vî gundî ji wan hêzên dirin de û wahşî rizgar bike wê deh kesên çekdar û piyade bin. Şevekê bi hemû hêza xwe baran dibarî. Her der çik tarî bû. Di gel barîna baranê de sermayeke kujer hebû. Hema bêje deh xulek li derve mayîn negengaz bû. Di sengeran de mirov herî zêde dikarî nîv demjimêrî bimîne. Ji bo wê zû zû nobedar dihat guhertin. Hîn despêka şevêbû. Lê êdî her kes fêr bibû, di şevên wiha de misoger li cihekê dê şer derkeve. Ji aliyekî ve serma, ji aliyê din ve bendewariya ku bê ka wê vê carê hêrîşî kî derê bê kirin û dudiliyên bi vî rengî di nav hev de dixemilandin cihana hemû gêrîlayên ku herêm diparastin. Şevên bi vî rengî ewqas dirêjin gelek caran mirov wiha dizane ku dê qet dawiya van şevan neyê. Lê ti şev bê dawî nînin, mîna wê şevê. Di

nav girme girma ewran, şire şira baranê de agahiya hêrîşa ser herdu gundên Kakayiya Elîsera û Zanqir gihîşt. Du hevalên jin ên perwerdeya xweparastinê li wî gundî ji bo jinan di meşandin jî ji bo perwerdê li gundê Zanqir bûn. Di wê şevê de ji aliyekî ve hebûna wan hevalan avantaj bû ji bo girtina agahiyê di demeke kurt de, lê ji aliyê din ve jî xeteriya dorpêçkirina herdu hevalan jî mijara gotinê bû. Ji ber ku bi tenê jî şer bikirana û şehîd jî biketana ji ber parastina pirestîja PKK'ê ku di qadê de hatibû afirandin naçar bûn şer bikin. Lê em tev dizanin li beramberî hêzekî ewqas hov û dirinde bi du kesan du gund nayên parastin. Lê dema ku prestîja rêxistinê mijara gotinê be tê heta fîşeka xwe ya dawî şer bike, ya ku ji destê te tê qet xwe jê paş nede. Ji aliyekî ve xeteriya li ser gund û gundiyan ji aliyê din ve jî xeteriya ku herdu heval pê re rûbûrû mane lê kir ku di demeke kurt de hejmareke heval hewl bidin xwe bigihînin wê qadê. Ji cihê hevalan heta wî gundî hema bêje nêzîkî nîv demjimêrî mesafe heye bi Erebê. Bi vê kelecan û berpirsyariyê hêjmarek heval ber bi cihê bûyerê ve ketin rê. Lê piştî cihekî li beramberî hemû îhtîmalan fare Erebeyan vemirandin û ber bi pêş ve çûn. Dema ku nêzîkî gundan jî bûn ji Erebeya daketin weke ku hûn jî dizanin bi rêbazê esasî yê gêrîla ku sizmaye ketin nav gund. Dema ku heval giştin gun êdî dengê Allahû ekber ji nêzîk ve dihatin û tevahî gundî di nav tirseke mezin de bûn. Hinek ji wan yên derfetên wan hebû jin û zarok derdixistin derve, hinek ji wan çek girtibûn destê xwe û baweriya xwe bi hebûna herdu hevalan tanîn û hewl didan li gel wan şer bikin, gundê xwe biparêzin. Di vê kêliyê de giştina deh hevalan bi tevahî amûrên xwe ji wan re di kêliya despêkê de dihat wateye girtina nefeseke kur û derbazkirina tirsa ku dihat jiyankirin. Wê şevê di dema xwe de heval li cihê pêwîst amade bibûn. Di heman demê de li gundên derdorê jî hêz hatibû bicihkirin û li beramberî tevahî egeriyan di demeke pir kurt de ji bo parastinê xeta dihat xwestin hatibû avakirin. Êdî ya diket ser milê gêrîlayan ev bû ku di sengeran de li benda hatina çeteyan û bersiveke xweş dayîna wan bû. Bêguman

çawa ku gundî ne li bendê bûn di demek ewqas kurt de heval xwe bigihînin wan, çete jî ne li bendê bûn ku gerîla di demeke ewqas kurt de xwe bigihîne wan gundan.

WÊ ŞEVE Dİ herdu gundan de jî şerekî dijwar qewimî. Lê tevî dijwariya şer çeteyan nekarî bikevin wan gundan û gund ji aliyê gêrîla ve hatin parastin. Piştî vî şerê êdî vegotina efsaneyê despêkir di nav Kakayiyan de. Li gorî wan pêşbîniyên seyîdê wan pêk hatibû. Seyîd jixwe gotibû wê şerekî dijwar biqewime, xeteriyeke mezin dê li ser gundan çêbibe, lê deh piyade wê gund û gundiyan rizgar bikin. Ew şer û bûyerên ku seyîdê wan qala wê kiribû çeteyên DA'ÎŞ'ê bûn. Deh piyade jî gêrîla bûn. Ez dibêjim gêrîla, lê li gorî baweriya wan hawarî ne. Bêgûman di demeke ewqas kurt de çûyîna gêrîlayan a herêmê û di tariyê de çûyîna wan ji aliyê gundiyan ve wiha hat fêmkirin ku rêya nîv demjimêr a bi Erebi gêrîla bi piyan di deh deqeyan de giştine wan. Ger hêzekî îlahî, efsanewî, xwedayî nebe gelo dikare di demeke ewqas kurt de xwe bigihînin herêmê?  Lê wan ne dizanî gêrîla bi Erebeyan heta cihekî çûye, piştî cihekî lambeyên Erebeyên xwe vemirandiye û bi awayekî nihînî ketina nav gund. Yanî taxtîkê şerê gêrîla pêk anîne. Nezanîna vê rastiyê wiha lê dikir ku gêrîla bibe hêzêkî îlahî ji aliyê wan ve. Di gundê Zanqir de ev efsane dihat vegotin, li gundê Elîsera jî efsaneyeke din despêkiribû. Bi vê efsane û çîrokê ve girêdayî.

**EFSANEYA GUNDÊ ELÎSERE:**

HEMAN ŞEV BÛ, ev gund jî yek ji wan gundên ku di bin xeteriyeke mezin de bû. Çend carên din jî di vî gundî de şer derketibû, lê nekarîbûn bikevin gund. Çend caran xwestin sizma bikin, lê serkeftî nebûn. Ev gun di heman demê de gundê yekemîn bû ku me tê de ciwan perwerde kiribûn û pergala wan a nobedariya şevê bi awayekî pergal pêşxistibû. Hêrîşeke li ser vî gundî jî ji aliyê van ciwanan ve vala hatibû derxistin û çalakiya xwe ya vala derxistina çeteyên DA'ÎŞ'ê li ser navê HPG'ê dabûn. Piştî ku di wî şerî de serkeftin bidest xistin êdî baweriyeke wan bi wan çêbibû û weke dema borî ji çeteyan neditirsiyan. Ji ber ku hêrîşa li ser vî gundî ji aliyê şeş ciwanan ve vala hatibû derxistin. Hêzekî ewqas bi nav û bang, şerker, cihan hemû jê ditirse ji aliyê şeş ciwanên ku qet şer nedîtine, tenê 20 rojan perwerdeya çekan û 5 taxtîkên esasî yê gêrîla dîtine çawa dibe ku dikare vê hêrîşê vala derxin? Ne ew kî be jî dê baweriya xwe bi xwe bîne. Ne asane ku tu hêrîşeke çeteyan bi şeş kesan vala derxî. Ew jî di nav vê kelecanê de bûn. Her ku şer, ango hêrîşa ser van gundan dikete rojevê ji xwe bawer dihatin pêş û dixwestin tevlî şer bibin. Wê şevê ev ciwan jî bi gêrîlayan re di nav şer de bûn. Lê bicîkirina di çeperan de ji aliyê hevalan ve hatibû kirin. Kî wê li kî derê cih bigire, şerê çawa destpê bike tev hatibûn diyarkirin. Li gorî mewzîgirtinê bi Tirkî dibêjin ya "tesadüfün bu kadari" tîmeke hevalên jin li aliyê qebristana gund hatibûn bicihkirin. Ez ê di vir de hurkariyên şer venebêjim. Lê ya ku ez dixwazim vebêjim bi cihbûna hevalên jin di nav qebristanê de rê li ber piştrastkirina efsaneyeke din vekiribû. Ez dizanim niha hûn dibêjin li gorî baweriyên olî çawa dibe heval bi vê nefikirine û hevalên jin di nav qebristanê de bicih kirine. Hinek ji we jî dibêjin "Ma di dema şer de kî bi vê difikire" Lê ez ê tevahî texmînên we vala derxim. Tevahî texmînên ku hûn di vê mijarê de bikin dê vala derkevin. Em dîsa

tên ser baweriya seyîdan. Yek ji seyîdên herî ezîm ê Kakayiyan jî Seyîd Abbas'e. Seyîd Abbas kesek bûye ku tevahî jiyana xwe daya parastina baweriya Kakayiyan. Dev ji hemû derfetên cihanî berdaye û di nav cihana uhrevî de jiyaye. Çawa ku baweriya Xocê Xizir di nav ola îslamê de heye, heman bawerî di nav Kakayîyan de jî heye. Çiye rastiya Xocê Xizir? Di demê tengasiyan de dema ku mirov hawara xwe jê re dibe ew jî wê hawarê dibihîze û alîkariya wan kesan dike. Seyîd Abbas jî kesekî bi vî rengî bûye. Qala gelek bûyerên ku kirine dikin, lê ya ku mijara me eleqedar dike ev e. Li gorî murîdên wî ev kes 22 salê berî niha wefat kiriye." 35- 40 sal beriya niha her tim wî di ayînan de, di nav mûrîdên xwe û derdorê de gotiye ku artêşeke wî ya jinan heye û ew ji aliyê jinan ve tê parastin. Di heman demê de wê di demên pêş de jî felsefe û baweriya wî ji aliyê jinan ve bê parastin. Yê ku felsefa Kakayitî ya rast biparêzin ji wê ev jin bin. Erê we şaş nebist. Ev Seyîdê ku em qala wî dikin xwedî behremendiyên bi vî rengî bûye û her kes jê piştrast e. Xala ji bo min balkêşe ew e ku dema ku seyîdê navê wî derbaz dibe qala artêşa xwe ya jinan kiriye rastî salên damezrandina PKK'ê tê. Ez jî hîn tam nebawerim lê divê mirov li ser vê rastiyê û fikra vî seyîdî lêkolîn bike. Ger em felsefeya Yarsanî bipejirînin dikarin vê teoriya wan rast bibînin. Ez vê jî ji baweriya we ya şexsî re dihêlim.!

LÊ EM Jİ VAN efsaneyan tevan bêxeberin. Piştî wî şerî biryar hat girtin ku em hêzên xwe yên leşkerî di herdu gundan de jî bi cih bikin. Ji ber ku her ku diçe xeterî li ser wan zêde dibû. Tabûrek di herdu gundan de hate bicihkirin. Lê tesaduf bi cihkirina hevalan de xaniyê ku ji bo mayîna hevalên jin guncaw hat dîtin xaniyê wî seyîdî bû. Hêz hîn nû çûbû ti amadekariyên wan nebû, lê tevî vê jî serdaneke ne asayî dihat kirin. Hema bêje jiyana hêzên me yê leşkerî felç bibû tenê dikarîn pêşwaziya gel bikin. Lê kî tê misoger dest vala nayê. Hema tu çi bixwazî ya rast bêy ku tu bixwazî ew ji te re tînin. Me despêkê ev weke nêzîkatiya ji ber parastina gundê

wan û xwedî derketina li gêrîla girt dest. Tam nayê bîra min çend roj di ser şer de derbaz bibû. Vê carê heyata tevahî Seyîdê wan hatin Elîsere. Tevî ku her yek ji wan li cihekî dimînin. Hinek ji wan li Kerkûk, hinek li Hewlêr, hinek li Xaneqîn û hwd. Bi awayekî germ pêşwazî li wan jî hat kirin mîna adetê caran. Nede olsa PKK'yî bûn mijara gotinê ye. Di torene de dema ku giştin cihê silavdayîna hevalên jin, hemûyan sere hevalan maç kir û bejna xwe tewandin. Bi ciwan û pîran heman tişt kirin. Me wisa fêmkir ku ev jî yek ji kevneşopa ola wan e. Lê hevalên me yên ciwan di nav xwe de dest kirin bi pit pitê. Ev çima hevalên me yên jin maç dikin, şeytan dibêje hema berde wan û hwd. Ciwanên me jî têre xwe feodalin. Ma ew navçavên hevalên keç maç dikin we çi jê ye. Ma qet wa dibe, çawa dibe hinek kesên bêgane enî û çavên keçên me maç bikin û ciwanên me bê bertek bimînin. Lê van ciwanên me ne dizanî li gorî çanda kevnar a Kurdan serê jin ango keçekê maçkirin tê çi wateyê. Ev çand hema bêje di nav tevahî Kurdan de serwer e. enî, û navçavên kesên ku gelek rêz jê re tê girtin nebe yê tu kesên din nayê maçkirin. Heta di nav Kurdan de her keçeke layiqê vê hatibe dîtin cihekê wê yê taybet heye di nav wê civakê de. Me çiqas hewl da ku em sedema vê eleqeya taybet li beramberî hevalên jin fêm bikin me ji dervî ew ferasetên tê zanîn ti wateya din nedayê. Ya rast me hinekî jî bi berxwedana Kobanê û asta tevlibûna jina ji vî şerî re girt dest. Lê piştî demekê di nav nîqaş û guftugoyên wan de me rastî fêm kir.

ME FÊMKİR KU di şeva şer de mewzîgirtina hevalên jin di nav qebristanê de li ber tirba Seyîd Abbas bûye, mala ku ji bo hevalên jin hatiye tamîrkirin û tê de hatine bicihkirin mala wî seyîdî bûye. Li gorî van tesadufan pêşbîniya seyîd a di derbarê hebûna artêşeke wî ya jin û di pêşerojê de parastina felsefeya wî ji aliyê jinan ve rast derketiye. Ew artêşa ku qala wê kiriye, hevalên jin bûne. Yê ku dîsa biparêzin jî ew in. Ji ber ku ew di mala wî de bicih bûne. Beriya damezrandina arteşa jinan di nav PKK'ê de wî ev rastî

dîtiye. Ger kesekî ne xeybanî bûya gelo dikarîbû van pêşbîniyan bike?

YEK Jİ WAN XALAN ev bû ku gelê Kakayî yê wê herêmê gêrîla bi hemû germahiya xwe ve pêşwazî bike. Ya din jî dîsa li gorî pêşbiniyê seyîdê wan ku ew dilxweş bûn seyîdê wan pişgiriya me dikir di vî şerî de. Ji ber ku heman seyîdî qala hêzekî şerker kiriye di Kerkûkê de. Li gorî wan vî seyîdî beriya ku wefat bike gotiye: "**Dê şerekî pir dijwar di Kerkûkê de despêbike. Ev hêzê ku şer destpêbike wê aleke reş hilgire, cilê reş li xwe bikin, rih berdin, bêyî ku bifikirin wê hemû kesî ketil bikin. Jinan li bazaran bifroşin, destdirêjî ser hemû nirxên mirovan bikin. Lê wê tenê hêzek bikaribe rê li pêşiya pêşveçûna wan bigire û gelê Kerkûkê biparêze."** Di dema vî şerî de ew ê jî zindî bibe û tevlî vî şerî bibe. Di destpêka şer de her tim Kakayiyan ev gûman jiyan kiriye. Şer û hêza ku seyîd Abbas qala wî kir ev şer û ev hêz e. Lê wan qet ne zaniye bê ka wê seyîdê wan di kîjan refi de cih bigire. Tirsa wan ew bûye ku seyîdê wan pişgiriya çeteyan bike. Bêyî ku vê ji kesî re vebêjin her tim di nav van fikaran de bû ne. Di heman demê de ew pir ji vê bawerin ku seyîd li gel kîjan hêzî cî bigire binkeftina wî hêzî negengaz e. Piştî şerê Elîsera û Zanqir ew êdî piştrast û bi bawer bûne ku seyîdê wan li gel gêrîlayan, di refê gêrîlayan de dijî çeteyan şer dike. Ev bû ya ku ew dilxweş dikir û berê wan dida hêzên me. Di heman demê de pê serbilind bûn ku seyîdê wan xiyanet li wan nekiriye, li gel mafdariyê cihê xwe girtiye. Di hemû şerê herêmê de windahiyên hêzên gêrîla jî bi vê rastiyê ve rave dikirin. Li gorî wan destê seyîd li pişta me bû. Ev çiqas rast e, an na ez nizanim; lê ya ku ez dizanim ev e ku di van demên borî de bi dehan car hêzên me ketin nava çemberan, şerên giran rûdan. Di hinek şeran de me qet texmîn nekir ku hêzên me bê windahî derkevin, lê em derketin. Ev êdî bi rastiya ku wan qal dikir ve girêdayiye, yan bi têkoşerî û cengaweriya gêrîla ve girêdayiye, yan jî tesaduf bûn ez jî nizanim. Bi rastî jî dema ku hinek şer û bûyer

tên bîra mirov û mirov pê difikire bê ka çawa heval ji wan cihan rizgar bûn sînorê aqlê mirov disekine. Weke Tevgera azadiyê eşkereye ku em ji rewşên wiha re nebêgan e. Bi sedan car, sedan bûyerên bi vî rengî di nav şer de bûye mijara gotinê. Gelek caran te qet texmîn nekiriye ku ne tu ne jî hevalên derdora te ji wê rewşê bi saxlemî rizgar bibin, lê beyî ku difna hevalekê /î xwîn bibe derbaz bûye. Eşkereye ku ev jî hinek ji wan mînakan e. Ji ber ku şer bi tesdufan dagirtiye, biqasî wê jî karê kêliye ye. Ger di wê kêliyê de tu bizanibî li cihê rast be, însiyatîf bikarbînî û hinekî jî tecrûbeyên te hebe eşkereye ku tê bikaribî xwe ji wê rewşê rizgar jî bikî. Ya ku dihat kirin hinek ev bû. Çalakvanî, fedayîtî û ezmûnên heyî bûn ya ku gêrîla ji wan rewşan xilas dikir. Lê tevî vê jî ez li vir bêjim bila weke wan be û vê çîrokê jî bi dawî bikim. Êdî hûn çawa dibînin û şîrove dikin ji we re dihêlim.

HİNEK XALÊN KU di derbarê Seyîd Abbas de hene ku ev şexsê min eleqedar dikin. Heta vê kêliyê jî min biryar nedaye ku ez divê nivîsê de qala wan xalan bikim. Belê hinek xal hene ku min ji nivîsandina van rastiyan dûr dixe. Ez ê li gorî pêşveçûna hinek xalên baweriyê di demên pêş ên nivîsê de biryar bidim. Bê ka ez qala wan bikim an na! Ji bo vê ez li benda hinek îşaretên ku divê ez pêbawer bim. Ev pêwendiyeke ruhî ye. Dibe ku gelek ji we baweriya xwe bi pêwendiyên ruhî neyînin. Rast e, ez jî di vê mijarê de bi gûman im.  Ez ê destûr bixwazim û wisa biryar bidim. Ger destûra pêwîst werbigirim ez ê di vê nivîsê de cih bidim wan xalan.

EZ Ê Lİ VİR DEV ji efsaneyan berdim û vegerim ser hinek taybetmendî û çawaniya ola Kakayitiyê. Ew beşê ku xwe weke Kakayî bi nav dikin li gorî wan bi eslê xwe hewramî ne û di serdama bi darê zorê îslamiyet bi wan dane pejirandin ji Hewraman ber bi van herêman ve herikîne. Lê warê wan û perestgeha wan ya herî esasî li derdora Helepçe li Hawar e. Di heman demê de perestgeheka wan jî li Rojhilatê Kurdistanê heye. Jixwe ji aliyê bawerî û îbadetê ve ew û Yarsanî heman bawerî,

felsefeya seyîdan diparêzin. Hinekî jî xwe nêzîkî elewiyan dibînin. Li gorî wan ew û elewî ji heman çavkaniyê tên. Lê dema ku mirov di derbarê merasîmên wan yên olî û taybetmendiyên wan yên civakî de hinek lêkolîn dike ji hev pir cudane. Di nav wan de ya serwer çînatiye. Di asta herî jor de saziya Bawan'nan heye. Tê wateye bavikan. Bawan kesên ku mîna derwîşan dijîn û tevahî nihîniyên vê baweriyê diparêzin. Di asta herî jor de mîna desteya rêveber a vê civakê ye. Tevahiya wan divê rêz li van bigirin û yê ku ew dibêjin pêk bînin. Ji gotina wan derketin tê wateya ji rê derketinê. Ev beş ji bilî wan tu kes nasnake, jiyaneke wan a pir mûtewazî heye. Di nav gelê xwe de ne. Tenê ferqa wan ji endamên din yê civakê ew e ku parêzvaniya nihînî û çanda wan a olî dikine. Ji vê zêdetir ti cudahiya wan nîne. Biqasî ji dest wan tê van kesan bi ti kesî nadin nasandin. Ev jî yek ji xalên xwe parastina wan e.

PİŞTÎ SAZİYA BAWAN, çîna Seyîdan tê. Ew jî di nav xwe de xwedî eşîretin. Her eşîr çend seyîdên wan hene. Lê di nav van hemûyan de jî hinek seyîdên wan hene ku tevahî eşîr naçarin rêz lê bigirin û bipejirînin. Ev jî xaleke olî ye. Di nav eşîran de dikare çend seyîd hebin. Ne mercê ku tenê seyîdekî eşîretekê hebe. Seyîdî ji bav derbazî kur dibe. Mîna xanedaniyê yan jî melîkiyê. Yê ku seyîde kurên wî jî seyîd in. Di nav kuran de ti ferq nîne ku tenê yek ji wan şûna bavê xwe bigire. Hîn di temenê zarokatî de tevahî eşîret rêz li van seyîdan digire hema bêje mîna bavê zarokan. Di nav wan de jin qet nikare bibe seyîd. Jixwe saziya seyîdiyê ayîdî zilam tê hesabkirin. Lê jin dikare di nav saziya Bawan de cih bigire. Jinên jêhatî, cihê baweriyê û yên ku dev ji tevahî jiyana xwe ya şexsî berdidin dikarin parêzvaniya nihîniyên olî bike û wan biparêze. Lê mîna yên din ew jî nayên naskirin. Di nav pêwendiyên wan ên civakî û şêwazê wan ê rêzgirtina li hinek kesan mirov dikare texmîn bike ku ev endamê saziya jor e. Seyîd ne mîna şêxên îslamê ne. Em tev dizanin di ola îslamê de kesên ku herî zêde

dewlemend şêxin. Jiyaneke wan a pir şatafatlî heye. Xizmetkarên wan hene. Lê di saziya seyîdan de mirov rastî vê nayê. Dewlemendî ango hejarî bi rastiya wî kesî ya aborî ve girêdayî ye. Ger xwedî derfet be rewşa wî baş e. Hinek ji wan tevlî siyaseta pergalê bûne û bi vê riyê karine bigihêjin astake baş a aborî. Lê yê din bi giranî jiyaneke wan a ji rêzê heye. Xala ku di nav wan de herî zêde xweşiya min hat şêwaza wan a rêzgirtinê ye. Dema ku tên gel seyîdên xwe bi jin an zilam ve destê xwe didin hev. Çawa ku em di gêrîla de dest didin hev hema bêje wiha. Lê piştî vê her kes destê xwe maç dike. Kes destê kesî maç nake. Ev weke çandekê di nav hemû çinên wan de heye. Di nav xwe de li beramberî hevdu pir vekirî, lê biqasî ku di nav xwe de vekirîne ewqas jî li beramberî derve girtîne. Quralê wan ê herî hişk di mijara jin anîn û jin xwestinê de ye. Seyîd tenê dikarin bi keçê seyîdan re bizewicin. Mam bi maman re, am bi aman re. Ji bilî vê ti şansekî wan ê din tineye. Kesên ku derveyî vê qanûnê tevbigerin bi çavê xiyanetkar lê tê nerîn û ji aliyê civakî ve tên tecrîtkirin. Ji bo vê ye ku di nav hemû çînê wan de hejmareke zêde keçên ku nezewicî hene. Hinek ji wan bi riza xwe nezewicîne, weke ku ew dibêjin hinek ji wan jî qismetê wan derneketiye. Piraniya wan zarokên xwe didin xwendin. Lê hinek ji wan jî ne bi wê re ne ku keç zêde bixînin. Lê mirov dikare bêje asta xwendinê di nav hemûyan de gelek li pêş e. Tekkiye, ango malê wan ên cem hene. Lê ev ne dişibin mizgeftan, ne jî malên cem ên Elewiyan. Heta dawî cihên mutevazî ne. Tevahî îbadetên xwe di van cihan de pêk tînin. Her tim vekirî nînin. Hinek rojên wan ên taybet hene ku diçin îbadetê tê de dikin. Jin nikare biçe cihê ku mîna tekkiye hatiye diyarkirin. Ji dervî wê odê dikare bisekine, îbadeta xwe bike, lê nikare di wan rûnistinan de amade be. Mîna elewiyan xwarina wî danî li wir tê çêkirin û tevahî kesên ku lê amadene divê ji wê xwarinê bixwin. Çêkirina xwarinê ayîdî jina ye. Jin bi dil diçin tevlî vî karî dibin ji bo wan xêre herî mezin e. Lê ne merce ku tevahî Kakayî di wê rojê de li wir amade bin. Di vê mijarê de jî serbestiyeke wan heye. Xwarina tê amadekirin bi

alikariya hemûyan e. Yek kes vê mesrefê nake. Çawa ku di nav Elewiyan de Sazlêdan heye, di nav wan de jî tembûr jenî heye. Kesên ku di vê mijarê de taybet tên perwerdekirin hene. Lê bi awayekî giştî seyîd û zarokên xwe bi vî karî re radibin û encam didin. Ger rojekê rêya we ket gel wan pêşniyara min ji we re ew e ku hûn ji wan bixwazin tembûrê ji we re lêdin. Bi zimanê “Maço” ji we re stranan bêjin. Jixwe ew ji xwe re dibêjin maço ziman. “maço” li gorî kurmanciya me tê wateya “dibêje”ji ber ku vê peyvê di nav axaftinên xwe de pir bikar tînin ji wan re dibêjin maço ziman.

PİŞTÎ SAZİYA seyîdan a mama tê. Mam hinekî jî nûneratiya xeta navîn dikin. Di navbera seyîd û aman de ne. Ew jî heta radeyekê îtîbareke wan û navdengê wan heye. Bi heman şêwazî ew jî tenê dikarin bi hev re bizewicin, di nav xwe de jin û jinxwaziyê bikin. Li gorî saziya seyîdan hinekî din vekirîtir û civakîtirin. Em bixwazin an nexwazin seyîd hinekî din jî dixwazin wê statuya xwe ya serdestiyê biparêzin û derdor jî wiha nêzîkî wan bibe. Lê mam ne bi vî rengî ne. Xaleke ecêbe ku di nav wan de jî pergala axatiyê heye. Ev axa dikare ji seyîdan be jî, ji maman be jî. Lê heta niha di nav aman de min axa nedît. Axayên wan piranî hevkarê pergalê ne. Jixwe di encama vê hevkariyê de karine bibin axa. Pergala axatiyê xwe dispêre axê. Kesê ku ax û zewiyên wî hebin xulamên wî jî hene. Yên xilamê xwe hebe dikare bibe axa jî. Tevî ku rastiyeke wiha heye jî, piraniya civakê ji wan acizin. Hema bêje kesî ku xulamtiya wan bike bi çavekî biçûk li wan dinêrin. Ji bo vê piraniya xulamên axayên wan Ereb in. Ji ber ku di felsefeya wan de kes ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî bikaranîn tiştekî xirab e. Li gorî min ev xaleke pir xweşik ya vê baweriyê ye.

Dİ ASTA HERÎ JÊR DE jî am in. Am; yanî giştî. Hêjmara van li gorî yên din zêdetir e. Hinek qanûnên ku ji bo herdu saziyên din derbazdarin ji bo van nederbazdar in. Mînak; weke ku qûralekî giştiye ew jî tenê divê ji tebeqeya xwe jin bînin, lê hinek ji wan

dikarin ji olên din jina bixwazin. Her çiqas bi çavekî biçûk li wan bê nerîn jî, lê nayên tecrîtkirin. Tu kes pêwendiyên xwe ji wan qut nake. Ji ber ku ev tebeqe erkeke xwe ya parastina nihîniyên baweriya wan nîne. Lê ji kîjan olî jin bînin bila bînin divê ev jin piştî zewacê bê ser baweriya wan. Hinek ji wan bi Tirkmen, hinek jî bi Ereban re zewicîn e. Lê baweriya xwe dayîna pejirandin bi qedexe û darê zorê nakin. Di vê mijarê de qanûnên derbazdar pêvajoya evrimsel, yanî tedrîciye. Li bendê dimînin heta ku ew jî bi daxwaza xwe weke wan lê bê. Heta ku bigihêje vê baweriyê dikare nimêj bike, rojî bigire. Lê Piştî demekê ew bi xwe hêdî hêdî ji bo ku xwe bi wê komê bide qebûlkirin û weke wan lê bê dev ji îbadeta xwe berdide. Hinek ji wan pê kêfxweşin, hinek ji wan jî êşa vê dijîn, lê ji naçarî pê re dibin yek. Keçên ku bi wan re dizewicin jixwe ji aliyê ola xwe ve piranî tên redkirin. Yanî ji aliyê civak û ola xwe ve tên tecritkirin. Li gorî vê tebeqeyê çend jinan ji olê din tevlî xwe bikin ewqas baş e.

LÊ HEMAN QANÛN ji bo keçên ku Kakayî ne û bi kesên ji olên din re dizewicere derbazdar nîne. Ger bê û keçek Kakayî bi yekî sûnnî, ango musliman re bizewice yan tê kuştin, yan jî heta maye nabê careke din bê nav civaka xwe. Kes wê qebûl nake. Xala balkêş keçên ku bi kesên olê din re dizewicin hema bêje nînin. Yanî ewqas kêm in. Di vê tebeqeyê de keçên nezewicî li gorî tebeqeyên din pir zedetir in.

Jİ BER KU her kes dikare bi tebeqeya xwe re bizewice, ji dervî tebeqeya xwe kesên din hemû mîna xwişkên wan in. Ji wan re heram e. Ger bê û yek ji keçeke tebeqeya din hez bike ev mîna xiyaneta herî mezin tê destgirtin. Çawa kurek ji xwişka xwe hez bike, ango li beramberî xwişka xwe xwedî niyeteke xirab be bi çaveke sivik lê tê nêrîn û ji aliyê civakê ve nayê pejirandin, ew jî hema wiha ye. Ji bo vê ye ku di nav xwe de pêwendiyên wan pir xwezayî ne. Seyîdek biqasî di nav tebeqeya mam û aman de rehete, di nav tebeqeya xwe de ewqas rehet nîne. Heman xal ji bo

yên endamên tebeqeyên din jî derbazdar e. Ji ber ku tu vê rastiya wan dizanî dikarî pir rehettir nêzîkî wan bibî. Ji ber ku tu dizanî ew di aliyê niyetê de jî nikarin bi vê bifikirin. Baweriya wan ji aliyê fikrî ve jî derfet nade vê. Ya girîng ji bo wan paqijiya ruhî ye, ne ya fîzîkî. Bi van xalên xwe û asta tebeqeyan hinekî jî dişibin Êzîdiyan.

BİNGEHÊ felsefeya wan reankarnasyon e. Yanî bi soranî donawdon. Piştî mirinê jiyan çavkaniya baweriya wan e. Ceste, laş dimire, lê piştî demeke din ruh di kesayetiya yekî/ê din de tê dinê. Hebûna xwe dispêrin Zerduşt. Ji dervî ola îslamê hema bêje dijatiya ti baweriyên din ê Rojhilata Navîn nakin. Di felsefeya wan de heq, maf pir girîng e. Di çarçoveya maf û rêzgirtina ji pir jinî re di nav wan de nîne. Di hinek mercan de du jinî dipejirînin, ew jî bi mercê ku jina yekem razîbe. Ger ew jin zarokên wê nebe, nexweşiyeke wê pir cuda hebe ku nikaribe erkên xwe yên dayîktî û hevseriyê pêk bîne zilam dikare jineke din bîne. Lê ji ber ku bi salane di gel çanda Ereb û îslamê têkeliyeke wan heye hinek ji wan ji vê çandê bandor bûne û berevajî vê çandê ketine. Ew bi xwe jî vê bandorê dipejirînin. Jixwe kesên xwedî du jinan jî hema bêje her kes henekê xwe pê dike û bi çavekî ketî lêdinêre. Parastina kevneşopan di nav wan de pir girîng e. Wiha difikirin ku dev ji kevneşopên xwe yên olî berdin wê li nav biçin. Ev ji bo wan xaleke sereke ya xwe parastinê ye. Ez bawerim mijara jin anîn û xwestinê jî bi heman baweriyê dikin. Çawa ku di xanedanan de xala saf qan, yanî xwîna resen heye, di nav wan de jî ev tê parastin. Ger seyîdek jinek ji tebeqeya din bîne ev xwîn tevlîhev dibe. Dema ku tevlîhev bû nikare reseniya xwe biparêze.

ÇEND GOTİNÊN din di derbarê taybetmendiyên vê herêmê de. Ez weke kes gelekî ji Şahmaran hezdikim. Dibe ku bandora zarokatiya min be jî. Di hemû malên me de hebû. Rêzeke taybet jê re dihat girtin. Her keçeke fêrî naqiş dibû hema bêje despêkê li ser etemîn wêneyê şahmaran dineqişand. Niha jî ev çand berdewam dike yan na nizanim. Gelek caran ji bo min bûye mijara meraqê. Di

temenê zarokatiya xwe de min gelek caran xwestiye ku ez jî weke wê jinê, nîv mar, niv mirov bim. Beriya ku ez felsefeya APO'yî nasbikim jî min ji maran hezdikir. Heta roja îro jî ez vê hezkirina xwe diparêzim. Dema ku em hatin vê herêmê li gelek malan min wêneyê Şahmaran û yê Teyrêtawis bi hev re dîtiye. Dema ku min pirs kir, bersiva ji min re hat dayîn ev bû: Her sal di demsala biharê de ji aliyê jinan ve xwarineke taybet ji bo Şahmaran tê çêkirin. Li gorî baweriya jinên vê herêmê ev xwarin bi armanca ku mar di tevahiya salê de zirarê nedin wan xwarineke taybet çêdikin û belav dikin. Xwarin ji van malzemeyan pêk tê. Ji seriyek pîvaz, dan, rûn û xwê pêk tê. Lê ev xwarin mîna xwarinên din tam nayê kelandin. Nîv kelî dimîne. Piştre li ser tevahî cîranan tê belavkirin. Li gorî baweriya wan dema ku tam bê kelandin xwarinek heye jê re dibêjin helîse, yanî xwarina tam bikele dibe helîse. Helîse jî yek ji xwarina taybet a şîaya ye. Ger mîna helîsê bibe dê ji aliyê Şahamaran ve neyê qebûlkirin. Ji ber ku tevahî mar di bin berpirsyariya şahmaran de ye, ger tu jê re xwarinê pêşkêş bikî, rêz lêbigirî dê ew jî zirarê ne de te û derdora te. Dîsa li gorî wan şahmaran ji aliyê kî/ê ve bê dîtin di dema ku dibinî de çi daxwaze bike dê pêk were. Di gel vê de çahmaran wê hinek ji taybetmendiyên xwe bi de wî/ê kesî. Lê ji ber ku di demên borî de ji ber xiyaneta mirov li beramberî wê ji ser erdê daketiye bin erdê û xwe nîşanî tu kesî nade. Ger xwe nîşanî mirovan bide dibe ku dîsa xiyanetê lê bikin. Şahmaran di wateya Kralîçeya maran de tê biakranîn. Çîroka wan a di derbarê Şahmaran de ev e.

LÊ Lİ GORÎ nerîna min û encamên ku min ji vê bûyerê derxistiye ev e. Teyrêtavus, mar, şahmaran di nav tevahî Kurdan de pîroz in. Ev pêwendiya xwe bi serdemên borî yanî beriya ola îslamê ve hene. Şahmaran berdewamiya çanda neolotîk a di nav Kurdan de ye. Yanî pênaseya serdema wê civakê dike. Bi wateyeke din mirovê ku hîn reseniya xwe, ya civaka xwe diparêze û bi şaristaniyê re nebûye yek îfade dike.

MARÊ REŞ di nav hemû Kurdan de remza bereket û parastinê tê binavkirin. Heta li gorî felsefeya gelek cihan kesên ku marê reş di mala wan de, di nav zewî, bax û baxçeyên wan de be îşareta başiyê ye. Nabe tu endamên wê malê zirarê bide wî marî. Him remza bereketê ye, him jî pîroz e. Heta li hinek cihan tê gotin ku ev îşatereke îlahiye, xwedê bi rêya wî marî evdê xwe di îmtîhanê re derbaz dike. Ji bo wê kes testê xwe nade wî marî. Heta ku mirov destê xwe nedê, ew jî zirarê nade mirovan. Di nav piraniya Kurdan de ev bawerî heye. Lê her baweriyek li gorî ola xwe wateyeke cuda daye mar. Di nav Kakayiyan de weke ku li jor me qalê kiriye. Di nav sûnniyan de remza berektê ye.

Lİ GORÎ Elewiyan jî çîroka marê reş heye, lê hinekî ji yê din cuda ye. Ew weke “Akça yilan” binav dikin. Li gorî elewiyên Bakurê Kurdistanê û Şîayên Îranê marê reş di serdemên kevn de bi mirovan re di nav aşîtiyê de bûye. Akça yilan ji bo ku tevahî nexweşiyên mirovan çareser bike hebûna xwe dimandiye. Li gorî efsaneya wan: Marê reş mareke mezine, biqasî mezine ewqas jî dostê mirova ye. Li kîderê kî nexweş be, hawara xwe digihîne wê marê û ji bo çareseriyê alîkariyê jê dixwaze. Marê reş vê hawarê dibihîze, ji çil mêrgan giya dixwe, ji çil kaniyan avê vedixwe, ji gul û gulîstanan derman kom dike û berdestê sibê tê ber serê kesê nexweş bi bînê lingê vî/ê ve dide. Ew kes dema sibê ji xew radibe tiştekî wî namîne. Lê biqasî ku ji dest tê xwe nîşanî mirovan nade. Vî karî her tim di nav nihîniyeke mezin de dike.

ROJEKÊ ZAROKÊ yekî nexweş dikeve, ev kesekî ciwane û haya wî ji vê çandê nîne. Dayika wî bêyî ku ew bizanibe hawara xwe digihîne akça yilan. Akça yilan dîsa ji çil mêrgan giya dixwe, ji çil kaniyan avê vedixwe, hemû gul û gulîstanan li xwe bardike û berê xwe dide mala zarokê nexweş. Bavê ciwan ku haya wî ji bûyerê nîne berdestê sibê li ber serê zarokê xwe şiyare dibîne mareke mezin dikeve oda zarok û diçe ber lingê zarok. Dema ku nêzîkî zarok dibe, zilam ditirse ku bi zarokê wî ve de, şûrê bavê xwe

digire û li orta marê reş dide. Mar dibe du qet. Serê mar bi cihekî de, duvka wî bi cihekî de direve. Piştî vê bûyerê mar dibe dijminê mirovan. Mar li wir sozekê dide û dibêje heta ku nifşê min li serzemîn hebe ez ê şûna çareserî û rehmê xezebê belav bikim li nav mirovan. Ji bo wê jî mar bi mirovan ve dide û wan dikuje. Heta ku herdu parçeyên marê reş neyê gel hev ev dijminantî dê bidome. Dîsa li gorî efsaneya wan ev mar mê bûye. Qet nehiştiye çêlikê wê ji aliyê mirovan ve bê dîtin. Heta ku ew bi awayekî baş perwerde nekiriye nehiştiye dakevin nav civaka mirovan. Yê ku ev şer daye despêkirin xiyaneta mirov e, ne ku mar e.

Lİ GORÎ ÊZÎDİYAN jî mar pîroze, ya rast marê reş. Hema bêje li ser hemû deriyên qebrên laleşê wêneyê marekî reş hatiye çêkirin. Gelek caran dema ku mirov lêdinêre wiha dizane ku ew mar zindiye. Li gorî baweriya wan jî dema ku dijmin bi dû Şêx Hadî- Adî-ketiye û xwestiye wî bikujin; ji bo ku xwe biparêze xwe vegiherandiya marekî reş û xwe wisa parastiye. Yanî Şêx Hadî xwedî taybetmendiyeke wiha bûye ku kengî xwestibe xwe veguherîne çi kariye. Ji aliyekî ve bi vê çirokê dixwazin vê bînin ziman, ji aliyê din jî pîroziya marê reş bi vê şîrove dikin.

Dİ ÇİROKA şahmaran de jî hema bêje di nav hemû Kurdan de heman bawerî heye. Lê dîsa her cihek li gorî xwe wateyekê dide û çîrokekê jê re amade dike. Xala hevbeş di van çirokan de xîyaneta mirov e li beramberî şahmaran. Weke xiyaneta mirov li beramerî akça yilan.

DEMA KU di derbarê vê mijarê de em vegerin ser mîtolojiya Yunans di derbarê “yilanli kadin” em ê hinek xalên hevbeş tê de bibînin. Li gorî mîtolojiya Yûnan yilanli kadin remza xirabiyê ye. yanî Medûsa. Di bin erdê de dijî. Lê di bin erdê de jî ji bo ku zirarê bide mirovan hebûna xwe didomîne. Him di çirokên Kurdan de, him jî di mîtolojiya Yunan de şahmaran xwe berdaye binê erdê. Lê di navbera wan de ferqeke mezin heye. Li gorî Kurdan ji bo ku

zirarê nede mirovan, mirov jî zirarê nedin wê ketiye bin erdê. Lê li gorî Yûnaniyan Medûsa tenê armanca wê zirardayîna mirovaye û tolgirtine.

DEMA KU EZ van çîrokan tînim gel hev digihêjim encamekî wiha. Pênasekirina jina bîlge, jina yekem ku bi şîfayê re mijûlbûye û piştre ji aliyê pergalê ve şaş hatiye şîrovekirin. Gelek balkêşe ku remza tib a serdema sermayedariyê jî di roja me ya îro de mar e. Dibe ku pêwendiya van hemûyan bi felsefeya Zerduşt re jî hebe. Li gorî hinek bawermendên Kakayî û Elewî Zerduşt jî xwedî marekî bûye. Ev mar jî marê reş e. Di gel teyrê Sîmûrg marekî wî jî hebûye, heta gelek caran dema xwestiye biçe cihên dûr teyrê Sîmûrg marê Zerduşt li ser pişta xwe gerandiye. Dema ku çûye nav girseyên gel ji bo ku gel jê netirse Zerduşt ew mar ji xwe re kiriye gopal û pê meşiya ye. Gopal jî di felsefeya pêxemberan de mîna “Asa” hatiye pênasekirin. Hema bêje hemû derwêş jî xwedî gopalekî ne.

BAWERİYA WAN ya din jî di derbarê xewnên ku mirov li ser hev dibînine de ye. Dema ku mirovek li ser hev çend şêvan kesekî mirî di xewna xwe de bibîne, divê ew kes tebaxek savar, hinek xurme û nanekî bigire û biçe ser gora wî kesî/ê. Divê li ser gora wî kesî sê caran bêje “ dev ji min berde, dev ji min berde, dev ji min berde” da ku ew kes dev jê berde. Kesên ku ev ceribandin kirine dibêjin rast e. Lê raste an nerast e em ji wan re bihêlin. Bihêlin bila ew van taybetmendî û baweriyên xwe biparêzin. Ma gelo yê ku civakê, ango civakan li ser piyan dihêle ne baweriya wan e.? Ger mirov dev ji baweriyên xwe berde dê civak bikaribin xwe li ser piyan bihêlin. Dê bikaribin bi hev re bijîn. Dê bikaribin hebûna cihana xwe ya manewî bidomînin. Na! Ez ne di wê baweriyê de me ku bikaribin hebûna xwe bidomînin. Ji bo ku mirov, ango civak hebûna xwe bidomîne pêwîstiya xwe bi cihaneke manewî heye.

KUŞTİNA MARAN li gorî felsefeya wan ne gûncaw e. Ew li gorî anîmîzmê tevdigerin. Çawa ku mirov zindî û giyanlibereke, hemû tiştên di nav xwezayê de jî mîna mirovan zindî û giyanliberin. Ji bo wê mirov çawa nêzîkî xwe dibe, divê bi heman şêwazê nêzîkî tevahî xwezayê jî bibe. Çandinî û zîreet li gel wan pîroz e. Ez bawerim ev jî çavkaniya xwe ji felsefeya Zerduşt werdigire. Ew di nav xwe de li şûna peyva Kakayî zêdetir peyva maço ziman bikartînin. Hema bêje xwe û hemû Yarsanan weke maço ziman pênase dikin. Ev ziman ne tenê di nav wan de, di nav hewramiyên Rojhilatê Kurdistanê û yên Başûrê Kurdistanê de jî tê bikaranîn. Li gorî wan maço zimanên Sunnî yên ku zol, -pîç in- yanî dönme ne. Bi darê zorê bûne îslam. Ew jî bi armanca parastina hebûna xwe bûye. Her tiştekî bi darê zorê hatibe qebûlkirin di cihana manewî de derbazdariya xwe ji dest dide. Îhtîmaleke pir mezine ku ew derên ku qala wan tê kirin di serdema pêşkeftina neqşîbendiyê de bi darê zorê bûbin musliman. Ev îhtîmaleke pir mezin e. Him li hewramanê vî mîlî û him jî li yê wî milî, li derdora Hawar û Helepçe bermahiyên baweriya Kakayiyan gelek zêde ne. Heta hinek goristanên kevn hene ku qet naşibin yê serdema niha. Ji ber ku ew berê qebrên xwe nadin qible, didin rojê. Yanî roj ji kîjan mîli ve hiltê berê qebrê wan jî li wê derê ye. Ez bawerim ev mijar jî dîsa çavkaniya xwe ji ola Zerduşt digire. Lê her qebrek wan xwedî nihîniyekê ye. Çi bi şêwazê danîna wan, çi bi ya çêkirina wan û remzên li ser wan hema bêje gelek ji hev cudane. Hinek qebr kunek di ber serê wan de hatiye hiştin, hinek ji wan di orta qebrê de, henek ji wan jî qubbe ji wan re hatine çêkirin. Lê qubbeyên ku hatine çêkirin mîna pîramiyên misirê ne. Sêkoşeyî ber bi jor ve bilind dibin, lê di hemûyan de jî di asta herî jor de kunek tê de heye. Ji vê kunê roj li nav hemû qubbey belav dibe. Ez bawerim ji aliyê mîmarî ve sêkoşeyî bilindkirina van qubbeyan pêwendiya xwe bi girtina rojê re hebe. Her çiqas dora wan qebra hatibe girtin jî divê misoger tav, ango rojê bibînin.

EZ DİXWAZİM nivîseke Felekedîn Kakayî ya ku di derbarê Kakayitiyê de belavkiriye di vir de bi cih bikim ji bo ku bê fêmkirin û vê mijarê jî bi dawî bikim.

★

## HINEK JI TAYBETMENDIYÊN BAWERIYA YARSANÎ

**“**Cehwera baweriya Kakeyî ev e ku hemû ol, çand, ziman û reng weke ku hene bêne qebûlkirin, nabe bîr û baweriya tu kesê/î û civatekê bi xirabî bibînin. Damezrenerên ola Kakeyî wiha dibêjin: " Xwe xirab û kêm bizane, lê xelkê ji xwe baştir bizane.” Vêca ew xelk Kakeyî bin yan jî biyanî bin ferq nake. Ew şîret ji baweriya cihanbîniya navdar û felsefeyê “Donawdon”(Kirasgorîn, Reankarnasyon) ve hatiye, em ê di xalên din yê vê gotara xwe da li ser bisekinin.

### a) Koka Navê Kakayî;

Peyva Kakayî him ji bo kes û him jî ji bo civatê tê bikaranîn; ango gotin. Lewma li şûna peyvê Kakayiyan yan jî Kakayîtî tenê peyva Kakayî bikartînin. Ev zarava zêdetir li Iraqê hatiye nasîn. Li Îranê bi giranî di bin navê “Enel Heq” tên nasîn. Di hinek welatên din de jî bi navên cuda tên nasîn. Mînak: Li Efxanîstan û Pakîstanê bi navê “Zikrî” tên nasîn. Naveroka van navan çavkaniya xwe ji navê Derwêşan digire. Ji bo vê ye ku em ê di vê gotara xwe de navê Kakayî, ango Yarsanî bikarbînin.
Wateya Van Peyvan:
Yarsan (Yaristan) ji du kiteyan pêktê. “YAR” yek ji naveke ji navên Kakayî ye û nasnavê Sultan Sehaq e. Di heman demê de di wateya xweşevîsîtî, mîhrîbanî de ye û yek ji navên herî kevnar ên xwedê ye. Li gorî zaravayê Goranî (Hewramiya kevn) her wiha di wateya dost û hevkar de jî tê bikaranîn û nasîn.
Weke ku em dibînin peyva mîhrîban jî yek ji wateyên “YAR” e. Ev jî pênaseya rastiyeke dîrokî dike. Damarên baweriya Yarsanî (Kakayî) çavkaniya xwe ji ola herî kevn yanî Mehrperweeriyê (Mîrtatiyê) û Zerdûştiyê digire. Di vir de “Mehr” di wateya roj, ronahî,

xweşevîstî, biratî de hatiye bikaranîn. Her wiha “ Mîtra” xwedayê soz û ragirtina rastî û peymana ye. Ji bo vê ye ku di dema niha de jî Kakayî nabe soza xwe çi li beramberî xwe, çi li beramberî yên derveyî xwe pêkneyînin. Yanî nabe soza xwe bişkînin. Ji bo pêkanîna vê sozê gelek rê û resm hatine danîn ji bo ferzkirina peymana navxweyî. Ev Peyman him ji bo kesan, him jî ji bo civatê derbazdar in. Ev jî me dibe ser felsefeya Zerduştiyê ku her tim li ser duristî, rastî û gotina rast. Yanî rastî, yasaya cewhera cîhanê ye.

Kakayî ji pirtûka xwe re dibêjin: “Defter” ango “Beyaz” her tim Beyazên yar dûbera dikin. Ti carî çar tiştan jibîr nakin. Pakî, rastî, nefsbiçûkî û camêrî.

Pakî; di hemû tiştî de, di ziman, bîr, liv û tevgerên mirovan de, di cil û bergan de, di rabûn û rûniştinê de, bi kurtî di hemû aliyê jiyanê de.

Ruhsivîkî; (Nefsbiçûkî jî jê re dibêjin. Lê di pirtûka wan de ew jê re dibêjin xakerayî û tuwaze)yanî di hemû qadên jiyanê de esasgirtina dilnizmiyê, xwe ji derdora xwe mezintir nedîtin.

Reda, Ango camêrî; Mihrîbanî û xizmetkariya xelkê. Ev xizmetkarî merc nîne ku tenê ji ola te be. Ne merce ku hemwelatiyê te be jî. Ya girîng cihangiriya wî wê ye. Dema ku mirov li van rastiyan dinêre eşekereye ku rastiyên ola Zerduşt dixe bîra mirov. **"Baweriya paqij, gotina paqij, kiryara paqij."** Em dikarin li şûna peyva paqij peyva qenc jî bikarbînin.

**San** paşgota pêyva Yar e. Mana wê jî sultan, mezin, pîroz û malbend e. **Nûkirina baweriya ola Yarsan, ku hefsed sal berê, Sultan Îshaq (Sehak) ve hatiye çêkirin, ew her wiha San Sehak tê nasin.** Vêca dema ku em wan herdu pêşgot û paşgotina bi hev re girê didin, wek Yaristan, wek Kurdistan, wek Afxanîstan û Îngîlîstan ango mana malbend û nîştîmanê bi xwe ve digirt. Loma mana “Yarîstan”jî ango malbend û welatê Yaran. Em dikarin li cihê Yarsan, bi kurtî “Yarî” binivîsin. Pêyva “Yar” jî dikine çavkanî.

Baweriya Kakeyî ango biratî, bi hev re hevkarî, ku bi zimanê Erebî jêre “Exiyetî” tê gotin. Di vê derê de wiha diyar e ku Kakeyitiyê ji wan hinek tişt wergirtine, ji bizava Exîtiyê ku di cîhana îslamê da hebû ye û di piraniya terîqet û fîrqe û sofîgeriyê de edet bûye. Ji ber ku Exiye/biratî gelek nêzîkî Yarsanê ye. Koka Exîtiyê/biratiyê ber bi hezar salan diçe, li Hindîstan Çîn û di Rojhilata Navîn de edet bûye. “Ayeran” nêzîkî gotina Yaran e, ku ev bi xwe jî nimûneyeke ji bo wê tevgera civakî.

Pêyva “Ehlî Heq” ku bi du rexan ve ji Kakeyî re dibêjin. Yêk ev e ku pêyva “Heq” her tim di nava Beyazên Kakeyiyan de tê dîtin ku bi mana “Xudê” ye, perwerdegerê cîhan e, bilindtirin dereca irfan e, xwe nasîn û xweda nasîn e. Bi gotineke din Kakeyî israra rêbaza bi nav û dengê sofîgeriyê dike, yê ku dibêje mirov di çar qonaxan re derbaz dibe. Bi vî awayî: Şerîat, terîqet, marîfet û heqîqet. Di dereca heqîqetê de roşen dibe û li dergehê Perwerdegarî nezîktir dibe. Ango xwe dinase û xwedê dinase. Ji ber vê rastiyê Kakeyî di gel piraniya fîrqa sofiyên cîhana îslamê de hevdigerin.

Gelek firqe û komên din ên sofîgeriyên cîhana îslamê hene ku hemû xwe Ehlê Heq dizanin. Ango heq tevna wan e, yan jî gihiştine heq. Heq navekî dinê yê Xwedê ye.

Em ewqas li ser şirovekirina navê Kakeyî (Yarsan) rawestiyan, ji ber ku nav nişanderê (delaletî) naverokê ye.

Şiroveyên, ku li ser çavkaniyên nivîskî ya Yarsan hatine kirin, nîşan didin ku, çavkaniya baweriya Kakayî xwe digihîne olên Mîtrayî (Mehrperwerî) û Zerdeşt û olên Hindî û Aryayî û Hindûs û Bûdayî û yên din û ola Îslamê, ku ewan hemû di nava Defter û Beyazên Yarsana de bi ronî reng didin.

**b) Felsefa Yarsan**

Felsefa, cîhanbînî û boçûnên Kakeyî (Yarsan) di du sitûnên bingehî de xwe nîşan dide.

Yêk: Donaudon e, ya dudiyan jî li ber tîşkên Donawdonê xulqandina gerdûn, kainat e.

Donawdon, baweriyeke cîhanî ya herî, kevn e, ku di seranserî dinyayê de hebû û niha jî heye, lê ev nayê wê manê ku, hemû kes jê bawer in, ji ber vê ye, ku di piraniya welatên cîhanê da belav bûye.

Li gora baweriya Donawdonê, rûh tê guhastin û ji bedenekê derdikeve, dikeve nava bedenekê din. Her giyanliberek (Canli varlik) dema ku dimire, weke ku ew jî cîhanekê bar dike û diçe cîhanekî din... Ji ber ku rihê wan, an dikevine nav qalibeke din ê ji rêgez, rengên xwe, an jî cureyekî din ê jiyana xwe berdewam dike. Bawermendên Donawdon ne wek hev in, bîr û baweriyên ji hev cuda di nav wan de tê dîtin. Ji bo nimûne, Kakeyî bi roşinayiya Donawdonê de, bawerî û ola xwe digihînine roja xulqandina gerdûnê (afirandina diyayê).

Ku, paşê ola Yarsan bi Donawdon, ango qonax bi qonax gihiştiye roja îro.

Kevintirîn baweriya Donawdon di Ola Hindosî (Birehmayî), di pirtûka Rêg Vêda (Marîfet) de dikeve ber çavan. Her wiha bi cureyek jî di ola Mîtrayî û Zerdeştî de jî xwe nîşan dide. Bi giştî baweriya olên Hindî û Aryayî, wek Hindos û Bûdayî û liqên Mîtrayî, Zerdeştî, Manî, Mezdekî û Kakeyî û hindekî dinê, bi Donawdon heye. Vê yekê xwe gihandiyê seranserî Rojhelat û Rojavayê.

Di demên borî, ango kevn de baweriya Donawdon di nava xelkê eslî yê (binecî) welatê Emerîka, nexasim Emerîka Latînî (Başûrî) Efrîqa, Asya û Awustiralyayê de hebûn. Heta radeyekê îro jî heye. Ev bawerî di sedsalên derbazbûyî de li Ewrupa û Emerîka

Başûr jî belav bûye. Baweriya Donawdon baweriyeke teybetî nîne, ku ser bi neteweyek, welat û baweriyekê ve girêdayi be, ji ber ku baweriyeka cîhanî ye.

Di her civatekê de jî rê û resmên xwe yên taybetî hene. Wek nimûne rê û resma baweriya Kakeyiyan cuda ye ji rêbazên Çîn û Japonê. Ew jî her wiha jî rêbaza Kakeyiyan cûda ne. Lê belê hemû bawermendên **Donawdon** di ser xaleke serekî de yek digirin. Ew jî bawerî bi Mirov-xwedayî, an insan-firîşteyî ye. Ango, wekî Celaledînê Rûmî dibêje, mirov bi rêka roşinayiya ruhî û hizrî ve li heqîqeta mezin yê gerdûnê nêzîk dibe, ku ew jî nûra Perwerdegar (Xwedê) ye. Ango, meremê felsefeye Donawdon, rizgariya ferd e, ku ji sinorê bertesk ê niha derbaz bibe û ber bi cîhanekê manevî û ruh yê paqijtir diçe. Di naverokê de peyama olên esmanî (îbrahîmiyan) jî her eveye ku mirov ber bi kemal û hikmetê ve herin. Kemal û hîkmet yanî xwe tamamkirina mirovan e.

Lewra, li dinyayê, di bingeh de peyama meshebên olan, perwerde kirina mirov e. Armanc di vê perwerde kirinê de ev e, ku mirov bi rêka qencî, rastgotinê, duristbûnê û bi hizra paqij ve, xwe bigihîne bilintirin qonaxa îrfanê, ku xwedênasin û xwe nasin e. Heta ku mirov xwe nenase ne gengaze ku xwedê jî binase.

Bir û baweriya Kakeyî (Yarsan) ji destpêkê heta niha û di pêşe rojê de ev e, ku temamiya mirovatiyê ber bi vê heqîqetê ve dimeşe. Mexseda Donawdon jî palavtina rihê mirov e. Don be don, an ku jiyan bi jiyanê. Mirov divê di her jiyanekê de bixebite, ku xwe ji xirabî dûr bêxe, xwe qenc bike, da ku di jiyanekê din de bikeve ser rêyeke baştir û qenctir, heta ku di aqibetê de ruh paqij dibe û digihe çavkaniya xwe ya asil ku ew jî ronahiya Xwedê ye. Her weke ku di ferhenga Îslamî de tê gotin: "Ena lle wêna elîh raceyun", anku Mirov ji ku hatiye dîsa vedigere wî cihî. Yanî ya girîng xwe gihandina eslê xwe ye.

Baweriya Kakaîyan bi temamî bi vê heqîqetê heye. Ji bo vê ye ku nabe ji tu kesî re bêjin xirab. Ji ber ku em bi tenê ruhsara (zahirî) ya însan dibînin, lê em nizanin gelo rihê wî paqij e yan na? Yan jî gelo rihê wî di çi qonaxa paqijbûnê de ye? Li gorî vê baweriyê mirov di jiyanekê de li malbeteke oldar û bawermend de tê dînyayê, lê dibe ku, di jiyaneke din de di malbateke din û olekê cuda de bê dinyayê. Ji ber ku hemû ber bi yêk heqîqetê ve diçin. Nabe bi çavekî sivik temaşeyî ti bawerî, ol, ziman -çand û regên din bikin. Ev yek xala bingehîn ya ehlaq û felsefa Yarsan e. Her wiha divê di berxurd de (rabûn û runiştinê de, pêyvendiya şexşî û civakî de), singfireh û bêhnfireh û lêbûhorîn bin. Her weku me got, nefsbiçukî û ruhsivîkî ango xakerayî şertekî bingehîn yê Yarsanî bûnê ye. Her çiqas ev rewişt (ehlaq) bi kiryarî her tim reng need jî, lê belê îdeolojiya baweriyê wiha ye.

Di cihana Îslamê de, hindek ayînzan (mezheb) û komên din hene, ku wek Kakeyiyan difikirin. Wek Elevî, Bektaşî, Dûrzî, îsmaîlî û bi dehan liqên sofîgeriya Kurdistanê, Îranê, Rojhelata Navîn, Sûdan û Bakurê Efrîqayê. Hevbeşiya wan aliyên ku me behs kirin, aşitîxwazî, qebûlkirina hevdu, di nava aşitiyê de bi hev re jiyan, mîhrebanî, lêborinî ye.

Di cîhanê de, hêjmara bawermendên baweriya Donawdon di rêza sêyan de ne ku pêreviya ola xwe dikin. Her weku tê zanîn pîştî bawermendên Mesîhî, pêrevên Ola îslamê tê.

Hejmara bawermendên Donawdon jî yêk mîlyarê zêdetir e. Li gorî zanyariyê, ku Rêxistina UNESCO yê ser bi Rêxistina Netewên Yêkgirtî de ye, 11 sala berî niha, hêjmara bawermendên Donawdon bêtirî nehsed milyon kes e. Îro tenê li Hidîstanê 820 milyon Hindosî hene ku bawermendên Donawdon in. Di hindek welatan de, rûniştiyên wan an bi temamî an jî bi piranî li ser wê

baweriyê ne, wek Tayland, Nepal, Korya, Viyetnam, Kamboçiya, Laos, Burma, Filîpîn, Hindîstan, Endonozya û Awustirilya yê. Gelek bawermendên Donawdon her wiha li Japon, Çîn, Pakîstan, Afxanîstan û hindek welatên Asyayê Navîn û Rusya û hindek welatên Ewrupayê Rojhelat û di welatên din de jî dijîn. Evana jî ji bilî bawermendên Rojhelata Navîn in.

Her weku me di destpêka gotara xwe de gotibû, baweriya Donawdon baweriyekê cîhanî û gelek jî kevnar e û bi gelek aliyan ve pêvendîdar e digel olên din de.

**2) Xulqandin (Afirandin)**

Di vê derê de em diçin ser felsefa Kakeyî (Yarsan) ya afirandina dinya û esman û candaran li ser bingeha Donawdon.

Kakeyî ji olên dinê cuda difikire, behsa "ezel" ya berê xulqandinê dike, fikrê hanê jî ji efsaneyek serçave digire.

Li gorî bîr û baweriya zana û pisporan, efsane (mîtolojî) gelek netew, kom û civatên ji hev cuda yên cîhanê, bingeha afirandina dinyayê dibine ser çend xalên sereki wek "valahî" "av" û tiştên weha. Di Qurana pîroz de behsa afirandina cîhanê tê kirin, ku di 6 rojan da temam bûye. Olên dinê yên esmanî jî nêzîkî vê baweriyê ne. Ew dibêjin "her di destpêkê de, tarî di nava tariyê de veşartibû." Vêca di 6 rojan de guhertin li ser vê rewşa heyî hatiye, dinya û canliber hatine afirandin. Ku, evê jî hemû li ser xwestin û îrada Xwedê yê perwerdeger e, ku difermê: "Kin", (Bibe), "Fîkun" (Dibê). Di Încîla Mesîhî de hatiye ku Xwedê difermê: "Ronahî bibê, ronahî peyda bûye."

Baweriya Yarsan, li ser efsaneye afirandinê "'Kin' û 'Fikun' di saniyeyek de çêbû" dibejê û destpêka xulqandinê bi vî awayî

şirove dike: Di destpêkê de, di ezel de tenê hêzekê veşartî di nava "dur" ango cewher (navok, naverok, atom) de hebûye. Yarsan, ew ê hêzê wek hêza Xwedê dinase, hêzekê mutlaq dizane. Mezinahiya "dur" jî nehatiye zanin.

Xwedê biryar daye ku xwe eşkere bike û xwe nîşan bide, ji bo vê mexsedê irade kiriye û gehwera hanê wek nûr peqiye û jê pijîqiye. Bi peqîna wê dur ango gehwerê ve kainat çêbûye. Li serserê hemûyan hêzek bi navê hêza Mutleq di ser kar û barê gerdûn de desthelatdar bûye. Pişkên, ku ji dure cuda bûne, ji hêza sereki ya destpêkê istifade kirinê. Sedema vê yêkê ji ev e, ku pişkan, di destpêka afirandinê de ji hêza mutleq cuda bûne.

Tarifkirina saniyeyeka afirandinê û xwe nîşandana Xwedêwend, gencineya (xazine) veşartî ya Ola Yarsan e, ku bi navê "alemî dûr" tê nasin. Ji ber vê hindê jî di destpêkê de ji valatî û tarîtî zêdetir tiştekî din nebûye. Piştre ew durê, ku ji hêzekê veşartiyê peyda dibe, bi fermana Xwedê dipeqe, da ku xwe bide nasandin.

Ango, hemû tiştek, mirov, teyr û tûr, dar û ber, ajel û candarên deryayê û her tiştên ku tê dîtin, hemû berhema wê durê ne. Hêz, wize (enerjî) ya di nav durê de, xwe guhert û bû madeyê gerdûn û jiyan. Evê jî guhartina yeka a wize bo made ye.

Bawermendên Îşraqî (tîşkdan û biriqedar), ku Yektaperest in, di her tiştên, ku lê dinêrin, Xwedê tê de dibînin û digihijine vê encamê, ku hebûn û nebûn heq in, beşek ji Xwedê di nav wan tiştan de veşartiye. Ev felsefeya İşraqî-Zerdeştiyê, ku Şêx Şehabedîn Suherwerdî pêşde biriye, di eslê xwe de Zerdeştî ye. Baweriya Yarsan jî herweke wê baweriya Îşraqiya ye. Di dîrokê de fîlîzofên Yunanî wek Soqrat, Eflatûn û Fîsagors û yên dinê jî baweriya wan bi felsefeya Îşraqiyê hebû. Piştî, di dema îslamê de

jî, Farabî, Îbnî Sîna û Îbnî Arebî û zanayên din, felsefa Îşraqiyê anîne nava çanda Îslamê. Navroka felsefeya hanê eve ye, ku erd û esman û hemû tişt û xulyaqeta canliber, bi sedema peqîna wê durê peyda bûne. Her ji ber vê çendê ye ku Kakeyî (Yarsan) li ser wê baweriyê ne, ku ne tenê bi rêz û mihribanê ve berxurd li gel mirovan û civat bikin, divê rêza hemû canliber, tabiat, kâinat, erd û esman jî bê girtinê. Li gorî baweriya Yarsanan, dibê tu zerar negihînî tîştekê, heta piyê xwe li ser mîrûyekê jî daneynî. Ji ber ku ew jî canliber in û pişkek ji ruhê gerdûnî tê de heye.

**Fizîknasî û peqîna durê:**

Hindek zanayên Kakeyî, peqîna durê peqîna mezinê ya zerreyê (pirtik) herî piçûk û nenas dizanin, ku dinyayê îro xulqandiye. Dibêjin armanca zanista fizîkê jî zerreyê hanê ye. Ango, eger dureyê bi pirtûka hanê ve bizanin, hingê him di warê zanist û him jî di warê olî de, nezikê ronî kirina xulqandinê dibin.

Kakayî 700 sal berî niha behsa peqîna durê û afirandina erd û hebûnê kirine, di Beyaz û destnivîsên kevnên xwe de tomar kirine. Di destpêka sedsala bîstan de ev destnivîsana hatine wergerandin. Ji bo bi zimanên Rusî, Îngilîzî, Firansî, Almanî û hindek zimanên din şirove li ser hatine kirin. Hacî Nîmet zanayekî Yarsanê navdar e, di dawiya salên 1940’an de, efsaneyên Kakeyî li ser xulqandin û gelek babetên din ê, bi zimanê Farîsî nivîsandiye, daye çapkirin û piştre ji bo zimanê Firansî hatiye wergerandin. Navdar di vê derheqê de pirtûka Şanameya Haqiqetê nivîsandiye.

Lê belê di sala 1995’ê de cara yêkê fizîknasên şehrezayên cîhanî, gihiştine rastiyeke zanistî ya girîng, ku gerdûn encama peqina mezin a zerreyê herî piçûk û nenas e. Peqina hanê Big Bang) ji aliyê teleskopa esmanî Habil ve hatiye dîtin û waneyê wî hatiye kişandin.

Pisporên Fizîknas dibêjin di destpêka peqîna mezin de wizeyekî (enerjî) gelek mezin, lê belê biqasî serê derziyekê hebûye, ku paşê bi gorî formulê Einstein (E=MC) hêdî hêdî bûye made û meteryal. Şayanê gotin e wize bê rehend (boyut) û hecim e, ji bo vê yêkê jî wizeyê herî mezin di ciyekî herî biçûk de ci dibe.

Ango ciyê şaş û mehtelmayinê nine, ku kainatê îro, ku gelek mezin û berfireh e, ji zerreyê herî biçûk peyda bûye. Ji ber ku aqil û mentiq vê yekê qebûl dike. Her wekî diyar e, eslê hemû tişt wize (enerji) ye.

**Ronahî:**

Min behsa babeta Îşreqê kir, ku bi maneya ronahî kirina ruh û derûna mirov e. Di her cihekê de rûberûyî rastiya ronahî dibin. Di Qurana Pîroz de suretek bi navê "Elnûr" (Ronahî) heye ku dibêje "Xwedawend ronahiya erd û esman e." Di Încîla Mesîhiyan de jî hatiye gotin, ku "Xwedawend ronahi ye." (Mêzekin Peyamê Yohenna).

Her wiha Xwedewend li ber çavê wiha Pêxember (Silavê Xudê lê be) bi şîveyek ronahî derket, tecelî bû: Agirekî gûr û geş peyda bûye, çirûskên wî agirî belav dibû bê evê ye ku der û dor, dexl û daran ber agir bikevin û bişewitin.

Ola Sabiyê-Mendayî behsa "Niştîmanê Ronahî" dike, ku bingeha mirovatiyê lê vedigerine. Ola Zerdeştî jî li ser bingeha ronahiyê hatiye damezrandin. Yarsan di vî warî de rê û qedrê hetavê (roj), agir û ronahiyê digrin. Ji ber ku ewan teceliyê Xwedewend in, remz û sembola wê ne. Her wiha jî pîr û zanayên Kakeyî hemû rojan, berê sibê tev helatina rojê dest bi duayên xwe dikin heta ku roj derdikeve. Her wiha êvaran jî bi vî şiklê malavayê

li rojê dikin. Lê belê Kakeyî rojperest nînin. Zerdeştî jî ne agirperest bûn. Ewan ronahiyê bi derkevtina heqiqeta Xwedê dizanin. Ji aliyekî din ê vê ve Kakeyî dibêjin “roj paqijtirîn û ronahîtirîn tiştê gerdûnê ye.” Her kes vê dizane ku ronahî, tîşk û enerjiya rojê çiqas bedew û xweşik in. Her wiha jiyanbexş e, ji ber ku çavkaniya herî mezin û girîng yê wize ye ango enerjî ye. Di Qurana Pîroz de sond bi rojê tê xwarin.

Armanc ji behs kirina ronahiyê ev e: Weku hemû bawermendên din yê îrfan û sofîgeriyê, Kakayî jî dibêjin, ku hemû kaînat ji nura Xwedê hatiye afirandin, di ruh û bedena her mirovekê de misqaleke ronahiya Xwedê heye. Divê bi rêka xwedaperestiyê û qencbûnê ve bixebitin heta ku em wê ronahiya veşartî di derun de, di cihana bîr, hizr û hestan de geş bikin. Naveroka ronahiyê ango ronahîdariyê de ev e.

Kakeyî dibêjin: Ronahîbûn bi wateya vê ye ku çavekî derûnî vedibe, hindek rêbazên sofîgeriyê ji bo vê yêkê “çavê basîret” dibêjin. An jî weke ku Bûdayî dibêjin:“çavê siseyan.” Jixwe, wateya pêyva Bûda “ronahîbûn e.” Ango Bûda gihiştiye vê qonaxê. Ew pêyv ji zimanê Senskrîtî-Hîndiyê hatiye.

**Girîngiya çanda Yarsan (Kakeyî) ji bo Kurdistanê:**

Çavkaniyên Yarsan (Kakeyî) di çend Beyazên pîroz de hatine tomarkirin, ku ji bilî hinekan, ku taze hatine çapkirin, piraniya wan destnivîsin. Beyazên, ku koka baweriya Yarsanê dibine ber hezaran salan, qonax bi qonax hatine nivîsandin. Em ewqas dûr naçin, em ê li ser Yarsana piştî belavbûna Îslamê biaxivin, ku cara yekemîn di sedsaliya duwem ya Hetavî de, ji aliyê Behlûlê Zana ve hatiye gotin. Em ê piştre jî biçin ser dewrên din û guhertinên din, ku bi baweriya Yarsan divê di paşerojê de her berdewam dibe.

Em niha, di vê derê de tenê pirsa hanê tînin holê, ku gelo Kurd çima giringî bide naskirina çand û edebiyata Kakeyî?

1- Ji ber ku bi zimanê kevn ê Kurdî hatine nivîsandin, ziman û çanda Kurda dewlemend dikin.

2- Girîng e ji ber ku di nava cergê Kurdistanê de, li Hewreman, Loristan, Hemedan û malbendên din de olekî wiha kevn hebûye, heye û ligel olên din yê mezinê cîhanê peyda bûye û pêşde çûye û xwe nû kiriye.

3- Girîng e, ji ber ku rêbaza baweriya Kakeyî, bi rêka Donawdonê ve nûkirin û paqijkirina derûnî û şexşiyetê ye.

## 3)- Ziman:

Nêzikî 1200 sal e, bi derketina Behlulê Zana li Loristanê zimanê bingeh yê Olê Yarsan (Kakeyî) zimanê Goran (Hewramî ya kevn) e. Hindek zanayên zaraveyê Goran wiha dibêjin: Goranî, Pehlewiyê serdem, zimanê pirtûka Zerdeşt (Avestayê) e.

Diyalektên Hewremanî, Maço, Şebek, Bacelan, Zengene, Cimûr, Şêxaniya Germiyan û heta qasekê jî Kelhorî û Lorî, hemû liq û çeqên Goranî ne. Goranî jî zaraveyê resenê Kurdî ye. Defterên Yarsan bi hezaran rûpel in. Îro Deftera serekî Serencam e. Pişka yêkan a Serencam çap bûye, ku nêzikî 9 sed rupelên mezin e. Pişkekê biçûk a şiroveyên beşeka Serencam jî hatiye çapkirin, ku 8 sed rupelên mezin e. Bi dehan Beyaz û nivisên berhevkirî (derleme) destnivîs hene ku hêj nehatine çapkirin, an jî neketine ber çapê û yan jî Kakayî naxwazin bêne weşandinê.

Hemu jî bi peyv û îdyomê ve tijê ne û nîşanên ol û çanda kevn a Kurdistan û Rojhilat in. Ji aliyê zimanvaniyê ve xezîneyeke giranbiha ne. Ji ber ku aliyekî veşartiyê çanda kevn a Kurdistanê

zelal dikin. Bi dehan cih û war, turbe û ziyaretgeh nîşanên şaristanî û dîrokî yên Yarsan di coxrafiya vê baweriyê de berçav dikevin, Îran û İraqê hindekê wana şûnwar û çanda xwe nîşan didin.

Beyazên Yarsan bi zimanê Kurdî, bi diyalektîka Goran hatine nivîsandin. Piştre ayînzanek (teologek) Kakeyî Azerî Kuşçuoxlu, 700 sal berê niha, (ji bilî dîwana xwe) piraniya defteran wergerandiye ser zimanê Azerî. Piştre jî çend Tirkên Kakeyî wergerandine ser zimanê Tirkî.

Niha bi hezaran Azeriyên Kakeyî li Azerbaycanê, Tirkên Kakeyî li Tirkiyê û di hindek welatên tirkîziman de dijîn.

Ji aliyê din ve, Hemû Beyazan li ser zimanê Farisî hatine wergerandin. Her weku em dibînin pişka berçav a çavkaniyên baweriya Yarsan bi zimanê Farisî ne. Loma piraniya kelam (beyd) û qewl û fermûdeyên Yarsan bi çar zimanan in: Bi Kurdî ( Soranî û Goranî), Azerî û Farsî û Tirkî.

Di destpêka sedsala bîstan de, Rojhelatnasê navdarê Rus Mînorskî, hindek jî Defteran wergirandiye zimanê Rusî. Di welatên din de bi zimanên Îngilîzî, Firansî, Almanî û çend zimanên din hatine weşandin. Çanda Yarsan, di zanîngahên cîhanê de ketiye ber vekolîn û tê xwendin. Lê belê ne beşekê taybet û serbixwe, di nava pişka îrannasînê de...

Her çend rojhelatnas destnîşan dikin, ku zimanê Yarsan (Kakeyî ) liqeke resenê zimanê Kurdî ye, lê dibêjin “Yarsan ji alî dîrok û çandî ve pişkek ji îrannasîn e.” Sedema vê yêkê bi taybet ne xemxoriya Kakeyî û bi giştî jî ya hemû Kurdan e. Sedema dinê jî ev e: Kakeyî ayinek ji ayinên Hindî û Aryayî (wek Mîtrayî, Zerdeştî, Manî û yên din) e, ku pirtûk û nivisarên wan zêdetir bi zimanê Farisî hatine tomarkirin û şirovekirin.

Ew zanyariyan hewcedarê zanîngehên Kurdistanê ne, ku di van dehsalên borî de zindî bûne û rabûne ser piyan. Pêwîst e çanda Yarsan di van zanîngehan de cihê xwe bike. Ji ber ku, her weku me got, çanda Kurdî ye, zimanê Kurdî ye; Kurdî ye bi muzîka, kelepûr û teybetmendiya xwe ve.

**Kakeyî û sofîgerî û îrfan:**

Bingeha baweriya Kakeyî ji rêbaza Sofîgeriya Îrfanî tê. Pêgiriyê li ser taqekesî (birey) dike, ji ber ku ruhê mirov bi tenê Donawdonê dike û ji qelibekê (ji maddeyekê) derbazî qelibike din dibe. Xelk, li vê dinyayê bi hev re, wek civat dijîn. Lê belê di jiyanên din de, vêca çi di derbazbûyî û çî pêşeroj de, her kesek bi tenê, bi serê xwe tê guhastin. Ji ber vê jî divê di jiyana xwe de bixebite da ku xwe bigihîne dereca herî bilind a paqijbûnê ye.

Di Yarsaniyê de, zikr, nimêj û îbadet bi hev re ye. Lê belê hemû rê û resim û rêk sedemên wiha ne ku, kesek bikare, bi tenê û bi rêka îrfanê ve ruha xwe bigihine kemaliyet û bi ser bixe. Kes nikare li cihê kesekê din vê rêkê bidomine. Her kes divê zehmeta xwe bi xwe bikişîne.  Ev jî rêya azadî û rizgarî ya manevî ye. Ji ber ku sofîgerî û îrfan qeyid û bendên li ser riya mirov dişkîne, da ku mirov di vê sefera xwe de azad be. Îrfan rêya azadiya manewî ya takekesa ne. Takekesî ji qeyd û bendên civakî, fikrî, ji adet û toteyên heyî û wehmê rizgar dike. Ew wehmên ku ketina nav mêjî, dil, hizir û hestên mirovan divê mirov bi rêya ronahiyê jê rizgar bibe. Ev jî bi dirêjahiya temenê mirov li wê derê dimîne.

Ji aliyê naverokê ve sofîgerî, irfana Yarsanan her weke sofîgerî û irfana olên din ên cihanê ne. Ji ber vê ye ku Yarsan xweyî li sofî, arîfên mezin, navdarên ola îslamê yên ku di Sedsala 2 û 3 de heta roja îro derketine bi yê xwe dizanin.

Bi taybet ji van Hesen Besrî, Rabîaye Adewiye (ku di sala 135’ê Hicrî de miriye), Sifyan Sewrî, Ebu Haşim Sofî, Zulnun Misrî, Dawud Tayî û ewên din ên ku şagirdên Hesen Besrî bûne.

Di navbera salên 250 û 350 Hicrî de hinek sofiyên din peyda bûne. Rêhberên mezinê wana jî Ebulqasim Cinîd e (ku di sala 297 hicrî de miriye). Bayezîd Bestamî (261 Hicrî) Sehil Bîn Ebdullah Tisterî (283 Hicrî), Ebu Saîd Xeraz (286 Hicrî), Emer Bîn Osman Mekî Sofî (334 Hicrî), Amîd Zencanî û ewên din. Mensurî Hellac, ku hezar sal berî niha li Bexdayê pêyda bûye û ji ber baweriya îrfanî li Bexda, tê bi dar de kirin. Her wiha ew filîzofên roşenbûnê wek Ferîdedîn Atar, Celaleddînê Rumî, Şemsî Tebrîzî û Senayî û Haqanî û Şa Nimetûlla Welî (li Kirman), Şêx Mehmudê Şebisterî û Eyindilûlqewzat Hemedanî (ku ew jî li ser bîr û baweriya irfanî hatiye kuştin), Seyîd Muhemedê Nurbexş û Camî û Seyîd Îmadeddîn Nesîmî (ku ew jî hatiye bi dar ve kirin), sofî û arifên dinê ne, ku her yêk ji wan serhatî û dîrok û tirajediya xwe heye.

Yarsan van hemûyan yar, dost û rênîşanderên xwe dizanin ku navên piraniya wan di zincîra Donawdona de hene, di Defteran de hatine tomarkirin. Hindek ji wan sofî û arifên mezin rêbaz û firqeya sofîgeriyê damezrandine û hinek ji wan firqanan jî di aqubetê de dikevin nav tevgera berfireh a Yarsanan e. Her firqeyek ji yê dinê tecrûbe û zanyarî werdigire, bîr û hizrên nûtir pêşkêşî tevgera sofîgeriyê li cihana îsamê dikin. Ji ber vê ye ku Kakayî, ango Yarsanî mîna tasavûf jî dikare bê şîrovekirin.

Ger em bi tevahî hûrkarî û berfireh li vê mijarê vekolin, em dê bibînin ku pêlên sofîgeriyê ji Kurdistanê û Rojhilata Navîn ber bi Hindîstan, Serhedê, Çîn û Rojhilata dûr ve diçe. Di heman demê de digihêje Rojava û Bakurê Efrîqa jî. Ji van welatan ve jî ber bi Ewrûpa ve diherike.

Sofîgerî û Îrfaniya Kakeyî nezîkê sofîgeriya Cuhî, Mesihî, Hindos û Budayî û baweriyên dine. Ji ber vê yekê jî bizava Kakayî di despêkê de yanî ji 1200 sal beriya niha ve tevgerekî civakî, hizrî û

felsefî bûye; li dijî zilm, zordarî û desthilatdariya serdemê. Lê ev bizav tenê bi serê xwe nebûye, xwe veneşartiye. Her tim ji bo rizgarî, kamilbûna ruhî û ronahiyê mîna rûbarekê tevlî tevgerên civakî bûye.

Hinek nivîskarên şariza dibêjin: "Di navçeya Çiyayê Zagroz û derdora vî çiyayî de pêşkeftina Yarsanî şoreşek bûye li beramberî pergala civakî, siyasî û aborî ya wê serdemê." Lewra ziyaret û qebrên pêşengên Kakayiyan li nêzîkî Tebrîz, Erdebîl, Hemadan, kirmanşan, Hewraman, Şarezûr, Loristan, Bexdad, Kerkûk û Mûsilê hene. Şûn û warên wan heta niha jî mane, hatine parastin. Cografînasên hinek welatan dibêjin:"hinek ji wan ne tenê ziyaretgehên kakayî ne, di gel Kakayiyan de bawermendên olên din jî serdana wan perestgehan dikin. Em ê di beşên din de navên wan binivîsin.

**Erndîgarî û Dîrok:**

Di vê beşê de ez ê qala erdnîgariya peydabûn û belavbûna Yarsanan bi rêya perestgeh û ziyaretên navdar ên Kakayiyan bikim. perestgeha yekane û herî girîng, qibleya hemû Yarsanan Merqed (Tirba) a Sultan Sehaq e. Di navbera 1270-1400'î de jiya ye. Sultan Sehak ji aliyê hinek oldarên hişt û tûndrew ve hatiye şehîdkirin. Li gundê Şêxan li devera Hewraman hatiye veşartin. Tirb, ango merqeba wî bi navê Pirdêwer hatiye nasîn. Dikeve kêleka din ya pira kevn ya ku li ser Çemê Sîrwan e. Tevahî Yarsanên Rojhilatê Kurdistanê serdana ziyareta Sultan Sehaqê Berzencî dikin. Bi taybet di rojên Newrozê de, ev serdan zêde dibin. Yarsan di vê baweriyê de ne ku Sultan Sehaq di roja yekem a Newrozê de hatiye dinê. Yanî di 21'ê Adarê de. Zerduştî jî di vê baweriyê de ne ku Zerdûşt di depsêka meha Newrozê de hatiye dinê. Li gorî hinekan ji wan jî roja 5'ê Newrozê, ango 26'ê Adarê her sal ji bo vê armancê destnîşan dikin.

Di Newrozê de bi dehan hezar Kakeyî yên Kurd, Azerî, Tirk û Fars serdana Pirdêwer dikin. Her wiha hemû demên salê, bi taybet bihar û havîn û payîzê xelk diçe serdana Pirdêwerê, ji ber ku Yarsan Pirdewerê weku hec dizanin.

Ji bilî Pirdêwer şûnewar û ziyaretgehên din jî hene, ku hindek ji wan ew in:

1-Baba Yadigar li Serane, Çiyayê Dalaho – Kirmanşan. Gelek kes piştî serdana Pirdêwer diçine serdana Baba (Bawe) Yadigar.

2-Tirba û ziyaretgeha Xatun Rezbar; Kirmaşan, Pawe, Pirdêwer.

3-Dawid Kewe Siwar, Pirdêwer.

4-Pîr Binyamîn, Kirmaşan, Kerend.

5-Pîr Musê, Kirmaşan, Kerend.

6-Pîr Mikayîl Dawdanî, Hewreman, Bangiyan.

7-Seyid Mihemed Gewre Suwar, Kirmanşan.

8-Kake Mustefa, Pirdêwer.

9-Pir Şalyar, Hewremana Text.

10-Gunbed û Elewiyan, Hemedan.

11- Baba Tahîrê Hemedanî, Hemedan.

12-Dede Bekter, Xudabenda, Sehend, Kirmanşan.

13- Hecî Babo Îsê, Kirmanşan li Deynûr, Sehend.

14-Xan Ehmed (Pîr Ehmed / Îmam Ehmed), Kerkuk li taxa Musella.

15-Bawe Heyder - Gêlana Xerbî, Dêyê Kifrawer.

16-Şah Îbrahîm, Bexda, Şêx Emer.

17-Bawe Şasuwar, Kifre.

18-Bawe Mehmud, Xaneqîn.

19-Seyîd Ferzî û Şêx Emîr, Gundê Qezwêne, Kengawer, Kirmanşan.

20-Şa Heyas, Qezaya Qerequş, Musil (Neyînewa) li taxê Werdek.

21-Kel Dawid, Serpêlî Zehaw

22-Quşçîoxlî, di navbera Tebrîz û Herdewêl, Azerbeycan.

23-Merqadê Şêx Îsa û Merqeda Şêx Mwiha Berzincî, Berzince-Silêmanî

24-Mîrê Sûr, Silêmanî, Seiydsadiq.

25- Mîr Mensur, Silêmanî

26-Pîr Mihemedê Şarezurî, Helepçe.

Evana û bi dehan ziyaretgehên dinê, ku li Hawar, Helepçe û Şarezur û cihên din hene.

Weke ku ji cih war û ziyaretgehan jî derdikeve, Yarsan ji Loristan, Kirmanşan û Hewraman bigre; heta Azerbeycan, Bexdad, Xaneqîn, Kerkûk û Mûsilê hebûne û di roja îro de jî hebûna xwe li van cihan didomînin. Lê Kakayî ji van navçeyan berfirehtir niştecih bûne. Di dema niha de weke demên borî nebejî hîn di van herêman de bi bandor in. Ger em li gorî hinek belge û çavkaniyan li lîsteya niştevihên Kakayiyan bikin, wê demê dê xeriteyeke gelek mezin û berfireh derkeve bêşberî me. Bêgûman Kakayî di wan hemû cihên ku navê wan tê gotin, her çiqas hêjmareke wan a zêde nema be jî; di van herêman de hebûna xwe didomînin. Di encamê zextên li ser wan pêş dikeve ji Başûr ber bi Bakur ve diçin:

1- Ehwaz (Xuzistan); li qeraxên Kendavê de jî Kakeyî hene. Her wiha li nava Parêzgeha (Wilayeta) Ehwazê gelek hene û bi navê “Muşe Eşeyî” têne nasin.

2-Loristan; bi piraniya bajêr û navçên xwe ve. Mînak; piraniya xelkê Lekistan Kakeyî ne.

3- Di nav bajêrê Şîrazê û derberên wî bajarê de pişkek ji Bextiyarî.

4-Kirmanşan; him li nava bajêr û him jî li deverên dewir û berên bajêr hêjmareke ber çav Kakayî cîhwar in.

5-Hemedan; ji nava bajêr û dewir û ber, heta Qezwênînê.

6-Divê bajêrê Tehran jibîr nekin, him li nav bajêr û him jî dewir û berê Tehranê bi taybet li Kerec û Heştgird û li heremên ku, ji Tehranê heta Sawe û nêzîkî Qûmê Kakayî hene.

7-Çalus û Mazenderan û Sarî; bi taybet Parêzgeha Gêlan de rûnişvanên vir ji sedî 70’ê gundan Kakayî ne.

8-Hewreman; bi giştî malbendeke kevn û çalakiya Kakayî bûye, heta Sultan Sehak bi navê “Şahê Hewreman” hatiye nasîn. Ji aliyê Rojhelata Hewremanê heta bajarên Bêcar û Zencanê, ji aliyê Rojavayê Hewremanê, Ji Hawar û Helepçe heta Deşta Şarezur û Çemçemalê, û navanda Kerkuk û der û dorê Kerkûk, ji aliyê Başûrê Hewremanê ve, ta Daqûq û biniya Çiyayê Hemrîn, kifrî, Kelar, Xaneqîn, Mendelî û Bexda û hindek navçeyên Navrasta Îraqê, (her wiha li Parêzgeha Diyala, Baqubê da Erebên Kakeyî jî hene), ji aliyê Bakûrê Hewremanê ve, heta Hewlêr û Qeza Xebat û Qerequş û navenda bajêrê Musil û Telafer û Nemrûd diçin.

9-Azerbeyacana Rojhelat û Rojava, her wiha Azerbeycana Sovyeta berê û di hindek cihên din yê weke, Tebrîz, Êlixçî ,Sofiyan, Heştarud, Kurddere, bajêrê Ûrmiyê der û dorên Ûrmiyê, bi sedan gund û bajarokên piçûk yên navçeyê ji Makuyê heta tixubên Ermenîstan-îranê.

10-Tirkiyê; Rumelî, Dersîm, Sîvas, Erzîncan, Qereqoyînlî, Anadoliya Rojava, Urfa, Wan, Colemêrg hindek cihên din.

11-Welatên Sovyeta berê; bajarên Îşiq Abad, Arakis, Êlzabes, Pird.

12-Afxanîstan; li der û dorên Mezarê Şerîf û di gelek malbendên din. Kakeyî di vê welatî de bi navê “Zikrî” tên nasin.

Heta niha jî di hindek cihan de civat û komên hur û mezinê Kakeyî hene. Lê belê ji ber tirs, nebûna zirufa hevnasinê wek îro xwe nezaninê, xwe nedane nasandin.

Her weku me got, bi destnîşankirina wan bajêr, dever û welatan, armanca me ne ev e ku em bibêjin hemû runiştîvanên wan deran Yarsan in. Dibe ku li piraniya wan welatan eqeliyet in. (kêmayîne)

Ji aliyekî din ve, ji ber baweriya Donawdon, Kakeyî xwe bi cihekê ve evqas girê nadin.

**Hêjmara Kakeyiyan:**

Heta niha serjimêriyeke rêk û pêk û durûst li ser Kakeyî nehatiye kirin. Li gorî nifûsiha giştî hêjmara Kakayî li Iraqê kêm e, li Îran û Tirkiyê zêde ye. Li ber çav girtina berfirehbûna navçeyên, ku Kakayî tê de ne, hinek kes dipên (texmîn dikin) ku hêjmara Kakayî nezikê 5- 6 Milyon in. Hinek kes dibêjin ev reqam kêm e û texmîn dikin, ku hêjmara Kakayî 8-9 milyon in. Belê li Iraqê 150 hezar Kakeyî dijin. Ji bilî Kakayiyên ji ber zext û zorê koçberî derveyî welat bûne."

**Felekedîn Kakayî**

★

KAKAYÎ NE tenê li Kerkûk û derdora Kerkûkê, li Xaneqîn, Helepçe, Hawar û di navbera Mûsil û Hewlêrê de jî dijîn. Hema bêje bi awayekî zanebûn ji hev hatine qutkirin, belavkirin. Dibe ku ev siyaseta serdemekê be ji aliyê îslamiyetê ve hatibe meşandin li beramberî Kakayîyan. Dema ku mirov li şêwazê belavbûna wan dinêre dikare bêje ku ev tesbît di cih de ye. Ji aliyê erdnîgarî ve jî ewqas ji hev dûr û belavin hema bêje qet dê nikaribin bên gel hev. Li gorî her herêmekê taybetmendiyên wan ên civakî jî hatine guhertin.

EZ BAWERİM di derbarê Kakayiyan de ewqas zanyarî ji bo niha bes in. Lê divê ez vê ratiyê jî vebêjim, di derbarê ola Kakaî, bawerî, dîrok, çand û zimanê wan de nerîn û nirxandinên corbicor hene. Ya ku herî zêde min girîngî dayê nivîs û nerînên Felekedîn Kakayî bû. Jiber ku yek ji seyîdên wan e û di derbarê baweriyê de xwedî fereseteke mezin bûye ji bo wê. Li gorî Felekedîn Kakayî êdî dema xwe û baweriya xwe eşkerekirinê hatibû. Diviyabû gelek xalên xwe yên olî bêyî ku ji kesî veşêrin bi asanî pêk bînin. Heta bi vê armancê yek ji keçên xwe kir bêjer (Spîker) ê Kerkûk TV û di bernameya xwe de mijara Kakayiyan vedigot. Lê ji aliyê Seyîdên Kakayî ve rastî bertekek pir mezin hat. Di dawî de ew bername jî rakirin. Keça wî jî ji ber ku bi yekî sûnnî re zewicî niha ji aliyê Kakayiyan ve hatiye tecritkirin.

EM DÎSA vegerin ser mijara bajarê Kerkûkê. Weke ku me di serî de jî gotibû; bajarê Kerkûkê bajarê pir netew û baweriya ye. Di vî bajarî de di gel Kurdan de Ereb, Turkmen, Aşûrî, Kildanî û hwd jî dijîn. Lê hêjmara zêde Ereb û Kurd pêktînin. Li gorî gelê niştecihên herêmê û belgeyên dîrokî hêjmara Kurdan di demên borî de rêjeya herî mezin bûye. Lê di serdema Hizba Baas de di çarçoveya tevgerên enfalê de tevahî Kurd ber bi bajarên Ereban ve birine û Erebên wan bajaran anîne di vir de bicih kirine. Ev rastî heta roja me ya îro jî derbazdar e. Biqasî ji destê pergalê tê dixwaze rêjeya niçtecihên Ereb di vî bajarî de zêde bike. Tevî ku êdî ti serweriya

hikûmeta navendî li vir nemaye jî ev bi vî rengî didome. Bi hatina DA'ÎŞ'ê ya herêmê re hêjamareke zêde di bin navê koçberiyê de di vî bajarî de bicih kirine. Ji aliyekî ve hatina wan demografya bajêr bandor dike, ji aliyê din ve jî bandorê li ser aborî û sûkê dike. Dema ku di bajarakî de ji hed zêdetir niştecih hatin bicihkirin ne gengaze ku ev bajar mîna berê bikaribe jiyana xwe bidomîn. Dema ku rastiya şer jî li vê zêde bibe êdî hûn texmîn bikin bê ka wê jiyan li bajarekî wiha çawa bidome. Rojane tevahî nirxê bazarê dikare li gorî vê rastiyê bê guhertin. Pergala ku vê bixe bin kontrolê jî nîne. Hinek kes bê sînor dewlemend dibin, hinek jî di bin sînorê xizaniyê de dijîn. Kendalên di navberê de ewqas kûrin ku tu gelek caran nikare ji nav derkevî. Tu diçî malekê, mal heta dawî xizane, tu diçî mala din nema zane ji dewlemendiyê çi bike. Ewqas dewlemendin ku di malê de cihê ku tu lê rûnê ji te re dibe mijara pirse, gelo ez li kî derê rûnim başe.? Ya rast di van malan de tu qet nikarî rehet tevbigerî. Hema bêje tevahî alavên wan mîna derziyê di laşê te re diçe. Dema ku tu vê rastiyê dibînî dibêjî xwezî avakirina pergalê bi destê min bûye û min bikaribûna ev bêdadiya heyî ji holê rakira. Hinek alav, xwarin û vexwarinên ku di destê van de heye bidaya wan kesên hejar. Yan jî min kariya tiştek bikira da ku ev kesana hest bi kesên hejar bikira. Ger hûn rastiyê dixwazin kes nikare hestên yê beramberî xwe fêm bike.

XALA KU herî zêde ez li beramberî matmayî dimînin ewe ku tê ewqas di nav hev de bijî, tê ewqas bi hev re bî, lê tê qet nikaribî bi êş û azarê hev bihesî! Hinek xal hene ku mirov nikare pênaseya wan di vê herêmê de bike. Ji aliyekî ve bi sedan sale bi hev re dijîn, ji aliyê din ve jî tevî ku bi hev re dijîn, ji çanda hev bandor bûne, bê hev nikarin hebûna xwe bidomînin; lê ewqas jî dijminantiya hev dikin. Kîn û nefreteke mezin di navbera Ereb û Kurdan de hatiye afirandin. Ji aliyê civakî ve tu dema ku li wan dinêrî tu dibê qet pirsgirêkê wan nîne, lê ji aliyê siyasî û hizbî ve hema bêje du dujminên herî mezin in. Ev dujminatî her çiqas xwe bispêre salên

dirêj û siyaseta rejîman jî; di roja me ya îro de li gorî min ji tehdîta DA'ÎŞ'ê zêdetir xeteriyê dafirîne. Qet nebe DA'ÎŞ hêzekî bi dujmin tê nasîne, lê mirovên bi hev re dijîn, ji çanda hev bandor bûne, êdî ji aliyê xwînê ve jî tevlîhev bûne dema ku mîna dujmin li hev binêrin tê çawa bikaribe pirsgirêka wan çareser bikî. Kendaleke mezin di navbera herdu gelan de hatiye afirandin. Biqasî ku Kurd û Ereb ji hev acizin, ne Kurd ne jî Ereb ji gelên din neacizin. Dibe ku ev çavkaniya xwe ji kêmbûna hêjmarî ya wan netewan jî bigire. Piraniya gelên vir bi sê zimanan dizanin. Di gel Erebî û Kurdî de zimanê Turkmenî jî serwer e. Li gorî netew û baweriyê demografya bajêr jî hatiye diyarkirin. Hinek tax bi taxên Ereban û bi navê Erebî hatine navkirin, hinek tax jî piştî hilweşîna hizba Baas bi navê Kurdî hatine binavkirin û niştecihê wan jî piraniya xwe Kurd in. Çend tax hene ku ayîdî Turkmen û Aşûriya ne. Li gorî çanda netewan tu ger şariza bi dikarî bi awayekî asan di kîja taxê de kîjan netew dimîne fêm bikî. Ev fêmkirin ti pêwendiya xwe bi çanda netewî re nîne. Ji aliyê cil û bergan ve hema bêje hemû çandan bandor li ser hev kiriye. Lê ji aliyê paqijî, jiyana civakî ve berevajî ye. Taxên herî xweş û paqij yên Aşûriya ne. Gelek caran ez pê difikirim. Dema ku mirov xwe ayîdî cihekî bibîne xizmeta wî cihî dike, lê xwe ayîdî wî cihî nebine, dem borî lêbinêre xizmetê jî nake. Tevî ku Kurd xwe xwediyê Kerkûkê dibînin, ji bo Kerkûkê bi hezaran berdel jî dane, hema bêje qet xwedî lê dernakevin. Ereb ji xwe her tim di nav derûniya mêvaniyê de ne. Dizanin dê rojek ji rojan ji van cih û waran bên derxistin. Ji bo vê ye ku qet xwe xwediyê vî bajarî nabînin. Ji aliyê aborî ve ti sermaya xwe tê de narazînin. Jiyana wan rojene ye. Li gorî teoriya me ya jor ger em biçin, bi asanî dikarin bêjin ku yên xwe xwediyê Kerkûkê dibînin tenê Aşûrî ne. Yanî ev rastî derdikeve holê. Mîna ku dê qet ji van deran neçin û dê her tim lê bin xwedî lê derdikevin.

Jİ ALİYÊ NETEWÎ ve pevçûnên herî dijwar di navbera Kurd û Ereban de tê jiyîn. Ji aliyê olî ve jî ev dijwarî di navbera Sûne û baweriyên din de xwe dide pêş. Xala ku herî zêde di nav pevçûnê de ye di vî bajarî de pevçûnên mezhebîne. Tevî ku Kakayî Kurd in jî, ji aliyê Kurdên sûne ve mafê wan tê binpêkirin. Biqasî ji dest wan tê dixwazin wan ji baweriya wan dûrbixin û bînin ser baweriya xwe. Ji aliyê civakî ve tecrîdeke mezin dixin ser wan. Di netîceya vê tecrîdê de hinek ji wan dev ji nerîtên xwe berdidin. Tevî ku baweriya wan dest na de û hinek xalên îslamê pêkbînin, mîna ku pêk tînin xwe nîşan didin. Mînak: Ew qet nimêj nakin, dema wan a rojî girtinê û cejna wan ji ya sûniyan cuda ye jî, li derve berevajî tevdigerin. Ne xwarin dixwin di dema rojî yê de, ne jî li ber çavên wan hinek xalan pêk tînin. Heta hinek ji wan ji bo ku ji aliyê civakê ve bên pejirandin dev ji kevneşopên xwe berdidin û tevahî kevneşopê îslamê pêk tînin. Li gorî wan ev jî yek ji şêwazên xwe parastinê ye. Lê nizanin bi vî awayî ne xwe parastin ji esl, reh û rîşên xwe dûrketine. Di vê mijarê de biqasî ku zext li ser Kakayiyan heye li ser Aşûrî û baweriyên din nîne. Mînak: heta niha min nedîtiye ku Kurdek ji Aşûriyan aciz be, hewl bide da ku wan bîne ser dînê xwe. Yan jî xwarina destê wan, ava destê wan nexwe. Lê dema ku Kakayî dibin mijara gotinê, xwarin ji destê wan girtin, ava wan vexwarin jî heram tê hesibandin. Di be ku ev jî yek ji siyaseta serdestan be ku di bin navê baweriyê de xwestibin gelê Kurd bi hev bidin kuştin. Ger ev be mebest, ez dikarim bêjim gelek serkeftîbûne di vê siyasetê de.

ÇAWA KU di pêwendiyên Kurd û Ereban de pirsgirêk hene, di heman demê de di pêwendiyên Turkmen û Kurdan de jî pirsgirêk hene. Lê ne biqasî yên Kurd û Ereban kûr e. Turkmen jî di nav xwe de dibin sê beş. Hinek ji wan hema bêje MHP. Jixwe xeta faşist diparêzin. Ev xwe weke "Irak millî turkmen partîsî- cephesî" bi nav dikin. Yên ku nijadperestî, dijbertiya Kurdan û dujminatiyê dafîrîne ev beş e. Hemû polîtîkayên wan di çarçoveya nijadperestiyê de ye.

Di gel vê xetê de “Bereyê Turkmenî” heye. Ev beş ji nijadperestiyê zêdetir bi hemû beşên civakê re di nav pêwendiyan de ye û zêdetir jî bi ticaretê re mijûl dibin. Karê wan ê esasî bazirganiya. Yanî berjewendiyên şexsî li pêşe. Nêviyê suka bajarê Kerkûkê di destê wan de ye. Li gorî berjewendiyên wan kî tevbigere dikarin ber bi wan ve biçin. Heta radeyekê ev beş dikare di nav pergala fermî ya bajêr de jî cihê xwe bigire. Ji ber ku ne tûndrewin, yanî aligirê zorê ne di nav civakê de jî tên pejirandin. Mirov dikare vane mîna beşê ku dixwaze di nav desthilatdariyê de cihê xwe bigire jî bi nav bike.

BEŞÊ DİN ÊN Turkmena jî yên ku haya wan ji bayê felekê nîne. Ne ji aliyê siyasî, ne ji aliyê civakî û ne jî ji aliyê çandî ve ti bandora wan nîne. Di halê xwe de ne. Lê amûrê destê herdu beşê dinin. Herdu beş jî li gorî berjewendiyên xwe dixwazin ji wan sûd werbigirin. Komara Tirkiyê jî bi salane bi rêya van beşên din tevahî polîtîkayên xwe dixe meriyetê. Bey ku bizanibin çawa tên bikaranîn xizmeta pergala nijadperestiyê dikin. Tenê hestê ku wan ber bi pêş ve daf dide, hestên qewmîne. Tevî vê rastiyê jî biqasî nijadperestan dijatiya Kurdan nakin. Heta radeyekê dikarin bi Kurdan re di nav çandekê de bijîn.

TURKMEN JÎ di nav xwe de hinek şîa ne, hinek sûnnî ne. Yên sûnnî xwe nêzîkî Turkan, ên şîa jî xwe nêzîkî Îranê dihesibînin. Heta bi pergala hikumeta navendî ve jî dikarin xwe pênase bikin. Ji bo wan ev zêde ne girîng e. Ji hestên qewmî zêdetir hestên mezhebî li pêşin. Dikarin ji bo merasîmeke mezhebî bi kîlometreyan rê bibirin û biçin ew şûna ku dixwazin. Lê nikarin ji bo hestên xwe yên qewmî nikarin ji cihê xwe bileqin.

DİL DİXWEST ku ez di vê nivîsa xwe de bikaribin qala taybetmendî û çanda Aşûrî û Kildaniyan jî bikim. Lê mixabin heta niha min û me nekariye em bikevin nav van netewan. Her çiqas xaleke ku ez pir hez dikim fêr bibim û bi wan re bidim û bistînim jî, lê ji ber gelek sedeman ez hîn fêr nebûme. Ev sedem dibe ku

çavkaniya xwe ji min, dibe ku ji rastiya me û xebata me jî bigire. Lê Ez ê qet qala van nekim. Ji naçarî devjê berdim.

GELEK CARAN dema ku ez bi paradîgma Rêbertiyê ya Netewa Demokratîk difikirim cihê ku herî zêde mirov dikare derbazî meriyetê bike, bajarê Kerkûkê ye. Di vê herêmê de tevahî ol, bawerî, netew û qewm bi hev re di nava ahengekê de dijîn. Ev ahenga ku heyî ger ji aliyê hêzên der ve destlêneyê dayîn dê bê pirsgirêk hebûna xwe bidomînin. Ji aliyê civakî, çandî û hûnerî ve ewqas ketina nav hev tu qet nikarî wan ji hev cuda bikî. Gelek caran tu dema diçî malên Kurdan û li çanda wan a nav malê dinêrî tu dibê qey Ereb in. Ji xwarin xwarinê bigire, heta tevger û pêwendiyên wan ê malbatî hema bêje hemû şibiyane hev. Di hinek cihan de jî Erebên vir ketine bin bandora Kurdan. Dema ku tu bi wan re didî û distînî ger ew bi xwe nebêjin em Ereb, ango Turkmenin tu qet pê nizanî. Ji aliyê qewmî ve hema bêje nakokiyên mezin di navbera wan de nînin. Di vî bajarî û derdora vî bajarî de, di gel lihevkirin, ji hev bandorbûnên çandî yên mezin, xalên nakok jî ewqas zedene ku tu gelek caran nîkarî wate bidî van nakokî û lihevkirinan. Him ji hev bi bandorin, him jî dijberî hev radiwestin. Him kendalên gelek mezin hene di navbera wan de, him jî mîna ku qet nakokiyên wan nînin tevdigerin. Dema ku tu bi Kurdekî re diaxivî tu wiha fêmdikî ku dijminantiyeke xwe ya pir mezin heye li beramberî gelên din, bi taybet ên Ereb û Turkmenan. Lê dema ku tu li jiyana wan a civakî dinêrî berevajî ye. Wiha germ û samîmî nêzîkî hev dibin tu dibê qey ê bêgane û hevsengiya wan têkdaye tu yî.

EZ VÊ rastiyê nikarim înkar bikim ku bi hev re jiyana demdirêj a gelan bandor li ser hev neke û ji hev fêrî hinek tiştan nebin, yan jî ji hev hez nekin. Lê ya ku ez nikarim tê bigihêm ev e, ku ew kesên ewqas ji hev aciz diyar çawa di nav aramiyê de dikarin bi hev re bijîn e. Dema ku mirov hinekî din vê rastiyê lêkolîn dike dikare bibîne ku pevçûn û nakokiyên ku di navbera gelên vê herêmê de

nakokiyên ku hatine afirandinin. Her netew, qewm û bawerî jixwe li gorî fikir û felsefeya siyasî hewl dide hestên xwe yên di derbarê qewmê din de bîne ziman. Yanî nakokiyên heyî ne di asta nijadperestî û hev qirkirinê de ye. Berevajî nakokî û pevçûnên ku bi destê pergalên siyasî hatine avakirinin. Wê demê em dikarin bigihêjin vê rastiyê. Çawa ku tevahî diyardeyên civakî ji aliyê mirovan ve hatiye afirandin, bi heman şêwazê dikarin bi destê mirovan li nav jî bên birin û ji holê jî bên rakirin. Lê ji bo ji holê rakirina van eşekereye ku divê feraset, çemk, têgihîn û hevfêmkirinek hebe. Bi kurtî divê bîrdoziyek hebe ku xîtabê cihana hundirîn a tevahî netew û baweriyan bike.Bikaribin berjewendiyên xwe yên qewmî, bawerî û netewî di nav de bibînin. Civaka vê derê xwedî rastiyeke wiha ye ku kî/ê jê re xizmetê bike bêy ku li reng, reh, qewm û baweriya wî binêre dikare bi rehetî bipejirîne. Lê em jibîr nekin ku ev pejirandin jî dîsa li gorî berjewendiyên demdirêj nîne, yên kêliyê ne. Mirov di van cihan de wiha hatine fêrkirin ku tenê li berjewendiyên xwe yên şexsî, heta di berjewendiyên şexsî de jî yên demî bifikire. Min heta niha nedît ku kesek bi berjewendiyên demdirêj bifikire. Hema bêje her tişt li gorî rojane dê dîzaynkirin. Îro heye, diyare, lê sibê û sibê roj bi gûman e. Ya rast sibêroj raspardine xwedê. Gotina ku di derbarê pêşeroja mirovan diyar dike ya herî bi navbang li van deran gotina xwedê mezine. Dema ku hat gotin xwedê mezine, êdî wê demê pêdiviya te bi tevger, lêger, fikir û plansaziyê namîne. Jixwe te her tiştî xwe radestî xaliq û muxliq kiriye. Dê ev xaliq û muxliqê erd û ezman ji te re daxwazên te, pêdiviyên te diyar bike.

DİBE KU ji ber vê be di van deran de tişta herî erzan mirine. Mirov li vê derê li şûna jiyanê fêrî mirinê hatine kirin. Mirin ewqas erzane li van deran wateya jiyanê di nav mirinê de fetisiye. Tevî ku ya wateya jiyanê dibexşîne mirine jî, ev rastî ji holê hatiye rakirin. Di be ku sedema vê salên dirêj her tim di nav şeran de derbaz bûn û mayîn be. Lê çi dibe bila bibe, dema ku civakek ewqasî fêrî

mirinê bû û jiyan jibîrkir; ji xwe qutbûn jî diwir de despêdike. Jixwe qutbûna herî mezin jî di mijara mirin û jiyanê de tê dîtin. Biqasî ku fêrî mirinê bûne, jiyanê jî ewqas erzan dinirxînin. Jixwe jiyan tenê mîna giyanliberekî ji domandina nifşê xwe re tê gotin. Ji têrkirina xerizeyan re jiyan tê gotin li van deran. Lê ew qet ne diferqa wê de ne ku ew tişta ku ew jê re dibêjin jiyan, ji holê rakirina wateya rast a jiyanê ye. Li gorî wan jiyan ji xwarin, vexwarin, zewac, ger û zarok çêkirinê pêk tê. Yên ku ji derveyî van xalên ku me jimartin dimînin najîn. Ji bo vê ye ku gelek caran gotina ku ji me re dikin ev e; **"Ev çi jiyane, ne maaş heye, ne zewac heye, ne hûn daxwaziyên xwe yên şexsî pêk tînin. Ma dilê we jî naçe tiştekî, wîîîîî çi gunehin, sibê dusibê hûn pîr bibin kesî li we binêre, xizmeta we bike jî nîne**" û hwd. Dema ku tu wan guhdar dikî wa dizane ku zarokên wan 24 demjimêran di xizmeta wan de ne û em ji vê bêpar mane. Ma ne em jî dibinim bê ka ew zarokên ku hûn pê serbilindin çiqas zextê li we dikin û ti hesabekî ji we re nakin. Hema bila em bê zuriyet bin, bila em guneh bin, lê mîna we qet fêrî mirinê nebin û jiyanê ewqas erzan nejîn.

DOMDARİYA jiyanê di nav civakê de tenê di çarçoveya çêkirina zarokan de ye. Wiha dizanin ku civak tenê dikare hebûna xwe bi çêkirina zarokan bidomîne. Nizanin dema ku civakê aliyê xwe yê siyasî, bîrdozî, felsefî, leşkerî û parastinî ji dest da ti wateya domdariya fîzîkî nîne. Dibe ku mirov hebûna xwe ji aliyê fîzîkî ve bikaribe bi riya çêkirina zarokan bidomîne, lê ji aliyê nasnameya xwe ya mirovî ne gengaze ku hebûna xwe bidomîne. Hema bêje di navbera tevahî netew û kemahiyên vê herêmê de pêşbirkeke bi vî rengî heye. Dema ku tu li pewneyên cirantiyê dinêrî, her malekê hejmara zarokên wan dibînî hest bi vê pêşbirkê dikî. Di hinek xalan de jî dema ku ez lê difikirim wan neheq nabînim. Ji ber ku di van deran de her tim şer heye. Hebûna şer dibe sedema kuştinên zêde. Ji aliyê fîzîkî ve linavçûn em bixwazin ango nexwazin pirsgirêka hejmarê bi xwe re tîne. Di her malê de resmên bi

dîwaran ve daleqandî hene. Her kes li gorî xwe dibêje şehîdên min hene. Lê ev kes çawa, ji bo çi, ji ber çi jiyana xwe ji dest dane cihê gûmanê ye. Di be ku di teqînekê de, di şerekî nediyar de, di bûyereke kujerê wê nediyar de hatibe kuştin. Lê di encam de ji aliyê hizb ya aliyekî ve xwedî lê derdikevin û mîna şehîdê xwe tomar dikin. Malbat jî tenê ji bo ku mûçeyê wî/ê kesî bigirin dikarin li ser termê zarokê xwe bazariyê bikin. Bazarîkirin bi termê miriya çandeke li pêş e. Ya eyb ne girtina mûçeyê term e, berevajî dema ku mûçe ji bo term nayê dayîn malbat hikumetê, partiyên siyasî eybar dikin ji ber ku mûçe nadin. Xala ku mirov matmayî dihêle jî ev e. Çawa dibe ku malbatek li ser termê zarokê xwe ewqas dikare tasarûf bike. Dayikek ewqas dibêje ez bi zarokên xwe ve girêdayî me, dema ku tevlî nav refên gêrîla dibe ewqas hêsrê çavan dibarîne, gazî û hawar dike, çawa li beramberî vê bêdeng dimîne û ew dayik bixwe diçe dawa mûçeyê termê kurê xwe, ango keça xwe dike? Bi rastî jî cihê matmayîbûnê ye. Nizanim dibe ku ez ji ber ku di çarçoveya bîrdoziya PKK'ê de li mijarê dinêrim û dinirxînim ewqas bi min ecêb tê. Lê ji dervî vê jî birastî jî karekî sosrete. Îca dixwazin me jî fêrî vê bikin. Hemû hewldanên wan divê çarçoveyê de ye ku em jî bibin mûçe xur. Yan jî piştî mirina me, malbatên me jî bazariyê bi termê me bikin.

PİŞTÎ DEMEK di ser şahadeta Ş. Merwan re derbaz bû em li malbatêkê rûniştibûn. Perpirsê navçeyê yê YNK li gel me rûnîştî bû, bêy ku ji me pirs bike, hema TLF girt destê xwe û bi cihekî re axivî. Li gorî me ji axaftinên wî fêm kir, cihê ku pê re diaxivî kesekî paye bilind bû. Yekser ji kesê beramberî xwe xwest ku tawîza şehadeta hevalê Merwan bikin û mîktarek pere bidin me, yan jî malbata Hevalê Merwan. Di wê kêliyê de min wiha hîs kir ku kesek li beramberî min sekiniye û dixwaze nirxên me yê herî pîroz di bazarê de bifroşê. Bey ku bihêlim zilam axaftina xwe temem bike, min yekser mudaxeleyî zilam kir, TLF ji destê wî girt û vemirand. Piştî wê nizamin min çi ji zilam re got. Ya ku tê bîra min xwediyê

malê tenê dixwest min aram bike û zilam ji nav destê min derxe. Dema ku ev van kêliyan niha dinivîsînim jî dêst bi hekaret û xiyanetê dikim li beramberî nirxên pîroz ê vê teverê. Lê ji bo ku kêmekî be jî rastiya civakî ya ku bi destên van partiyên siyasî li van herêman hatine avakirin vebijim min ev mînak da.

DÎSA PİŞTÎ şehadeta hevalê Armanc ji aliyê berpirsyarê eniya şerê Kerkûkê ve bêy ku haya hevalan jê hebe ji Rojhilat bangî malbata heval kirin. Di çarçoveya biryara wezareta Pêşmerge her malbatekî şehîdan mîktarek pere dabûn wan xwestin bidin malbata hevalê Armanc jî. Ji bo ku malbat were navê endamên komîteya malbatên şehîdên PKK'ê ya başûr bikar anîn. Dema ku malbat hat ser sînor pêwendî bi hevalan re çêkir û got ku we bangî min kiriye. Dema hevalan çû ew girtin wê demê me zanî ku YNK'ê navê komîteyê bikaraniye û malbat bang kiriye ji bo ku pare bidin malbatê. Lê birastî jî bavê heval dema ku ev rastî bihîst wiha lê hat ku di heman şevê de xwest vegere. Ewqas şerm kir mîna ku tawanek li berembetî hevalê Armanc kiribe kete nav xemgîniyeke mezin. Helwesta bavê heval Armanc birastî jî bandoreke gelek mezin li ser me da avakirin. Tevî ku malbateke hejar e û pêdiviyên wan pê hebû jî qebûlnekirina wan em serbilind kirin. Di gel serbilindiyê de derfet da me ku em semînerekê jî bidin wan kesên ku dixwestin xwîna şehîdên me bifroşin malbatên wan jî.

TEVÎ VAN rastiyan hemûyan her roja ku derbaz dibe ez dizamin ku ez ji van deran hezdikim. Hez dikim ji ber ku dizanim êdî ez xwe aidî van deran û van deran jî aidî xwe dibinim. Rastiyeke mirovan heye ku qet nayê paşguhxistin. Ew jî ev e; dema ku te di cihekî de ked da, xwîn û xwêdan rijand ne gengaze ku tu bi asanî dev ji wan deran berdî, pişta xwe bide û biçe. Ma ez ê bikaribin rastiya Ş. Merwan jibîr bikim, ma ez ê bikaribim jibîr bikim bê ka xwîna Ş. Armanc çawa ku dilop bi dilop rijiye ser axa vî welatî? Ma em ê bikaribin dev ji wan nirxên ku me ber bi mirovbûn û serkeftinê ve dibe jibîr bikin? Ez dizanim ku êdî xwîna

me tevlî nava axên vî bajarî bûne. Ez dizanim ku ev xwîn dê heta ku em hebin her tim di bîra me de be. Pir baş dizanim ku em ê van deran, vî gelî û rastiyên van gelan qet jibîr nekin. Lê ez nizamin bê ka ev gelê jî mîna îro wiha her tim ji me hezbike û berê xwe bide me yan na? Ger li gorî rastiyên civakî û gel ên îro şîrove bikim ez ê bi asanî bêjim dê ev gel qet Armanc û Merwanan, Peyman û Dûnyayan jibîr neke. Lê vê jî pir baş dizanim ku ev gel fêrî jibîrnekirin û bi hêvi jiyanê nebûye. Her tim fêrî jibîrkirinê hatiye kirin. Her çi hatiye serê wî/ê jê re hatiye gotin ku dê ev jî derbaz be. Tiştek bi navê hafizeya civakî heye. Ev hafiza ji çi pêk tê? Ji bûyer û diyardeyên civakî yên ku divê civak mirovan mîna tecrube ji xwe re bike ezmûn û xwe li ser bide avakirine. Dema ku ev hafiza civakî ji holê hate rakirin jixwe ji rewşa civakbûnê derdikeve. Ger gotin di cih de be ya ku li van dera tê jiyîn ev bi xwe ye. Di hafizaya civakî de darbeyên mezin, taxrîbatên ecêb hatine jiyîn. Ji bo vê ye ku dikare bê paşeroj û pêşeroj bijî, tenê li îro bifikire. Ji dervî îro ti xaleke din di bîrê de nemîne. Ji bo vê ye ku ez dibêjim ez dê jibîr nekim, lê garantiya wê nadim ku ev gel jî van rastiyan jibîr neke. Dibe ku hêjmareke zêde van rastiyan ji nedîtî ve bê, divê ku gelek kes van rastiyan bilêv neke, lê ez pir baş dizanim ku dê zarok, ango nivşê nû pêdigihe û ketiya pêşbirka bûyîna YPG-YPJ û Gêrîla dê qet van rojan jibîr neke. Dibe ku wê demê mirov bikaribe qala guhertinên civakî di van herêman de bikî.

EZ Ê VÊ BİBÎNİM ango nebînim; ev mijareke dine. Lê ez dikarim bi awayekî misoger vê bibêjim ku biqasî ku ew ji me bandor dibin, em jî ewqas ji wan bandor dibin. Li beramberî hestê dayikekê, nêzîkatiya zarokekî, silavdayîna kesekî/ê em jî bandor dibin. Gelek caran hevalên me li nav çavên wan dinêrin û hewl didin ku hestên wan ên di dilê wan de veşartî di nav çavên wan de bixwînin. Bi rastî jî mirov pir asan dikare hest û sozên vî gelî di nav çavên wan, awirên wan û qermîçokên rûyê wan de bixwînî. Ya pêwîst tenê tu bizanibî ji vî zimanî fêmbikî. Şadî û dilxweşiyên xwe, nexweşî û

êşên xwe pir eşkere dikarin li ser rûyê xwe vemalînin. Dikarin tevî hemû zorî û zahmetiyan kenê li ser lêvên xwe, hêvî û bendewariyên xwe li ser rûyê xwe niştecih bikin.

GER Dİ CİHEKÎ de zarokên ku li kolanan dileyzin di lîstokên xwe de kîjan hêzî esas bigirin û kîjan hêz bibe xala sereke ya lîstokên wan misoger dê ew hêz jî di wê herêmê de mayende bibe û mohra xwe li demeke dîroka wî gelî bide. Niha xala ku di lîstokên zarokên kolanên welatê bê xwedî de tên lîstin bûyîna gerîla ye. Her yek ji wan zarokan darekî digire destê xwe, dike çek û mîna çek bikartîne. Bi taybet wan cihên ku perwerdeyên xwe parastinê ji jin û ciwanan re tê dayîn de hema bêje tevahî zarok di nav pêşbirka fêrbûna çekan de ne. Tevgera ciwanên perwerdê çawa be, ew jî texlîda wan dikin, hinek caran xwe davêjin erde, hinek caran bazdidin, hinek caran xwe vedişêrin û hinek caran jî pozisyona bikaranîna çekan digirin. Xala herî balkêş jî ew e ku di nav xwe de dibin du grûb hinek ji wan dibin DA'ÎŞ, hinek jî gêrîla. Lê di vê lîstokê de pir zehmete ku zarok bûyîna DA'ÎŞ'ê bipejirînin. Ji bo pejirandina vê yekê divê serpereştê grûbê xwedî kabîliyeta îknayê be, da ku zarokan razî bike. Hema bêje tevahî cihana van zarokan bûye rastiya vî şerî. Ewqas li TV dinêrin û dîmenên şer dibînin, di wan şeran de kî/ê çikiribe ew jî heman tiştî dikin. Yek ji xalên sereke yê serkeftina van şeran jî weke ku tê zanîn şerê al vedanê ye. Kîjan hêz digihêje kî derê hema ala xwe li wir dadiliqîne. Ji bo vê ye ku zarok jî di lîstokên xwe de hema çi li berdestê wan be di wê kêliyê de li şûna alê bi serê darekî vedikin û dadiliqînin. Bi vî awayî serkeftina xwe li beramberî hêzê dijberê xwe radigihînin.

Jİ BO TEVGEREKÊ bûyîna hêvî neasane. Di gel ku ne asane, dema ku pêk hat jî qet nayê jibîrkirin jî. Hema bêje tevahî hêvî û şadî li ser rûyê van zarokên pêxwas dikare bê dîtin. Pêxwasin, porê wan qirêjî, laşê wan taziye, lê bê hêvî nînin. Hêviyeke wan a mezin heye. Ew jî dema ku mezin bûn bûyîna parêzvanê gel û welatê xwe ne mîna gêrîla. Hêrîlaye hêviya zarokê pêşerojê, gêrîlayê jinin

mînaka jina azad a welatê rojê. Bi giştî liberamberî gêrîla eleqeyeke mezin heye, lê bi taybet ev eleqe li beramberî gêrîlayên jin hîn zêdetire. Ji ber ku di nav civakên Rojhilata Navîn de jina ku lewaz, zeyîf, bêçare, nikare xwedî li xwe derkeve, li beramberî hemû helûmercan bêdesthilate tê dîtin, ji wê jinê jineke kahraman, têkoşer, şerker û azadîxwaz hatiye afirandin. Ya ku wan matmayî dihêle, dibe sedem ku bi heyranî seyrî gêrîlaya jin bike ev xale. Hema bêje di nav tevahiya civakê de heyrandariyeke pir mezin li beramberî gêrîlayên jin pêşketiye. Gelek caran bawer nakin ku ev jin jina ku di welatên serdest û zilmdaran de ji dayik bûbe, mezin bûbe. Tu kes nikare li nihîniya vê rastiyê bi asanî têbigihê, fêm bike. Jina hatiye afirandin û jina ku niha dibînin di nav hemû eniyên têkoşînê de pêşengatiyê dike ne heman jine. Dema ku tu vê rastiyê bi felsefe û bîrdoziya Rêbertiyê ve şîrove dikî, dîsa jî gûmanên wan bi dawî nabin. Biqasî ku liberamberî vê jinê bi gûmanin ewqas jî, girêdayî vê jinê ne. Ya rast me û jinên civakê mîna ku tu bi çekoyê pasteyekê bi du qet ji hev cuda dikin. Ew wiha dizanin ku rastiya vê jinê bi nêzîkatiyên parçeyên din yên Kurdistanê ve girêdayî ye. Di her kêlî û derfetê de dibêjin: “**Em û hûn ne mîna hevin. Civaka ku hûn tê de mezin bûne, ne mîna vê civakê ye”**. Lê nizanin pergala desthilatdariya zilam li kî derê, li kîjan qadên cihanê dibe bila bibe mîna hev in liberamberî jinan. Nizanin ew Bakurê Kurdistanê ku niha di hemû aliyan de ji xwe re mînak digirin, dema ku ji vî parçeyî jî jin beşdarî refên gêrîla bûn nêzîkatiyeke çawa raber dikirin. Dema ku tu hinek mînakên wê civakê di demên derketina tevgera azadiyê de ji wan re vedibêjî jî, bawer nakin. Bawer nakin ku ji nav civakeke bi vî rengî ewqas jin ber bi refên gêrîla ve herikî bin. Beriya ku derbazî herêmên din bibim di vê navberê de ez ê bîranîneke din jî bi we re parve bikim û weha derbaz bibim.

**QUTBÛNEKE BÊ WEXT:**

ROJA 15'ê Tebaxê weke hevalên li qada Daqûq'ê me biryar da ku em mîna li çiyê li derdora agir me çawa moralên xwezayî çêdikir em nostaljî bikin di wê deşta riqî rût de. Ji bo vê jî biqasî ji destê me dihat me hewl da ku gel pê nehese. Heta me yek bi yek heval hişyar kirin da ku ji gel re nebêjin. Lê gelê me dema ku ji hinekan hezkir birastî jî gelek caran ev hezkirina wan a zêde mirov difetisîne. Tevî ku me gotibû pîrozbahî nîne jî, ciwanên herêmê li hev rûniştibûn û şîroveya rewşê kiribûn. Li gorî wan çawa dibin êrîşên balafiran de di herêmên parastina medya de pîrozbahî tên lidarxistin, lê li herêmeke ewqas aram pîrozbahî nîne. Di dawî de gîştine encamê ku em ê pîrozbahî lidarxin, lê ji ber ku em naxwazin ew werin me ji wan re negotiye. Lê hûn rastî bixwazin me ti amadekarî nekiribûn û me dixwest vê carê em xwe bi xwe bin. Hîn demek mabû ji dema pîrozbahiya me ya xwezayî, me dît ku her kes ber bi cihê me ve diherikin. Hema bêje çiqas ciwan hebûn li derdora wan gunda hemûyan xwe birêxistin kiribû. Hinek ji wan jî ji ber ku Erebe bi destê wan neketibû bi hespan hatibûn. Çar neçar em derbazî cihê xwe bûn, me bi germî pêşwazî li miletê xwe kir. Ma ji vê zêdetir gelo ti çareseriyeke me ya din hebû? Na, nebû.

JÎ ALİYEKÎ ve bi germî em wan pêşwazî dikin, ji aliyê din ve jî hevala Bihar yek bi yek ji hevalan pirs dike. Kê/î ji we ev ciwan agadar kirin, me ewqas got ev tenê navxweyî ye û hwd. Tevahî lêkolînên hevala Bihar vala derketin. Ji ber ku her yek ji me sond dixwe û dibêje min negotiye. Xulase em çûn gel ciwanan û me dest bi sohbetê kir bi wan re. Di encamê sohbetê de me fêm kir ku

tu kesî/ê ji wan re negotiye. Wan li gorî xwe rewş şîrove kiriye, girîngiya 15’ Tebaxê di têkoşînê de tê çi wateyê fêm kirine û biryar dane ku gêrîla dê di rojeke wiha bê pîrozbahî derbaz neke. Heta di nav wan de ciwanekî Erebe heye, ji roja ku hêzên me hatine herêmê hema bêje piraniya demê xwe bi hevalan re derbaz dike wî tev ciwan li xwe komkirine. Heta ji wan re gotiye: **“ dema ku bi tlf ji wan re sinyal da hemû li mala wî kombibin û bi hev re werin gel me”** birastî jî weha kiribû. Hemû ciwan agadar kiribû, beriya bê gel me kî wê sitran bêje ew jî diyar kiribûn.

XWEZGA ew tenê bi hatina ciwanan ve sînordar ma ba. Lê piştî demekê ku me morala xwe ya xwezayî bi hev re çêkir, em ji naçarî ketin torenê. Me hinek pêşwazî dikirin, hinek dişandin. Heta demekê wiha lê hat ku êdî me nemadizanî kî tê, kî diçe. Hejmareke zêde polîsên herêmê jî hatin wê derê. Di nav wan de yekî Belçîkî û Emerîkî jî hebû. Dema ku dinya hênik bû, ez dibêm hênik, lê hûn wiha fêm nekin ku hênikiyeke hûn texmîn dikin. Hênikiya alana me bi şev jî li ser 40’lî ye. Me dest bi govend gerandinê kir. Piştî demeke govendên me yên gêrîla carekê min dît ew ê Belçîkî di navê govenda Mêrdînî de xwe dihejîne. Dibêjim xwe di hejîne. Bi rastî jî xwelîser nedizanî govend bigire, lê ne dixwest ji wê çoşê jî mahrum bimîne. Di dawiyê de birayar da ku dema bi zewice şahiya xwe li Kurdistanê lidar bixe. Daxwaza wî jî ev bû, li gel gêrîla li darxistina şahiya xwe. Lê feqîrî nedizanî wê ti eleqeya gêrîla bi şahiyeke weke ya wî re tinebe. Dê gêrîlayên ku ew pir ji wan hez dike çandeke wisa nepejirînin. Wî tenê di van çend mehên ku bi me re tevgeriya bû ji me hez kiribû û bi hevalan ve hatibû girêdan. Herî zêde jî ji jiyan û disîplîna jiyana me û şerê me bandor bibû.

ME, gelê xwe û hêzên cuda bi hev re bi awayekî xwezayî pîrozbahiya xwe lidar xist. Lê piştî pîrozbahiyê me nû nû fêm kir ku ew trafîka hatinê ya wê rojê ne tenê beşdarikirina pîrozbahiyê bû. Hejmarek ji wan di nav hev de bihîstibûn ku dê hevalê Sertav ji alanê biçe, vesazbûna wî çêbûye. Êdî kê balavkiribû, çawa belav bibû ez bawer dikim hûn hemû dizanin. Ji ber ku di Başûr de tiştek veşartî namîne. Çi yekî bihîst, çi deh kesan bihîs heman tişte. Hatine wan kesan jî bi armanca xatirxwestinê ji hevalê Sertav.

LÊ XALA balkêş ew bû. Di despêkê de her kesi govend gerand, stran gotin, bi coşbûn. Lê dema xatirxwestinê hat, ew coşa di govendê de derket holê cihê xwe ji kêliyên bi hest re hişt. Hejmarek zêde wan ciwanan dest bi grî kirin. Kî dibêje zilam nagirîn. Xweziya we ew kêlî di şexsê hinek ji wan ciwanan de dîtiba. Te digot qey nezîktirîn kesê wan ji wan qut dibe, bi wî rengî tevdigeriyan. Hinek ji wan wiha lêhatin ku êdî niqrsîk vedidan. Ez nizamin çawa wan hest û kêliyan binim ziman, lê ya ku min ji van kêliyan fêm kirbû ev bû. Êdî ne em dikarin dev ji wan berdin; ne jî ew dikarin bê me bijîn. Hest û hezkirineke wiha avabûye ku di navbera me de em bi xwe jî gelek caran nikarin têbigihêjin. Tevî wê êvarê karê me hebû me dixwest em ber bi tabûreke din ve biçin negengaz bû ku em xwe zû bi zû ji wan xilas bikin. Wî ciwanê Ereb heta soza êvarê çûyîna mala wan ji me negirt siwarî hespê xwe nebû. Xala balkêş ew bû ku hema bêje hespê wî jî mîna ku nexwaze ji wê derê cuda bibe linge xwe li erdê dida û li derdora xwe dizîvirî. Di encama hewldananeke mezin de encax hesp ket nava bez ê. Li ser pişta hespê zivirî û ji hevalê Sertav re got: “**Heval hespê min jî naxwaze tu ji vir biçî, ji bo wê wiha dike”**

PİŞTÎ KU me hemû mêvanên xwe birêkirin em ber bi mala wî ciwanî ve çûn. Dema ku em giştin ber deriyê malê, vê carê wan ji me re toren çêkribûn. Hejmarek ciwan li mala wan kom bibûn. Ê me jî ecela me hebû. Me di got em ê biçin demeke kurt bimînin û derkevin. Lê dema ku em çûn ji xwe wan pêşwext xwarin amadekiribû. Yekser sifre danîn. Lê me jî li cihê xwe xwarin xwaribû. Tevî vê jî me li mala wan jî ji naçarî xwarin xwar. Ger me nexwara dê di dilê wan de bima. Nîqaşa wan hemû li ser yek xalê bû. **“Em ji hemû tiştên we hezdikin, bernameyeke we ya gelek baş heye. Lê xaleke we bi dilê me nîne. Em fêrî we yekî dibin, hûn yekser diguherin. Êdî em nema dikarin xeber ji wan bigirin. Her roj em li pêşberî TV rûdinin, nûçeyan guhdar dikin. Tirsa me ew e ku bêy ku em careke din wan hevalan bibînin şehîd bikevin, yan jî biçin cihekî ku em qet nikaribin we bibînin.”** Bêgûman piştî çûyîn û şehitbûyîna Hevalê Şevger û Akîf ev tirs bi awayekî xwezayî di nav dilê wan de ava bibû. Piştî 20 rojan herdu heval çûn Kobanê di êrîşa erebeyên bombebarkirî û pevçûnên di wê demê de derketin herdu heval jî şehîd bûn. Ciwan beriya me bi şahadeta wan hesiyabûn. Ji ber ku dîmenên şerê herdu hevalan ji aliyê çapemeniya Rojava ve hatibûn weşandin û wan heval di wan dîmenan de naskiribûn. Jixwe yek ji wan dîmenan jî dîmenên hevalê Şevger bû.

WEKE KU hûn ê jî texmîn bikin, van gotinên xwe weke ku ez niha dinivîsînin ne dianîn ziman. Di nav hestên aloz, çavên bi hêsir û kelogirî digotin. Tirsa wan ew bû careke din hevalê Sertav jî nebinin. Ger hûn rastî bixwazin ev ne tenê tirsa wan bû. Tirsa me jî bû. Xala herî zehmet ne tenê bi wan xatir xwestin bû. Di heman demê de ji bo me jî her xatirxwestinek wate û îhtîmala careke din

nedîtinê jî di nav xwe de dihewand. Di gel hezkirin û girêdanên hevbeş, tirsên me jî hevbeş bûne. Hestên ku tu dixwazî di van kêliyan de veşirî çi dibe bila bibe bi awayekî xwe dide der. Yê wan bigirî û şadiyan bû, yê me jî bi bêdengî li wan nêrîn bû. Lê ya rast ger demeke din em li wê malê bimana mine jî bi wan re dest bi girî kiriba. Demekê wiha li min hat ku kêliyek mabû hêsrê min bi ser hinarokên rûyê min de bên xwarê. Ji bo wê di bin navê cigare vexwarinê de ez çûm derve û min wan hêsirên ku di nav çavên min de mîna ewrê biharê kom bibûn paşde zivirandin. Êdî min nema dikarî biaxivim. Ger gotin ji devê min derketa, dê li gel her peyvêkê dilopên minê jî mina barana payîzê bi şîdet bihatana xwarê. Ji bo wê min ew kêlî tev di nava bêdengiyeke mezin de derbaz kir. Ji bo ku ez xwe veşirêm min bala xwe da ser zarokên malê. Du zarokên cêwî hebûn. Tevî ku ne di temenê lîstikê de bûn jî, min hewl da ez bi wan re bileyzim. Elbet, ew kêliyên ku min jiyan dikir ne ji ber qutbûnê bû. Ji ber hestên wan ên ku li beramberî gêrîla bûn. Tiştekî ecêbe di demeke ewqas kurt de wan mirovan çawa ewqas ji me hez kir û çawa wiha bi jiyana me ve hatin girêdan? Ji aliyekî gilî û gazincên xwe dikir, ji aliyê din jî digotin: **“ Ji niha û şûn de her hevalê/a hat bi me nedin naskirin. Em we nas dikin, ji we hez dikin, bi we ve tên giredan; piştre hûn diçin û me di nav hestên aloz de bi cî dihêlin.”** Ji aliyê din ve jî digotin: **“Gelo hevalê ku bê cihê te em ê bikaribin ewqas ji wî jî hezbikin?”** Her çiqas destê me ji wan û ji sohbeta wan nedibû jî em naçarbûn ber bi cihê xwe ve bikevin ser rê. Di nava hestên aloz de me berê xwe da cihê ku em biçinê. Ez bawerim ev hest ne tenê hestên min bûn di heman demê de hevalên ku li gel min jî xwedî heman hestan bûn. Ji ber ku di navê bêdengiyeke mezin de rêya ku nêzîkî seetekê me birî. Tenê dem dem me nefeseke kûr dikişand ji bo ku me xwe ji wê

atmosfere rizgar bikin. Di derengiya şevê de bi hestên kûr û birîndar me berê xwe da nediyariyeke din di jiyana xwe de. Jixwe yê ku jiyanê xweş dike û balkêş dike jî nediyarîne. Ger mirovan di derbarê jiyana xwe de her tişt bizaniya gelo wê bi pêy jiyanê biketana, ango wê kelecana pêwîst ji jiyanê bigirtana? Na! Ez ne di vê baweriyê de me ku mirovan çoş ji jiyaneke dizanin dê çawa be bigirtana.

JİYAN biqasî di nav herikbariyê de ye, ewqas jî bi nihîni û nepeniyan ve dagirtiye. Jixwe ya ku jiyanê balkêş dike jî ev taybetmendiya jiyanê bi xwe ye. Ger nihînî û nepenî di jiyana mirovan de nebe, nediyar nebin, mirov her tiştî di derbarê pêşeroja xwe de bizanibe wê demê pêwîstî bi wê jiyanê jî namîne. Ger mirov bi dûv nediyariyan û nihîniyan nebeze gelo dê tama jiyanê bîmînî? Çawa mirov xwarineke qet nexwaribe dema ku navê wê xwarinê tê ziman bi meraq û baldariyeke mezin li benda kêliya hatina wê xwarinê ya ser sifrêyê; hema bêje jiyan jî mîna van kêliyane. Lê ne ji bo demeke kurt, ne ji bo kêliyekê hemû kêlî bi vî rengî ne. Hemû kêliyên jiyana gêrîla bi nediyarî û nepeniyan ve dagirtiye. Kî wê kî demê berê xwe bide kî derê û çawa bijî qet nediyare. Nediyarî çavkaniya xwe ji rastiyê jiyana ku tu tê de cih digerî digire. Nediyariya ku qala wê tê kirin ne nezelaliya di fikir, raman û bîrdoziyê de ye. Ger na ji aliyê bîrdozî ve armanca me mîna ava rûbara Dîcleyê zelal û herikbare.

EZ BAWERİM dîsa ketim nav deryaya hestên jiyan û bîranînên gêrîla, lê min mijara xwe ya danasîna herêman jibîr nekir; tenê da aliyekî. Ji bo demekê.

BERİYA KU EZ derbazî herêmeke din bibim divê xaleke din heye ku ez li vir qala wê bikim. Ew jî zilamê bi navê mam Reşîd e ku bi mame Rîşe dihat naskirin di herêmê de. Ji ber ku ew niha ne di nav me de ye ez ê hinekî qala jiyana wî bikim. Mam Reşîd ji gûndê Yêngicê bû. Bi temen hema bêje kesê herî temen mezin yê vî gundî bû. Ev gundê ku ez qala wî dikim di herêma Daqûq de yek ji gundên ku di nav xeteriyê de bû. Dema ku xeterî pêş dikeve hêjmareke zêde ji gundê xwe direvin. Tu kes naxwaze li wir bimînin. Mam Reşîd di TV'yê de dema ku dibine gêrîla derbazî bajarê Kerkûkê bûye çifteya xwe digire destê xwe û diçe pêşiya gundiyan ji wan re dibêje: **"Hûn ji xwe şerm nakin ew keçên temen biçûk ji çiyayan, ji Bakurê Kurdistanê ketine rê, hatine ji bo parastina we, hûn jî bêy ku bi vê bifikirin dev ji cih û warên xwe berdidin. Ma ev e zilamtiya we, ma ev e camerêtiya we? Heta yek nefer ji wan hebe ez ê jî li vir bi wan re bimînim"** Bêgûman biştî vê axaftinê hinek ji wan vedigerin û gundê xwe bernadin. Dema ku em diçûn wê derê bi gotina wî **"Tapira"** wî di destê wî de bû û li derdorê mîna nobetdarekî digeriya. Me cara yekê civîna xwe ya qadê li mala wî lidarxist. Mam Reşît ji ber ku kevne pêşmergeyê Hizba şûhî bû ji karên bi vî rengî dûr nebû. Weke ku hûn jî dizanin şûhîtî bi axaftina zêde karê kêm tên naskirin. Ji sibehê heta evarê dema ku dît civîna me didome û derfetên wî yên bi me re axaftinê nema; di ber şibakê re diçû û dihat. Herî dawî tahamûl nekir û got; **"Law min di got qey ez pir diaxivin, xwuyaye ku hûn ji min bêtir diaxivin."** Me jî di nav xwe de kiribû henekek û digot. Yên ji mam Reşît zêdetir diaxivin tenê PKK'lî ne, ji bo wê nikare tahamûl bike. Lê birastî jî gelek ji hevalan hez dikir. Dîwanxaneyeke wî hebû. Ji hemû malbatê re digot; **"Ev cihê hevala ye, nabê ji bilî hevalan kes derbazî vî cihî bibe"** Bi

rastî jî nedihişt kes derbazî wî cihî bibe. Piştî demekê em li wîr man dem dem me ser lê dida. Şevekê derengê şevê TLF hat û gotin mam Reşît emrê xwedê kiriye. Bi hatina xeberê re heval derbazî wir bûn û heta ser qebran li gel cenazeyê wî çûn. Serê sibê em bi sê erebeyan çûn cihê taziyê. Bi awayekî xwezayî me hevalên jin berê xwe da cihê çadira taziyê ya jinan. Hevalên xort jî çûn cihê zilaman. Çawa keçên wî em dîtin ji dûr ve kirin gazî û hawar û gotin: **“Mêvanên ezîz yên bavê min hatine, de ka rabin dîwanxaneyê jê wan re amade bikin. Ji derveyî wan bavê min nedihişt kes biçe wê diwanxaneyê. Ma êdî kî wê we li dîwanxaneyê pêşwazî bike”** bi van gotinan hatin em li derveyî çadirê pêşwazî kirin. Hemû kesên di çadirê de bûn cih ji me re vekirin, heta ku em çûn gel dayê. Yanî kebanî û şîrîka jiyana Mam Reşît. Dayê jî em himêz kirin û têra xwe girî. Piştî çend xulek di ser de derbaz bû, rehmetî hat jibîrkirin, tevahî jinên di çadirê de ketin pêşbirka bi me re resim girtinê. Êdî me nema zanî bê ka em çibikin. Ji aliyekî ve em ji van mijaran dûrbûn, ji aliyê din ve me wisa dizanî ku dema tu çû serxweşiyê divê tu tenê bi rehmetî bifikirî, êşa wan parve bikî, xemgîn bî. Ya rast bi mirina mam Reşît em gelek xemgîn bibûn. Lê me dît ku derdor biqasî me ne xemgîne. Em demekê rûniştin, me resim girt, em çûn dîwanxaneya ku ji me re hatibû veqetandin, lê me xwest ku em êdî rabin. Lê hemû keçên wî bi hev re hatin pêşiya me û gotin hûn nikarin biçin. Divê hûn wesiyata bavê me, yanî daxwaziya wî ya dawî pêk bînin. Me hemûyan li hev nerî. Ji ber ku me nedizanî daxwaziya wî ya dawî çiye. Daxwaziya mam Reşît ya herî dawî dibêjin ya di ber sikratê de ew bû ku dema heval çûn taziya wî divê xwarina nîvro yanî ya ku ji bo wî hatiye çêkirin ji aliyê hevalan ve bê xwarin. Ji neçarî em li bendê man da ku em wesiyeta wî ya dawî pêk bînin. Me pêk anî.

EV MİJARÊN KU heta niha ez qala wan dikim li çadira jinan diqewimîn. Lê li aliyê din jî bûyêrên ji ya me jî balkêştir hatibûn jiyîn. Di nav hevalên xort de yek ji berpirsyarê hevalan Elewî bû. Eşkereye ku taziyên Elewî û Sûniyan ji hev cuda ne. Ya rast di taziya wan de Quran nayê xwendin, fatihe nîne. Di taziyê de milet dest bi fatihe xwendinê dikin, destê xwe radikin ew hevalê me jî radibe ser piyan û di nav çadirê de li derdora xwe dinêre. Mîna kesekî di şokê de li derdora xwe dizîvire. Milet jî bi wî re dikeve şokê. Hevalên din ji xwedê dixwazin ku ji demekê zûtir ji wir derkevin. Jê re îşaret dikin ji bo derketinê. Lê niyeta wî ya derketinê nîne. Ji koşeyeke çadirê diçe koşeya din. Mîna ku derketibe keşfa çadira taziyê li herçar aliyê wê derê digere. Kurê Mam Reşît yê ku demek bû li gel me dima, em ji nêzîk ve nasdikir û dizanî ew heval Elewiye; hema destê wî digire û dibe derveyî çadirê, serê xwe dide ser sînga wî û dest bi girî dike. Tabî kî ji bo rewşê weke serhediya negotî qurtar bike. Lê ya ecêb ew heval dîsa nizane çi bike. Çar neçar wî di bin cihê xwarinê û di bicîkirina wesiyeta bavê xwe de heval anî cihê çadira jinan ji bo xwarin xwarinê. Ew ji girî, em jî ji belayeke mezin xilas bûbûn bi xêra wesiyeta mam Reşîd. Ger ev wesiyet neba xwedê dizane ew hevalê me yê ji van rastiyan dûr dê hîn çi anîba serê me. Em bêjin xwedê li mam Reşîd ê Şûhî bê rehmê û derbaz bin.

★

## LI KERKÛKÊ DEMA KU KÊLIYÊN BÊ HÊVÎ, VEDIGUHERIN HÊVÎ YÊ

TİRS Lİ SER çavên jinan rûniştibû. Di tirsiyan. Lê tirsa vê carê ne ya bav, mêr, bira û kevneşopên civakê bû tirsa ku li ser çavên jinan rûniştî. Ditirsiyan, ji ber ku ji revandinê, li sûka firotinê, her roj bi destdirêjî yê re rûbirûmayînê ditirsiyan. Fêrî tevahî pêkanînên mêr, bav, bira û kevneşopên ku ji aliyê civakê ve li ser jinê dihatin ferzkirin bûbûn; fêrî tevahî quralên civaka paşverû bûbûn. Ez ê nebêjim fêr bûbûn, ez dê bêjim hatibûn fêrkirin. Fêrî lêdanê, jina duwem, bey ku ti daxwaziyên xwe bînin ziman, bê berdêl fêrî xizmetkariya zilam bûbûn. Bêy ku ti berdêlî bigirin hatibûn fêrkirin ku mîna koleyeke bê mûçe bixebitin, xizmet bikin. Ji ber ku fêrî hemû corên mirinê hatibûn kirin. Ne bêganeye ji jinên ku xwe li Geliyê Zîlan di zinaran de avêtin; ji komkujiyên civakî, qet ne bêganeyê Helepçe û kîmyabarana ne, bi çekên kîmyayî kuştinê ye. jixwe qet bêganeyê jiyana koçberiyê nîne. Ji ber ku di hemû qadên jiyanê de jin koçbere di van qadan de. Ne jina mala xwe, ne dayîka zarokên xwe, ne jî xwedî welatê xwe ye jin. Mirin, xala devjênegere ji bo jinê di van herêman de. Heta ku bi rastiya Şengalê re rûbirû ma. Şengal bû şêwazê mirineke nû ji bo jinan. Heta gelek caran ji mirinê jî xiraptir bû navê jiyanekê xeter gelek caran Şengal. Dema ku tê gotin Şengal, tirseke ji mirinê jî xirabtir rûdinê li ser rûyê jinan. Hinek caran di van awiran de tu tirsê dibînî, hinek caran jî ji mirinê re meydan xwendinê dibînî di van awiran de. Gelek caran jî tu dibî şahîdê kêliyên li bergerîna ku vediguhere qêrînê. Hinek caran jî tu feryada dilên ku di bin

dagirkeriya bêhîvîmayînê de parçe bûye dibihîze. Feryadên wan jî mina wan bêdeng e. Bêdenge mîna qîrên jinên vê herêmê.

Jİ VAN HERÊMAN re tê gotin xeta 36. Di navbera hikumeta navendî û herêmê de asê maye, bi dewlemendiyên ser erd û bin erdê xwe çavkaniya dewlemendiya ye; cihê ku her kes para xwe jê digire; lê qet xwedî lê dernakeve. Bi wateyeke din cihê ku ji sedên salane dewletên dagirker hebûna xwe tê de didomîne. Yan jî weke ku di destûra bingehîn a Iraqê de tê binavkirin; "**Herêmên Nakok**" e. Jê re çi tê gotin û çawa tê bilevkirin bila bê kirin, ji sedên salan e şerek di van herêman de tê meşandin û ya ku tevahî êşa van şeran dijî jin e. Şerê dawî yê herî xeter û qirêje ku tevahî şerên borî li şûn xwe ve hiştiye. Tenê nakuje, di komkujiyan de derbaz nake û çekên kîmyayî jî bikarnayîne. Tevahî jinan mahkûmê jiyana herî metirsîdar dikir. Ez ê nebêjim ji bo jinên Rojhilata Navîn mirin, lêdan, hewî û hwd weke rewşa asayî ya jiyanê lê hatiye; lê êz ê bêjim ne bêganeye ji wan rastiyan. Lê rastiya ku jinên van axan qet fêr nebûye, nasnake û dê qet nasneke heye. Ew jî mijara namûs û şerefê ye. Şeref û namûse nasnameya din ya jinan. Hîn ji temenê biçûk em tên fêrkirin ji diyardeya namûs û şerefe re. Ti carî namûs û şerefa herî mezin xwe parastin, li xwe xwedî derketin û xwedî derketina welat fêrî me nayê kirin. Ji bo vê ye ku weke jinên vî welatî em dikarin ji bin hemû baran derkevin, lê nikarin ji bin barê destdirêjî, bi rêbazên taritiya serdema navîn jî li şûn xwe ve dihêle li bazaran firotinê qet nikarin rakin. Piştî hêrîşên DA’ÎŞ’ê navê tirsa li ser rûyê jinên herêmê rûniştibû destdirêjî, li sûkan firotin e. Bi awirên ku li ber te digerin komikan ava dikirin jinên Kerkûkê. Bi Kurd, Tirkmen û Ereban ve her kes di nava panîkeke mezin de terkî çarenûsa xwe hatibûn kirin. Tevahî awirên terkî bêçarenûsê

hatibûn kirin, vegûherîbûn ser Qendîlê, nemaze hêzê ku dê ji çiyayan bihata. Bi awirên şikestî li benda rizgarvanên xwe bûn tevahî jin.

PİŞTÎ ÇEND ROJÊN di nav tirs, xof, tengezarî û bendewariyan de derbaz bûbû bi erebeyan hêviyên mezin jî bi xwe re anîbûn û ji çiyayan dadiketin xwarê gêrîlayên jin. Ji bêhêvî, tirs, panîk û bêçarenûsa ku dihat jiyîn re ji bo ku bibin çareserî hatibûn. Wê tenê jin ne ji hêrîşên hov û wahşî, di heman demê de dê ew ji kevneşopên ku bi hezaran salin li ser jinê ji aliyê civakê ve dihatin ferzkirin jî biparastana. Ji ber ku dizanîn komkujiya li Şengalê li ser jinê pêkhatiye encamê aqlê zilamê serdestbûye. Dizanîn qirên jinên ji insafa zilam re hatiye hiştine ya ku di zinarên çiyayê Şengalê de deng vedide. Li ser navê nebûna şahidê heman tabloyî baweriya xwe bi hêza jinê anî, himbêz kir hêzên YJA-Star; di himbêzkirin û xwedî derketinê de dereng nema, bêganeyî nejiyan. Xiyaneta Şengalê û berxwedana Kobanê fêrkiribû divê ku jin ji bilî xwe bawerî bi ti hêzên din neyîne. Fêr bûbû bi demê re baweriya xwe bi xwedayê zilam neyîne. Ji ber ku wê dizanî di derfeta herî biçûk de ew zilamê ku baweriya xwe pê aniyê dê dest bavêjê, wê bifroşe, bêy ku ji xwe şerm bike dê di şevekê de wê pêşkêşî bi dehan zilam bike. Dizanî dê ji dervî daxwaza wê, wê ji bo armancên xwe yên qirêj bikar bîne. Fêr bûbû yê ku jê re dibêje ez te diparêzim û yê destdavêjê, wê difiroşe di sûkan de jî zilam e.

GERÎLAYÊN JİN, hêzên YJA-Star hatibûn ji bêhevimayîna wan re bibin hêvî. Tirs cihê xwe ji hêvî, bêçarenûsî jî cihê xwe ji lêgerînên jiyanake nû re hiştibû. Di bin lehiya evîndariyê de, tenê bi himbezkirinê re sînordar nema hezkirina jinên Kerkûkê. Awirên

matmayî cihê xwe ji bendewariyê re, daxwaza weke wan bûyîna şervanên azadiyê re hiştibû. Ji ber vê bû ku piştî demeke kurt a hevnaskirin û hezkirinê daxwazên xwe yên dîtina perwerdeya leşkerî bilind kirin. Ji aliyekî de ketibûn pêşbirka xizmetkirina gêrîlayên hatine herêmê, ji aliyê din ve jî dixwestin weke wan bibin. Ji bo vê ketibûn nav lêgerîna dîtina perwerdeya xwe parastinê. Di ferqa wê de bûn ger xwe perwerde nekin dê tişta ku hatiye serê jinên Şengalê bê serê wan jî. Di ferqa wê de bû ku di nav xwezayê de tu zîndewerek bê parastin nîne. Dizanî her zindewerekî bê parastin mîna gula ku bi ber bayê payîzê bikeve dê ji rehên xwe qut bibe. Li ser navê bi berbayê neketinê, li xwe xwedî derketinê, dê xwe perwerde bikirana. Dê çek bigirta destê xwe û baweriya xwe bi xwe bianiya. Weke ku meydan bixwîne ji tevahî têgeh û ferasetên mîna **" Cihê jinê gel mêrê wê ye, jin nazik û narîn e, nikare şer bike, divê ku kes nede şerkirin, dayika zarokên xwe ye, xizmetkara mêrê xwe ye"** dest avêt çekê ji aliyên hêzên YJA- Star ve hat perwerdekirin.

TEVÎ, tevahî astengiyên civakî, dê tevlî perwerdeyên xwe parastinê bûba. Ji aliyekî vê dê li zarokên xwe mêze bikira, debara malê bikira, dê erka xizmetkariya xwe pêk bianiya, ji aliyê din ve jî dê tevlî dewreyên perwerdeya xwe parastinê bûbaya. Biqasî ku perwerde bidîta dê baweriya li beramberî xwe cihê xwe ji baweriyê re hiştiba. Bi lez dê ji jina kevneşop dûr keta û xwe nêzîkî azadiyê bikira. Jin di encama perwerdeyên ku didît de dê tenê ne li dijî hêzê çeteyên DA'ÎŞ'ê di heman demê de dê meydan ji kevneşopên civakê re jî bixwenda. Li Kerkûk û derdora Kerkûkê ji bo dûbarenebûna karesateke mîna Şengalê bi sedan jin di perwerdeyên xwe parastinê re derbaz bûn. Yek ji xalên devjêneger

ê jiyanê **" xwe parastin"** ji bo jinan êdî derbazdar bû. Bi sedên salane ji ber şerê ku li herêmê hatine meşandin bi her awayekî zilam çek girtiye destê xwe û heta radeyekê kariye xwe biparêze. Lê di gel zilamê bi çekê fêrî xweparastinê bûye rastiya jina ku xwe diparêze jî derxist holê ku bi hatina DA'ÎŞ'ê ya van herêman, biqasî ku careke din qet ji çekê netirse, qut nebe çek himbez kir. Dema ku tu di bin tirs û xofan de mahkûmê jiyanê bêkirin ji bilî himbezkirina çekan ti çareyeke din nehat hiştin ji jinê re. Ma ji xwe, xwe parastin ne = bûyîna dayikeke baş û hevjîneke baş e.

ŞERÊ KU di herêmê de tenê jin fêr nekiribû dê çawa ji aliyê fîzîkî ve xwe biparêze. Di heman demê de ji aliyê civakî, çandî û aborî ve jî divê çawa xwe biparêze fêr bûbû. Di encamê perwerdeyên ku didît de ji xwe bawer dikir û di encama vê baweriyê de di gelek qadên jiyanê de mohra xwe li guhertinên nû dida. Weke ku vî şerî gelek tişt ji jinan girt, ewqas tişt jî bi wan da qezenckirin. Divê ku mirov bi van aliyan ve jî vê rastiyê şîrove bike. Biqasî rastiya civaka ku parastina xwe ji dest da, mahkûmî mirinê ye, jina bê parastin jî dê nebe ayîdê xwe bi awayekî biêş be jî fêr kir. Ji bo vê ye ku her roja ku derbaz dibe jin di rêya xwebûnê de gavên nû davêje. Ji jina ku bê zilam nikarîbû gavê bavêje ber deriye hewşa xwe, veguherî jina ku di gundê xwe de nobetê digire, di dest de çek bi zilaman re dikeve pêşbirkê hat afirandin. Li şûna ku baweriya xwe bi hinekî din bîne, rastiya jina baweriyê tenê bi xwe bîne hat afirandin. Ji jina ku terkî mirinê hatibû kirin, tirs li ser awirên wê niştecîh bûbû, rastiya jina berxwedêr hat afirandin. Şitla zanistiya hêviya jiyana nû ye ya ku nû nû li ser van axan ajdide. Jinên ku mahkûmî bêhêvîtiyê hatibûn kirin deriyekî hêviyê yê nû vekiribûn di jiyana xwe de, bi saya perwerdeyên ku dîtibûn.

Jin êdî di ferqa wê de bû ku dê artêşên zilaman ên biqasî dêwan mezin wê neparêze. Di bin navê ewlekariya civakê de tevahî saziyên ewlekariyên ku hatine avakirin em devjê berdin parastina jinê; di zanebûna wê de ye ku ev saziyên herî esasîne ji bo pêkanîna şîdetê li ser jinê. Zanista ku jin teşwîqî perwerdê kir ketina ferqa rastiya mijara xwe parastinê ye, ku divê ji dervî xwe ji tu kesî din re nehêle.

YA KU nû nû di van qadan de derbazî meriyetê dibe û dibe felsefeya jiyana nû bîrdoziya rizgariya jinê ye. Ya ku bi berxwedana Bêrîtanan bûye artêş, bi şerê Arînan re bûye mîlîtan yanî Şoreşa azadiya jinê ya jiyana nû ajdide. Navê vê şoreşê Kobanê; Kerkûk û Şengale îro. Tolgirtine ji xwedayên zilam ên nêr. Tolhildane ji dagirkeriya hezaran sal a keda jinê. Xwebûyîne di pêşengatiya YJA-Star û YPJ'ê de şoreşa ku pêşdikeve. Gîştina xwediyê xwe yê rast e, Kerkûka ku mîna jinê bênasname hatiye hiştin. Ya herî girîng jî meydan xwendine ji tevahî Zeusên tecavuzkar e!

★

**DAYIKA XWEDAVEND A BAJARÊ KERKÛKÊ:**

DAYÊ ZEMAW; (yanî ava zemzemê) dayikeke 45 salî ye. Ew û zilamê xwe tenê dijîn. Demeke dirêje zewiciye, lê zarokê wan nînin. Di nav civakê de bê zarok mayîn xaleke biçûk û lewaziyê ye ji bo jin ango zilamê civakê. Derdor bi çavekî biçûk, noksan li wan kesan dinêre. Lê ev ji bo dayê qet ne bûye pirsgirêk. Wê li şûna çend zarokên ku ji wê çêbûne dilê xwe ji zarokên gel yanî gêrîla re vekiriye. Hemû jiyana wê bûye hevalên ku diçin mala wê. Xwe dayika hemû gêrîlayan dibîne û bi vê jî serfiraze. Di her derfetê de, di hemû kêliyên jiyana xwe de, di nav hemû kesên ku nasdike de bi serbilindî qala vê dike. Hîle, derew, xapandin çiye nizane. Rastî û rastgotinê qet jêdûr nakeve. Biqasî ku rastgo ye, ewqas jî wêreke li beramberî kevneşopên civakê. Maleke wê ya biçûk, dilekî wê yê mezin heye. Tevî ku du kesin, lê diberoşa mala wê de qet xwarina du kesî nakele. Her tim bi tedbîre. Tevahî tedbîrên wê jî ji bo hevala ye. Ji ber ku ji bilî hevalan pir kes li deriyê mala wê nadin. Tiştekî gelek ecêbe, lê tenê xwe li gel hevalan aram û asûde dizane. Dikare tevahî mala xwe, jiyana xwe radestî hevalan bike. Lê karê nav malê di jiyana xwe de heval jî di nav de radestî tu kesî nake. Qîma xwe bi karê tu kesî/ê nayîne.

DAYA Bİ temen tevî ku ne zêde mezin e jî, ji ber kîloyên xwe yên zêde gelek zahmetiyan dijî. Dema ku mirov lê dinêre wiha dizane ku nû nû ji nav dîmenên xwedavêndên serdema neolotîkê derketiye derve. Peykerên xwedavendên wê serdemê çawa ku bi amatorî hatine çêkirin, hema bêje xwedê jî dayê Zemaw bi heman amatoriyê çêkiriye. Sîngên wê li ser çogên wê ne. Lingên wê nema

dikare gewda wê rake. Divê ku cilên taybet ji xwe re bide dirûtin. Dema ku dixwaze rebe ser xwe divê despêkê herdu destê xwe bide erdê û wiha rabe. Berûvajî ne gengaze ku bikaribe rabe ser xwe. Lê dema rabû jî nizane di cihê xwe de rûne. Di nav wê mala biçûk, hewşa biçûk de hema bêje niv demjimêrî jî rûnanê. Rojane çi di wê malê de hebe ji serî heta binî hemû paqîj dike. Ji aliyê cesteyî ve li gorî pîvanên xweşikiya civakê tu nikarî bêje xweşike. Lê ya ku xweşikî û şêrîniyeke taybet pê dibexşe xweşikiya wê ya ruhî ye. Ruhekî wê yê xweşik û bedew heye. Berûvajî gelek jinan êş û zehmetiyên jiyanê ji hezkirin û hêviya wê tiştek nebiriye. Hema bêje mîna zarokeke pir bi hêvî jiyana xwe didomîne. Dema ku tu li nav çavên wê dinêrî ewqas bi hêvî dibiriqînin tu tevahî xem û êşên xwe di wê kêliyê de jibîr dikî. Kêliyên ku pê re tên derbazkirin tu qet pê nahesî bê ka çawa derbaz bûn. Di jiyana wê de disiplîneke ecêb heye. Nîzama mala wê tu kes nikare bigore. Hemû tiştên wê mîna artêşeke bi nîzam di rêze de ne. Tevî ku ji ber kîloyên xwe yên zêde zahmetiyan dijî jî, mala wê gelek paqije. Tu ji bo derman jî nikarî qasî serê derziyê tozê li wê malê bibînî. Gelek caran me di nav xwe de digot: Di vê malê xwe xwarina bikeve erdê jî tê xwarin. Bi rastî jî wiha ye. Berûvajî gelek malan, ji paqijiya zêde mirov nedixwest li vê malê xwarin bixe. Ewqas paqij û bi pergale ku tu wiha hîs dikî ji cihê xwe bilebitî tê wê pergalê xira bikî. Dema ku tu dixwazî alikariyê bidiyê û karêkî bikî, mîna fermandarekî şer koordine bike; li ser serê te disekine û ferman li ser fermanê dibarîne. Gelek caran digot: **“Min jiyana xwe bi Fuad re –di vê Navberê de Fûan hevjînê wê ye- xisar kiriye. Ger ez tevlî PKK’ê bibûma ez ê niha li şûna Karayilan fermandara leşkerî bûma”**

-Dayê te çav berdaye cihê hevalê Cemal

-Keçê ez Cemal nasnakim û nizanim kiye. Ez bêm nav PKK'ê divê hûn cihê Karayilan bidin min. Ger na ez nayêm. Ez ê wê demê di derbarê Fuad de jî biryar bigirim. Ji ber ku wî gelek zehmetî bi min dan jiyankirin. Ez ê jî tola xwe jêhilînim.

-Tu tenê ji bo tola xwe ji Fuad hilînî dixwazî bibî fermandereke leşkerî?

-Na keça min, ger ez bibim fermandereke leşkerî ez ê despêkê Fuad, pişre PDK'ê û van gendelên Başûr têk bibim. Beriya çeteyan divê ku mirov van mesûlên ji derveyî firotina Kurdan tiştekî din nakin ji Kurdistanê paqij bikin.

-Başe dayê tu çima dixwazî biçî çiyê û li wir bibî fermandar, were em ê te li vir bikin fermandara YJA-Star. Ger tu qebûl bikî em ê jî qebûl bikin.

-Na keçê hûn dixwazin min bi destê çeteyan bidin kuştin, beriya ku ez tola xwe bigirim. Xwedê ji min stendiye ez li vir bimînim. Çiya xweş e. Ewqas asêne firokeyên cengê ên Tirkan her roj lê didin û nikarin tiştekî bikin. Çiya saxlem e. Ne weke van dera ye.

-Dayê em weke hevalên jin te fermandarê xwe qebûl dikin, lê ji bo hevalên xort jî te qebûl bikin divê tu xwe bi wan bidî qebûlkirin.

-Ma ez cihê Karayilan bigrim ew jî naçarin min qebûl bikin. keça min weleh ez pir jê hezdikim ha şaş fêm nekin.

-Na dayê em şaş fêm nakin, dizanin daxwaziya te ya fermandariyê tenê ji bo kê ye.

Dema van gotinan dike, ji dûr ve li Fûad dinêre û çavan li te dişkîne. Ew jî li gorî xwe dixwaze bi hebûna hevalan gefan li Fûad bixwe. Lê dema ku danekî jî neyê malê xwarin nexwe, çavên wê li deriyê hewşê dimîne. Ger hinekî din dereng bikeve TLF na xwe radike û pirsa wî dike. Ji bo nehêle pê bihese jî dibêje: "Tu li kî derê mayî, ez ji birçîna mirim, ma tu nayê, ger tu neyê ez ê xwarina xwe bixwim." Lê min qet nedît rojekê bê Fûad xwarinê xwariye.

YANÎ FUAD her tim di rêza yekê de bû ji bo dayê. Ez bawerim em hemû sedema vê texmîn dikin bê ka çiye. Di despêka çûyîna xebatên saha navin de, ji bilî mizgeftan yek ji wan dayikên ku herî zêde bi me re bû alikar dayê Zemaw e. Bi rastî jî mina navê xwe ye. Bi wateya gotinê ZEMAW 'ê. Kî heval biçe mala wê despêkê bela xwe lêdide. Heta hinek hevalên bêdeng, di halê xwe de dibîne, li ser wan dikare dahûrinên kesayetiyê pêş bixe. Yek bi yek taybetmendiyên hevalan ji te re şîrove dike. Lê kemasiyê te çi dibe bile bibe ji wê malê dernakeve, li wir dimîne.

★

## PÊŞBIRKA DI NAVBERA KEÇA CIWAN Û ZILAMÊ FERMANDAR DE:

Bİ DEMÊ RE perwerdeya ku ji aliyê jinan ve hat dîtin weke ku di herêmê de deng vedida, di heman demê de jî pirsgirêkên cuda jî bi xwe re derdixist holê. Ji aliyekî ve PDK'ê bi hemû hêza xwe hewl dida van perwerdeyan asteng bike, ji aliyê din ve jî zilamê serwer nedixwest serweriya xwe ji derst bide, keç û jinên xwe bişîne van perwerdeyan. Hinekan ji wan jî pêşengatiya perwerdekirina jinan dikir. Lê xala herî başkêş ew bû ku zilamên bi salane di nav hêzên leşkerî de pêşmergetî, fermandariya pêşmergeyan dikir, di her derfetê de henekê xwe bi wan jinan dikir ku perwerdeyeke demkurt didîtin. Qet baweriya xwe bi wan keç û jinan nedianîn ku ew fêrî perwerdeyeke baş bûne. Li nêzîkî bajarokê Daqûqê gundek bi navê Rizgarî heye. Ev gund yê Kakayiya ye û gundê ku cara yekê me tê de perwerdeya jinan bi 31 kesî despêkir. Kakayî jî ji ber ku mîna Êzîdiyan pir didirsiyan derfet dan ku jin perwerde bibînin. Perwerdeya wan nêzîkî mehekê dewam kir. Piştî demek di ser perwerdê re derbaz bû yek ji fermandarê wê herêmê di heman demê de xelkê vî gundiye ji yek wan keçan re dibêje: **"Ka were ez û tu em pêşbirka nîşanê bikin. Bê ka kî ji me eskere. Ger ez li nîşanê bidim tê devji PKK bûyînê berdî bibî YNK'lî, lê tu di pêşbirkê de serkeve ez ê dev ji YNK'lî bûyînê berdim bibim PKK'lî.** Keçik jî jê re dibêje: **"Ez mîna te bê wîjdan nînim, PKK lî bûyîn ne mijareke di pêşbirkê de birinê ye. Bi baweriyê ve girêdayî ye. Lê**

**ger ez te bibin bixim tê qutiyek fîşekê BKC ji hevalan re bikirî û ez ê pêşkêşî wan bikim.”** Li hev dikin û diçin cihê ku me perwerdeya pratîkî lê dida wan. Jê re dibêje em bi kîja çêkê destpê bikin. Fermandar bibêje bi BKC'ye. Ew jî qebûl dike. Bi BKC destpê dikin, hema bêje tevahî çekan bikartînin. Di hemû çekan de jî keça xwendevana amadeyi yekê ku temenê wê 15 saliye di hemû çekan de fermandarê salan bibin dixe. Di vê navberê de herdu tenê naçin, hejmarek kesên gundî jî bi wan re diçin. Di gel gundiyan de pêşmergên ku di bin fermandariya wî de, himaye yanî guvenlîka wî jî li gel diçin. Hemû çekên li gel wan hene diceribînin. Di hemûyan de jî ya ku serdikeve keça ciwan e. Êdî wiha li fermandar tê nema zane çibike. Lê carekê li pêş çavê ewqas kes rezîl bûye nebese, di vê ser de jî soza xwe ya kirîna Qutiya fîşekan jî pêk bîne.

XEBERA ME ji wan xalan teva nebû bêgûman. Piştî ku keçik serdikeve tevî nêzîkatiyên fermandarê pêşmerga yên ku naxwaze soza xwe ya kirina fîşekan pêk bîne li ser ferz dike û dide kirin. Piştîvê yekser bi dilekî xweş TLF'nî hevalan kir û got: **“Heval werin di encamê pêşbirkê de min qutiyeke fîşekê BKC ji mirovekî xwe yê fermandarê salan ê pêşmergeyan biriye ez bidim we. Hûn jî biçim pê DA'ÎŞ'ê bikujin.”** Piştî vê bûyerê yên ku dixwestin henekê xwe bi wan jinan bikin jî nema wêrîn tiştekî bikin. Ji ber ku ev bûyer di hemû herêmê de hatibû bihîstin.  Ew zilam diçû kî derê pirsa pêşbirkê jê dihat kirin.

BELE; de ka em bi hev re ji Kerkûk; Daqûq derkevin û berê xwe bidin herêma Leylan û Qadirkerem. Em bi hev re li van deveran bigerin û bibînin bê ka jiyan li van waran çawa birêve diçe. Çi tê jiyîn?

★

**LEYLAN:**

JI ALIYÊ erdnîgarî ve dikeve navbera bajarê Kerkûkê û Daqûqê. Piştî hilweşandina rêjîma Baas Kurdên ku ji cih û warê xwe bûbûn û weke aware yanî koçber dihatin binavkirin vegeriyan bajarê Kerkûkê him ji aliyê nifûsê ve, him ji aliyê mezûnbûna bajêr bandoreke mezin li ser demografya vir kiriye. Ji bo mezinbûna bajêr hema bêje gîştiye Leylanê. Di navbera bajarê Kerkûk û leylanê de bi erebê tenê mesafeyeke 10 xulekî heye. Tevî ku cihekî biçûke hema bêje biqasî gundekî mezine jî di statuya bajarok de tê pênasekirin. Ev rewş bi rastiya vir a dîrokî ve girêdayiye. Di serdema hizba Baas de derdora vir mîna navendên leşkerî hatiye bikaranîn. Di serhildanê hizbên Kurdî de gundên derdora vî bajarokî weke cihên serhildanê hatine bikaranîn. Yek ji wan kesên ku herî zêde jî li van herêman têkoşîn meşandiye Mame Rîşe ye. Li pişta vî bajarokî çiyayê Zenûr heye. Derdora wî heta ku digihêje Qadirkerem hemû çiyayên biçûkin û ji bo şerê partîzanî gelek guncaw e. Şerên dijwar di navbera rejîmê û hizbên Kurdî de li van herêman quwimiye. Yek ji cihên ku Tevgera Enfal lê hatiye meşandin jî ev herême. Piştî Tevgera enfalê Kurdên ku li vê herêmê hebûne hemû derxistine, surgun kirine, yên ku zarokên wan di nav hêzên pêşmergeyan de bûne hemû neçarî revê kirine. Bi kurtî di encama polîtîkayên hikumetê de bi zanebûn hatine valakirin. Şûna Kurdan berûvajî cihên din Turkmen tê de hatine

bicihkirin. Hêzên leşkerî di sêgoşeya Qadirkerem, Leylan û Çemçemal de hatine bicihkirin da ku careke din Kurd piştî enfalê nikaribin serê xwe rakin. Ji Leylanê heta Qadirkerem hemû gund di çarçoveya Tevgera Enfal de hatine valakirin. Yek ji cihên ku herî zêde gel tê de hatine kûştin jî ev herêm in.

LEYLAN Jİ aliyê fermî ve girêdayî bajarê Kerkûkê ye. Him Leyalan him Qadirkerem jî di çarçoveya navçeyên nakok de ne. Leylan ji aliyê siyasî, çandî, civakî, aborî û leşkerî ve pişta xwe dispêre Kerkûkê. Turkmenên ku li virin jî him pêwendiyên wan ji aliyê sîyasî, civakî û aborî ve him bi Turkmenên Kerkûkê, him jî bi yê Daqûqê re heye. Piraniya wan di nav bereyê Turmenî de cih digirin. Hinek ji wan jî ji ber ku têkiliya wan bi Kurdan re zêde ye di nav rêxistina YNK'ê de cih digirin. Ji ber ku ji aliyê hêjmar ve kêm in naçarin xwe bispêrin hêzekî siyasî. Hinek ji wan li gorî xwe YNK'ê hêz dibînin ji bo wê jî berê xwe didin YNK'ê.

BAJAROK nîv bi nîve. Nêvî Kurd in, nêviyê din jî Turkmen in. Hêjmareke pir kêm Ereb tê de hene. Lê piştî şerê çeteyan hêjmara niştecihên Ereb mîna bajarê Kerkûkê zêde bûye. Hema li kêleka bajarok Qampeke penaberên Ereb hatiye avakirin. Lê tu pêwendiya qampê bi bajarok re nîne. Ya rast nahêlin bikevin nav gelê vir. Ev jî di bin navê ewlekariyê de tê kirin. Hemû kesên ku destê wan çek digire çekdar in. Tu yek kesî li vî bajarokî bêçek nabînî. Kesên bi çek na, lê yên bêçek ecêbe. Ji dervî hêza fermî yê peşmergeyan her çend kes hatine gel hev û ji xwe re grûbeke çekdar avakirin. Hinek ji van nêçîrvan in, hinek grûbê tetîkçî yên mesûlane, hinek ji wan jî grûbên serbixwe ne û dilê wan çi bixwaze dikin. Bê pergaliyeke mezin di vir de heye. Navenda qaçaxçîtî û çek

firotinê ye. Çekên ku li tu derê neyên dîtin misoger li vir bi dest dikevin. Di vê mijarê de hema bêje bi Çemçeman re rojane di nav pêwendiyan de ye. Çi ji aliyê qaçaxçitiya çekan, çi jî ji ya erebeyan. Tevahî erebeyên bê plaqe li van herdu cihan bi dest dikevin. Kesî ku mudaxeleyî vê bike jî nîne. Ji ber ku pişta wan saxleme. Her grûbek ayîdê mesûlê hizbekê ye. Fermandarê leşkerî digirin pişta xwe û karê xwe dimeşinin. Bêgûman bi mercên ku para wan jî cuda ji wan re bê dayîn, heta ku xwedî par bin dengê xwe nakin, lê dema ku ev grub berûvajî wan tevgeriyan hema hûn çi bixwazin tînin serê wan.

TURKEMENÊN li vir ne weke yên Xormato ne. Têkiliyên wan bi Kurdan re gelek zêde ye. Ji aliyê jin û jinxwaziyê ve jî gelek di nav hev de ne. Tevî ku çetegerî serwere li vir, lê gelê vir di nav aramiyekê de dijî. Baweriya wan bi hev heye. Dikarin jiyana xwe jî bispêrin hev. Kes çav ber malê kesî nade. Heta radeyekê jiyanake wan a kolektif jî heye. Hevkarî gelek li pêş e. Nêzîkatiya wan ji Tevgera azadiyê re li pêş e. Bi germî pêşwazî li te dikin.

Dİ GEL qaçaxçitiyê de yek ji xalên debara jiyanê jî zirîhet yanî çandini ye. Mirovên vir fêrî tembeliyê nebûne. Çi kar dikeve pêşiya wan dikarin bikin. Lê ji ber qaçaxçitî û bazirganiya nerewa di temenê biçûk de zarokên kur fêrî van karan dibin. Gelek caran dema ku mirov li wan ciwanên temen 15-16 salî dinêre wiha dizane kesekî temen mezin li pêşberî te ye. Li gorî temenê xwe najîn. Her yek ji wan dabançeyek di ber de ye û tim destê wan di ber pişta wan de ye. Dema rûdinin, diaxivin tu wiha dizenî ku kesekî temen 40 salî li pêşberî te ye.

JÎ BER çanda di nav civakê de heye rengê jinê di bajêr de nayê dîtin. Di kuçe û kolanan de jina ku nîne, di nav malê de serwer e. Piraniya malan ji aliyê jinan ve tê birêvebirin. Asta du jinî gelek li pêş e. Bêgûman di nav Kurdan de. Ev mijar di nav Turkmenan de gelek kêm e. Turmenên vir ji ber ku sûnnî ne, bi Kurdan re li hev dikin. Xala ku wan tîne gel hev mijara olî ye. Ger ew jî sûnnî nebûna ez bawerim wê pirsgirêkên weke yên Xormato di nav wan de jî derketa. Him ev, him jî ji ber hebûna pêwendiyên civakî yên ku di navbera wan de heye, bi demê re wiha lê kiriye ku bê nakok bi hev re bijîn. Di vê herêmê de di mijara Kurdîtiyê de hîn di bin bandora têkoşîn û têkoşeriya Mame Rîşe de dijîn. Kesên ku ev dem jiyan kirine dema ku gêrîla dibînin yekser diçin ser wan rojan û dest bi bîranînên xwe dikin. Di nav hemû bîranînên wan de Mame Rîşe di rêza yekem de ye. Hezkirin û evîndariyeke mezin heye li beramberî Mame Rîşe. Tevî vê rastiyê jî ez qet rastî navê Mame Rîşe nebûn di vê herêmê de ku yek malbatê jî li zarokê xwe kiribe. Ji min re gelek balkêş hat. Tevî ku di demeke kurt de gêrîla ketiye van herêman ji niha ve navê zarokên ku piştî çûyîna gêrîla ji dayîk bûne navê hevalan e. Çi navê şehîdan, çi navê hevalên ku nas kirine li zarokên xwe dikin. Lê çima navê Mame Rîşe yê ku ewqas pê ve girêdayîne li zarokên xwe nekirine mijara gûmanê ye.

**QADIRKEREM:**

BAJAROKEKÎ girêdayî qeza Çemçemal e. Ji aliyê civakî ve jî peywendiyên xwe bi Çemçemal re gelek zêde ye. Piştî hilweşina rejîma Saddam piraniya wan ji Çemçemal vegeriyane Qadirkerem. Ji aliyê coxrafîk ve cihekî gelek xweş e. Di navbera çiya û girên biçûk de hatiye avakirin. Xwezayeke xwezayî kesk heye. Berûvajî

Kerkûk û derdora Kerkûkê di demsala biharê de tu dibê qey te ji xwe re bi dest neqîşandiye. Dîmenê vî bajarokê mîna tabloyêkî ji firçeya wênekêşekî derketibe ewqas xweşike. Ji ber ku di pala çend giran de hatiye avakirin belav e. Tevî ku cihekî biçûke jî diyare xwedî dîrokeke dûr e. Lê li gorî vê kevniya xwe zêde pêşneketiye. Sedema vê jî komkujiyên ku li ser hatine pêkanî ne. Ji ber ku her tim bûye cihê şoreşgerên mîna Mame Rîşe û pêşmergeyên Komala her tim bi zext û fişarên rejîmê re rûbirû maye. Di orta bajarok de rûbarek derbaz dibe. Ev rûbar bajarok dike du parçe, yê ku herdu parçeyan bi hev ve girê dide pireke mezin a serdema Osmaniya ye. Her çiqas gelek caran hatibe ruxandin jî hatiye nûjenkirin. Ji aliyê siyasî ve YNK serwer e. Hebûna PKD'ê qet li vir nîne. Ne komîte, ne rêxistina navçeyê li vir heye. Di gel YNK'ê de Goran jî xwedî rêjeyeke endam e. Bi taybet piştî derketina Goran hêjmareke zêde dev ji YNK'ê berdane û derbazî refên Goran bûne. Kesayetiya vê qadê îsyankar e. Zû zû serî natewînin li beramberî tu kesî. Heta radeyekê ji kesayetiya hemû herêmên Başûrê Kurdistanê cuda ne. Bi karê partiyan ên sîyasî û rêxistinî ve mijûl dibin, lê hema bêje kesên ku pêşmerge, polis û hwd tê de nîne. Mamoste, doktor yanî pîşeyên din gelek li pêş in. Lê mijara leşerî nayê dîtin. Ji ber ku yek ji cihên ku pêla enfalê tê de hatiye pêkanîn û gelê wê ji neçarî koçber bûye, di van salên dawî de gel derbazî vê navçeyê bûye, ji aliyê nifûsê ve zêde qelebalix nîne. Him qelebalix nîne, him jî nifûsa ciwanan hema bêje tê de nîne. Ya kesên gelek bi temenin, yan jî kesên ku nû jiyana hevjînî pêkanîne. Ji bo wê jî rêjeya ciwanan tê de nîne.

JÎ ALÎYÊ civakî ve ji ber ku bi Çemçemal ve girêdayî ye; ji aliyê aborî ve jî bi vir ve girêdayî ye. Lê piraniya wan di şîrketên neftê de

karmendin. Yek ji xalên ku herî başe li vê herêmê hebûna şîrketên neftê, hebûna van şirkêtan wiha lêkiriye ku kesên bêkar yên vê herêmê hemû di van deran de kar bikin. Berevajî cihên din karmendên vê derê hemû ji kesên vir pêk tê. Dema ku destpêkê ev şîrket hatine vekirin ji cih û bajarên cuda hinek kes anîne, di van şîrkêtan de bicih kirine, lê ji ber ku gelê vê alanê qebûlnekiriye û li dijberî rayedaran çalakî pêk anîne, nehiştine berhemên van şîrketan biçin derve ji neçarî kesên vir tê de bicih kirin. Ger ev şîrket bi awayekî baş bên bikaranîn dikarin ji van şîrketan tevahî neft, benzin, xaza surûştî ya herêmê ji vir derxînîn. Lê ji ber ku weke tevahî dewlemendiyên din ên herêmê di destê çend kesan de ye li gorî berjewendiyên xwe bikartînin gel ji van berheman zêde sûd nagire. Ger bê rojek, an du rojan ev şîrket kar bisekinînin qeyrana xaza sûriştî, benzin û neftê li herêmê derdikeve. Ji ber ku karmendên van şîrkêtan di ferqa vê rastiyê de ne, çi dixwazin bi vê rêyê dikarin bi destê xwe bixin. Ger rojekê nehêlin tankêrê xaza sûriştî derbaz be û bisekinînin nirxê xazê sê qat zêde dibe.

QADİRKEREM ji aliyê erdnîgarî ve dikeve sêkoşeya Kerkûk, Xormato û Kifrî. Di gel ku ji aliyê bazirganî ve pêwendiyeke wan a zêde di gel Çemçemal de heye, ji aliyê qaçaxçitî û çetegeriyê de jî ewqas bi Xormato re di nav pêwendiyê de ne. Dahateke wan yê gelek baş heye. Yek ji xalên ku di vê herêmê de divê ku mirov qala wê bike jî camêrî û merdiya wan e. Bi rastî dema ku min ev taybetmendiyên wan dît, Kurdên serdema kevn ên ku di van mijaran de her tim qala wan dihat kirin û di roja îro de ji vê taybetmendiyê eser nemaye ket bîra min. Kesekî lêqewimî be, pêwîstiya wî hebe û bizanibin kêm derfete dikarin tiştê di mala wan de heye bêy ku pê bifikirin hemû bidin wan. Di nav navçeyê bi

xwe de çend kesên kêm derfet hene, ji bo ku nehêlin dest bi kêmbûnê bikin, di nav şîrkêtê de qûmbare danîne. Mehane dema ku maaşên xwe digirin her kes ji meaşê xwe mîktarek pere dixe nav wê qûmbarê û du kes vî perî kom dikin; li ser wan malbatên kêm derfet belav dikin. Bawerim 5-6 malbatên bi vî rengî di wê navçeyê de hene.

Dİ GUNDEKÎ navbera Qadirkerem û Leylanê de malbateke Êzîdî ya ku koçber bûbû hebû. Dema ku em pêhesîn me xwest em biçin serdana wê malê û wan nasbikin, rewşa wan fêm bikin. Dema ku em çûm malê, me dît ku sê malbat bi hev re di du odeyan de dimînin. Du zarokên wan nû jidayik bûne, lê tiştek nîne bidin wan zarokan. Dayika malê serê tiliya xwe di reçelê de dike û dixwe devê wan ji bo ku ji birçîna nemirin. Em hinekî li gel wan man, me rewşa wan pirs kir, yek ji keçên wan ê ciwan got: **"Ev sê roje di mala me de xwarin çênebûye. Ji ber ku tiştek nîne em bixwin."** Piştî vê gotinê çaya ku danîbûn pêşiya me di qiriqa me de ma. Em demek dirêj li wir neman û me berê xwe da Qadirkerem. Payîz bû ba û baranekî ne asayî hebû. Mirov nikarîbû derkeve derve. Tevî hemû israrê wan em ji malê derketin, lê hemû hest û aqlê me li gel wan mabû. Diviyabû me wê rojê tiştek ji wan re bikira. Di encam de me biryar da em di nav dostên xwe yên wê derê de hinek alîkarî ji wan re kom bikin. Lê me qet texmîn nedikir ku di heman rojê de, di nav wê baran, bahoz û hewaya nexweş de em bikaribin xwe bigihînin gel wan. Malbata ku li benda me bû, em çûn xwarin hazirkiribûn, sifreyek hatibû amadekirin hema bêje tiştek jê kêm nebû. Lê me hersê hevalan li çavên hev nerî û me nekarî em xwarin bixin. Ji ber ku mala Mam Xelef, zarokên wî, rewşa wan bi zindiyî li ber çavên me bû. Bêy ku em dem winda

bikin em yekser ketin nav mijarê û me ji wan re got ku malbateke wiha heye divê em hinek tişt ji wan re kom bikin.

PİŞTÎ KU me rewşa malbatê bi kurtî ji wan re got êdî me nema dît dayik, keç, bûk û kurê malê her yek ji aliyekî ve ketin nav malê. Her yek ji aliyekî ve tiştek kom dikin. Herî dawî odeya ku em lê bûn û weke odeya mêvanan hatibû amadekirin em ji wê odê derbazî odeyeke din kirin. Çi di wê odê de hebû hemû dan hev. Bi xaliya ku hîn nû raxistibûn ve xistin nav erebê. Ji aliyekî ve cil, xwarin, firaq, sobe, xaz û hwd komdikirin, ji aliyê din ve jî telefon di destê wan de ji hinek kesên din alîkarî dixwestin. Carekê me dît ku sê erebe tijî tişt li ber deriyê malê kom bûn. Em bêyî ku bisekinin bi grûbekê ve ber bi wê malbatê ve rêketin. Dema ku em giştîn nav bajêr li ber supermarketekê sekinîn tevahî pêwistiyên xwarinê jî bi kîsa kirîn û ew jî xistin nav erebê. Di wê rojê de di nav saetekê de hema bêje ji bo malbateke 24 nefer çi pêwîst bû hatibû amadekirin û şandin.

EV WEKE hemleya yekê bû ku ji bo pêşwazikirina îhtiyacên lezgîn. Li ser pêşniyara çend kesên li gel me biryardan ku di nav kesên ku nasdikin hemûyan de pêngaveke alikariyê despê bikin. Yên ku dikarin pere, yên dikarin li gorî pêdiviya malbatê erzak û hwd bide. Ji ber ku hemû mirovê hevin, ên ku ne mirovin jî hev nasdikin û pêwendiyeke wan a bihêz heye her kes ji aliyê xwe ve xwest bi şêwazekê tevlî vî karî bibe. Em li malbatekê bûn du birayên ku kêm endamin û mehane karmendên şîrketê alîkari di nav xwe de kom dikin û didin wan hatin gel me. Bi dîtina me gelek kêfxweş bûbûn. Mala ku em lê bûn ji bo wan herdu zarokan amadekariyê dergûşan dikirin. Wan ji pirsyar kir ku em ê çi bikin ji

wan dergûşan. Xwediyê malê bi kurtî ji wan re qala malbata Şengalê û rewşa wan kir. Demekê li gel me rûniştin, hezkirin û dilsoziya xwe li beramberî PKK’ê anîn ziman û ji bo rojeke din em dawetî mala xwe kirin û çûn. Dema ku ew derketin xwediyê malê ji me re qala çîroka wan a kêmendamiyê, hejarî û rewşa wan ji me re kir. Demek di ser re derbaz bû yek ji wan ê ku nikarîbû biaxive di destê wî de 35.000 dînar û hat gel me. Bi israr xwest ku em wî perî ji bo wê malbatê bigirin. Lê ji ber ku xwediyê malê qala rewşa wan ji me re kiribû me nexwest em ji wan bigirin. Bi îşaretên desta bi me da fêmkirin ku ger em wî pereyî ji bo wê malbatê negirin ew ê li pêş çavê me bişewitîne. Ji naçarî me girt. Ji bo wan herdu zarokên ku nû ji dayik bûbûn û şîr nebû bixwin da bişîr û ji wan re bir.

DÎ HÛNDURÊ hefteyekê de bi aliyakariya gelê vir me tevahî pêwîstiyên wan pêk anî, bi komîteya YNK’ê ya herêmê re ji wan re du xanî dabîn kir, tevahî belgeyên wan ên fermî cî bi cî kir û navê wan xist nav lîsteya awareyan.

BÎ QASÎ KU em ji vê nêzîkatiya wan bandor bûbûn, ewqas jî me hewl dida ku em sedema vê fêm bikin. Hêdî hêdî em ketin nav vê civakê, me naskir, kûrahiya dîroka vê herêmê fêm kir me dikarî wate bidin wê nêzîkatiyê jî. Yek bandora eşîrên kevn ên Kurdan hîn hebûna xwe didomîne. Du di serdema pêngava Enfal de ew jî koçber bûne, hemû barê şoreşê rakirine, li beramberî êrîşên dijwar rûbirû mane, weke ku wan digot. **“Muhtac”** bûne, hemû corê jiyanê jiyane rewşa koçberiyê bi giraniya xwe dizanîn xwedî li kesên weke xwe derdiketin. Wan jî dizanî koçberî çiye, desteserî, destdirêjî, komkujî û hwd. Dema ku me qala wê malbatê kiribû

rewşa wan a borî ketibû bîra wan û tiştên ku wan jiyan kiribû nedixwestin ew malbat jiyan bike. Ji bo çi di malê wan de hebû dixwiztin pişta erebeyan û berê xwe didan wê malbatê.

GELÊ VİR merd in, camêrin, xwedî li soza xwe derdikevin. Gotina xwe ji kesî/ê venaşêrin. Bi germî pêşwazî li rêxistinê dikin. Daxwaz û pêşniyara wan a yekem jî li ser navê PKK'ê vekirina meqer e li navçeyê. Lê Tevgera azadiyê ji nêzîk ve nasnakin. Gelek caran nêzîkatiyên wan ê mîna ku ji partiyên din re derdikeve holê nêz dibin. Lê tu nikarî wan tawanbar bikî. Ji ber ku weke Tevger heta niha me jî nekariye em xwe bi gelên li vê derê bidin naskirin. Di çarçoveya navçeyên bi nakok de di vê navçeyê de tenê Kurd dijîn. Ji bilî Kurdan tu qewm û netewên din di vê herêmê de nînin. Ji derveyî çend malbatên Ereb ên ku li wir şivaniyê ji Kurdan re dikin. Yek ji çanda ku nû nû di van herêman de jî pêşketiye xulamtiya Ereban e ji Kurda re. Çawa ku di demên borî de Kurdan xulamtî ji Ereban re kiriye, weke ku tola xwe ji Ereban bigirin Kurd ketine nav tevgerê da ku Ereban weke xulam ji xwe re bikarbînin. Ji bo felahî, şîvan û gavaniyê Ereba bikartînin.

DEMEK BERİYA niha di gundekî girêdayî Qadirkerem de dîsa ji bo karê şivaniyê du malbatên Ereb anîne gel xwe. Ev malbat du salan ji vê malbata Kurd re xizmetê dike. Rojekê Kurê mala Ereb li gel mamê xwe pez dibin çêrê. Li gorî îtîfaqa wan dema ku zilamên malbata Kurd derdikevin ew jî biryar didin hemû malbatê qetilbikin û tevahî malê wan desteser bikin. Piştî zilamê malbata Kurd ji malê dûrdikeve, tên dikevin malê sê jin, du zarok û Kurê malê yê mezin ku wê rojê tesadüf li malêye qetil dikin, pez, zêr û çi derfetên maddî yê malbatê heye li gel xwe dibin û direvin. Her

çiqas piştî vê bûyerê hesasiyetek çêbûbe jî li beramberî malbatên Ereb, lê dîsa jî devji xulamtiya wan bernadin.

MİROVÊN VÊ herêmê bi gund û bajarên xwe ve ne mîna yên din in. Ji qirêja pergalê pir zêde para xwe negirtine. Li gorî reseniya xwe jiyana xwe didomînin. Heta radeyekê bi çand û kevnoşopên xwe ve girêdayîne. Çanda ku devjê bernadin jî Kurditiya ku li Başûr êdî devjêhatiye berdan e. Lê ew hîn jî xwedî li vê çandê derdikevin, pê ve girêdayîne û bi vê jî serbilind in. Xala ku mirov kefxweş dike jî di vê herêmê de ev e. Pir zêde bi jiyana bajarvaniyê re haşîr-neşîr nebûne. Bi jiyanek û çandeke sade dijîn. Ji vê jî nebêzar in. Berevajî kefxweş in. Ji aliyê cil û bergan ve bigire, heta şêwazê axaftin û pêşwazîkirina wan ji mêvanan re bi wateya gotinê li gorî çanda Kurdîniye. Hest û sozên netewî pir zindî ne. Dibe ku kêmbûna partiyên siyasî û çanda enfalê rê li ber parastina vê çandê vekiriye. Sedema xwe çi dibe bila bibe rewşeke dilxweşker e. Ger mirov giraniyê bide vê qadê ez di wê baweriyê de me ku ji bajarên mîna Silêmanî û Hewlêrê baştir encam bigire.

ARAZİYÊ VÊ herêmê ji bo şerê gêrîla jî guncaw e. Dibe ku dar û daristanên wê ne be, lê hemû dol û dirên biçûk in. Hema bêje weke kolanên bajara ne. Pirsgirêka av û kaniyan qet lê nîne. Di gel kaniyan de çem û rûbarên xwe jî kêm nînin. Weke navendekê ye ji bo çûyîna gelek cihên Başûr. Hêzekî leşleri ku xwe di vir de bi cih bike dikare ji vir xwe bigihîne gelek cihên Başûr. Tevî van rastiyan jî qada ku herî kêm hêza leşkerî ji aliyê herêmê ve tê de hatiye bicihkirin ev herême. Kêmbûna hêza leşekerî jî bi valabûna arazi ve girêdayî ye. Araziyekî mezin- fireh e û bêxwedî ye. Lê gundnişînî tê de gelek kêm e. Ji ber ku mirov di arazi de kêmin parastina van

araziyan jî nayê kirin. Her hêzekî ku bixwaze nêviyê başûr bixe destê xwe ji vê sêgoşeyê êrîşekê pêk bîne dê di demeke kurt de serkeftî be. Eger rojek ji rojan di çavçoveya ku Rêbertî dibêje di Başûrê Kurdistanê de em mijara Saha Navîn bixin meriyetê divê em ji vê herêmê destpê bikin. Ger na li gorî nerîna min dê naveroka wê projeyê vala bimîne. Di gel ew cihên ku niha hêzên me yên leşkerî tê de ne divê ku mirov vir jî bixe nav çarçoveya parastina Kerkûk, Xormato, Kifrî, Qadirkerem, Leylan heta digihêje Qeredax. Em vê mijarê li gorî pêşketin û pêşveçûnên siyasî û leşkerî re bihêlin, ji vir jî berê xwe bidin her du navçeyên din. Yanî Xormato û Kifrî.

★

## XORMATO -DÛZ- KIFRÎ

BERÎ HER TİŞTÎ pêwîstî bi destgirtineke giştî heye. Herdu navçe bi gelek hêlê xwe ve nêzîkî hevdu ne. Ji aliyê erdnîgarî, dîrokî, civakî û hema bêje gelek mijarên din mîna hev in. Di gel vê de xalên gelek ji hev cuda jî hene. Lê xalên hevbeş ji cudahiyan zêdetir in. Herdu navçe jî di nava sînorên Germiyan de cihê xwe digirin. Lê mirov dikare wan ji derveyî erdnîgariya Germiyan jî bifikire. Taybetmendiyên cografî mîna hev in. Xormato û Kifrî di bin sîlsîleya kendalekî hatine damezrandin de ye. Ev sîlsîle çiya bi dirêjahî ji Xormato heta Kifrî diçe. Ev kendal di heman demê de weke ku di destpêka nivîsê de jî min dabû diyarkirin dikeve sînorê xeta 36'an. Bi wateyeke din sînorên xeta 36'an ev kendal in. Herdu bajarên ku qala wan tê kirin di binê vî kendalî de hatine avakirin. Sedema vê ya esasî xwe dispêre mijara parastin û ewlekariyê. Ji ber ku di dema damezrandina van bajarokan de xala herî esasî ji bo civakê pişta xwe dayîna çiya û bi vî rengî xwe parastine. Ji aliyê cografî ve ber bi Başûr ve dikeve niştecihên van herêman hemû Ereb in. Ber bi Bakur ve jî Kurd in. Caddeya giştî, ya ku di dîrokê de mîna "îpek yolu" rêya îpekê hatiye nasîn; rêya sereke ya bazirganiyê ye. Di serdema împaratoriya Osmaniyan de rêya ragihandinê, bi wateyeke din xeta telgirafê jî mîna sînor tê dîtin. Di roja me ya îro de jê re dibêjin rêya Kerkûk û Baxdadê. Di bilî kendalan re rê jî mîna sînor e. Niştecihên Bakurê vê rêyê tevahiya

xwe Kurd in. Li Başûrê rê Ereb, di orta herdu netewan de jî tirkmen hatine bicîhkirin. Ev coğrafya mîna pasteya ku tu bike du qet bi midogerî hatiye diyarkirin. Ya ber Tirkmenan jî ketiye navbera herdukan ya hatin û çûyîne. Herdu navçe jî, ji aliyê cografî ve digihêjin çiyayê Qeredax, ber bi Başûr ve jî digihêjin çiyayê Hemrîn. Çîyayê Hemrîn di heman demê de sînorê Kurdistana Başûr û ya Rojhilt e.  Ev herêma ku dikeve navbera herdu çiyayan nîştecihên wê tevlîhev in. Kêmenetewên Kurd, Tirkmen û Ereb tê de hene. Hema bêje tevahî bermahiyên şaristaniyên kevin di van herêman de tê dîtin. Ji ber ku Mezopotamya navîn cih û warê şaristaniyên kevne ji bo wê tu dikarî bermahî û çanda hemûyan tê de bibini. Di roja me ya îro de li şûna çanda hemû netew û şaristaniyan cihê sereke yê şer û pevçûnên netewî, olî û qewmî ye. biqasî ku ji pêşkeftinan re vekiriye, ewqas jî ji hemû cureyên şer û tevlîheviyê re jî vekiriye.

Dİ DEMA borî de bajarokê Xormato girêdayî Kifrî bû ye. Piştî damezrandina Iraq'ê Xormato jî dibe navçe, ango bajarok. Yek ji xalên din ên van herdu bajarokan jî ew e ku li kêleka çem hatine avakirin. Li ber çemê Kifrî di roja me ya îro de bendavek mezin hatiye avakirin. Hewl didin bikin cihekî seyahî. Lê li ser Ava Spî ku ya Xormato li ser hatiye avakirin heta niha ti bendav nehatine çêkirin. Sedema sereke ya vê jî Ava Spî aveke şore û xwê jî berhem tîne. Li Bakurê Xormato, yanî Rojavayê Kifrî herêmeke bi navê Xornawaze heye. Ev herêm ji bo şerê çekdarî ya rast şerê gêrîla gelekî guncaw e. Di demên borî de tevahî hêzên dijberî desthilatiyê ser hildane ev herêm ji xwe re kirine navend. Di dîroka nêz de jî, bi taybet di dîroka têkoşînên gelê Kurd de di ev herêmê de mîna mekanekî esasî yê hêzên çekdar hatiye bikaranîn. Di vê

herêmê de eşîreta herî bi navban a dawê ye. Herêmeke berfireh di bin kontrola vê eşîretê de bûye. Li gorî hinek agahiyên dîrokî tê gotin ku ev eşîret ji aliyê bawerî ve Kakayî bûne. 300 sal beriya niha di dema Osmaniyan de êrîşên gelek mezin li ser vê eşîretê pêşxistine û ew belavkirine. Hinek ji van ber bi Xaneqîn ve, hinek ber bi Kelar ve hinek jî ber bi Daqûq ve çûne. Di roja me ya îro de ji vê herêmê re tê gotin, herêma Dawê. Dawê di dema konfederasyonan de mîna konfederasyoneke vê herêmê rola xwe listiye.

Ev xalên ku me heta niha qala wan kir, xalên hewbeş ên herdu herêma ne. Lê di hinek xalan de jî tevî ku gelek nêzîkî hevin jî ji hev cuda dibin. Ger em bixwazin ji nêzîk ve van bajaroka binasin:

**XORMATO:**

**(Bi giştî weke Dûzxormato tê nasîn, lê Kurd tim peyva Xormato bikartînin. Ji bo wê ez ê jî di vê nivîsê de Xormato bikarbînim.)**

NİFÛSA Xormato niha dibêjin 180 hezar e. Kurd, Ereb û Tirkmen tê de jiyan dikin. Nufûsa herî zêde yê Kurda ye. Erep bi nifûs ji Kurd’an kêmtirin. Tirkmen jî ji Ereb’an kêmtirin. Rêya Bexda û Kerkûk di nav bajêr de derbaz dibe. Ev rê bajêr dike du beş, Başûrê rê bi piranî Erebin. Bakûr ê rê bi piranî Kurd in. Ji bo taxên Ereban bi giştî dibêjin Heyî Eskerî. Vê dema ku em tê de derbas dibin hemû teqîn, kuştin li vê taxê pêş dikeve. Kêm li cihê din jî hene, lê bi giştî li vê taxê pêş dikeve. Berê li Heyî Eskerî wek nifûs Kurd jî hebûne. Lê piştê êrîşên DAÎŞ û şerê ku destpêkiriye, Kurd malên xwe ji Hey Eskerî birine. Nifûsek kêm maye. Nifûs li

gundan zêde nîne. Ji ber ku her kes berê xwe daye bajaran di dema berê de kesên ku li gundan jiyan dikirin malên xwe anîne bajêr. Hijmara gundan kêm bûye, lê yên bajaran zêde bûye. Bi destpêka şerê DAÎŞ re gelek malên Kurdan koçî bajar yan jî ciyê din kirin û hîn jî berdewam e. Ereb û Tirkmenên ku di nav şer de bûn penaber hatin li Xormato niştecih bûn. Tirkmen bi giştî di nav Xormato de niştecih bûn, lê Ereb çûn li gundên kurdan jî niştecih bûn. Ev rewş di pêşerojê de wê encamên çawa derbixîne nediyare. Ev koçberiya mecbûrî dibe ku di demên pêş de rê li ber hinek pirsgirên cuda veke. Ji niha ve di gelek aliyan de diyar dibe ku di vê herêmê de şerên di navbera kemnetew û olan de dê roj bi roj dijwar bibe.

DÎ DÎROKÊ de ji aliyê nufûsê ve xwedî hejmareke kêm bûye. Lê ji aliyê dîrokî ve xwedî dîrokeke kevnar e. Heta serdema Hûriyan jî diçe. Ji aliyê pênaseya nav ve jî tê wateye "yê Hûriyan" li gorî hinek çavkaniyên dîrokî jî tê gotin ku ji aliyê Mîtaniyan ve hatiye damezrandin. Lê kela ku li dora Xormato ye ji aliyê Hûriyan ve hatiye çêkirin. Hemû tiştên kevnar aîdî serdema Hûriya ne. Ev jî dide diyarkirin ku ev cih ji aliyên Hûriyan ve hatiye damezrandin. Cihekî kevnar û biqîmet e. Hema bêje di êrîşên wê serdemê de çend caran hatiye rûxandin û dîsa ava kirine. Cihê herî kevnar ya vî bajarokî qaleya li jorê bajarê niha ya ku di bin axê de mayî ye. Lê tê payîn ku di serdema civaka xwezayî de jî mîna navendekê hebûna xwe domandiye.

DÎ DEMÊN Pers, Îskender, Sasanî, Bîzans, Emevî, Abasî, Osmanî, Safavî de jî her heremek girîng bûye. Di dema Babîliyan de Xurmatû tê xerakirin. Piştê zayînê di sala 1394 an de di navbera

gelên vî heremê û Tîmûrleng de şerên dijwar diqewimin. Di encama van şeran de kurê mezin yê Tîmûrleng ji hêla kesên ku navê wî Omer Şêr e ku xelkê Xurmatû ve tê kuştin. Ev bajar navenda bazirganiya cihûyan bûye. Di dema Osmaniyan de ev der li ser rêya telgirafê ya Îstanbûl û Baxda de bûye. Împaratoriya Osmaniyan ji bo parastina xeta telgirafê Tirkmenan anîne û li vê heremê bicîh kirine. Tirkmenan wekî hêzek parastinê hanîne vê heremê. Piştre ji feqîriyê Kurdên ku li heremê jiyan dikin hinek ji wan xwe wek Tirkmen didin nîşandan. Ji bo karibin jiyana xwe berdewam bikin ji hêla aborî ve dev ji Kurdayetî berdidin û dibin Tirkmen. Niha jî ev beş ji hêla Kurdan ve nayên heskirin. Kurdên heremê ji van re dibêjin “zola kurd”. (yanê Kurdên pîç)  Şêniyên vî bajarî bi piranî Kizilbaş û Kakaî bûne. Ji ber ku dewleta Osmaniyan êrîşên mezin anîne ser wan ev demokrafya tevlîhev bûye. Berê bi ser Kifrî bûye. Lê di sala 1940’î de bi Daqoq ve hatiye girêdan. Di 1974 an de bi Tîkrît ve hatiye girêdan. Heta niha jî di fermiyetê de li ser Tikrît tê hesibandin. Ji salên 70 yan heta 1991 di bin dagirkeriya Baasiyan de bûye. Ji 2003 heta niha di çarçoveya maddeya 140 de navçeyên ku bipirisgirêk tên dîtin.

NİHA ÇAR nahiyên Xormato hene. Newcûl, Sulemanbeg, Îngîce û Amirlî. Amirlî, Suleymanbeg û Îngîce bi piranî Ereb û Tirkmen bûne. Nahiyeya Qadirkerem berê li ser Xormatobû lê di salên 80 an de Baasiyan ji ser Xormato girtin û bi Çemçemal ve girêdan. Ji ber ku hêza Kurdan li Xormato kêm be vê siyasetê meşandin. Newcûl û Qadirkerem jî bi piranî Kurd bûne. Ji bo vê hevsengiyê ji holê rakin Qadirkerem bi Çemçemal ve girêdane. Navê Newcûl yê din Zinane ye. Niha her kes dibê Zinane. Lê Newcûl jî tê gotin. Ev

core guhertinên navan piştî hilweşandina rêjîma Seddam hatine lêkirin. Li gorî xwe navên Erebî veguherandine Kurdî.

SÊ EŞÎRÊN girîng li aliyê Xormato hene. Yê herî mezin Dawê ye. Di nav eşîra Dawê de gelek eşîrên biçûk jî hene. Weke Îsayî, Mûsayî, Newcûlî, Barnewerî, Ababe, Qewalî, Omersofî, Germik, Talaw, Waranî û Omerbil. Hemû van eşîran di bin banê Dawê de ne. Him eşîrin him jî navê gundan e. Du eşîrên mezin Zengene û Lek in. Yanî bi giştî li heremê eşîreta Dawê, Zengene û Lek bi bandor bûne.

CİVAKA Xormato civakek şerker e. Di dîrokê de jî her wiha bûye. Beşdarî raperîne Şêx Mehmûd Berzencî bûne. Di wê demê de şehîdên wî raperînê hene. Di sala 1959 an de di dema Ebdûlkerîm qasim de li dijî axaya serî hildane. Di civaka Xormato de Axe hene û kesimek girêdayî axayan ji wan re dibên gene. Ev Beş di dîrokê de heta niha her caşîtiyê kirine. Di dema Saddam de caş bûne niha jî bûne KDP yî. Gelek gund li Xormato hatine ruxandin û hatine enfal kirin. Dîrokên 1974, 1991, 2003 ji bo civakê gelek tişt îfade dike. Di dema raperîna 1991 de ev bajar 11 roj bênavber li ber xwe dide. Niha xelkê Xormato bi serbilindî behsa vî berxwedanê dikin. Dema ku DAÎŞ êrîş kiriye û hinek navçeyên Xormato bi destxistiye û xwestiye navenda Xormato jî bi dest bixîne. Lê gelê Xormato li dijî êrîşên DAÎŞ şer kiriye. Kesimek reviyaye, lê kesimek jî şer kiriye. Di van şeran de biqasî ku serkeftî bûne û qet nehiştine dijmin bikeve axa wan, di hemû şeran de jî ewqas talankerin. Hema bêje felsefeya îslamê ya ganîmetê ji xwe re esas digirin. Biqasî cesaret û çavsoriya xwe, ewqas jî desteser dikin. Her tiştê ku di şer de girtin xwe li ser bidin kuştin jî nadin tu

hêz ango kesên din. Di encamê polîtîkayên hezaran sal ên desthilatdaran de li ser vê herêmê kesayetiyeke şerker biqasî şerkeriyê jî diz derketiye holê. Di vî şerê dawî de hema bêje hejmareke zêde xwebexş tevlî tevahî şeran bûn. Lê armanca wan a ji tevlîbûna şer re ne bi armanca parastina ax, nîştîmanî berevajî ji bo diziyê ye. Di hinek şeran de ew tiştên ku desteser kiribûn dema ku pêşmergeya dixwest ji wan bigirin çek li pêşmergeyan dikişandin heta hinek ji wan fîşek jî diteqandin. Piraniya wan ji ber ku dizanîn di nav hêzên gêrîla de derfet ji tiştên bi vî rengî re nayê dayîn eşkere ji me re digotin "heval, em pir ji we hezdikin, lê em dizanin hûn nahêlin em tiştekî ji xwe re bînin; ji bo wê em bi we re tevlî şer nabin."

DÎSA Dİ warê bîrdozî, bîr û bawerî de hêzên îslamî yên tûndrew li vî bajarî xebatek taybet didin meşandin. Gelê Xormato bi giranî misilman e. Girêdayî dîn e. Hêzên Selefî bi vê rêyê dikevin nav civakê û dixwazin vî bajarî bikin navenda îslamên tûndrew. Rêxisitina xwe di nav mizgeftan de dikin. Hijmara mizgeftan di salên dawî de pir zêde bûne. Cemeat û komik mizgeftan jî di nava xwe de dabeş dikin.

Lİ ALİYÊ din civakek pir zêde girtiye. Jin di nav jiyanê de tine ye. Di malê de hatiye hepiskirin. Dema ku tu li kolanên vî bajarî digerî negengaze ku tu rastî jinekê bê. Jinên ku di nav bazarê de tên dîtin jî ji serî heta binî bi çarşefeke reş dorpêçkirîne. Tenê herdu çavên wan tên dîtin. Di nav mal de jî bi ti awayî jin li gel civatê rûnanê. Tevî vê rastiyê jî ji aliyê exlaqî ve rizandineke pir zêde di nav civakê de heye. Yek ji pêwendiyên ku di vê herêmê de heye ew jî nêrbazî ye. (Oglancilik) ev çand ji aliyê Rêbertiyê ve di

parêznameyan de her çiqas weke çanda Yûnaniyan bêqalkirin jî, di vê herêmê de jî ev çand hîna jî didome. Di be ku çavkaniya xwe ji serdemên kevn jî bigire. Ji ber ku cihekî gelek kevnar e.

Dİ WARÊ sîyasî de valahiyek pir mezin tê jiyankirin. Li pêş YNK desthilat xuya dike. Lê niha xelk ji YNK' ê zêde aciz bûne. Goran wek alternatîf derket, lê ew jî bersiv neda pêwistiyên civakê. Hêzên îslamî ji vî valahiyê dixwazin sûd werbigrin. Ji ber ku xebatên me li vir di demên berê de lewaz bûne alîgirê me jî pêş neketine. Niha destê gelek dewletan di vî heremê de heye. Di serî de jî Îran. Dewleta ku herî bi bandore ji hikumeta navendî ya Irakê zêdetir dewleta Îranê ye. Quwetê Bedir, Ceş Mehdî, Heşdî Şabî pir zêde bihêz in. Ev hêzên mîlîs in û hema bêje hemû hêz li Îranê ne. Weke navenda Hişdî Şabî ye. Li aliyê Xirwelî û li navenda Xormato ciyê mezin yê Heşdê Şabî hene. Bi giştî dema ku em digrin dest valatiyek pir mezin tê jiyankirin. Ji ber ku valatî heye li vî bajarî çetegerî pêşketî ye. Gelek kes wek kom û wek çete kom bûne dixwazin hêza xwe bidin xwuyakirin. Van çeteyan îşê xirap dikin, navê Kurda xiradikin, gasp, talan, dizî, kuştin bi destê vana tê pêşxistin. YNK jî ji vana re bêdeng dimîne. Bi rastî kesên ku di nav YNK ê de wek desthilat tevdigerin ji bo berjewendiyên xwe van çeteyan avakirine. Bajar giştî di nav bêxizmet, bêser û ber, bê ewlehîbûyînê de jiyan dike. Destê kê di bêrîka kê de ye diyar nîne. Her roj kes tên kuştin û faaîlên wan nayên tespîtkirin. Li ciyekî gelek kes weke faaîl nediyar werin kuştin û faaîlên wan diyar nebin ev tê wê wateyê ku ev kes ji hêla hêzên desthilatdar ve tên kuştin. Rewşa civakê her roj ber bi xerabiyê ve diçe. Xelk dixwaze ji vî bajarê bireve. Hêza xwedî li bajarê xwe derketinê roj bi roj dişkê.

Kesên ku xwe wek rewşenbîr dibînin bê îrade hatine hîştin. Nikarin peywirên xwe yên rewşenbîrî bicîh bînin.

Dİ HÊLA aborî de rewşa Xormato pir xerap nîne. Ji ber ku li ser rêya bazirganiyê ye. Mehmelên bilok, lokanta û alanên kar tê de hene. Ev nêzîkê sê mehe bi boneya girtina Tikrît rêya Baxda û Kerkûk hatiye girtin ev jî rewşekî pir xirap li ser aboriya bajêr kiriye. Saylo (ambara genim) tê de heye ji bo aboriyê derfetek daye avakirin. Qanala avê ji bo aboriyê tesîrek erênî kiriye. Bi giştî civak li ser meaş jiyana xwe berdewam dike. Xwê, kirêç, kûm jê derdikeve. Di hêla petrolê de jî dewlemend e.

Lİ BAJAROKÊ Xormato tiştek bi navê jinê tine ye. Ji ber ku di nav cikakê de di rewşa herî talî de ye. Ji talîbûnê wêdetir jî; siya zilam, nemaze ya civakê ye. Tevî ku ji aliyê çanda civakî ve yê bê axkawî û ketîbûnê jiyan dike zilam e, ya ku tê dorpêçkirin, di nav çarçefa reş de têveşartin jine. Lê dema ku mirov rastiyên vê herêmê nas dike, bi taybet ji aliyê sosylojîk ve rastiya zilam di vê mijarê de bi awayekî eşkere tê fêmkirin. Zilamê ketî, bextreş, yanê bêexlaq, ê ku nikare hakîmê xerîzeyên xwe ji bo ku rastiya xwe li beramberî jinê lewaz veşêre; rêbaza ku serî lê dide pêçanên jinê ye. Dema ku tu li bajar, li kolan û bazarê digerî; ango derbaz dibî tu dibê qey ev bajar tenê yê zilama ye. Ti eser ji jinê di vê derê de nîne. Lê dema ku tu derbazî malê jî dibî tenê tu dikarî di çarçoveya xizmetkariya zilam de jinê di mutfaxê de, di hemamê cil şoştinê û firaq şiştunê de bibînî. Gelek caran pê difikirim gelo ev jin çawa dikarin li beramberî rewşeke ewqas xirap tahamûl bikin? Lê pir baş dizanim ku ji bilî vê rastiyê ti derfetekî wan ê jiyanê nîne.

ROJEKÊ EM li malekê bûn. Li ser israra kurê malê em wê şevê çûn wê malbatê. Di malbatê de 9 jin hebûn. Hemû xweşkê hevbûn. Hinek ji wan zewicîbûn, hinek jî hîn li malê bûn. Me xwarina êvarê xwar, demek di ser re derbaz bû, telefonek ji hevalekê re hat. Bi hatina telefonê min zanî rewşeke nebaş heye. Lê min texmîn nekir çiye. Di bin navê cigare vexwarinê de min ew heval bir derve û jê pirsî, ji bo ku ez fêm bikim bê ka çi rûdaye. Di encam de min fêmkir ku kurê malê yê ku wê şevê bi israr xwestiye em biçin mala wan qezaya trafîkê derbaz kiriye û rewşa wî girane; ber bi Kekûkê ve dibin nexweşxanê. Li me nexwest malbat ji me bûyerê bibihîze. Me ne dikarî em ji dayikê re vê xebera nexweş bêjin, ne jî dikarî ji malê biçin. Her telefona ku dihat em beriya wan diketin nav gengeşiyê. Dibêjin xebera nexweş zû belav dibe; bi rastî jî wiha ye. Di demeke kurt de xeber ji malê re hat. Mal ji wê rewşa ku çend kêlî berê ku bi me re ketibûn nav henek û sohbetan bi carekê cihê xwe ji şînê re hişt. Bi hemû hêza xwe me sê hevalan hewl da ku em malbatê aram bikin. Lê negengaz bû. Di vê navberê de hemû xizmên malbatê kom bûbûn. Heta vê kêliyê jî hemû tişt asayî bû. Weke her malbateke kesê herî xweşewîst di malê de xeretî derbaz kiribe girî, qêjîn û li xwe dan di nav hev de dimeşiya. Hinek ji ser heşê xwe diçûn, hineka li xwe dida; hinekan rûyê xwe diqelişand û hwd. Di vê navberê de erebeyeke din hat ber deriyê hewşê. Çend kesên rihê wan dirêj, fîstanên spî li ber wan, tezbîhên dirêj di destê wan de; di gel du jinên ku ji bilî çavê wan ti derê wan yên din nediyar hatin hewşê. Ya ku bala min kişand di nav wan de keça temen biçûk û ji serê xwe heta lingê xwe çarşefeke reş li xwe pêçabû. Bi awayekî lez ji hewşê derbazî odê bû, çawa ku derbaz bû çarşefa ser xwe rakir, tevî ku di malê de rewşa şînê hebû dest bi henekan kir û hemû kesên derdora

xwe da kenandin. Hema bêje bela xwe da hemû endamên di malê de. Bêy ku bifikire bêje ev zilam ango jine. Tevahî tevgerên wê ne li gorî çarşefa ku li xwe kiribû. Demek di ser de derbaz bû min xwe negirt û jê pirsî. **“ Tu him çarşefê li xwe dikî, ji bilî çavê xwe ti derê xwe li derve nahêle, lê henekê xwe jî bi jin û zilamên ku nimêj dikin dikî. Ev çawa çêdibe.”** Bersiva ku da min gelek balkêş bû. Got ku; “**Ez mîna keçeke zanko temamkiriye xwedî du birayên selefi me. Min 16 sala vala nexwend, xwend da ku li cihekî kar bikim û xwedî serbixweyiya aborî bim. Ger min ev çarçef li xwe nekira min nedikarî biçim li nexweşxanê hemşîretiyê bikim. Yan jî min nedikarî bi asanî di kolanan re derbaz bim. Di dema derbazbûnê de wê tevahî zilaman awirên xwe berdana ser min, ji bo vê jî dê nehiştana ez biçim karê xwe bikim. Ez ê niha wiha bijîm heta ku ez bizewicim, dema ku ez zewicîm ez ê devji van hemûyan berdim.”** Min wê demê fêm kir ku jin tevî ku qebûl nakin di bin navê xwebûn û xwe parastinê de naçarin li gorî hinek kevneşopên civakê tevbigerin. Dibe ku rêbazê vê keçê ji me re gelek basit bê, lê li gorî min rêbazekî baş e. Herî kêm ji bo giştina armanca xwe rêbazekî wiha bikartînin.

BEGÛMAN ev yek ji wan jina ye. Bi hezaran jinên mîna wê di nav civakê de hene. Gelek ji wan jî bi armanca ji malbatê rizgarbûnê, ji bin zextên bav, bira û hwd derketinê di temenekî gelek biçûk de dizewicin. Rizgarî û xelasiya xwe di zewacê de dibînin. Mixabin nizanin piştî ku zewicîn jiyanake ji wê xiraptir li benda wane. Gelek keçên xwendevan piştî zewacê nikarin karê xwe dewam bikin. Hinek ji wan beriya bizewicin soza piştî zewacê karkirinê ji mala xwezûrê xwe digirin. Ger derfet nedin bi wî kesî re nazewicin, lê hejmara van keçên bi vî rengî gelek kêm in. Ji bo vê

ye ku hêjmarake zêde zarokên keç girîngî nadin xwendinê. De ka em vî cihî jî li şûn xwe ve bihêlin û berê xwe bidin herdu bajarên dawî û binêrin li wan deran ka çi heye.

**KIFRÎ:**

Dİ HÊLA erdnîgarî de weke Xormato ye. Nifûsa Kifrî navend 30 hezar, gund 10 hezar in. Bi giştî dike 40 hezar. Ji ber ku ev navçe li ser rêya bazirganiyê nebûye. Weke Xormato bi hêjmar zêde nebûye. Xormato girêdayî Kifrî bûye lê piştre Xormato bi hejmare pir zêde pêş ketiye lê Kifrî wek xwe maye.

DÎROKA WÎ diçe heta 4-5 hezar sal berê. Qeleya Kifriyê kevn li ser girekî 20 donime. 15 metre bilind e. Di serdema Asûran de parêzgeh bûye. Asawarên Zerduştiyan tê de hene. Niha jî gelek şikeft li heremê hene. Gelek şikeft di bin erdê de ne. Ciyek zêde dîrokiye. Hin bermahî ji dema civaka xwezayî mane. Di dema Sasanî û Bîzansan de, di dema Sasanî û Îslamiyetê de qadek şer bûye. Di dema Osmaniyan de sancaxa bi navê Zengabat bûye. Mîmarî û goristanên Osmaniyan hîn jî li navçê hene. Berê dora navçeyê bi sûran girtîbûye. Di 1872’an de bûye navçeya Kerkûk ê. Wê demê Kerkûk Sancax bûye. Di dema avakirina Iraq’ê de bûye navçe. Heta 1945 an yek deriyê wê qelê maye dûre ew jî xira bûye. Ji ber ku tê de newt zêde bûye siyasetên Erebkirinê hatine meşandin. Bi siyaseta asîmîlasyon, surgun gelek mal cih warên kevnar ê vê derê hatine xirakirin. 5 hezar kes enfal in. Di dema raperîna 1991 an de nîvê navçê dikeve destê Kurdan. Nîvê din di

destê dagirkeriya Iraqê de dimîne. Di 2003 an de hikûmeta Iraqê tê de namîne.

SERQELE, Cebare, Qeretepe û Kokiz nahiyê Kifrîne. Di fermiyetê de tevlîhevî hebe jî di fîîliyatê de girêdayî Kifrî ne. Newcûl berê li ser Xormato bû niha bi Kifrî re hatiye girêdan. Bi giştî Kurd in lê Ereb û Tirkmen jî pir kêm tê de hene. Serqela bi giştî Kurd in. Cebare tevlîhev e. Kurd, Ereb û Tirkemen tê hene. Kurd ji nîvî zêdetir in. Qeretepe ji % 80 Ereb in, piştre jî Kurd û Tirkmen tên.

EŞÎRÊN ku li herema Kifrî hene wiha ne: Zengene, bandora ev eşîret ji hemû eşîretên din zêdetir e. Delo, Caf, Rawatî û Dawê. Ev eşîrên ku navên wan derbas dibin li aliyê Xormato jî hene û bi bandor in.

CİVAKA Kifrî ji sê etnîsîteyan pêk tê. Yê herî zêde Kurd in, Tirkmen û Ereb jî tê de hene. Lê Erebên Kifrî hejmara wan zêde nîne. Tirkmen jî tê gotin ku ji %5 e. Kurd bi hejmar pir li pêş in. Bi van aliyên xwe ve weke Xormato nîne. Navçeyek biçûk e. Ji ber ku li ser rêya bazirganiyê nîne, her cure însan tê de jiyan nake. Jiyana wan sade ye. Têkiliyên wan li gel bazirganiyê bisînor e. Ji ber ku demek dirêje girêdayî herêma Kurdistan bûye, di hêla sîyasî û ewlekarî de ji Xormato baştir e. Kêm jî be xizmetguzarî tê de heye. Lê gel ji hişmendî, têgihêştinên heyî, yanî ji desthilatdarî pir zêde bêzar bûye. Nerazîbûyîna xwe bi awayek aşkere diyar dike. Di demên berê de gelek kes beşdarî nava refên gerîla bûne. Hinek ji wan şehîd in, yek ji cihê ku herî zêde şehîdên tevgera azadiyê tê de heye ev dere.  Hinek jî ji refên şoreşê revî ne. Bi hejmar zêde ne. Ev rewş tesîreke girîng li ser xebatê dike.

DEMA KU DAIŞ êrîş dike, ev navçe jî li ber xwe dide. Ciyê ku Ereb tê de ne dikevin destê DAIŞ'ê. Lê gel, vê yekê qebûl nake. Gelek kes xwebexş tên beşdarî şer dibin. Li alî Qaratepe şerên dijwar diqewimin. Di encam de gel DAIŞ ji heremê dûr dixîne. Çend meh berê gel li dijî Quwet Bedir jî helwest girt û nehiştin ev hêz di herêmê û derdora herêmê de xwe bicih bike. Ji ber ku hêzên nêzîkî Îranê di encama berxwedana gel de neketin herêmê niha ji aliyê ewlekariyê ve li gorî Xormato gelek baştir û ewletir e.

Dİ HÊLA bawerî de civak hemû misilman in. Erep û Kurd sûnnî ne. Li navenda nehiya Qaratepe Tirkmenên şîa hene. Hema bêje piranî Tirkmenên vê herêmê ji ber ku di bin bandora Îranê de ne şîa ne.

CEPHE Tirkmen'î berê tê de pir bi quwet bûye. Bi alîkariya dewleta Tirkan gelek bi hêz bûne. Lê niha ji ber ku giraniya Kurdan pêş ketiye wekî berê aktîf nînin. 5–6 partî hatine gel hev Cepheyê Tirkmen'î avakirine. Di vê navçeyên de di dema qeyrana aborî ya Iraq'ê de hêjmareke zêde Kurd navê xwe li gel cepheyê Tirkmenî mîna Tirkmenan qeyd kirine. Ji ber ku wê demê ji aliyê dewleta Tirk ve ji bo van alikariya aborî her tim hatiye şandin, wan jî weke Tirkmenan nifûsa xwe derxistine. Bi eslê xwe Kurd in, lê ji ber rewşên aborî di demên borî de xwe mîna Tirkmenan qeydkirine. Bi vê rastiyê ve girêdayî rêjeya Tirkmenan di vê navçeyê de digihêje ji % 5' ger na hêjmara wan kêmtire. Xala herî balkêş jî ew e ku Tirkmenên vir li gorî yê cihên din ji Kurdan baştir bi Soranî diaxivin. Tirkmeniya wan jî nêzîkî azeriye.

KİFRÎ Jİ hêla aborî ve weke Xormato li pêş nîne. Ji hêla petrol ve dewlemend e. Çend şîrket li vir îş dikin. Ev şîrketên neft wihan

e: 1-Gasprom;ya Rûsye ye. Ji sînorê Rojhilatê Kurdistan heta Rojavayê Başûrê Korçay di destê vê şîrketê de ye. 2-Westin Zagros; ev şîrket aîdê Kanadayê ye. Ji Rizgarî heta Şêx Tewêl di destê wan de ye. Piştî demekê ev şîrket dibe aîdê Gasprom. Gasprom ev şîrket dikire. 3-Oîlsenc; ev şîrket Avûstralyayî ye. Ji mintiqa Dawê Binarê Gel heta Qadirkerem di destê wan de ye. Digihêje nêzîkê Çemçemal. Her sê şîrketên biyanî tevahî derfetên di herêmê de heyî li gorî daxwaz û berjewendiyên xwe bikar tînin. Ya ku di van şîrketan de para Kurdan ketiye bekçîtiya wan e. Ji derveyî bekçîtiyê ti karên din di destê Kurdan de nîne. Bê gûman di vê ku mirov mesûl û berpirsyarên herêmê yên ku para xwe ya sexsî ji van şîrketan digirin jibîr neke. Her şîrket bêyî ku para van bide ne gengaze ku bikaribe hebûna xwe li herêmê bidomîne.

BENDAVA ku li Kifrî hatiye çêkirin di gelek xalan de li şûna ku sûda wê ji gelê herêmê re hebe jiyana gel li vir tehdît dike. Ji ber ku bendava ku hatiye avakirin mîna tevahî karên din gendelî, yanê parexurî tê de hatiyekirin weke tê xwestin projeya wê saxlem nîne. Di her derfet û kêliyê de zêdebûna baranê îhtîmala li ber avê çûyîna Kifrî jî dixwe rojevê.

NAVÇEYA Kifrî li gorî ya Xormato ji aliyê civakî ve hîn vekiritir e. Asta xwendin û nivîsandina jinê li pêş e. Heta radeyekê jin di nav vê civakê de dikare xwedî meslek be. Tevî ku navçeyeke girêdayî Kerkûkê ye ji aliyê civakî ve zêdetir hatin û çûyîn ji Silêmaniyê re çêdibe. Bi awayekî teqlîdî hema bêje mînakeke biçûk a Silêmaniyê ye. Curê azadiya ku em jê re dibêjin: “çarpık ozgurluk” yanê azadiya xelet di vê herêmê de pir li pêş e. Ji bo vê mijara ku herî zêde di rojevê de ye mijara berdana jina ye. Yan jin

xwe didin berdan, yan ji aliyê zilam ve dema ku jin ne li gorî wî be berdide. Di mijara berdanê de tu kes bi pêşeroja zarokan nafikire. Yek ji xalên herî xeter heta niha di vê navçeyê de derketiye holê û weke jin mirov matmayî dihêle jî tevlîbûna du keçan ji nav refên DA'ÎŞ ê re ye. Her çiqas sedemên tevlîbûna van keçan ji aliyê civakê ve neyê zanîn jî, lê heta radeyekê mirov dikare şîrova vê bike. Jina ku di nav çar dîwaran de ji aliyê pergala malbat, civak û kevneşopên civakî ve hatiye dorpêçkirin rêya çareseriyê di reva ji derve re dibînin. Ji bo van  jinan xala herî esasî reva ji vê rastiyê ye. Ji bo wê hêzê ku biçe gel kî ye, yan jî çî ye negirîng e.

LÎ NAVÇEYA Kifrî di gel van xalan de hinek cihên pîroz jî hene. Yek ji van cihan nav û cihê "Bawe Şaswar e." Bawe peyveke ayîdî baweriya kakaîyan e. Tevî vê jî di Kifrî de kakayî nînin. Lê ev cihê pîroz li gorî kakayiyan yê wan e. Tevî vê rastiyê jî yê ku di roja îro de xwedî lêderdikeve, diparêze, hinek adet û teqlîd, ya rast rê û resmên civakî-olî di vê perestgehê de pêk tînin sûnnî-misilman in. Li derdora vî cihê pîroz hinek gorên kevnar û şêwazên çêkirina wan qet naşibin yê îslamê hene. Hinek ji van goran li gorî nivîs û dîroka li ser wan hatiye nivîsandin ê serdema Osmaniya ne. Heta yên beriya serdema Osmaniyan jî hene. Cihê bajarê kevn niha cihê sûkê ye û gelek cihên wê hilweşiyaye tê dîtin. Di nav wan xerabeyan de gelek cih û tiştên balkêş hene. Hema bêje cihên ku hatine çêkirin hemû mîna hev in. Ji jêr ve her ku ber bi jor ve diçe teng dibin. Di jorê hemûyan de jî kunek heye ku di vê kunê re tav dikeve hundir. Diyare ku pergala ku ji tavê çêkirine tirêjên rojê ji jor ber bi jêr ve anîne. Di hinek xalan de dişibin pîramîtên Misirê. Lê pîramîtên Misirê sêkoşene, ev berevajî girover in. Ji bo hemû kesên ku diçin vir çi hîs dikin nizanim, lê ji bo min, mîna di nav

demên kevnar ên dîrokê de gerekê bû. Min wiha dizanî ku ez ne di vî serdemî de, di serdemekî kevn de dijim. Ji bo kêliyekê be jî min xwe xist şûna wan mirovên wê serdemê. Hewlda ku ez wan hîs bikim. Heta radeyekê min dikarî hîs jî bikim. Ji bo demeke kurt be jî min hîs kir ku ez li gel xwedavendên wê serdemê me. Dizanim hûn mîna min xeyalperest nînin. Lê ya rast ew cih û warên kevnar vê rastiyê bi mirov dide hîskirin. Ne bi destê mirov e.

Lİ DERDORA bajarokê Kifrî pergala parastinê bi awayekî pir baş hatiye danîn. Niha tenê li hinek cihan bermahiyên van qaleyan maye. Dema ku li wan cihan dinêrî dikarî fêm bikî bê ka mirovên wê serdemê çiqas girîngî dane mijara xweparastinê. Berî her tiştî li cihên herî bilind pergaleke parastinê ya pir baş avakirine. Dîwarên ku lêkirine di roja me ya îro de jî ez bawerin dê ti corên roketan nikaribin derbaz bikin. Pergala parastina Xormato û Kifrî gelek nêzîkî hev in. Ev jî dide diyarkirin ku pêvajoya damezrandina herdu navçeyan di heman serdemê de ye. Gelek asewar û şûnwarên dîrokî dişibin hev.

DÎSA gelek bermahiyên ku tê gotin ê serdema ola Zerduşt in hene. Li çiyayên derdora Kifrî gelek şikeft hene, ya rast mirov ji van re nikare bêje şikeft. Di nav zinar û latan de hinek çal bi destan hatine kolan. Dema ku mirov li van cihan dinêre li gorî felsefeya Zerduştiyan a defnkirina mirovan digihêje vî encamî ku ev gorên serdema Zerduşt bin, ango li gorî baweriya Zerduşt hatine definkirin. Di nav latê de mîna şikefteke biçûk e. Di hundirê wê şikeftê de çawa gora mirovekî tê kolan ev lat wiha hatiye kolan, lê yek ferqa wê ji gorên îro heye ku ewqas ne mezine. Biqasî ku hestiyên mirovekî tê de bi cih bibe hatine kolan. Ma ji xwe li gorî

felsefeya Zerduşt dema ku mirov dimire li cihekî bilind tê danîn heta ku zindiyên din ji laşê mirov sud werbigire. Yanî ji aliyê teyr û bazan ve goştê wî/ê bê xwarin pişre tê definkirin. Ya ku tê definkirin tenê hestiyê mirov e. Li gorî vê felsefeyê hema bêje ev cihên ku hatine çêkirin tam li gorî qeyasê ye. Hinek ji van şikeftan jî mîna cihên miraza hatine nasîn. Di roja îro de jî hîn mirov ji bo bicihatina hinek daxwaziyên xwe diçin van cihan. Lê ya herî balkêş ev e ku her kesa/ê biçe ji bo qebûlbûna daxwaza wî/ê divê hêkên ku boyaxkirine bibe bavêje wê şikaftê. Çend hêkin, ango çawa tên avêtin di derbarê vê de zêde agahiyên min nînin. Dema ku despêkê min ev kevneşop dît ji min re wiha hat ku pêwendiyeke wê bi baweriya şîatiyê ve hebe. Yanê şîatiyê ev çand ji xwe re mîna kevneşopekê domandiye. Lê bi hinek guhertinan ve. Ez bawer dikim ne tenê di nav şîayan de di nav mesîhiyan de jî ev mijara hêkên reng û rengî heye. Her yek ji wan navekî lê dike, lê di cewherê xwe de hemû ji heman çavkaniyê tên. Li gorî kevnariya dîrokê tenê mirov dikare bigihije qenhetekê bê ka kê ji kê sûd wergirtiye.

ME Dİ serî de gelekî qala xalên hevbeş yê van herdu navçeyan kir. Lê ji aliyê taybetmendiyên civakî ve hema bêje ti xalên wan ên bişibin hev nînin. Berevajî mirovên Xormato mirovên vir hîn sadetirin, mîna wan bi dûv malên dinyê zêde nakevin. Germahiyeke wan li beramberî tevgerê heye. Hezkirina wan ji dile. Ji ber ku pir zêde neketine nav mijara bazirganî, berjewendiyên şexsî mijarên mîna dizî û hwd di vê derê de nayê dîtin. Heta tu bixwazî navçeyeke aram û bihizûr e. Li gorî bajarên din ji aliyê trafîkê ve gelek aram e. Sedema wê pir zêde nizamin lê dema ku mirov tê vir hest bi aramî, hizûr û asûdeyî yê dike. Jiyana navçeyê

jî mîna kolanên wê aram e. Zêde şer û perçûn tê de nîne. Nakokiyên civakî, olî pir li pêş nînin. Mîna ku ne bi aramî, tevlîhevî û pevçûnên Xormato re di nava înadekê de be aram e. Xormato destê kê di bêrîka kê de ye ne diyar e. Kî li kî derê kîjan demê bê kuştin nayê zanîn. Hema bêje Teksas e. Jixwe gelek caran em di nav xwe de dema ku qala vir dikin gotina Teksas bikartînin. Di her malekê de çend corên çekan hene tên dîtin. Jixwe yê ku ticareta çekan nake, ne diz be, grubê xwe yê çetan û şêlandinê nebe ji zilam nayê hesibandin. Kifrî jî hema berevajî vana hemûyan bifikirin ev dibe rastiya Kifrî. Bajarokekî biçûke, biqasî ku biçûke ewqas jî şêrîn û aram e. Di nava hizûreke mezin de dijî. Dema ku tu di cade û kolanên vî bajarî de dimeşî wisa hîs dikî ku tevahî kolanên bajêr ji bo ku aramiyê ji te re bibexşe ketiye nav pêşbirkê. Yê ku di kolan û kuceyan de bêdengiya vî bajarokî xira dike, na wele xweşikiyê dide vî bajarî zilamekî bi temen e.

DEMA KU tu di cadeya navîn ya Kifrî de derbaz dibî û ber bi Kelarê ve diçî li milê rastê barakaye heye. Derdora wê baraqayê tijî teneke, hesin, kîsên xweliyê, qutî, qarton hema tu çi bixwazî li ser hev hatiye komkirin. Cihekî gelek balkêş e. Ewqas bala mirov dikişîne bê pirs tu nikarî derbaz bî. Rojekê em derketin gera nasîna nav bajêr. Carek du carên din ew cih berçavên min ketibû. Lê kes nebû ez bipirsim. Wê rojê şansê min hebû yê ku bajar bi min bida nasîn li gel min bû. Dema em giştin wê derê min pirsa wî cihî kir. Ji min re got: Ew cih yê kesekî bi temen e, kesî wî nîne, ew bi tenê dijî.” Min hinek pirsên din arasteyî rêberê me kir. Di encam de me zanî ku ew kes pêşmergeyekî kevn bûye, salên dirêj ên temenê xwe di nav şerê dijberî rejîma Sedam de bi ser biriye. Di dema şoreşê de sozek de ye, “weke me gelekan” gotiye: Ger rojek ji

rojan herêma Kurdistanê ji destê rêjîma Baas derkeve û serbixweyiya Kurdan bikeve destê wan ew ê heta dawiyê temenê xwe di bajarê xwe de çopçitiyê bike. Bi rastî jî ev soza xwe pêkaniye. Piştî raperîna 91’ê heta niha di baraqayê de dijî, her sibe radibe dikeve nav kolanên bajar û çi çopa ku dikeve berdestê wî kom dike. Hinek tiştan dixwe ser ereba xwe ya destan û tîne ber mala xwe, yên din jî dibe cihê erebeya çopê. Taybetmendiya wî ya esasî bêdegiya wî ye. Hema bêje bi tu kesî re naxive. Lê di nav bazarê de biçe ber dikana kê çi jê re lazim be ji dikanê digire û derdikeve. Tu kes jî rojek ji rojan jê re nabêje; “neke” tevahî dikanên bazarê jê re vekirîne. Di wê baraqayê de ew qirêja malê û mişk bi hev re jiyan dikin. Kes ji yê din aciz nabe. Tiştên li derdora xwe kom dike heta niha jî kes nizanê dê çi ji wan tiştan bike. Ne kes jê dipirse, ne jî ew jî kesî re sedema vê dibeje. Tenê dibêje; “ Dê rojekê bê pêwistiya we pê çêbibe.” Ne hatina DA’ÎŞ’ê, ne qeyrana siyasî, aborî û çandî bandor li ser jiyana wî tenê nake. Ne tenê di Kifrî de di tevahiya Iraqê û Başûr de. Ji ber ku tevahî dikanên sûkê ji bo wî vekirî ne. Lê ew jî ji pêwîstiyên xwe yên wê kêliyê zêdetir tiştekî ji dikanan ranake. Dema ku min jiyana wî kesî dît, ji xwe re got: “Ji vê jiyanê asûdetir û xweştir dê ti corên din ên jiyanê nebe. Ger rojek ji rojan ev şoreş serbikeve û heta wê demê bimînin ez ê jî ji xwe re rêyeke weke ya vî zilamî hilbijêrim. Ji vê bawer im. Şûna ku tu di welatê xwe de mîna Barzanî û Talabanî bijî, weke vî zilamî jiyan asûde û aramtir e.

HIM Lİ vir him jî li Xormato xeteriya herî mezin mîna gelek deverên din radeya pêşketine selefîti ye. Gelek ciwanên temen biçûk bi rêyên cor bi cor ber bi vê xefikê ve diçin. Du meylên serwer hene li vir. Yek ji wan bandoreke zêde ya ola îslamê, yanê

selefiyî ye. Ya duwemîn jî: di bin navê ku tevahî xirabkarî çavkaniya xwe ji îslamê digirin dijbertiya ola îslamê ye. Eşkereye ku herdu rê û rêbaz jî dê bi civakê nedin qezenckirin, bidin windakirin.

YEK Jİ xalên din divê ku mirov di derbazî vê navçeyê de qala wê bike jî ev e. Asta beşdarikirina nav refên gêrîla ji salên 96-97 ve gelek li pêş e. Biqasî tevlîbûne ewqas jî paşde vegeriyane. Tu diçî kî dera vê navçeyê misoger rastî kesên ku berê di nav me de mane û revîne tê. Ne weke civakê dikarin bijîn, ne jî weke me. Di navbera herdu jiyanan de asê mane. Navê zarokên wan hemû navê hevalên şehîd in, yan dema ku li çiyê bûne hevalên ku herî zêde jê hezkirine navê wan li zarokên xwe kirine. Hema bêje hemû hevdu nasdikin, pêwendiyên wan ên civakî bi hev re heye. Xala balkêş min qet nedît yek ji kesên ku reviye di vê navçeyê de dijbertiya me kiribe. Weke ku tu bêjî lihevkirine bêdengî di nav hemûyan de hebe kes antî propagandeya tevgerê nake. Berevajî, xwe, kesayetiya xwe riswa dikin, lê xwedî li partiyê derdikevin. Piştî ku xebatên saha navîn li vê herêmê pêşket, piraniya wan raporên xwe peşkêş kirin û xwestin tevlî xebatê bibin. Xwe ji ti xebatan paşde nadin. Tevî ku bi salane ji rêxistinê qutbûne hîn jî bîraninên wan hevalên ku naskirine, cihên ku lê mane weke ku îro di bîra wan de maye. Tu dibê qet ji wê serdemê derneketine, tê de asê mane. Weke ku piştî wê jiyanê qet jiyaneke wan a din nebûye.

DEMA KU min ev kes bi vî rengî dîtin rastiyek fêm kir. Dema ku mirov ji refê xwe qut bû, lê nekarî di nav refekî din de jî weke berê bijî neçare bîraninên xwe yên borî himbêz bike. Ger di jiyana xwe de ne xwedî herikbariyekê be û bîranînên nû li ser jiyana xwe zêde neke ji bo ku bijî neçara di yê kevn de asê bimîne. Asê bimîne da

ku xwe li ser piya bigire. Berevajî li ser piyan mayîn, jiyîn jî gelek zehmet dibe. Ya ku ew jî dijîn rastiyeke bi vî rengî ye. Ne dikarin bibin ferdeke civaka çûyînê, ne jî dikarin mîna mîlîtanekî bi ser bilindî di nav civaka xwe de bimînin. Gelek caran dema ku rêzgirtina gel a li beramberî gêrîla didîtin xemgîniyek li ser rûyê wan rûdiniş, keserek kûr jidil dikişandin. Di wê kêliyê mirov poşmaniyeke mezin di nav çavên wan de didît. Ger li gorî felsefeya îslamê mijara di “araf”ê de mayîn hebe, ez bawerim ev kêlî bixwe ne. Xwedê di vê rewşê de mayînê neke para tu kesî.

EM VÊ CARÊ ji Kifrî derbazî herdu herêmên din bibin. Kelar û Xaneqîn. Lê li gorî rêza coxrafîk em ê ji Kelar despêbikin. Di Başûrê Kurdistanê de her tim dema ku tê gotin Kelar, Gever dikeve bîra min. Gever ji aliyê têkoşîna azadiyê ve xwedî çi rol û ristêye hema bêje Kelar jî di dîroka Başûrê Kurdistanê de xwedî heman rol û rist e. Yan jî ez bixwe weha li vî bajarokî dinêrim. Ya dilê min ev e û ez ê li gorî ya dilê xwe di vê nivîsê de cih bidim vê derê.

★

**KELAR- XANEQÎN:**

NAVÇEYA Kelarê ya ku ser bi bajarê Silêmaniyê ye, nêzîkî sînorê Îranê; ango Rojhilatê Kurdistanê ye. (Qesra Şêrîn-Kirmanşan) nifûsa vê navçeyê 300.000 e. bi gundên derdorê ve hema bêje digihije 50. 000'î. Tevî ku hejmarake zêde gundên vê navçeyê heye jî, tenê gundên nêzîkî navçeyê gundên mezin in. Gundên din ên ji bajêr dûr hema bêje ji çend malan pêk tê. Lê gundên herî xweş û jiyana komînal tê de serwer e jî ev gund in. Bi taybetî jî gundên li ser sînor jiyanake wan a gelek xweş û balkêş heye. Weke deverên din jî ji gundan ber bi bajar ve koçberiyeke mezin tê jiyîn. Bi taybetî piştî hatina DA'ÎŞ'ê ev koçberî bi awayekî berbiçav zêde bûye. Di gel koçberiya Kurdan de ya Ereban jî ber bi vir ve zêde bûye. Her çiqas hejmara zêde ya Kurdan be jî, heta radeyekê Ereb û Tirkmen jî di vî bajarî de dijîn. Di van herdu salên dawî de hejmara Ereban her roja ku derbaz dibe zêde dibe. Di gel van de hema bêje 5-6 hezar Kakayî jî di vê derê de dijîn. Kakayiyên vê herêmê ne weke yên Kerkûk û Daqûqê ne. Ji ber ku hejmara wan kême gelek caran ji ber ku xwe biparêzin nasnameya xwe ya olî vedişêrin. Heta radeyekê mirov dikare bêje devji hinek taybetmendiyên xwe yên olî berdane; ango van ayînên xwe yên olî bi awayekî veşartî pêk tînin. Hinek rojên wan ên taybet hene ku di nav xwe de bi awayekî nihînî pêk tînin. Dema ku me perwerdeya leşkerî dida ciwan û jinên wan bêy ku bihêlin em pêbihesin digotin: "Heval îşev karê me heye, em nikarin werin perwerdê, ger hûn perwerdê bihêlin sibê êvarê dê gelek baş be" Wê demê me dizanî ku karekî wan ên taybet heye. Êdî em jî fêr bûbûn roja

Çarşêmê divê ne em biçin malê wan, ne jî perwerde; ango civînan bixin rojeva wan. Ne wan ji me re ev rastî got û ne me jî bi wan da hîskirin. Hema bêje bi awayekî bêdeng me lihevkiribû li ser wê rojê. Hinek ji wan yên ku gelekî nêzîkî me bûn ev rastî digotin. **"Heval karê me yê xweser heye."** Ew jî ji me hevalên jin fêrî gotina xweser bûbûn. Ev jî li xweşiya me diçû. Me wê demê dizanî ku me ji nêzîk ve dişopînin. Hinekan ji wan jî digot: Heval em ji wê jiyana komînal a ku Rêbertî qala wê dike zêde nedûrin, ji ber ku cewherê felsefeya jiyana me hema bêje li gorî vê paradîgmayê ye.

NASKİRİNA Kakayiyan ji aliyê civakê ve, di derdor de li gorî simêlê ye. Sembola wan a olî ji aliyê zilaman ve eşekereye ku simêle. Gelek caran di nav bajaran de dema em dimeşiyan êdî em jî fêrbûbûn dema ku me yek bi simêlê zêde û dirêj didît me yekser digot: "Ev Kakayiye" her çiqas me nedabe hîskirin û em bi xwe jî pênehesî bin, hema bêjin di pêvajoya despêkê de em li dûv wan digeriyan. Piştî naskirinê êdî me dikarî bi awayekî rehet henekan li gel wan bikin. Hinek caran me digot; "başe em dikarin zilaman bi "şarib" ji simêlê nasbikin, baş e em ê jinên wan çawa binasin? Tenê bi kenekî bersiva vê pirsa me didan. Ya rast naskirina jinên Kakayî gelek zahmet e. Ji ber ku ew jî mîna jinên sûnî û hwd cil û bergan li xwe dikin. Ji bo wê jî tu nikarî jineke Kakayî di nav civakê de binasî. Ger hûn ji min bipirsin; ez ê bêjim ev jî bi rastiya zilamserweriya di nav baweriya Kakayiyen a heyî ve girêdayî ye. Her çiqas di nav xwe de xwe gelek demokratîk bibînin jî tenê li ser mijara sembola simêlê li mijarê binêrî dikarî vê rastiyê bibînî. Kakayî beşa herî hejar ya vê qadê ne. Ji aliyê civakê ve zêde nayên pejirandin. Tevî vê jî yên gelek kedkar in. Bi keda xwe, xwêdana eniya xwe jiyana xwe biser dibin. Rojane karkeriyê dikin, di karên

biçûk û erzan de dixebitin. Lê onura xwe diparêzin. Xala herî xweşik jî di nav wan de li gorî min ev e.

JÎ BİLÎ Kakayiyan ve hema bêje yên din hemû sunî ne. Lê li gorî gelek deverên din ên Başûrê Kurdistanê sûnîtiya vê herêmê ewqas hişk nîne. Di ber serê bajarê Kelarê de ava Sîrwan diherike. Ji ber ku rûbara Sîrwanê diherike mijara çandinî, ango zîraatê gelek li pêş e. Weke tevahî herêmên din ên Kurdistanê hema bêje li van deran jî tevahî berhemên çandiniyê tê dîtin. Lê li wê herêmê çandina birincê xala sereke ye. Ger girîngî ji vê mijarê re bê dayîn tevahî pêwîstiya birincê ya Herêma Kurdistanê tenê dikare ji vê herêmê bê dabînkirin. Di van salên dawî de mijara çandina darên fêkî jî derketiye pêş. Di nav van fêkiyan de ya herî li pêş bêgûman henar in. Hema bêje derdora Kelarê bi darê hinaran hatiye xemilandin. Ne biqasî hinarên Efrînê be jî gelek li pêş e. Bi rastî jî dema ku mirov diçe vî bajarî li ser dikanan dema ku hinaran dibîne hema dixwaze bixwe. Ewqas bala mirov dikişînin. Dema ku min ev dîmen didîtin çîroka pîrka min a hinarokê tim diket bîra min.

Lİ GORÎ çîroka pîrka min di gundeki de zilamek hebûye, ji jina wî ya yekem ji ber ku zarokên wî çênebûye, jina dûwemîn xwestiye. Li gorî qudreta xwedê herdu jin bi hev re dugiyan bûne. Rojek ji rojan jina mezin nav malê paqîj dike, li erdê hinar dibîne. Wê demê dibêje; “xwedayê mihrîban tu keçek mîna vê liba hinarê xweşik bide min” demek di ser de derbaz dibe vê carê jina biçûk malê paqîj dike. Gêzik di destê wê de nav malê pak dike. Di dema pakkirinê de şûjinekê li erdê dibîne wê demê dibêje; “xwedê tu keçekê bike nasîbê min û diranê keça min mîna vê şûjinê tûj bin.” Xwedê daxwaziya herdukan pêk tîne û keça mina liba hinarê dide

jina mezin, keçeke diranên wê mîna şûjinê jî dide jina biçûk. Piştî demek di ser de derbaz dibe jina biçûk hesûdiyê bi keça jina mezin dike. Dikeve nav liv û tevgerê ji bo ku jina mezin ji holê rake. Di encam de rojekê jina mezin dikuje. Hinarkê yanî keça jina mezin dikeve berdestê jinbavê. Dema ku bavê wê li malê li gel wê baş e. Dema ku ne li mal be îşkencê lê dike, da ku keçik ji xweşikiya xwe dûr bikeve, kes beriya keça wê neyê hinarkê nexwaze. Tevî hemû pêkhate û bûyerên ecêb tîne serê wê jî ji xweşikiya xwe tiştekî ji dest nade. Tevî hemû şert û mercên hewayê jî hinarên vî bajarî ji xweşikiya xwe tiştekî ji dest nadin. Di nîvê zivistanê de jî dema ku tu di ber wan baxçeyan re derbaz dibî hinarên bi daran ve mane dawetkarin ji bo temaşevanên xwe.

Dİ BEJAHİYA Kelar de çanda eşîretî gelek li pêş e. Gelek taybetmendiyên ku di demên borî de di nav civaka Kurdan de hebû hîn hebûna xwe li van deran diparêze. Hejmareke zêde eşîret hîn weke heyî xwe diparêzin. Di gel vê de jî roj bi roj ew jî ber bi helandinê ve diçin. Exlaqê civakî, taybetmendiyên civaka xwezayî di van qadan de zêde ne. Lê ciwan bi pêşketina teknolojiya serdemê ve girêdayî ji van taybetmendiyan dûr dikevin. Jinên di qadên bejayî de li gorî jina bajêr hîn azadtir û civakîtir e. Di tevahî qadên jiyanê de çalak e. Hete ji zilaman jî çalaktir e. Hema bêje tevahî jiyan li dora jinê tê hûnandin. Di qada aborî de jî hebûna jinê gelek li pêş e. Bêy ku biryara jinê hebe zilam nikare tenê bi serê xwe biryara tiştekî bide. Ev xal herî zêde jî di mijara derbazbûna bajêr de derbazdar e. Ger jin çûyîna bajêr qebûl neke zilam bi serê xwe nikare vê biryarê bide. Lê dema ku jinê xwest derbazî bajêr jî bibe zilam çi dike bila bike neçare jê re mal; ango xaniyekî bibîne, wê bibe cihê ku dixwaz e.

Dİ NAVENDA Kelarê de pêşkeftinên çors ên bajarvaniyê bi lez pêşdikeve. Çanda eşîretgeriyê biqasî ku hebûna xwe diparêze bi awayekî lez linav diçe. Hema bêje jin di nav vî bajarî de hebûna xwe ji dest daye. Di nav malê de hatiye hepiskirin. Ne xwedî ti mafekî ye. Di temenekî biçûk de didin mêr, bi xweşî yan nexweşî dayîna mêr li pêş e. Qada ku herî zêde xwekuştinên jinan li pêşe dîsa ev qad e. Cihê jinê di nav xebatê de nîne. Di encama van nêzîkatiyan de bunalimên kûr tên jiyîn. Ji jiyanê bêzarî, pirsgirêkên derûnî û li hevnekirinên civakî li pêş in. Mijara telaqdayînê ji hemû alanan zêdetir e. Şîdeta li ser jinê pir zêde ye. Bi bandora ola îslamê jî jin mîna karkereke bê mûçe di malê de tê bikaranîn.

REWŞA ciwanan hema bêje ji ya jinan jî xirabtir e. Ji zanistiya dîrokî, civakî û çandî gelek dûr in. Ji derveyî tevahî aktîvîteyên civakî ne. Bîreycîne, ji manewiyatê dûr in. Ji ber vê ye ku nikare bibe xwedî vîn. Di cendereya pergalê de di valatiyê de dijî û ji çareseriya pirsgirêkan dûr e. Pir zû dikeve bunalimê, bi biryar dikeve, zû devji hêviyên xwe berdidin, bi dûv xeyalên xwe baznadin. Gelek bê bawer in. Girêdaniya xwe bi axê, welat, nirxên dîrokî re gelek lewaz e. Fêrî jiyanake rehet û erzan hatiye kirin. Ciwan fêrî bê kedî û bi rêyên erzan bi destxistina pereyan hatiye kirin. Bi awayekî giştî ji tevlîbûna jiyana civakî û aborî gelek dûr in. Ji lêpirsîna pergalê pir dûr in. Tevahî îtîrazên wan ji bo pergalê tenê di çarçoveya aborî de ye. Dema ku li beramberî pergalê bertekên xwe jî nîşan didin ji aliyê aborî ve tê sînordarkirin. Yanî pergal wan bi pereyan terbiye dike. Siyaseta bi pere û aborî terbiyekirinê ji aliyê pergalê ve tê meşandin. Di encama vê polîtikayê de kesîmekî ciwanan ê nayê zehmetiyan, asankar, bê ked û apolîtîk hakîm e. Piştî hatina DA’ÎŞ’ê ji aliyê ciwanan ve her

çiqas partiyên sîyasî bên lêpirsînkirin jî, alternatîfê pergalê nayê dîtin û pejirandin. Niha him ji aliyê civakê ve, him jî ji aliyê ciwanan ve eleqeyek li beramberî PKK'ê di qadê de derketiye pêş. Lê av eleqe veneguheriye sekneke çalak. Di asta hestyarî de ye. Yek ji alanên ku herî zêde ciwan berê xwe didinê nav refên gêrîla jî ev herême. Biqasî tevlîbûn heye, ewqas jî piştî tevlîbûnê vegera wan jî heye. Di dema şerê Kobanê de hejmareke zêde ji vê herêmê berê xwe dan Kobanê. Hinek ji wan heta niha jî li wir in, hinek ji wan di şerê wê demê de birîndar bûn û hatin. Lê hinek ji wan jî piştî vegeriyan ji aliyê PDK'ê ve hatin teslîmgirtin û hatin bikaranîn. Di vê qadê de xala ku herî zêde li dijberî me tê bikaranîn qerta îslamiyetê û mijarên exlaqî ne. Bi taybet ev propagandayên dijber ji aliyê PDK'ê ve tên bikaranîn.

Dİ DEMÊN borî de di navbera netewan de ti pirsgirêk derneketine. Lê di dema niha de, bi taybet bi hatina DA'ÎŞ'ê re çelîşkî û pevçûnên di navbera Ereb û Kurdan de li vir gelek kûr bûye. Hema bêje tevahî civak ji Ereban acize, baweriya xwe bi wan nayîne, ew çelîşkiyên ku bi salane cemidandibûn hebû zindî kirine û li gorî wê nêzîkî Ereban dibin. Mîna hemwelatiyê duwem li wan tê nêrîn. Tevî rastiyeke bi vî rengî jî her Kurdekî dixwaze jina duwem bîne serî li Ereban dide. Bi pereyekî kêm, bê mesref dikare keçeke temen biçûk ji Ereban bixwaze. Ne tenê li Kelarê, bi giştî di Başûrê Kurdistanê de niha navê kabûsa jinên Kurd keçên Ereb in. Zilamê Kurd ê ku ji aliyê siyasî û qewmî ve qet Ereban napejirîne, dema ku ketîbûna zilam dibe mijara gotinê hemû tên jibîrkirin. Ji bo ketîbûna xwe, dikare bêy ku jina wî pê bihese bidizî dikare biçe bi jinek Ereb re bizewice, maleke cuda jê re bigire û ji hemû kesî

veşêre. Bi taybet ev xal ji aliyê fermandarên YNK û PDK'ê ve weke çandekê di nav civakê de dane rûnişkandin.

JÎ ALİYÊ siyasî ve di rêza yekem de yekîtî tê, piştî yekîtî Partiya Gorran e ya di herêmê de serwer e. Sedemê esasî yê peydakirina oyan ji aliyê Gorran ve di vê herêmê de têkiliya xwe bi rastiya civakî ya vê herêmê re heye. Ji ber ku li beramberî pergalê bi bertekin û alternatîfên pergalê digerin, Gorran ji pergalê re alternatif dibînin. Ji bo vê jî berê xwe didin partiya Gorran. Lê piştî van nakokiyên dawî yên derketin êdî mîna berê nêzîkî Gorran jî nabin. Bi awayekî giştî di herêma Kelar, Bawenûr û Rizgarî de îktîdara YNK'ê zêde ye. Lê tevî vê jî Gorran hejmareke zêde deng ji van alanan digire. Di hinek hilbijartinan de yekîtî jî li şûnxwe ve dihêle. Di despêka derketina xwe de Tevgera Gorran ji ber ku îdeyê ji holê rakirina gendelî (yolsuzluk) bêdadî yê xitabê hestên gelê herêmê, rewşenbîr û tevahî çînê civakê dikir û di nav wan de hêvî ava dikir hemû kesî berê xwe dayê. Lê di van demên dawî de gel her ku diçe rastiya vê tevgerê jî nas dike û jê dûrdikeve. Bi taybetî bi pêşketina hêrîşên DA'ÎŞ'ê re YNK'ê di vê alanê de îtîbara xwe ya ku ji dest dabû dîsa bidest xist. Tevî ku PDK dengên zêde di vê herêmê de nagire jî weke hêzekî zextkar hebûna xwe didomîne, gel bi zetx, tirs û xêfê li gel xwe digire. Xeteriya şer, hebûna DA'ÎŞ'ê û lewaziyên hêzên pêşmergeyan, mudaxeleya gêrîla ji herêmê re, asta berxwedanî û tevlîbûna gêrîla ji van şeran re weha lêkir ku gel berê xwe bide Tevgera Apoyî. Lê ev eleqeya gel li beramberî gêrîla û tevgerê nehatiye birêxistinkirin. Di vê pêvajoyê de nebûna partiyeke sîyasî ya Başûr sedema esasî yê vê rastiyê ye. Ji ber qeyrana di herêmê de tê jiyankirin valatiyên mezin derketine holê. Vê qeyranê tevahî partiyên siyasî yên herêmê bê îtîbar kiriye,

baweriya gel li beramberî wan nemaye. Vê jî rê li ber xwe cîbicîkirina Îranê kiriye di herêmê de. Di her derfetê de Îran hewl dide ji vê valatiya siyasî sûd werbigire.

DÎ RİZGARÎ navçeya ser Kelarê Ve jî rewşeke mîna ya Kelar tê jiyîn. Lê çanda eşîretî di vê herêmê de hîn li pêş e. Dîsa welatparêzî, bi axê ve girêdan li pêştir e. Yek ji herêmên serekê yên ku “Enfal” lê hatiye pêkanîne. Çanda gund û gundîtiyê bi awayekî balkêş tê dîtin. Hema bêje 50 hezar nifûsa wê heye. Bi çandinî, xwedîkirina lawiran, baxçegeriyê, karkerî û kedkariyê debara jiyana xwe dikin. Tevî ku mesafeyeke zêde di navbera Kelar û Rizgarî de nîne jî ciwanên vê herêmê li beramberî mijarên netewî baldartir in. Asta wan a xwedî derketina li xalên netewî li pêştir e. Yek ji bajarêkên girêdayî Kelar jî Bawenûr e. Bawenûr di navbera Kelar û Silêmaniyê de cih digire. Lê zêde ji Kelar nedûr e. Cihekî biçûk e. Hema bêje mîna gundekî Bakurê Kurdistanê ye. Lê weke bajarok tê binavkirin. Cihekî biçûk e, biqas biçûkiya xwe jî ewqas girîngî ji aliyê pergalê ve jê re nayê dayîn. Bawenûr navê xwe ji qebra seyîdekî li wir hatiye veşartin digire. Li gorî hinek belgeyên kevn, ên dîrokî ev der cihê Kakayiyan bûye. Lê ji aliyê sûniyan ve Kakayî ji wê derê hatine derxistin û sûnî tê de hatibe bi cihkirin. Biqasî ku sûnî dixwazin bila vê rastiyê înkar bikin, lê dema ku tu naveroka navê bajêr lêkolîn dikî dikarî bi asanî bêjî cihê kakayiya ye. Ger despêka nivîsê bê bîra we me qala tebeqeyên di nav Kakayiyan de kiribû û me gotibû yek ji tebeqeya wan a herî jor “ Bawe” ye. Hemû peyvên bi bawe despêdikin ayîdî Kakayiya ne. Bawenûr, Baweşaswar û hwd. Eşkereye ku di dema belavbûna ola îslamê de Kakayî ji vê navçeyê hatine derxistin. Qebra seyîdê ku qala wî tê kirin jî him ji aliyê Kakayiyan ve, him jî ji aliyê sûniyan ve

tê parastin. Ez jî weke wan bêjim; “rastî ji aliyê xwedê ve tê zanîn û devjê berdim.”

Lİ KELAR û derdora Kelarê bi giştî tîcaret xwe dispêre tîcareta sînor, karmendiya petrolê û pîşesazî ye. Li gorî herêmên din mirovên vir dewlemendtir in. Biqasî hebûna bêkar û hejaran, kesên ku kar nakin û pere qezenc dikin jî zêde ne. Hejmareke zêde esnaf hene di herêmê de. Weke pîşeyekî rêjeya polis, pêşmerge û asayişê jî pir zêde ye. Di şerê dijberî DA’ÎŞ’ê de hejmara zêde ya şehîdan ji vê qadê ne. Hema bêje di rêza yekem de ye. Biqasî pêşmerge, polis û asayişê koçberiya ber bi Ewrûpa ve jî dîsa di vê qadê de zêde ye. Hejmara kesên di deryaya Îce de xeniqîn gelek zêde ne. Ji ber ku ciwan fêrî rehetiyê hatine kirin, girêdaniya wan a bi welat ve jî gelek lewaz e. Pêşmergetî, polîs û asayiş bûye hilbijardeya esasî ya bêkaran. Kesên ku derfetên wan ên tîcaretê hebe qet serî li van pîşeyan nadin. Lê ji bo hinekan jî di nav hêzên eskerî de cih girtin tê wateya bihêzbûnê li beramberî yê din. Pêşmergetî ji aliyekî ve jî bê ked bi destxistina derfetên jiyanê ye, ango pereya ye. Di gel van rastiyan de jî mijara ticatê jî di herêmê de tê dîtin. Hema bêje qet xwe bê bazirganî nahêlin.

**XANEQÎN:**

XANEQÎN; her çiqas di hinek xalan de xwedî heman taybetmendiyan be jî li gel Kelar; lê di gelek mijaran de jî ji hev tên guhertin. Hema bêje xwedî nifuseke 150.000 kesî ye. Bajarekî kevnar ê herêmê ye. Di sînorê Îranê de cih digire. Niçtecihên vî bajarî bi giranî ber bi mezhebê ve Şîa ne. Di gel Şîa’tiyê de him di nav Xanewîn de, him li derdora Xaneqîn nifûseke berbiçav a Kakayiyan jî tê de heye. Di nav bajêr de ava Elwend derbaz dibe.

Lê ji ber ku bendavên hatine avakirin xeteriyeke mezin li ser vê avê didin çêkirin, roj bi roj ber bi zûwabûnê ve diçe. Ya ku xweşikiyê ji vî bajarî re dibexşe ev av û zêdebûna darên xurman e. Araziyeke mezin di nav bajêr de ji baxçeyê xirmeyan re hatiye veqetandin. Di nav bajêr de hinek pir hene ku mirov nikare texmîn bike bê ka ji kîjan dîrokê ve hatine çêkirin. Lê ji her halê wan ve diyare ku temenê van piran û yê bajarê Xeneqîn yek e. Li gorî niçtecihên esasî yê vî bajarî gelê Kurd, Ereb, Şîa, Sûnî, Mesîhî hemûyan bi hev re di nav aramiyê de jiyan kiriye. Di dema niha de jî bûye bingehê nakokiyên esasî yê ev mijar. Di roja îro de hema bêje mesîhî tê de nemane. Ber bi warên cuda ve koç kirine. Tevî ku weke herêmên din pevçûnên mezhebî zêde ne li pêşin jî, Îran hewl dide sûd ji van çelîşkiyan bigire. Biqasî ji dest tê di vî bajarî de girîngî dide şîa mezheban. Ji aliyê fermiyetê ve ser bi eyaleta Dîyala ve ye. Ji aliyê civakî ve jî biqasî ku pêwendiyên xwe bi Îranê, hikumuta navendî re heye; ewqas bi herêmê re nîne. Pîştî hatina DA'ÎŞ'ê her çiqas ji aliyê hêzên Kurdî ve hatibe parastin jî, lê civaka vê derê pir zêde aligirê hikumeta herêmê nîne. Ev bajar jî yek ji bajarên ku di çarçoveya madeya 140 de tê destgirtine. Hejmara zêde ya niştecihan Kurd in. Kêm be jî Turkmen û Ereb hene. Hejmara Ereba piştî şerê dawî zêde bûbe jî, zêde çalak nînin. Erebên ku hatine vê herêmê mîna herêmên din di karên herî zahmet de tên xebitandin, lê bi pareyekî kêm. Yanî kedeke zêde, pereyekî kêm.

Dİ NAV Ereban de xala ku herî zêde ji min re balkêş hat ew e ku di karkirinê de qet ferq û cudabûnê nakin. Çi kar tê pêşiya wan û di vî karî de çiqas pere ji wan re bê dayîn nabêjin na. Di vê demê de tevahî şivanên Kurdan malbatên Ereb in. Yên di herêmê de

felahî yanî karkeriyê dikin dîsa ew in. Ji bo Kurdan di van karan de cih girtin mijara biçûkbûyînê ye.

XANEQÎN li gorî tevahî bajarên din civakîtir û vekirîtire. Asta rewşenbîrî tê de li pêş e. Hejmareke zêde nivîskarên vî bajarî hene. Helbestvanên xwe jî kêm nînin. Doktorên herî zîrek ê vê herêmê ne. Lê ev rewşenbîrî li gorî rastiyên bûrjûvaziya biçûk e. Rewşenbîriya bi vî rengî rê li ber welatparêziya rast jî digire. Herî zêde jî nesîbê xwe ji bîrdoziya lîberalîzmê girtiye. Di bin navê azadiya fikrî, qewmî, mezhebî de neketina nav pevçûnan xaleke gelek xweş e. Lê vê ne bi zanebûneke rast; berevajî li gorî bîrdoziya lîberalîzmê dipejirîne. Ji ber bê yekê di dema êrîşên DA'ÎŞ'ê de bi asanî devji axa xwe berdan. Girêdaniya bi axê ve gelek lewaz e.

Jİ ALİYÊ leşkerî ve yê serwer e ne pêşmergene, ne jî leşkerên Iraqê ne, Heşdê Şahbî ye. Heşdê Şahbî ji ber ku Şîa ne, hêzên Îranî û mezhebê Şîa jî di vê herêmê de li pêşe û hemû kes berê xwe dide wan. Li ser yek bangawaziya fermandarê Heşdê Şahbî du hezar kes bi asanî tevlî vî hêzî bûn. Di vê mijarê de xala yekemîn ne mezheb e. Di vê mijarê de xala bandorker maaşê ku ji wan re tê dayîne. Pêşmerge mehane 500 hezar dînarî digirin, kesên di nav vî hêzî de cih digirin mehane 1.200.000 dînarî digirin. Ji bo vê ye ku gelê herêmê ber bi vî hêzî ve bazdide.

Dİ NAVENDA Xaneqîn de Kakayî jî jiyan dikin. Lê piraniya xwe li gund û navçeyên dordorê dimînin. Kakayiyên li vir gelekî bi pergalê re ketine nav hev. Hema bêje mîna Elewiyên li Bakurê Kurdistanê. Kesên ku xwedî berjewendiyên xwe dispêrin pergalê û hebûna xwe didomînin. Hinek ji wan ser bi YNK'ê, hinek ser bi

PDK'ê hinek jî xwe dispêrin Heşdê Şahbî. Xwe sipartina Heşdê Şahbî jî bi parastina Hz. Elî ve girê didin. Di gelek mijaran de xwe ji hev cuda nabînin. Ji ber vê jî pir bi asanî dikarin bi wan re bikevin nav pêwendiyên civakî, aborî û siyasî. Li gorî Kakayî, ango Yarsanê Rojhilat ji aliyê civakî ve girtîne. Têkiliyên wan ên civakî sînordar in. Heta mirov dikare bêje ku xwedî gelek taybetmendiyên paşverû ne.

ZİMANÊ vî bajarî ne Kurdî, berevajî Erebî ye. Kurdên li vî bajarî dijîn zêde bi Kurdî nizanin. Zaravayê ku bikar tînin jî ne soranî ye. nêzîkî zaravayê ROjhilatê Kurdistanê ye. Bandora Erdalanî li ser zêde ye. Ya rast zimanê Kelhorî pir li pêş e. Ji ber ku nêzîkî Qesra Şêrîn e û bi Rojhilatê Kurdistanê re zêde di nav pêwendiyan de ye, zaravayê ku bikartînin jî zaravayê Kirmanşan e. Gelek gundên xwe hene û di van gundan de hema bêje yek rengiya olî serwer e. Gundên ku du mezheb bi hev re bijîn nayên dîtin. Yanî hemû Şîa ne, yan Kakayî û hwd ne.

Dİ GEL bandora Îranê de ji aliyê siyasî ve bandora YNK'ê jî tê dîtin. Ji aliyê hejmar ve her çiqas PDK bi bandor jî nebe ji aliyê maddî ve hebûna xwe diparêze. Lê di hemû hilbijartinên hikumeta navendî de partiyên Şîa dengên zêde ji vir digirin. Hema bêje bandora partiyên îslamî di vê qadê de qet nîne. Ji ber ku bajarekî li ser sînore, xwedî deriyên sînore bazirganî xala sereke ya dabînkirina pêwîstiyên jiynê jî bazirganiye. Baxçeyên fêkî, çandinî û xwedîkirina sewalan jî li pêş e. Lê xala esasî ya bazirganiyê bi tankêran kişandin û firotina petrole ye.

Dİ XANEQÎN de weke Tevger em pir zêde nayên naskirin. Asta xebatên me jî gelek lewaz e. Di demên borî de jî bi vî rengî bûye û

îro jî bi vî rengî didome. Tevî vê rastiyê jî dema ku bîrîmên saha navîn despêkê derbazî vî bajarî bûn ji ber ku Celewla di destê DA'ÎŞ'ê de bû û li ser Xaneqîn jî xeteriyeke mezin hebû bi germî em pêşwazî kirin. Kesên ku derfetên xwe yên madî hebûn çi ji destê wan hat bi me re bûn alîkar. Lê di wê demê de ev êdî ji bo Başûr li beramberî gêrîla bûbû nêzîkatiyeke ji rêzê. Gelê Başûr ê ku gunehê xwe nade ti partiyên siyasî bi hemû derfetên xwe dixwestin xizmeta gêrîla bikin. Lê ez dixwazim li vir qala nêzîkatiya jinekê bikim. Di wê demê de heval diçin malekê. Dema ku heval dixwazin ji malê derkevin jin gustîlka tiliya xwe ya zewacê ji destê xwe derdixe û dide hevalan. Heval naxwazin bigirin. Gustîlka zewaci di civakê de bi taybet ji bo jinê gelek xwedî wate ye. Ew dikeve aliyekê, heval dikevin aliyekê. Lê ew jin ji hevalan re dibêje: "Heval ne ku tiştekî min ê din nîne ku ez pêşkêşî we bikim. Lê tişta ku herî zêde li gel min bi nirx ev e ji bo wê didim we. Ger na ez dikarim li beramberî vê pereyan jî bidim we." Wê demê heval naçar dimînin ku jê bigirin. Dibe ku ev ji bo me bûyerek ji rêzê be. Lê li gorî rastiya Başûrê Kurdistanê ne bûyereke ji rêzê ye. Li Rojava yê Kurdistanê em fêrî vê çandi bûne. Lê ev çand cara yekeme ku li Başûrê Kurdistanê pêşdikeve. Xala girîng jî ev bixwe ye. Derbazbûna gêrîla ya herêmê ne tenê di baweriya gelan de, di çanda gelên vê herêmê de jî gûhertinên bingehîn da çêkirin. Gelek caran bêyî ku tu pê bihesî li derdora te gûhertin û vegûhertin diqewimin, tevî rastiya te, ya civakê, ya serdemê, ev jî yek ji van deman bû.

MENDELÎ yek ji navçeyên ser bi Xaneqîn e. Xwedî nifûseke 25.000 hezarî ye. Ereb, Kurd û Turkmen bi hev re dijîn. Lê ji dervî Kakayiyan hemû ser bi mezhebê Şîa ne. Navend hemû Şîa ne,

gundên derdorê jî Erebên Sûnî ne. Bi taybetî gundên Ereban ên ku ji navendê dûrin hemû aligirê DA'ÎŞ'ê ne, bi hemû awayî alikariyê didin DA'ÎŞ'ê. Ji hemû aliyan ve di bin bandora Îranê de ye. Hebûna YNK'ê sembolîk e. Hêzên serwer Heşdê Şahbî û artêşa Iraqê ne. Li gorî ku tê gotin nêzîkî 80 malbatên Kakayî li vir jî hene. Lê ew jî mîna yên li Xaneqîn dimînin heliyan e. Di vê navçeyê de zimanê jiyanê Erebî ye, di gel Erebî de Farisî jî tê bikaranîn. Di demên borî de hejmara Kakayiyan li gorî roja îro pir zêde bûne, lê niha kêm bûye. Piraniya wan ji Rojhilatê Kurdistanê hatine vê navçeyê.

NAVÇEYÊN Celewla û Sadiye ji ber ku ji aliyê DA'ÎŞ'ê ve hatibûn girtin niha vala ne. Piştî rizgarkirina van navçeyan heta niha tenê destûr dane Erebên Şîa derbazî navçeyê bibin. Celewla ji ber sedemên şer hema bêje wêran e. Niha çelîşkiya esasî ya vê derê herêm naxwaze van navçeyan bide Iraqê, Iraq jî naxwaze dev ji van navçeyan berde. Hevsengiya di navbera her du hêzan de ji aliyê Îranê ve tê ragirtin. Ger hêza Îranê nebe dê her du hêz li vir bi hevkevin û şerên dijwar di navbera wan de biqewime.

★

**JI XETA 36 ÇEND ŞER Û PEVÇÛN:**

EW DEMEK bû hêzên me yên leşkerî di herêmê de bicih bûbûn. Heta wê demê şerê di qewimî tenê di çarçoveya pozisyona parastinê de bû. Di pêvajoya yekem de xala girîng ew bû ku hêrîşên DA'ÎŞ'ê bên şikandin, hêzên herêmî yên ku ji DA'ÎŞ'ê çavtirs bûne cesareta şer bi wan re bê pêşxistinbû. Hêzekî mîna yê pêşmerge ku cara yekemîn piraniya wan tevlî şer dibûn û di tevahî şeran de şikestin xwaribûn fêrkirina şer, ango cesaretê şer bi wan dayîna avakirin ne asan bû. Ji bo vê hema bêje li kî eniyê şer derdiket hêzên me yên leşkerî naçarbûn di demeke kurt de xwe bigihînin wê derê. Ev yek ji karên esasî yê me bû, ya duwemîn jî derengmayîn dibû sedema ketina destê Da'ÎŞ'ê ya wê eniyê. Herdu îhtîmalan wiha lêdikir ku demekê zûtir hêzên me xwe bigihînin cihê bûyerê. Lê ji bo hêzekî çekdar û şerker her tim di pozisyona xwe parastinê de mayîn ne ji aliyê taktîk ve, ne jî ji aliyê derûniya hêzên di sengeran de li benda hêrîşa hêzên dijbere xaleke zêde baş nîne. Divê ji demekê zûtir ji bo ku tu derûniya hêza beramberî xwe têk bibî dest bi hêrîşan bikî. Ger na tu bandora te di şer de namîne û înîsîyatîfa şer jî nakeve destê te. Bi armanca bidestxistina însiyatîfa şer û ragihandina serdestiyê despêkirina operasyonê ji aliyê hevalan ve ket rojevê. Ew cihê ku ji bo operasyonê hatibû diyarkirin cihekî stratejîk bû. 20 xulek ji Kerkûkê dûr, li ser rêya navendî ya Bexda û Kerkûkê bû. Hema bêje ev rê di bin kontrola çeteyan de bû. Li aliyekî rê hêzên me û biryargeha me, li aliyê din ê rê hêzên çete û biryargeha wan. Gelek caran wan bi çekên giran li cihên me dida û hêzên me jî bi çekên

giran, ferdî û sûîkastê li wan dida. Demekê di navbera me û hêzên pêşmergan de di çalakî û operasyonan de di mijara daliqandina alayên HPG û YJA-Starê de nîqaş derketibûn. Wê şevê hevalan biryar dan ku em çend alayên xwe li ser sengeran daleqînîn. Jixwe ciwanên me weke ku li benda biryareke bi vî rengî bin di nav deh xulekan de bi dehan al daliqandin. Çend xulek di ser de derbaz bû, nayê biramin; lê ya ku tê bîramin tenê ew bû ku bi hewan, doçka û çekên din dest bi gulebaranê kirin. Cihê despêkê jî bû hedef mewziya hevalên jin bû. Me meydan ji pêşmerge û berpirsyarê wan re xwendibû, lê DA'ÎŞ'ê ji bo xwe fêmkiribû.

BELÊ! Operasyonek li ser van cihan êdî devjêneger bû. Bi vê armancê amadekariyên pêwîst hatin despêkirin, bi hêzên pêşmergeyan re hevbeş çalaki dê bihata lidarxistin. Ji dervî hêzên me yên Kerkûkê hejmarek heval ji hêzên Mexmûr jî bi armanca tevlîbûna operasyonê derbazî alanê bûn. Di hedefê de sê gund hebûn. Du gûnd aîdê pêşmergeyan, yek jî ayîdî hêzên me bû. Di demeke kurt de gundê ayîdî hevalan hat rizgarkirin û heval derbazî gundên aliyê pêşmergeyan bûn. Di vê çalakiyê de ji ber tevlîhevî û bê wêrekiya pêşmergeyan tenê du mewzî mabûn ku hersê gund bikevin ji naçarî biryara paşde kişandinê hat girtin. Ji pêşmergan hejmareke zêde şehit û birîndar hebûn. Hejmarek cenaze man di destê çeteyan de. Di gel vê de birîndarên wan jî man li cihê şer. Çend heval fedayiyane ketin nav cihê şer û pêşmergeyên birîndan ji nav çeteyan derxistin. Şer ji sibê heta piştî nîvro berdewam kir. Piştî paşdekêşanê fermandarê eniya şer hat gel hevalan û got: "Çend pêşmergeyên birîndar di nav cihên di bin kontrola çeteyan de mane, ji bo rizgarkirina wan em ji we alikariyê dixwazin." Tîmek heval hema ketin tevgerê û berbi cihê ku pêşmerge lê mabûn ve

çûn. Piştî demekê heval pêşmergeyên birîndan anîn û hatin. Di despêka nivîsê de jî min gotibû ku Hevalê Merwan di operasyona Wehdê de şehit bû.

BÊ GÛMAN em ne li benda encamekî bi vî rengî bûn. Lê ger hûn rastiyê bixwazin ev çalakî bû bingehekî gelek mezin ji bo wergirtina tecrûbeyan. Ya rast bi pêşmergeyan re ketina şer, pêşxistina operasyon û çalakiyan ji şerê dijberî DA'ÎŞ'ê gelek zahmetir bû. Hezekî mîna yê gêrîla profesyonel, di gel vê de jî hêzekî di jiyana xwe de qet şer nedîtiye; em dev jê berdin şer nedîtiye çeka ku di dest de ye jî di jiyana xwe de bikarnaniye. Piştî tevlîhevî û genfgeşiyên vê çalakiyê di gel operasyonên hevbeş de, hêzên me biryara çalakiyên serbixwe jî girtin. Yek ji van çalakiyan jî ya Banşax bû.

ETŞANE, Uzêriye, Gomata û Banşax; çar navendên esasî yên çeteyan bû. Gomata cihê koordîneya wan a şerê Başûrê Kerkûkê bû. Çend caran hevalan xwestin operasyoneke hevbeş li ser van herêman bidin pêşxistin lê wan qebûl nedikir. Ji aliyekî ve mewzîlenma çeteyan di vir de gelek baş bû, ji aliyê din ve jî navenda bazirganiya hinek perpirsyarên PDK'ê û YNK'ê bû. Fermandarên şer ên ku rojane li beramberî çeteyan windahî didan, ji aliyekî ve jî ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî pewendiyên xwe yên bazirganî jî bi çeteyan re didomandin. Rizgarkirina van alanan dihat wateya ji holê rabûna berjewendiyên wan. Di her derfetê de digotin: "Agahiyên rojane ji wan deran ji me re tên, cih û mewziyên wan li vir gelek saxlem in. Hêzên bêgane hemû di van cihan de tên girtin. Em ê windahiyên zêde bidin" û hwd. Lê ne tenê me, hemû gel û pêşmergeyan jî dizanîn

sedema esasî ya despênekirina operasyonê çiye. Yan operasyon despênedikirin, yan jî dema biryar dihat girtin mîna dawulciyên remezanê xelkê radikin ji bo rojî girtinê dîrok, dem û cihê operasyonê radigihandin. Êdî di nav xwe de me henek dikir û digot: “Ne tenê zindî, mirî jî bi vê operasyonê hesiyan. Niha miriyên çeteyan bîlgiyên operasyonê ji wan re gotine.” Ger hûn rastiyê bixwazin heta ku operasyon dihat despêkirin gelek kes dimirin. Ne tenê gelê Kerkûkê û derdora Kerkûkê dizanî dê operasyon despêbike, miriyên bin erdê jî haya wan jê çêdibû.

HIM Jİ bo rê girtin li bazirganiya navbera fermandarên pêşmergeyan û him jî ji bo ji holê rakirina tirs û xofa DA’ÎŞ’ê amadekariyên encamdana çalakiyekê li ser van herêman hat despêkirin. Li gorî rêbaza şerê gêrîla çend grub ji êvar de di deştê de hatin bicihkirin. Nikarim bêjim di arazî de naçarim bêjim deşt ji ber ku ji dervî keviyê hawizên masiyan û cihokên avê cihekî tu xwe di berde, nav de veşêrî nîne. Li gorî çavdêriyên demeke dirêj û keşfa çend rojan her şev piştî demekê derdiketin arazî. Lê saetên wan ên derketinê her şev dihat guhertin. Heval ji êvar de heta sibê li benda wan man. Tirk dibêjin ya; tesadüfün bu kadari fazla” heta sibê yek kes jî çiye ji cihê xwe mewziyên xwe derneketin. Êdî hewa vebûye, deşte, grup nikarin başve bikişin. Naçarin heta êvarê di cihê xwe de bimînin. Bê gûman ev rewşeke gelek xeter bû. Heta piştî nîvro hemû grûp di cihê xwe de bi erdê ve zeliqî man. Derdora saet sê, sê û niv mîna keriyê pez derketin araziyê. Lê haya wan ji xeteriya li benda wan bû nebû. Bi dilekî rehet, bi aramî mîna ku forsa xwe bavêjin derketin araziyê. Gruba despêkê ket nav hevalan. Ji sê aliyan ve hevalan gule li wan barandin. Gruba despêkê hemû îmha bûn, taqwiyeya ku hat, ket hedefa gruba din,

ew jî li nav çûn. Koordîneyê şer ê bi navbang ê Gomata ket dewrê û weke taqwiye cîgirê xwe şand. Cigirê wî jî birîndar bû. Di cihazê de tekmîla xwe da û digot: "**Ez nikarim pêş de biçim.**" Koordinê şer bi dengekî aram û ji xwe bawer jê re digot: "**tekbîr bikişîne û bi ser wan de biçe, xwedê li pişta me ye.**" Yê ku birîndar bûbû bi aciziyeke mezin: **"Ger baweriya te heye dê tekbîr kişandin tê rizgar bikî çima tu bi xwe nayê?"** Di encam de koordîna vê alanê jî di nav de hejmareke zêde çete hatin kuştin û heval bi awayekî serkeftî başve kişiyan. Lê divê ez heqê zilaman nexwim. Bi rastî jî ew mijara wan a kişandina tekbîrê ji bo me dibû girtina tedbîran. Beriya ku bigihêjin cihê hedefê, yanî dema diketin saldiriyê hîn ji dûr ve çawa ku em bi **"BIJÎ SEROK APO"** despêdikin, wan jî bi "Allahû Ekber" despê dikir. Wan digot: "**Tekbîr**" Yê me digotin: "**Tedbîr**" Her tim ev gotin di nav pevçûnê de bû. Yanî yên şer dikirin ne tenê hêz bûn, bi hêzan re girêdayî gotin jî bûn. Jixwe nîvê serkeftinan di şeran de serdestiya deruniye, kîjan hêz di vê mijarê de serwer be dikare serkeftinê jî bi dest xwe bixe. Lê li beramberî çand û kevnaşopa bexwedan, vejîn û egîdiya bê hempa ya Tevgera Apo'yî negengaz e ku ti hêzên din bikaribin serbikevin û şansê wan ê serkeftinê hebe. Ji ber ku ev çand û kevneşop xwe dispêre ezbûn û berhemendiyên 40 salî. Ezmûnên 40 salî li pişta vê têkoşînê ye. Dema ku hêza fedayî û egîdiya salan xwe dispêrin bîrdoziya rizgariya netewî negengaz e ku tu hêz bikaribe li beramberî vê rastiyê xwe rabigire. Gelekî ku bi hemû awayî qirkirin, linavbirin û tasfiye li ser tê ferzkirin naçare ku pergaleke xwe ya parastinê pêş bixe. Eşkereye ku di vê pergalê de jî xala sereke di gel lehengî û egîdiyê de berxwedan e. Ger têkoşîn û berxwedan di zikhev de neyê meşandin negengaz e ku tu qala serkeftinê bikî.

★

## ASÊMAYÎNA Dİ NAVBERA KEVNEŞOP Û NİRXAN DE:

WEKE gêrîla demeke dirêj di qadên çiya de mayîn di be sedem ku tu ji gelek taybetmendî, çand û kevneşopên civakê dûr bikevî. Ev jî bi xwe re gelek zahmetiyan tîne. Lê piştî ku tu daket nav civakê naçarî hemû xalan li ber çav bigirî û wiha tevbigerî. Yan tê van xalan li berçav bigirî û li gorî wê tevbigerî, yan jî tê bibî sedema hinek nîqaşên ne di cih de di derbarê tevgerê de. Hema bêje di vê mijarê de her kesî ya ku ji dest dihat dikir. Di van mijaran de rojene hişyarî dihatinkirin. Hestyariyeke zêde di vê mijarê de derketibû holê. Di vê navberê de operasyona Celewla ket rojevê. Yek ji tabûrên me jî dê tevlî vê operasyonê bibana. Roja despêkirina operasyonê gruba yekemîn ku ket nav bajarê Celewla heval bûn. Bi ketina nav bajêr re alaya DA'ÎŞ'ê ya ku li ser trafoyê eletirîkê ber bi bayê ve diket ji dûr ve diyar bû. Hevaleke jin ku bi temen 18 salî bû. Ber bi alê ve bazdide û tevî tirsa xwe ya bilindiyê hilkişiya ser trafo. Gişt serê direk û ala çeteyan anî xwarê, li cihê wê ala HPG'ê daleqan. Hemû heval li bendê ne ku ala çeteyan bavêje xwarê, lê navêt. Ji aliyekî ve li alê dinêre, ji aliyê din ve li derdora xwe dinêre, êdî nema zane çi ji wê alê bike. Di nava aloziya avêtin û ne avêtinê de ji ser torafê tê xwar. Hevala kameraman jî li bendê ye ku ew wê alê ji wê bilindahiyê bavêje erdê, ew jî dîmenekî xweş bigire û biweşîne. Dema ku digihêje erdê hevala kameraman jê dipirse:

-TE ÇİMA ew al ji wê bilindahiyê ve navêt erdê da ku ez dîmenekî xweş ji bo çapemeniyê bigirim. Wê zewqê bi temaşevanan bidim jiyankirin.?

-HEVAL ez gelekî pê fikirim. Ez bavêjim yan na. Ji aliyekî ve min pir dixwest ez wê alê bavêjim, ji aliyê din ve jî ji ber ku nivîsa “Allahû Ekber” li ser hebû min nekarî ez bavêjim.

-ÇAWA yanî te tenê ji ber vê nivîsê wiha kir, ma dayika te, bavê te şêx e.?

-NA HEVAL, ma her roj heval me hişyar nakin, nabêjin rastî û hesasiyetên civakê li ber çav bigirin. Ez jî fikirim min got ji ber ku baweriya gelê me bi navê xwedê heye, ez bavêjim dibe ku bertek li beramberî rêxistinê derkeve ji bo wê min navêt erdê.

26-11-2014’an roja ku heval ji Celewla ber bi Kerkûkê ve dihatin ji aliyê çeteyan ve hêrîşek li ser Telelwedr hat pêşxistin. Di vê hêrîşê de tabûra pêşmergeyan şikest. Hejmareke zêde di xewde hatin girtin. Ji aliyê çeteyan ve serê pêşmergeyan hat jêkirin, hinek ji wan jî dîl ketin destê çeteyan. Bi wateya gotinê komkujiyek di vê êrîşê de pêk hat. Hêzên ku tevlî operasyona rigarkirina Celewla bibûn bêy ku bigihêjin cihê xwe berê xwe dan cihê bûyerê. Heta ku heval gîştin wê derê hema bêje esir bûn. Tevahî fermandarên wê eniyê û taqwiyeyê ku hatibû, li dijî terörê jî di nav de di civînê de bûn. Nîqaşa “em êrîş bikin, an nekin” dimeşandin. Piştî giştina hevalan fermandarê gêrîla yê eniya Kerkûkê jî tevlî civînê bû. Hevalên din jî di mewziyan de bûn. Lê civîn dirêj dikir, encam ji civînê dernediket. 16 hevalên ku li benda biryarê bûn êdî ji seknandinê aciz bûbûn. Tevî ku bi rihê serkeftina salvegera damezrandina PKK’ê tevlî operasyona Celewla bûbûn dixwestin bi heman rihî vê çalakiyê jî lidar bixin. Her ku dem derbaz dibû sebra gêrîla kêm dibû. Dema ku hêviyê wan ji civînê û biryara civînê qut bû. Di nav xwe de biryara êrîşkirina ser çeteyan dan. Di nav 5

xulekan de dest bi êrîşê kirin. Fermandarî di odeya operasyonê de bê biryar bûn, lê gêrîla biryara êrîşê dabû û dest bi êrîşê kiribûn. Cihê ku di nav 20 xulekan de çeteyan ji destê pêşmergeyan girtibû gêrîlayan bi biryareke di cih de di nîv saetan de ji destê çeteyan rizgar kiribû. Bi teqîna fîşekan re fermandarên ku di şokê de mabûn û wiha texmîn dikirin ku çeteyan dest bi êrîşa duwem kiriye çalakiya gêrîlayan bû li ser çeteyan. Şeva 27'ê Mijdarê bû. Fermandarê gêrîla yên ku di civînê de bûn dema ku fêm kirin hevalan êrîş daye despêkirin bêyî ku pê bifikirin divê koordîna şer bikin, li cihê pêwîst bimînin beriya hevalên din ketibûn nav grûba êrîşê. Di nav niv saetê de ew cihên ku ketibûn destê çeteyan hemû hatibûn rizgarkirin, di destê gêrîla de bûn. Hinek pêşmerge û endamên yekîneya dijî terorê piştî ku dîtin hevalan dest bi êrîşê kiriye ew jî ketin nav çalakiyê. Bêyî ku ferman bigirin. Di rewşên asayî de çi hêzên pêşmerge, çi hêzên taybet heta ku ferman ji wan re neyê fîşekekê nateqînin, lê wê şevê wan jî dev ji fermana berdabû û dixwestin bibin şirîkê wê serkeftinê. Bê windahî çalakî serkeftî derbaz bûbû.

ROJA PİŞTÎ çalakiyê civîna çalakiyê hat lidarxistin. Bi awayekî xwezayî tevahî hevalên tevlî çalakiyê bûne di nav nirxandinên xwe de ketina êrîşê ya fermandarên xwe rexne kirin û helwestên xwe diyar kirin. Ji dervî rexnedayînê tu derfetekî din nehiştin di destê fermandarên xwe de. Yek ji fermandarên ku tevlî êrîşê bûbû rabû ser xwe û xwest rexnedayîna xwe bide.

-Bİ RASTÎ JÎ rexneyên hevalan di cihê xwe de ne. Nedibû em wiha tevbigeriyana. Pêwîst bû weke hevalan jî got me şer koordine bikira. Lê heval jî dizanin roja 27'ê Mijdarê bû, ger em di vê rojê de

li gorî rihê PKK'ê û Tevgera APO'yî tevnegerin em ê kengî tevbigerin. Divê heval jî vê rastiyê fêm bikin. Heval çima hûn tenê min rexne dikin, ma fermandarê eniya Kerkûkê jî ket êrîşê çima hûn wî rexne nakin, tenê min rexne dikin."

-HEVAL tu rexnedayîna xwe didî yan berê rexne û êrîşên hevalan ji ser xwe radikî û berê wan didî min.

ÊDÎ Jİ wê kêliyê û pê ve ji xwe ji bilî rexnekirina wan hevalan û helwest girtina li beramberî wan tiştekî din ya bihata kirin nemabû. Di civînê de têra xwe rexneyên xwe xwarin. Her çiqas li gorî rastiyên me yê şer ev rewşeke ne rast be jî, di wê kêliyê de diviyabû ya bihata kirin ew bû. Ger di cihekî de tu nikarî ji aliyê teorik ve hêza beramberî xwe razî bikî û bixî tevgerê divê tu bi pratîka xwe vê bi wan bidî fêmkirin. Ya ku hat kirin jî ji aliyê wan hevalan ve ev bû.

ŞEVA 30- 02- 2015'an bû. Ji her çar aliyên Kerkûkê ve agahiyên amadekariyên çeteyan a êrîşê dihat. Êdî weha lêhatibû ku te nedizanî kîjan agahi raste, kîjan nerast e. Lê rastiyek hebû wê şevê ew jî Tevgera çeteyan a zêde bû. Li herçar aliyên bajarê Kerkûkê Tevgera wan dihat dîtin. Wê kengî êrîşî kî derê bikin nediyar bû. Heta derengê şevê ji bilî Tevgera wan a zêde tiştekî din di holê de nebû. Di hemû eniyan de rewşa înzar- întîşar- ê dihat jiyankirin. Li hinek cepheyan ew demek bû di cihên navbera wan û pêşmergeyan de calên mezin dikolan, naylon di wan calan de bi cih dikirin û ew çal tijî dikirin. Çawa ku di jiyana gêrîla de berê ji bo amadekariyên operasyonê me erd dikola, naylon tê de bicih dikir û tijî av dikir wan jî bi heman şêwazê ew cal dadigirtin. Lê kesî ji me nedizanî be ka ew tiştên ku di wan çalan de tên bicihkirin çine. Li

gorî xwe me texmîn dikirin. Hineka ji me digot av e. Hinekan digot mîna xendekan e. Hinekan digot tedbîrîn ji bo ku êrîş li ser wan neyê kirin, yanî xetin. Lê wê şevê demjimêr 8'ê êvarê û şûnde dema ku agir bi wan çalan xistin me hemûyan fêmkir ku petrola xam xistine wan çalan. Ji bo ku bikaribin êrîş bikin, bandora firokên keşfê û yê cengê kêm bikin agir bi wan çalan xistine. Ji ber ku petrola xam dema ku agir pêdikeve dûmaneke reş jê bilind dibe, mesafeya dîtinê kêm dike. Bi rastî jî taktîkekî gelek balkêş bû ji bo êrîşê. Ji aliyekî ve her der mîna qada newrozê lê hatibû, ji aliyê din ve jî ji ber dûmana zêde ti der nedihat dîtin. Êdî çiqas perol di wan çalan de bicih kiribûn heta ber destê sibehê jî ew agir her pêkatîbû. Heta saet dudiyê şevê ji ti alî ve êrîş nekirin. Lê piştî saet dudiyê şevê ji herçar aliyan ve agahiyên despêkirina pevçûnan hat. Hemû hêzê me li gorî şer di sengeran de bûn. Heta ber destê sibehê di hemû eniyan de şer bi xestî domî. Ne tenê li herçar aliyên Kerkûkê êdî şeş endamên întîharî ketibûn nav Kerkûkê û di nav bajêr de jî şer despêkiribû. Yekî ji van di navenda polîsan de xwe teqand, êdin jî li ser binaya herî mezin a navenda Kerkûkê bicih bûbûn û bi çeka karnasê suikast dikirin. Yên nav bajêr hemû bi armanca çalakiyên întîharî ketibûn bajêr. Di noxteya herî stratejîk de pêşmergeyan şikestin xwar. Ketina wî cepheyi dihat wateya ketina Kerkûkê. Hejmarek heval taqwiye çûn wî cepheyî. Heta ku heval çûn wê derê hejmarek pêşmerge şehîd bûbûn, hejmarek dîl ketibûn, yên mayî jî mîna edetê caran revî bûn. Heval çawa ku giştin cihê bûyerê yekser ketin êrîşê. Ji pêşmerga dixwazin li pişt wan bimînin û wan biparêzin. Lê piştî demeke kurt hevalên ku çûbûn man di nav dorpêça çeteyan de. Heval di cihekî wiha de hatibûn dorpêçkirin ku derketina wan hema bêje negengaz bû. Dema ku hevalê Armanc bihîst heval

ketine çemberê bi çend hevalan ve berê xwe da cihên ku heval tê de mane.

Dİ HERÇAR aliyên Kerkûkê û nav bajarê Kerkûkê de şer bi dijwariya xwe didomî. Lê şerê herî mezin yê wê rojê di nav dil û mêjiyê Hevalê Armanc de dihat jiyîn. Ji aliyekî ve hevalên wî di dorpêça çeteyan de bû, ji aliyê din ve jî bajarê ku parastina wî rasestî gêrîla hetibûkirin, gel ji bilî gêrîla baweriya xwe bi tu hêzî nedidanî ji bo parastinê di xeteriyê de bû. Ketina Kerkûkê dihat wateya binketina tevgerê, dibû malê gêrîla. Em dev ji vî berdin. bedala vê gelek zahmet bû. Bi vî hest û zanistiyê ve hevalê Armanc berê xwe da cihê bûyerê. Dema ku heval giştin cihê bûyerê hevalên din gelek pêş de çûbûn, biqasî ku ew pêş de çûbûn ewqas jî çete ji aliyê piştê ve li wan zivirîbûn. Lê haya hevalan ji pişta wan nebû. Wan dizanî pêşmerge li pişt wan mane. Dema ku gruba taqwiyê li pişt hevalan ketin şer nû ferq kirin ku ew di orta çeteyan de ne. Wê şevê 8 demjimêran şer berdewan kir. Êdî hewa ronî bûbû û çete ji naçarî paşde dikişiyan. Di wê demê de heval Armanc û du hevalên din ketibûn nav çeteyan û sîng bi sîng şer dikirin. Hevalê Armanc û hevala Peyman bi karnasê ji serê xwe de birîndar bûn. Hevalên din ê ku li gel wan yekser ew xistin nav erevê û ber bi bajêr ve birê ket. Lê di nav erebeyê de jî ji hemû aliyan ve gule li wan dihat reşandin. Erebeya ku heval tê de bûn hema bêje cihê ku fişek lê neketibe nemabû. Heta cihekî erebeya bê tekel ji aliyê hevalê şofêr ve hat derxistin ber bi teqînê ve bû. Hevalê şofêr tevî ku ji du cihan ve birîndar bû herdu hevalan ji erebê derdixe û wan ji erebê dûr dixe. Di vê navberê de agir bi erebê dikeve. Pêşmerge û ji gel hinek kesên nêzîkî wê derê dibînin û ber bi wan ve diçin. Dema ku dizanin hevalên birîndar hene yekser ber bi heval ve

diçin û hevalên birîndar digihînin nexweşxanê. Heta ku heval digihêjin nexweşxanê hejmarek zêde gel agahiya birîndarbûna hevalan digirin. Kî dibihîze berê xwe didin nexweşxanê. Jin, zilam, ciwan, kal, pîr her kes li ber deriyê nexweşxanê kom dibin. Bi sedan ciwan wê rojê diçin xwîn didin. Bi sedan dayik diçin ji bo li gel hevalan weke refaqatçî bimînin. Dayikên bi temen ên ku baweriya wan bi hinek tiştan heye, ava ku ji hecê anîne dibin bi wê avê dest, rû û linge hevalan dişon. Bi dehan ciwan bi çekên xwe li berderiyê nexweşxanê disekinin. Ji bo ku ewlekariya hevalan bigirin. Êdî îzdîhameke wiha li nexweşxanê çêdibe mudîrê nexweşxanê ji hevalan rica dike da ku wî gelî ji wir dûr bixin.

Jİ BER KU herdu hevalan jî di serê xwe de fîşek xwaribûn hêviya doktoran nebû ku bijîn. Lê tevî vê rastiyê jî me dixwest em hemû derfetan bikarbînin da ku em hevalan derbazî cihekî baştir bikin. Lê yek doktorî jî guncaw nedidît em wan ji cihê wan derxin. Piştî du roja rewşa hevala Peyman li gorî ya hevalê Armanc baştir bû, bi ambûlanseke taybet derbazî Silêmanî hat kirin. Piştî berxwedaneke şeş rojan 6 meha 2, saet du kêm şeşê şevê hevalê Armanc li nexweşxaneya Cumhûra ya Kerkûkê xatirê xwe ji me xwest.

ŞERÊ KU wê şevê despêkir heta piştî nîvro li hinek herêman bi dawî bûn, lê hîn li hinek herêman bi dijwarî berdewam dikir. Ji ber ku hedefa çeteyan wê şevê girtina bajarê Kekûkê bû. Li ser sîta xwe ya înternetê dabûn diyarkirin ku dê ji wê şevê û şûnde Kerkûk di destê wan de be. Di encama şerekî dijwar, egîdî û fedakariya canfedayên gel, çete negiştin vê armanca xwe. Kerkûk û derdora Kerkûkê piştî şerekî dijwar û xeternak ji nişkê ve disa giştibû

aramiya xwe ya berê. Jiyan ji cihê ku mayî di nav herikbariya xwe de didomî. Kerkûk ji xeteriyê, heval ji dorpêçê serkeftî derketibûn. Jiyan di herîkî, rêwîtiya xwe didomand. Lê rêwîtiya hevalê Armanc ji Kerkûkê ber bi Qendîlê ve despêkiribû. Hatina wî ya Kerkûkê nihînî û bêdeng bû, lê derketina wî bicoş, tilîlî, çepik lêdan û sloganan bû. Di nav sloganan, çepik, tilîlî û gulbarînê de bêrê xwe dabû cih û warên aramiya jiyana xwe. Şeşê mehê roja înê demjimêr 2 nîvro ji nexweşxaneya azadî, li ser milê hezaran di gel dayik û bavê xwe de berê xwe dabû warê evîna xwe.

DI DEMA derbazkirina cenaze de em di kîjan bajarî re derbaz bûn gel bi girseyî konvoya cenaze pêşwazî dikir. Bi jin, zarok, kal, pîr, polis, asayiş û hwd di amadebaşiyê de bûn. Mîna ku rêxistineke taybet hatibe pêkanîn gel rijîbû ser caddeyan û pêşwazî li Hevalê Armanc dikirin. Piranî kesên ku hatibûn ser cadeyan çepikek gul di destê wan de bû û dema ku ambûlans di wê derê re derbaz dibû te digot qey ji asmanan ve gul dibarin. Yên ku gul dibarandin, yên tîlîlî lêdidan, yên ku soza tolgirtinê bilind dikirin û yên ku jidil di derbarê gêrîla de slogan davêtin tevlîhev dibûn. Mîna senfoniya ku ji aliyê şefekî taybet ve tê organîzekirin lê hatibû.

★

## KURTE JIYANA DU CANGORIYÊN KERKÛKÊ:

### Hevalê Armanc:

HEVALÊ Armanc yek ji wan hevalan bû ku beriya hêzên me yên leşkerî bi fermî derbazî Kerkûkê bibe li gel çend hevalên din bi cilên sîvîl derbaz bûbû. Dema ku YNK di şer de gelek tengav bû ji rêxistinê xwest ku ji bo moralê pêşmergeyan bilind bibe û bikaribin li ber xwe bidin ji bo her tabûreke wan tenê çend hevalan bişînin. Li gorî vê grûpek heval hatibû şandin. Berpirsyarê vê grûbê jî hevalê Armanc bû. Yanî çûyîna wî di nav nihînî, nepenî û bêdengiyekê de bû, berevajî derketina wî ji Kerkûkê. Ji bo vê yekê despêka derbaz dibin yek ji wan hevalên ku hema bêje li nav tevahî tabûrên pêşmergeyan digere û tê naskirin heval Armanc bû. Him dihat naskirin, him dihat hezkirin. Yek ji gêrîlayên ku despêkê çûbû hawara wan û beriya hemû kesî bi wan re tevlî şer bûbû. Di hinek xalan de jî ew parastibûn.

Dİ DESPÊKA çûyîna xwe de dema ku dibîne pêşmerge nizanin şer bikin li gorî derfetan hema dest bi perwerdeya wan dike. Pratîkî, bêyî ku bixe çarçoveyeke fermî vê di meriyetê de pêk tîne. Piştre gelek pêşmergeyan digot: “Heval em bi xêra hevalan fêrbûn xwe çawa biparêzin, kemîn bavêjin û hwd. Di demên despêka çûyînê de li eniyekê çete bê xwet êrîş dikin. Di despêka êrîşê de heval yekser xwe davêjin nav senger û mewziyan. Pêşmergeyên ku vê dibînin dibêjin: **“Me wisa dizanî gêrîlayên PKK’ê netirs û bi cesaretin. Hûn li beramberî fîşekekê jî xwe davêjin erdê.”** Hemû pêşmerge radibin ser piyan û serê xwe ji mewziyan derdixin. Ew

çawa serê xwe derdixin çete jî bi sûîqastê çendeka ji wan dixin erdê. Wê demê fêmdikin ku divê di şer de refleksa mirov a despêkê bê ka çibe. Bêgûman hevalê Armanc piştre semînereke xweş dide wan û fêm dike ku divê ev bên perwerdekirin.



**Ş. ARMANC KURD**

Nasnavê min: Armanc Kurd e.

Navê min ê malê Talîb Mahmûdî ye.

Navê bavê min Cafer e .

Navê dayika min Behiye ye.

Di sala 1990’î de li bajarê Merîwanê ji dayik bûme.

**Hevalê Armanc:** Êrîşeke bi giştî li ser Rojhilata Navîn bi taybetî jî li ser Kurdistanê heye. Ev jî bi xwe re rê li ber kaosekê vedike. Beriya niha şerekî dijwar li Rojavayê Kurdistanê despêkir û niha jî didome. Di bin navê çetêyên DA’ÎŞ de ev şer ber bi herêmên Başûr ve jî hat veguhstin. Piştî ku pêşmerge ji Şengalê vekişiyan, Kekrûk, Maxmûr û Hewlêr ket nav xeteriyê weke hêzê HPG destwerdenake me pêş ket. Ev destwerdan di cihê xwe de bû gûncaw bû. Tangaviyên ku ji aliyê hêzên pêşmergeyan û artêşa Iraqê ve dihat jiyankirin bi destwerdaneke wiha gengaz bû. Him ji bo parastina van herêman, destkef û derfetên ji aliyê gelê me ve hatiye afirandin, him jî weke xwedî derketin li erkên xwe yê parastina gelê me yê herçar parçeyan em derbazî herêmê bûn. Ne tenê çeteyên DA’ÎŞ’ê her hêzekî din jî ger xeterî li ser Kerkûkê û gelê herêmê biafirîne em ê dijberî wan rawestin. Bi hemû hêza xwe. Em ê bibin bersivderê gelê xwe.

PİŞTÎ hatinê weke gêrîla û hêza pêşmerge mil bi milê hev di sengeran de şerkirin ruhekî baş bi mirov dibexşîne. Ne weke hêzekî hizbî, hêzekî netewî tevgerîn gelek girîng e di vê qonaxê de. Em dizanin di dîrokê de tenê hêzê yekgirtî tevgeriya ye Medan bûne. Piştî wê di encama polîtîkayên hêzên serdest de hêzên Kurd parçe parçe bûye. Hêzekî piştgiriya xwe ji gel bigire nebûye. Her hêzek ji aliyekî ve, li gorî taybetmendiyên xwe şer kiriye. Ji bo wê jî di hemû Kurdistanê de bandorker nebûye. Her tim belave bûye. Weke din jî di roja îro de mîna gêrîla û pêşmerge hatine gel hev, parastina derfetên gel dilxweşî û serbilindiyê ye ji bo me û gelê

me. Ger bi vî ruhî hêzekî parastina Kurdistanê bê avakirin dê xwedî wateyeke dîrokî be. Di roja îro de ev derfet derketiye holê. Di pêşerojê de dikare xizmeta netewî bike, hestên netewî pêş bixe di nav civakê de. Em dikarin bêjin ya girîng ne parastina berjewendiyên hizbî, yên nîştîmanî ne. Weke gêrîlayekî parastina vê civakê daxwaziya min ji gelê me ev e ku di vê dema awarte de li kî derê dibin bila bibin pêwendiyên xwe bi refên gêrîla re çêbikin û beşdarî vê pêvajoya dîrokî bibin. Jiyaneke bi rûmet û şeref jiyan bikin, ne ku bibin nûkerê pergalên serdest. Bi taybet divê ciwanên me vê erkê pêk bînin.

EM WEKE hêzên HPG amadene ji bo parastina Kerkûkê, gelanê Kerkûkê û tevahî derfetên gelê xwe hemû hêza xwe bikarbînin. Heta serkeftinê rawestan nîne ji bo me. Em vê garantiyê didin hemû gelê xwe yê Başûr ê Kurdisanê.

★



**Ş. MERWAN GEZGOR**:

-Nasnavê min Merwan Gezgure.

-Navê min ê malê Muslum Kaçim e.

-Navê dayika min Xetîce ye.

-Navê bavê min Mukeyîf e.

Dİ SALA 1983 li navçeya Riha Pirsûsê gundê Misircê hatime dinya yê. Di dawiya 2006, despêka 2007 li herêma heftanîn tevlî nav refên gêrîla bûm. Piştî perwerdeya serekî demeke pir kurt li Zapê mam û derbazî Zagrosê bûm. 2008-2009 li Kelareşê mam. Piştî wê derbazî Zapê bûm. Di wê pêvajoyê de têkoşîn li Bakurê Kurdistanê, Rojava û Başûrê Kurdistanê li pêş e. Lê weke PKK'ê armanca me ya esasî yek-kirina têkoşîna herçar parçeyên Kurdistanê bû. Di vê pêvajoyê de tevgerek bi navê DA'ÎŞ'ê li Rojava û Başurê Kurdistanê derket holê. Weke tê zanîn em ne hêzekî dagirkerin, hêzekî netewî ne. Gêrîla bi hêzên herêmî re mil dane mile hev û bi hev re dij bi vî hêzî dest bi têkoşînê kirin. Weke hêza gêrîla em ji bo parastina hemû destkeftên gelê xwe amade ne. Em weke şervanên Rêber APO bi hêviya yekgirtina herçar parçeyan şer dikin. Ji bo vê jî me heta niha 25 hezar şehîd dane. Yek ji van hevalan li gorî berjewendiyên malbatî, eşîretî û hwd tevnegeriya ne. Li ser vî esasî ji heft salî heta heftê salî xwe berpirsyar dîtin ji bo binxistina vî hêza hov. Weke endamekî Tevgera azadiyê û zarokekî vî gelî ez jî ji bo vê berpirsyariya xwe li beramberî gelê xwe pêk bînim li vir, li Kerkûkê amade me.

Çend gotinek beriya çûyîna çalakiyê:

Heval! Ev kîja TV'ye. Belkî em bi rêya we silav bişînin ji hevalên xwe re.

-Gêrîla TV ye.

Hevalê Merwan: Temam wê demê ez ji gêrîla TV re silavê xwe dişinim.

-Em dikarin çend gotinên we di derbarê vî şerî de bigirin?

**Hevalê Merwan:** Weke ku hûn jî dizanin ji şerê 2003'an û vir ve di van herêman de şerekî rojane yê ku kes nizane ji aliyê kê ve tê maşandin di meriyetê de ye. Îro ev şer giştiye zirweyê. Hêzek di bin navê mezhebê Sûnnî de bi navê DA'ÎŞ'ê derket. Armanca vî hêzî ji holê rakirina mirasa gelan e. Yek ji wan cihên ku di nav bernameya wan de ye jî bajarê Kerkûkê ye. Başarê Kerkûkê mirasa gelan e, ne yê ti hizba ye. Çawa ku di dema xwe de em xwedî li destkeftên Bakur, Rojava, Şengal û Mexmûrê derketin; bi heman şêwazî em ê xwedî li Kerkûkê jî derkevin. Çalakiya me ya îro jî bi vê armancê ye. Duh Şengal, Mexmûr îro Kerkûk e. Bê hesab êrîşkirina wan a ser gel wê bê bersiv nemîne ji aliyê me ve. Jixwe despêka em hatin em di zanebûna wê de bûn ku ji herdemê zêdetir pêwîstiya me bi netewbûn û pêşxistina hestên netewî heye. Ji bo pêşxistina vî rihî ya ku ji destê me bê em ê bikin. Jixwe li darxistina vê çalakiyê jî bi vî armancî ye.

**Hevalê Merwan:** Li ser van herêman hesabên aborî tên meşandin. Lê ev yek ne li gorî rastiyên gelên vê herêmê, berebajî ji bo berjewendiyên hêzên dagirker e. Lê em ê nehêlin yek destkeftên Kurdistanê bi taybet weke hêzên parastina Kerkûkê yek kevirên Kerkûkê nedin dijmin. Bi dewlemendiyên xwe yên çandî, aborî, siyasî civakî yanî bi giştî em ê biparêzin. Yek ji armanca hêrîşên çeteyan ên ser Kerkûkê jî ji bo bi destxistina van dewlemendiya ye. Beyî ku em bi berjewendiyên şexsî, hizbî tevbigerin em hatine Kerkûkê û tevahî Başûrê Kurdistanê ji van

xeteriyan biparêzin. Ji bo vê jî em ê gelê xwe biparêzin. Dewlemendiyên heyî jî radestî gelê wî bikin. Li ser vî esasî em hatine. Berê jî bangawaziya Rêber APO hebû, ji bo lidarxistina kongreya netewî. Ji bo vê jî em weke Tevger ji îtîfaqeke wiha re amadebûn. Lê hatina DA'ÎŞ'ê ev hêzên din jî naçar kir ku bigihêjin îtîfaqeke bi vî rengî. Dijminê gelê Kurd ne yeke û yek parçeye. Dijberî Kurdan Îtîfaqeke pir mezin tê meşandin bi taybet li Başûrê Kurdistanê. Ji her demê zêdetir netewbûn ji me re pêwîst e. Ji her demê zêdetir îtîfaqa navbera hêzên Kurdî ji me re pêwîst e. Bi pêşketina xeteriya DA'ÎŞ'ê re ev pêwîstî zarûrîtir bû. Em ê bê hesab û kîtap erkê xwe yê parastina gelê xwe pêk bînin. Ji bo vê ya pêwîst çibe em jê re amade ne.

HEVAL! de ka werin beriya çûyîna çalakiyê em çend wêne û dîmen bigirin. Ma yek ji xalên ku bûye çanda gêrîla jî ne ew e: Beriya çûyîna çalakiyê gerandina govendê ye.? De werin em vê çandê li vir jî pêk bînin û govendeke gêrîla bigerînin.

BELE! govenda cengê bû, ya serkeftina cengê bû. Dîlana hêvî û baweriya bi serkeftinê bû. Bi çavên biriqî, rûyê li ken, destê hevalên xwe girt û govenda azadiyê gerand. Ken, govend û dîmenên wî yên dawî bûn. Weke gelek cangoriyên din ew jî çû bêyî ku xatir bixwaze. Ken, gotin û hêviyên xwe ji me re hiştin, di gel baweriyên xwe yên bi serkeftinê.



★

KÊ TEXMÎN dikir ku ew roja ez di nav hestên xemgînî de ber bi nediyariya jiyana xwe ve bi rê ketim, dê pirsên ku bi salan bû di serê min de bibersivanda. Minê di rêwitiya vê carê de ne tenê ji wan cihên ku bi tirs û xof berve çûm jê hezbikira, pê ve bihatama girêdan jî. Jiyan çiqas bi surprîza dagirtiye ji bo mirovan. Hinek xalên ku êdî min jibîrkirîbûn, ez qet pê nedifikirim di vê rêwitiyê de wisa derketin pêşiya min ez matmayî mam li beramberî wan. Di nav nivîsê de min qala hinek xalên ku ji aliyê ruhî ve bi min ve girêdayî kiribû. Heta vê rojê jî min biryar nedabû ez binivîsim yan na. Lê ji vê kêliyê û şûnde min ferq kir ku divê ez binivîsim. Ev bi rastiya xewnên min ên salên borî ve girêdayî ye. Lê ez nizamin ez ê ji ku û çawa despêbikim? Ger despê bikim çawa bînim ziman. Divê ez ji cihekî ve despêbikim.

EZ Dİ ÇEND saliya xwe de bûm nizamin, tenê xala ku dizanim weke îro tê bîra min li gundê me ziyaretek hebû bi navê Karababa. Jixwe gundê me jî navê xwe ji vê ziyaretê digirt. Çîrokek vê ziyaretê hebû. Di nav hemû gund de dihat gotin hemû şevên înê ji wê ziyaretê çirayek pêdikeve û ber bi ziyaretek din ve diçe. Beriya derketina rojê dîsa vedigere cihê xwe. Ev ji bo min bûbû meraqeke mezin. Hemû şevên înê bi taybet havînan diçûm ser banê xanî û heta derengê şevê li benda wê çirayê dimam. Lê min qet ew çira nedît. Dema ku min ev ji pîrka xwe re got û jê pirsî ez çima nabînim, pîrka min got tu ne evdeka xwedê ya paqijî ji bo wê. Di wî temenî de paqijî yan jî qirêjî li gorî pîrka min eşkereye ku li gorî baweriya ola îslamê cil û bergên gîrtî lixwekirin û serê xwe girtin bû. Ne ez di ferqa wê de bûm û ji dervî pîrka min ne jî girtin ango

negirtina min di xema kesî de bû. Lê di her derfetê de pîrka min digot: “Baweriya te pê nîne, yên ku jê bawer nekin xwe nîşanî wan nade. Divê tu rojî bigirî, nimêj bikî erkên xwe li beramberî xwedê pêk bînî heta ku ev çira pîroz xwe nîşanî te bide.” Lê min ji pîrka xwe bawer nekir. Şopandina xwe domand. Êdî ez ewqas pê difikirim hema bêje her şev li bendê bûm. Demek di ser re derbaz bû, nexweşiyekê ez girtim. Her çiqas wê demê min nedizanî çiye jî, lê ez bawer dikim ji meraq û tirsa ziyaretê bû. Ji ber ku çûyîna min a doktor û xwarina dermanan qet fêde nedikir. Şevekê ez dîsa li benda çirayê bûm ku bibînim di xew de çûbûm. Di xewna xwe de min kalekî cilê spî li ber, riha wî spî, porê wî spî dirêj û gopalek di destê wî de di xewna xwe de dît. Ev kal hat ber serê min û ji min re got: “Keça min roja Çarşemê biçe ser zîyaretê, nîvro di nav ziyaretê de razê tê baş bibî.” Bi van gotinan ez ji xew veciniqîm û min yekser li zîyaretê nerî. Li gorî min ew kesê ku bi min re axivî bû şêxê zîyaretê bû. Lê ez gelek jê tirsiyabûm. Jixwe het tiştê ku mirov nasneke, di derbarê wî/ê de tiştekî nizanibe jêditirse. Di wê temenî de xwedê, şêx mele, baweriya dinyaya din û hdw ez ditirsandim.

Dİ NAV tirseke mezin de ez li benda roja çarşemê mam. Wê rojê bêyî ku ji kesî re bêjim çûm nav zîyaretê. Weke ku min berê jî pîrka xwe dîtibû dema ku gîştim ber deriyê ziyaretê pêlavên xwe danîn, derbazî hundir bûm, çûm kevirê ber serê wê tirba mîna ya eshabeyan dirêj maç kir û çengek axa bin kevir derxist hinek jê xwar. Pîrka min jî wisa dikir. Lê dema ku ev tişt dikir di dilê xwe de dûayek dixwend. Di jiyana xwe de min qet dûayek ezber nekiribû ku heta ez bixwînim. Ji aliyekî ve ditirsiyam ji aliyê din jî baweriya min bi gotinên wî şêxê ku di xewna xwe de dîtibû dihat. Di nav

tirseke mezin de bi wî tememê xwe li ber serê tirba şêx bi xew ve çûm. Di xewa xwe de tenê tiştê ku min dît marekî reş bû. Mar hat ser sînga min. Serê xwe bilind kir li navçavê min nerî. Mar bi min re axîvî, lê gotina ku ji min re got dema ku ez ji xew şiyar bûm qet nehat bîra min. Di wê kêliyê de ji xew şiyar bûm û heta hêza min hebû bêyî ku pêlava xwe bixim lingê xwe reviyam. Heta ber deriyê malê bêyî ku nefes bidim nesekinim. Encax dema gîştîm ber deriyê malê min xwe di nav aramiyê de hîs kir. Weke ku hûn ê jî fêm bikin min xwe avêtibû ber bextê şêx. Di dilê xwe de min biryar da bû, ger ez baş bibim ez ê êdî di rêya xwedê de bimeşim. Çend rojan li dora mizgefta gund çûm û hatim. Min xwest ku biçim mîna hevtemenê xwe de quranê bixwînim. Lê ji ber ku di gundê me de em dev jê berdin zarokên keç biçin gel feqeyekî temen 25 salî û nezewicî be, ji bilî sê zarokên kur tu kes deriyê wê mizgeftê venedikir ji bo fêrbûna quranê. Ji bo wê weke keçekê çûyîna mizgeftê û fêrbûna quranê ji bo min tenê sozeke ku min qet nekarî pêk bianiya bû. Ger min bixwesta jî dê malbatê ev derfet nedaba min. Ji bo wê min jî soza ku dabû jibîr kiribû û dîsa vegeriyabûm ser jiyana xwe ya berê.

ÇEND ROJ di ser de derbaz bû ne taya min ma, ne nexweşî û ne jî eser ji nexweşiya min mabû. Di serî de dayika min û hemû kesên malbatê matmayî mabûn bê ka ez çawa ji wê nexweşiyê xilas bûbûm. Ji ber ku doktorên ku ez biribûmê û îlacên ku min xwaribû qet fêda wan li min nekiribû. Piştî başbûna xwe, êdî sirekî min hebû, nedibû ez vî sirrî bi tu kesî/ê re parve bikim. Ger hûn rastiyê bixwazin heta salek beriya niha jî min bi tu kesî re parve nekir.

SALEK ANGO du sal beriya ku tevlî nav refên gêrîla bibim min ev xewn dîtibû. Piştî tevlîbûna xwe jî gelek caran min heman kes di xewnên xwe de dît. Lê tenê di rewşên xeter û demên ku pêwîstiyên min bi hişyariyê hebû. Di nav çend saniyeyan de li beramberî xeteriyên heyî ez hişyar dikirim û diçû. Êdî ez jê ne diritsiyam. Berevajî dema ku min ew di xewnên xwe de nedidît bê hizûr dibûm. Bi dehan car ez di mijarên xeter de ji aliyê wî ve hatime şiyarkirin. Ji ber ku hişyariyên didan min hemû rast derdiketin êdî min jî baweriya xwe pê anîbû. Lê min her tim wisa dizanî ku ew şêxê ziyareta gundê me ye, tenê xwe rê min daye û ez biçim kî darê dê min biparêze. Ez di wê baweriyê de bûm ku ez vê bi kesên din re parve bikim dê ji min dûrkeve. Ji bo wê min qet qala tiştekî wiha di jiyana xwe de nekiriye. Piştî hatina çeteyan û derbazbûna min a Başûrê Kurdistanê cihê ku cara yekê derbaz bûmê gundên girêdayî Daqûq ê Kakayiyan bû. Ez nêzîkî 8 mehan li wan deran mam. Her tim li wir nebim jî gelek caran çûm û hatim. Hema bêje min hemû kesên wê alanê naskirin. Şevekê ez û du hevalên jin çûm mala Seyîdekî. Xestibû me bibîne, ber bi êvarê bû em çûn me xwest ku bizanibin çima xwestiye me bibîne. Hinek pirsên wî hebû di derbarê fikir û felsefeya Rêbertiyê de me jî li gorî zanebûna xwe bersivand. Beriya ku em rabin albûmek anî da destê min. Di despêka albûme de wêneyek hebû, destê xwe da ser wî wêneyî û got: “Tu vî kesî nasdikî?” ew wêneyê li ber destê min kesek bû ku hema bêje bi salan e min wî nas dikir. Yekser got belê ez nasdikim. Zilam li nav çavên min nêrî. Weke ku hinek tasek ava sar bi ser min de bike, di nav panîkeke mezin de ez zivirîm û min got na. Ez nasnakim. Zilam dîsa qederekî sekini. Min fêmkir ku divê ez wî seyîdî îkna bikim ku ez wî kesê di wêne de nasnakim. Lê zivirîm û min jê re got. Seyîd bibore min wisa zanî ku ew seyîdê

Yarsana yê Rojhilate, çend roj beriya niha merasîm jê re çêkiribûn min di TV de dît. Ev kesê ku di wêneyê de ye dişibe wî. Min ev ji seyîd re gotin, lê ez ketim nav aloziyeke mezin. Êdî min nedikarî ez di derbarê kesê di wêne de pirsan jî jê bikim. Tenê min karî ez bêjim; Seyîd, te ew wêne bimin nenasand.?

SEYÎD GOT ku ew Seyîd Abbas e. Seyîdê herî mezin ê Kakayiya ye. 21 sal beriya niha wefat kiriye. Min wê demê fêm kir ku ew seyîd seyîdê ku hevalên jin û gêrîla kiribû mijara efsaneyan e. Di heman kêliyê de min rastiyeke din jî fêm kiribû, lê min nedixwest ez vê rastiyê ji xwe re jî îtîraf bikim. Ew kesê ku min di wêneyê de dît bi heman dîmenî di dehan car di xewnên xwe de dîtibû. Bi hemû tiştên xwe ve heman kes bû. Tenê yek ferq hebû ew jî wêneyê ku hatibû girtin reş û spî bû; lê min ew kes di xewnên xwe de mîna mirovekî dîtibû. Ji por bigire, heta cilan, heta torikê ku di milê wî û gopalê wî jî heman şêwe bû. Ez li bingûhê hev ketibûm. Çend rojan bi fikrekî aloz ez li derdora xwe zivirîm. Herî dawî min dît ku ez ji bin vê mijarê dernakevim çûm gel hevala Berfîn û min mijar ji wê re wekî heyî, lê bi hemû hûrkariyên wê ve vekir. Min nedizanî ez çibikim. Di vê navberê de divê ez vê jî bêjim, ev nezîkî 7-8 sale ku êdî min ew qet di xewnên xwe de nedîdît. Gotina ku heval ji min re kir ev bû.

-BELKÎ ew li benda te ye ku tu wî bibînî.

YANÎ DİVİYA bû ez bi dûv wî wêneyî, kesayetiya wî û nihîniyên wî biketama. Lê ji bo wê pêwîstiya min bi alikariya Kakayiyan hebû. Di vê mijarê de min dizanî ji Kakayiyan girtina bîlgiyan gelek zahmet e. Demekê pê fikirim ez pirsên xwe ji kê bikim dê weke pêwîst bersiva min bide. Di nav hemûyan de min dizanî dê kî

bersivên pêwîst bide min. Rojekê li gel hevalekî xort em çûn mala mirovekî wî. Ew jî hat wir. Min jê re got; ez dixwazim di derbarê mijarekê de hinek tişt ji te bipirsim û tu bersiva min bidî. Lê ji min re nebêje ev sirên me ne em nabêjin. Ez ê ya rast ji te re bêjim, tu jî ya rast ji min re bêje. Zilam ket nav meraqeke mezin. Beyî ku ez gotinê bizîvirînim yekser ketim nav mijarê û min jê re qala xewnek du xewnên xwe kir, ew kesê ku di xewnên xwe de dîtiye wêneyên wî çawa dîtiye kir. Zilam destê xwe bilind kir û got: “Bese! min mesele fêm kir. Ez ê jî ji te re rastiyê bêjim. Ez ji hemû gotinên te bawer dikim. Dizanim tu ne ji bo fêrî hinek nihîniyên me bibî vê dikî. Ger tu li çend cihên din qala van mijaran bikî em naçarin li vir, li ser navê te tekiyeyekê vekin.” Lê tu vê mijarê di hinek cihên din de, ji hinek kesên din bipirsî dê gûmanan ji te bikin. Em qewmekî gelek bi gûmanin, yên ji derveyî me dema ku hinek tiştan ji me re dibêjin em wisa dizanin ku dixwazin di derbarê baweriya me de fêrî hinek nihîniyên me bibim û bikarbînin.

XALA KU ez dixwazim fêm bibim çi pêwendiya min bi seyîd Abbas ve heye. Ez ji Amedê û seyîd ji Daqûqê. Ez sûnnî, ew Kakayî çima ez? Baş e çima ev çend sale ez êdî di xewnên xwe de nabîmin. Li gorî ku hûn dibêjim ev kes 21 sal beriya niha wefat kiriye. Dema ku ez jî xewn û demên xewnên xwe tînim gel hev, him dema ku jiyan dikir min ew di xewnên xwe de dîtiye; him jî piştî wefat kiriye. Ev çawa çêdibe?

-GER TU baweriya xwe bi felsefeya me bînî, tê tevahî bersivên pirsên xwe bibînî, lê tu pê bawer nebî ez nikarim tiştekî ji te re bêjim. Êdî divê ne ew bê gel te, tu biçî gel wî.

HEVALA BERFÎN jî ji ber ku heman gotin kiribû ez yekser ji cihê xwe veciniqîm û min got çawa yanî? Xala ku min fêmkiribû yanî divê ez jî bimirim û wiha wî bibînim. Yanî divê ez jî bimirim?

-NA HEVAL, hinekî bi rewşê, pêvajoyê, hatina gêrîla û hatina xwe ya despêka van gundan bifikire tê bersiva pirsên xwe bibînî. Hatina te ya van qadan ne tesadûf e. Ger DA'ÎŞ nehatiba, hêzê gêrîla nehatiba van deran te yê jî wêneyê Seyîd nedîtibe û te yê ew nasnekiriba. Ev hemû kerametê Seyîd in. Ew arasteya te diyar dike û te ber bi xwe ve kişand. Dema ku wî ew gotin dikirin min jî di dilê xwe de digot: "ya ku ez ber bi vir ve anîm ne Seyîd e, berevajî vesaziya rêxistinê ye. Lê piştî demekê pê fikirîm, ewqas sale her cara ku ji Başûr derketime û min gotiye ez ê careke din qet neyêm van deran, lê her car jî ji naçarî çûme dibe ku pêwendiya xwe bi vê rastiya ku ew qala wê dikin re hebe? Ger zêde bi vê mijarê bifikirim ez bawerim ez ê bêjim rast e. Lê naxwazim heta vê radeyê biçim.

BAŞ E; hûn dikarin min bibin cihê qebra wî, ez wî bibînim?

-DİVÊ TU biçî ji derwêşan îcaze bigrî. Lê ez vê jî ji te re bêjim, ez bawer nakim tu astengiyan ji bo te ava bikin. Ger tu rastiyê dixwazî hemû Kakayî ji roja ku tu hatiyî te ji xwe hesab dikin. Dibe ku tu ne di ferqa vê de bî, lê ev rastiyek e. Heta di nav xwe de me gelek caran gotiye ev heval ji me ye, lê naxwaze xwe eşkere bike. Niha êdî tu gûmanên min neman. Lê heval em rica dikin bila ev di navbera me û te de bimîne. Ez derwêşan bi te binasînim yan tê bi xwe binasî? Na ya baş ew e ku tu bi xwe biçe gel hinek kesan bila ez jî nizanibim kîne. Ji bo ku tu piştre min tawanbar nekî.

DEMEKÊ ez pê fikirîm biçim gel kîjan derwêşê/î, hemû îhtîmal dan ber çavê xwe. Li gorî tevahî îhtîmalan min biryar li ser jinekê da. Dayikek him pir ji me hezdikir, him jî me pir jê hezdikir. Lê dayikê qet nizanîbû ez dizanim ku dayê derwêşe.

PİŞTÎ demek di ser de derbaz bû, şevekê ez ji Qendilê ber bi daqûqê ve çûm. Beriya ku bigihêjim cihê xwe min tlf ji korê dayê re ku da ku bê pêşiya min ez biçim mala wan vekir. Bi tenê bûm ji bo wê jî min nexwest biçim maleke din. Ew demek bû ez neçûbûm gel dayê. Mala ku herî zêde me baweriya xwe pê tanî. Bi tenê çûyîna wê malê heta sibê nedibû pirsgirêk. Dema ku hatin ez ji ser rê girtim min dît ku hevalên xort ên bîrîma wir jî li wê malê ne. Em bi hev re li wê derê man. Wê şevê tişta ku ez qet pê nefikirîbûm nîqaşa di derbarê seyîd Abbas de bû. Lê çawa çêbû ez nizanim derengê şevê min carekê xwe di nav nîqaş û pirsên derbarê seyîd de dît. Çawa gotina seyîd Abbas ji devê min derket, kurên dayê dest bi ken kirin û gotin: “ Heval tu pirsê xwe neke, bila dayê bê pirs bersiva hemû pirsên te bide.” Min jî got; ma dayê çawa dizane ez ê çi pirs bikim heta bersiva min bide.?

-HEVAL SÊ şev beriya niha dayika min ji xew rabû û got. Wê heval di demeke nêzîk de bê mala me û di derbarê seyîd de hinek pirsan ji min bike. Wê bixwaze fêm bike bê ka çi peywendiya wê bi seyîd Abbas re heye. Yanî beriya ku tu bê me dizanî tê çi pirsan bikî. Em ji vê re amade ne.

NE TENÊ EZ hevalên ku bi min re jî matmayî mabûn. Ne gengaz bû ew seyidê ku ez despêkê pê re axivîbûm ji dayê re gotibe. Ji ber ku ew herdu malbat qet bi hev re nediaxivîn. Mijareke dijminatiyê

di navbera wan de hebû. Heta me gelek hewl da em çareser bikin. Wan nexwest em bikevin navbera wan. Me jî dev jê ber da.

MİN bi awayekî kurt xewnên xwe û pêwendiya xwe ji dayê re got. Di nav bêdengiyeke mezin da ez guhdar kirim.

-KEÇA MİN ez ê hinek pirsên te niha bibersivînim, lê ji bo hinek mijaran jî divê tu sebir bikî û li bendê bimînî. Ger seyîd Abbas mijara gotinê be divê tu li benda wî bimînî. Kengî, li kî derê wê çi ji te re bêje ew dizane. Ez nikarim vê ji te re diyar bikim. Lê vê jî baş bizanibe ev yek nabe qismetê hemû kesî. Heta niha ew li duv te beziye, divê jina û şûnde tu li dûv wî bibezî. Ger ewqas sale te wî nedîtiye, li benda te ye. Divê tu biçî wî bibînî. Lê dema ku tu çû gel wî hinek cihên din jî hene divê tu biçî wan deran jî. Nabe tu tenê biçî cihekî.

BAŞ E, ka ji min re bêje divê ez çawa wî bibînim û cihên din ku ez biçimê lî kî derê ne.?

YEKEM biçe ser qebra wî, li Elîsera ye. Duwem biçe Baweşaswar, ew jî li Kifrî ye. Sêyem biçe metqeba esasî, ew jî li Hewar e. Dema ku te ev hersê cih dîtin jixwe tê rêya xwe jî bibînî. Lê ger tu ji min pirs bikî te rêya xwe dîtiye, rêya ku te dîtiye ya rast e. Ger ne rêya rastbûye piştî tu tevlî nav refên PKK'ê bûyî û şûnde dê seyîd pêwendiyên xwe bi te re nedomanda. Lê xwuyaye rê ya ku te girtiye rêyeke rast e. Ji bo wê jî pêwistiya te bi rêyeke din nîne. Dibe ku ev çend sal te ew nedîtibe, lê ji bîr neke ew her tim bi te re ye. Heta ku pêwîstiya te pê çênebe ew ê xwe nîşanî te nede. Divê ku ew pêwîstiya te ya ku bi wî heye hîs bike û wiha bê, ger na tenê ji bo ku xwe nîşanî te bide nayê.

DEMA KU ez bi van gotinên dayê fikirîm û hinekî vegeriyam rojên xwe yên borê min dayê mafdar dît. Min tenê di rewşên herî tengav de, rewşên xeteriyên jiyanî de ew dîtibû. Di rewşên baş û xweşiyê de qet ew nedîtibû. Di vê navberê de gotina pîrka min ketibû bîra min, her tim ji me re digot: “Destê Xocê Xizir li ser we be” Gelo niha bizanibe ne destê Xocê xizir yê Seyîdekî kakayiyan li ser serê min e wê çibike. Ez bawerim wê ji qebra xwe rabe û min bixeniqîne, yan jî wê li wê dinyê Seyîd bixeniqîne. Ez bawerim ev maqûltir e. Dibe ku nikaribe xwe bigihîne vê dinyayê, lê li wê dinyayê dikare xwe bigihîne Seyîd.

DEMEKE DİRÊJ di nav fikrên cuda de çûm û hatim. Bi dehan car çûm Elîsera lê min qet ew hêz bi xwe re nedît ku ez biçim ser gora Seyîd Abbas, heta roja 26’ê Adara 2016’an. Yanî beriya ku ji qadê derkevim li gel hevala Berfîn çûm nav goristana Kakayiyan. Em li nav tevahî goristanê geriyan. Me tevahî nivisên ser qebran xwend, lê me gora Seyîd Abbas nedît. Di dawiyê de em çûn malekê û me keça malê bi xwe re anî. Dema ku em çûn ser qebrê me bawer nekir ew qebra Seyîdekî ewqas bi nav û deng be. Qebrek ji rêzê, bi heriyê, li kêlekekê hatibû çêkirin û ti girîngî jê re nehatibû dayîn. Heta ku hûn bixwazin ji rêzê bû. Ne weke qebra zarokekî jî bû. Hema bêje ti girîngî jê re nehatibû dayîn. Lê gelek qebrê din li derdorê hebûm bi hemû îhtîşama xwe ji dûr ve band dikirin ku qebrê kesên navdar, ango girîng in.

HEMA BÊJE weke ku cara yekê ez çûbûm nav ziyaretê min pêlavên xwe derxist, çûm ber serê wî, lê ji ber ku ber serê wî ne ji kevir ji heriyê hatibû çêkirin hêdî maç kir û li wir sekinîm. Gelek ecêbe lê ez di wê kêliyê de li benda marê reş bûm. Ya ku di dilê

min de derbaz dibû hatina marê reş bû. Ger di wê kêliyê de min marê reş ditiba, misoger minê di wê kêliyê de ji hemû tiştên ku hatibû gotin bawer bikira. Qumaşekî kesk li ser gora wî bû. Min ew qumaş rakir, bi hêviya ku mar ji binî derkeve. Lê derneket. Ez pê fikirîm gelo ez şev bêm li vir razêm ez ê wî marî bibînim yan na? Ez di nav pirsên bi vî rengî re asê mabûm. Di navbera niha û dîrokê de asê mabûm. Di wan kêliyan de nedizanî ez di nav dîroka xwe ya borî de, di ziyareta gundê me de me, yan li ber serê seyîdê ku min şêxê ziyareta gundê me dizanî.

GELO SEYÎD şêxbû, yan şêx seyîd bû. Ger ew ziyaret ya seyîdekî Kakayiya ye wê demê ew sûnnî û muslimanên gundê me çima jê re îbadet dikirin? Ger ya şêxekî bû keseke weke min di jiyana xwe de ti erk û wacibên olî pêkneaniya çima xewnên wiha didît.? Hema bêje ev pirs û gelek pirsên mîna van di serê min de li binguhê hev diketin. Ne wê demê û ne jî niha min bersiva van pirsên xwe negirtiye. Ger ez li gorî teoriya dayê biçim divê ji bo girtina bersivan ji van pirsan re ez li benda demê guncaw bimînim. Dayê dibêje, di nav xwezayê de her tiştê ku diqewime li gorî demê ye. Di xwezaya mirovan de jî ger dema wê nehatibe xweza tiştekî fêrî mirovan nake. Ew peyama ku tê dayîn ne ji aliyê hêzekî îlahî ve ye. Hêza herî îlahî û xuluqkar xweza ye. Ji wê zêdetir xuluqkar nîne. Ger dayika xweza guncaw bibîne dê bersiva hemû pirsên min di nav jiyanê de ji min re bên dayîn.

DEMA KU em ji wir dûrketin min ji keçikê pirsî; çima gora hemû seyîdên din cuda ye, mîna merqeban hatine çêkirin, lê ya seyîd Abbas ewqas ji rêzê ye?

SEYÎD Dİ jiyana xwe de kesekî sade jiyaye. Mîna derwêşekî, li gorî felsefeya derwêşan tevgeriya ye. Beriya wefat bike wesiyeta wî ew bûye ku goreke ji rêzê jê re çêkin da ku pênaseya jiyana wî ya rast, durist û sade bike.

TEVÎ KU 22 sale wefat kiriye heta niha jî hinek murîdê wî hene, lê kes negiştiye asta wî. Muridên wî şopdarên wî ne, lê di heman demê de sirrên olî jî ji aliyê wan ve tê parastin. Gelek nihîniyên wan ên olî hene ji aliyê van kesan ve parêzvanî lê tê kirin.

BELE! Weke ku dayê ji min re gotibû, ez çûm Baweşaswar û Hawar. Min herdu cih jî dîtin. Hema bêje mirov aşiqî xwezaya Hawar dibe. Çend cihên îbadetê lê hebûn em çûn hemûyan. Hêvîdarim ku min erka xwe li beramberî parêzvanê xwe pêk anîbe û li min qebûl bike. Ger ez li gorî bawerî û felsefeya wan a jiyanê vê mijarê şîrove bikim ez dê bêjim reankarnasyon (Donawdon) rast e. Yanî ruhê min ayîdî Kakayiyekê ye. Ji bo wê jî pêwendiyeke min a ruhî bi wan re heye. Ji bo vê ye ku ji aliyê Seyîdê xwe ve têm parastin. Lê hûn rastiyê bixwazin ez nizanim bi kîjan rêbazê û felsefeyê şîrove bikim. Ji bo wê jî ez ê dayê esas bigirim û li benda peyama dayika xwezayê bimînim. Heta ku ew peyama rast bide min êz ê jî li gorî wê tevbigerim. Bi hêviya girtina peyam û bersivên xweş ji xwezayê; em gera xwe ya vê qadê bi vê mijarê bi dawî bikin.

Jİ BER ku ez ê ji vê qadê veqetim û berê xwe bidim cih û warên xwe. Her çiqas cesteyî ji wan qadan dûrbikevim, qut bibim, dê ji niha û şûnde her tim aliyekî dilê min li vir bimîne. Hebûna hevaltiyê, hebûna mirovên ku tu bi wan heyî, ji wan hez dikî li kî derê bin tu jî bi wîr ve tê girêdan. Dizanim dê ev qad her tim xwedî

cihekî taybet bin ne tenê li gel min, li gel hemû hevalên ku li van qadan, ked dan, şer kirin, xwîn û xwêdan rijandin. Dê neyê jibîrkirin, ma jibirkirin ne xiyanet e? Gelo kesê bikaribe Merwan, Armanc, Akîf û Şevgeran bi tenê li vir bihêle, dê kes bikaribe pişta xwe bide wan û bi asanî biçe? Ma kes dikare Egîdê ku beriya her kesi ber bi Kerkûkê ve baz da û piştre berê xwe da Şengalê şehîd bû, ji van deran derxe. Dikare ji nav dilê ciwanên herêmê bavêje, ji bîra zarokên pêxwas û tazî bibe.? Ew ê her tim bi rûyên xwê yên bedew, lêvên bi ken bi xemilînin kolan û cadeyên Kerkûka rengîn. Dê bi rengê xwe bi xemilînin, bi xwîna xwe sor bikin ala azadiyê, meşxela pêşeroja zarokên rojê.

HER QUTBÛNEK derî li ber nediyariyan vedike di jiyana mirovan de. Her xatirxwestinek silavdayîn û merhebayeke nû di nav xwe de dihewîne. Her qutbûnek dibe sedema bi hevgiştineke din di jiyanê de, rê li ber nediyariyan vedike. Nediyarî her tim mirovan ditirsîne. Ditirsî, ji ber ku dizanî tu diçî, lê gelek tiştan li şûn xwe dihêlî. Tevahî hezkirin, girêdan, evîn û evîndariyên te li şûn te dimînin. Ya ku tu dikarî bikî di nav hest, soz û dilê xwe de cihekî taybet ji wan re veqetandin e. Di gel vê de hewandin û mezinkirina hêviya ku “gelo ez ê careke din bikaribin wan bibînim e” Ger di jiyana mirovan de nediyarî nebûna, bikaribûna hemû jiyana xwe di nav sînorên diyar de bijiya dê ti tam ji jiyanê bigirta? Dê bikarîba bi qasî tirsê tam ji nihîniyên jiyanê jî bigirta? Ger nihînî û nediyarî nexwemlînin jiyanê dê jiyan çawa bê bidestgiritin ji aliyên mirovan ve.? Jiyan bi nihînî, nepenî, nediyarî û srprîzên xwe ve xweş e, bi van bi wate ye. Lê ger di nav van de cihekî taybet ji hezkirin, evîndarî û evînên bê sînor re neyê veqetandin dê xweşî û xweşikbûn, balkêşiya xwe ji dest bide. Her jiyaneke balkêşî,

xweşîkî û xweşbîna xwe ji dest da bê wate dibe. Ma ne êş, jan, qutbûn û dûrketine ya ku dihêle mirov tamê ji yiyanê bigire? Tevahî kêliyên êş, azar, hêvî, şadî û dilxweşî dibe sedem ku mirov bi hebûn û xwebûna xwe bihese.

EZ CAREKE DİN pêhesîm ku em weke mirov çiqas xwe dixapînin. Ez ne bawerim ti tiştek weke xwe xapandina mirovan be, ji bo ku gelek caran mirov bikaribin jiyana xwe bidomîne rê li rêbazên bi vî rengî dide. Wisa dizane ku dikare sînorên hezkirinên xwe diyar bike. Kengî bi kî derê ve bê girêdan, jê hez bike ew bi xwe dikare van sînoran xêz bike. Lê hezkirin û girêdayîn ti carî sînoran nasnake, ji xêzkirinan re deriyê xwe venake. Hezkirin û girêdan bi mekanan ve nayê pîvan. Yên ku dibe sedemê hezkirinê ne mekan in, kesên ku di wan mekanan de ji bo heman armancê jiyana xwe didomînin e. Ger di wan mekanan de hewrêbazên te, hevrêyên te nebe, gelo jiyan dikare li wir bi hemû xweşikiya xwe bidome. Ma bingehê domdariya jiyanê ne hezkirineke bê berdêle. Di vê rêwîtiyê de sînorên hezkirin û girêdanên min ji asta çiyayan daket deşt û bajaran. Êdî dizanim her roja ku derbaz dibe sînorên min ên hezkirinê, sînorên aqlê min û yê dilê min derbaz dikin. Dizanim her cihekî hûn lê bin, bijîn, hebûna xwe tê de bidomînin ez, hûn, em ê pê ve bên girêdan. Ew cihên ku em bi israr jê direvin, dixwazin jê dûrkevin dema ku kêliyên dûrketinê tên ewrên xemgîniyê xwe berdide ser dilên mirov, tirsa qutbûn û nedîtinê dixwemlîne cihana rihên mirovan. Bi çavên kelogîrî, dilê şîkestî, dûr dikevî berê xwe didî rawestgeheke din a ku bi nediyariyan ve dagirtî. Dizanî di wê rêwitiyê de tê li xemên xwe xeman zêde bikî, li ser êşên xwe êşa, li ser bêrîkirinên xwe bêrîkirin, li ser hêviyên xwe hêviyên mestir zêde bikî.

Barên giran mirov di eciqîne, em di binê van baran de dikevin. Ev giranî gelek caran mirov bi erdê re dike yek. Lê barê herî giran têrbûna herî mezin e li beramberî jiyanê û derfetên ku bi te dide bexşandine. Bar çiqas giranbe, jiyana mirov ewqas dadikeve ser rûyê zevî. Wê demê hîn rast û dijwartir dibe. Ger mirov berevajî bifikire yan jî bi dest bigire, misoger ji vî barî rizgar bibe û mahrum bimîne dê mirov sivik bike. Biqasî ku bikaribe ber bi esîmanan bifire sivik bibe. Lê dema ku barê jiyanê jî negire ser milê xwe, bi giraniya jiyanê nehese ji xwe tê wateya ku tu najî. Ger tu bi jiyanê nehesî, dikarî azadiyê hîs bikî. Êş-azar, şadî- xemgînî- jiyan- mirin, xweşî- nexweşî, girêdan- qutbûn, ronahî- tarîtî, çorsî-nazikî, sar-germ, hebûn- nebûn di jiyanê de; nemînê ti wateya têkoşîna di navbera van de jî namîne. Ji bo vê ye ku divê mirov fêrî bi hev re jiyan û jiyandina van bibe. Yanê bizanibe piştî her xatirxwestinekê silav dayîna jiyaneke nûye. Hema bêje weke nivisê, çawa ku piştî her xalekê hevokek din tê, piştî her paragrafê divê paragrafeke din bê, heta ku tu paragrafekê bi dawî nekî nikarî dest bi yek din bikî, jiyan jî di nav vê qanûnê de didome. Ji bo ku tu silav li jiyaneke nû, li mekanên nû, li mirovên nû bikî, divê ji yê berê xwatir bixwazî. Yanê her neyîniyek erêniyekê di nav xwe de dihewîne.

Jİ ALİYEKÎ ve kêfxweş im ji ber ku ber bi cih û warên xwe yên jiyana xwe ve diçim. Pişta xwe didim bajarên ku mîna cinawaran mirovan dadiqurtîne, berê xwe didim himêza dayika xwe. Ez ê serê xwe bidim ser sînga dayika xwe, di himbêza dayika xwe de razêm. Bêyî ku bi tiştekî din bifikirim. Li bin darekê, li ber kevirekî, li asîmanên welatê xwe biqasî ku jê têr bibim binêrim. Lê ji aliyê din ve jî dizanim ku çawa bigihêjim wargehên jiyana xwe êz ê bêriya van deran bikim. Cihên ku ez ê bêriyê bikim ne bajêr, ne deşt, ne

dar û berên van qada ne. Ya ku girêdanê dide avakirin ne mekan in, hebûna mirovên ku di wan mekanan de dijîne. Xweşîkî û bedewiya xwezayê heta radeyekê mirovan matmayî dihêle li beramberî xwe. Lê ya ku dibe sedema evîn û hezkirinê hebûna hevalên ku li wir in. Ger ew nebin tu dizanî bi binayên bilind, axên zûwa, erdên bê berhem ve nayê girêdan.

BELE; min careke din tûrikê hezkirin û bêrîkirênên xwe da milê xwe derketim nêçîra nediyariyan. Nediyariyên ku dê deriyê nû ji min re vedike. Ez ê jî mîna şîrê pêsîra dayika xwe bê tirs; daqurtînim van nediyariyan. Da ku veguherînim diyarî, hezkirin û evîndariyên nû li ser axa welatê zarokên rojê.



**CİVÎNA PLANSAZİYA OPERASYONÊ**



06-08-2014 ROJA ÇÛYÎNA GÊRÎLA YA KERKÛKÊ



**MATARA, YEKEMÎN CİHÊ BİRYARGEHÊ**



## OPERAYONA SAHD Û XALÎD



**HEVALÊ ARMANC: BERİYA ÇÛYÎNA ÇALAKİYA WEHDÊ**



**ŞEHÎD ŞEVGER Û ARMANC**



**SENGERÊN ŞER**



**DEMA ÇÛYÎNA OPERASYONÊ**



**DARIŞTINA PLANSAZIYA ÇALAKIYÊ**



**ŞEHÎD MERWAN GEZGOR**



**GERÎLAYÊN JIN LI SER DOÇKAYÊ**



**ROPORTAJ LI GEL HEVALÊ MERWAN**



CIVÎNA PLANSAZIYA ÇALAKIYÊ



**HERDU CANGORÎ DI HEMAN KAREYÊ DE**



***De rabin heval! Rabin, Kerkûk,  Maxmûr, Şengal li benda we ye. Zarokên pêxwas, tazî û birçî di bin tirsê de dijîn. Tirs e, xewna şêvê wan. Xof e; ya ku jiyana wan dixemilîne. Xemgînî rûniştiye li ser rûyên zêrîn ê pêşeroja welatê te; zarokên rojê. Ka rabe berê xwe bide ware talan, dagirkerî û bêhêviyê. Da ku tu hêviyê biafirine di wan cih û waran de! Bibe hêvi û baweriya pêşerojê.***